

BİNGÖL ISSN: 2147-5679
ÜNİVERSİTESİ 2020/1
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
DERGİSİ Yıl/Year:6 Cilt/Volume:6 Sayı/Issue:11





BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year:6 Cilt/Volume:6 Sayı/Issue:11

2020/1
ISSN: 2147-5679

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
BİNGÖL 2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year:6 Cilt/Volume:6 Sayı/Issue:11

ISSN: 2147-5679

Sahibi / Owner

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Editörler / Editors

Öğr. Gör. Murat VAROL
Öğr. Gör. Şerif GÜZEL

Dergi Sekreteryası ve İletişim /

Secretary of Journal and Communication:

Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

Dergi Tasarım ve Uygulama / Magazine Design

Şemal Medya Tasarım Ofisi

Dergi Yazışma Adresi / Correspondence Address

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl

Telefon: 0426 216 00 42

Faks: 0426 216 00 42

Enstitü e-posta: yasayandillerenst@bingol.edu.tr

Dergi e-posta: bingolyasayandiller@gmail.com

Basım Yeri / Place of Publication

Enes Basın Yayın Matbaacılık Ltd. Şti.

Maltepe Mah. Litros Yolu Sok.

Fatih Sanayi Sitesi, No: 12/210,

Zeytinburnu/İstanbul

Tel: 0 212 501 47 63

Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu
Editorial Board and Advisory Board

Prof. Dr. Abdulaziz BEKİ
Prof. Dr. Abdulaziz HATİP
Prof. Dr. Abdullah KIRAN
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ
Prof. Dr. Mehmet BARCA
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ
Prof. Dr. Nesim DORU
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN
Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK
Doç. Dr. Abdurrahim ALKIŞ
Doç. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ
Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN
Doç. Dr. Hayrettin KIZIL
Doç. Dr. İbrahim USTA
Doç. Dr. Mehmet BİLEN
Doç. Dr. Metin YİĞİT
Doç. Dr. Mustafa AGÂH
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN
Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ
Dr. Öğr. Üyesi Ahmet KAYINTU
Dr. Öğr. Üyesi Ayhan TEK
Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY
Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ
Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD
Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YAZICI
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa GÜNERİGÖK
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDOĞDU
Assist. Prof. Dr. Yadgar Rasool

- Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, ulusal hakemli bilimsel bir dergidir.
- Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

Bu Sayının Hakemleri

- Prof. Dr. Hasan İFTCİ - Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Canser KARDAŞ - Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Hayreddin Kızıl - Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN - Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ - Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Ahmet KIRKAN - Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Hacı ÖNEN - Dicle Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi İlyas SUVAĞCI - Hakkari Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi M. Emin PURÇAK - Muş Alparslan Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDOĞDU - Bingöl Üniversitesi
Öğr. Gör. Ayhan YILDIZ - Mardin Artuklu Üniversitesi
Öğr. Gör. Mehmet ASLANOĞULLARI - Bingöl Üniversitesi
Öğr. Gör. Zülküf ERGÜN - Mardin Artuklu Üniversitesi

İÇİNDEKİLER



EDİTÖRDEN	07
BEYTÊN KURDÎ: MEMÊ ALAN WEK MÎNAK Parviz JAHANY - Hasan ÇİFTCİ.....	9-34
TAYBETÎYÊN SEBKA IRAQÎ DI HELBESTÊN ÎBN ADEM (WACIM) DA Hemin Omar AHMAD - Nurettin ERTEKÎN.....	35-56
ZAZAKÎ DE SEBEBÊ VURÎYAYÎŞÊ VENGAN Û CAVURÎNAYÎŞÊ VENGAN Ahmet KIRKAN.....	57-74
WEKÎ NIMANDINA ZANAVÊ; RANÊZIKIYA ZIMANÎ Û WÊJEYÎ DI KOVARA REWŞENÊ DE Dilaver DÖĞER - Canser KARDAŞ.....	75-89
KURTENÊRÎNEK LI TÊGEHÊN EDEBIYATA DINYAYÊ, EDEBIYATA BERAWIRDÎ Û NÊRÎNÊN DAVID DAMROSCH Türkan TOSUN.....	91-104
NAZIM Û ŞA'IR MELA ZAHID ZEHERÎ (BAŞER): JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Nurettin ERTEKÎN.....	105-136
MUQAYESEYÊ SONIKANÊ KÊZ XATÛN A KURMANCÎ Û GÛLAL XATÛN A ZAZAKÎ Pervin SEPTİOĞLU.....	137-148
DAHÛRANDINA HELBESTA BERKEN BEREH YA BI NAVÊ “TU CARÎ BERNEDE DESTÊ EVÎNÊ” Mehmet Nur YAVUZER.....	149-164

EDİTÖRDEN...



Değerli Okurlarımız

Yılda iki defa yayınlanan dergimizin 2020 yılı on birinci sayısını sevinç ve heyecanla sizlere sunuyoruz. Bu sayımızda zengin bir içeriğe sahip makaleler sizleri bekliyor.

Parviz JAHANY ve **Hasan ÇİFTÇİ**'nin hazırladığı *Beýtên Kurdî: Memê Alan Wek Mînak* adlı çalışma aynı zamanda bir karşılaştırma ve inceleme yazısıdır. Bu çalışmada *Memê Alan*'ın aslında bir beyit olarak ele alınması gerektiği vurgulanmakta ve Kürt edebiyatında beyit kavramının Arap edebiyatından farklılıkları açıklanmaktadır. *Memê Alan* hakkında detaylı bilgiler ve analizlerin olduğu bu çalışmada, Kürt edebiyatında buna benzer birçok beyitlerin mevcut olduğu da dile getirilmektedir.

Hemin Omar AHMAD ve **Nurettin ERTEKİN**'in ortak hazırladığı *Taybetîyên Sebka Iraqî di Helbestên İbn Adem (Wacım) da*, İran edebiyatında görülen sebk (üslup) özellikleri ele alınmakta ve Sebk-i Irakî üslubu üzerinde durulmaktadır. Makalenin girişinde sebk (üslup) çeşitleri açıklandıktan sonra Sebk-i Irakî'nin özellikleri ve İbn-i Adem'in şiirlerine yansımaları örnekler üzerinden gösterilmektedir.

Ahmet KIRKAN, *Zazakî de Sebebê Vurîyayîşê Vengan û Cavurînayîşê Vengan* adlı çalışmasında; Zazaca'daki ses değişimleri üzerinde durmakta, bu ses değişimlerinin sebepleri hakkında bilgi vermekte ve aynı zamanda örnekler sunmaktadır.

Dilave DÖĞER ve **Canser KARDAŞ**'ın beraber hazırladığı *Wekî Nimandina Zanavê; Ranêzîkiya Zimanê Ê Wêjeyî di Kovara Rewşenê de* adlı çalışma, 1992 yılında yayın hayatına başlayan *Rewşen Dergisi*'nin, dil ve edebiyat üzerindeki etkisini ele almaktadır. Bilindiği gibi 1991 yılı itibariyle birçok Kürtçe dergi ve gazete yayın hayatına başlamış, Bunlardan biri olan *Rewşen Dergisi*'nin dile olan katkısının yanında folklor ve klasik edebiyat alanında da Kürtçe için önemli bir birikime sahip olduğu vurgulanmaktadır.

Türkan TOSUN'un hazırladığı *Kurtenêrînek li Têgehên Edebiyata Dinyayê, Edebiyata Berawirdî û Nêrînên David Damrosch* adlı çalışmada karşılaştırmalı edebiyat ve dünya edebiyatı kavramları ele alınmakta ve bu alanda önemli katkıları olan David Damrosch'un teorisi, çalışma ve düşünceleri izah edilmektedir. Bu bağlamda Kürt edebiyatında David Damrosch'un teori ve fikirlerinden yararlanma uygulama olanakları ele alınmaktadır.

Nurettin ERTEKİN'in hazırladığı *Nazim û Şa'ir Mela Zahid Zehêrî (Başer): Jîyan, Berhem û Kesayetiya Wî ya Edebî* adlı çalışma, klasik Kürt edebiyatına yeni bir sima eklemektedir. Söz konusu çalışmada ardında birçok eser bırakan Mela Zahid

Zeherî'nin aynı zamanda yazdığı nazım ve şiirlerle de edebi kişiliğine vurgu yapılıyor. Yine bu çalışmada Zeherî'nin eserlerinin ilk defa tasnifi yapılmaktadır.

Pervin SEPTİOĞLU, *Muqayeseyê Sonikanê Kêz Xatûn a Kurmancî û Gûlal Xatûn a Zazakî* adlı çalışmasında, Kurmanca Kêz Xatûn ile Zazaca Gûlal Xatûn masallarının kısa birer özetini verdikten sonra; bu masalları ortak yönler, ayrılan yönler, tekerlemeler gibi birkaç açıdan incelemektedir.

Mehmet Nur YAVUZER, *Dahûrandina Helbesta Berken Bereh ya bi Navê "Tu Carî Bernede Desîê Evînê"* modern Kürt edebiyatının önemli şairlerinden olan Berken Bereh'in *Tu Cari Bernede Desîê Evînê* adlı şiirini tahlil etmektedir. Söz konusu şiir tema, edebi sanatlar ve dil açısından irdelenmektedir.

İyi okumalar dileğiyle...

BEYTÊN KURDÎ: *MEMÊ ALAN WEK MÎNAK*¹

Kürtçe Destanlar: *Memê Alan Örneği* Kurdish Epics: *Memê Alan as a Sample*

Parviz JAHANY² - Hasan ÇİFTÇİ³

Kurte

Mijara lêkolîna vê gotarê pênasekirina beyta Kurdî û çemka wê; cudatîya beyta kurdî û ya ‘Erebî û nasandina beyta *Memê Alan* e.

Yek ji çiqên herî giring di nav toreya gelêrîya Kurdî da beyt e, ku di parvekirinê da dikeve nav pişka helbestkî. Beyt şeweyeke toreyîya kurdî ya serbixwe ye û dewlemendirin çîqa toreya gelêrîya kurdî ye. Gelek lêkolîneran li ser toreya zarkîya Kurdî û bi taybetî jî li ser beyt û mijara beytên Kurdî; nav û çemka beytê lêkolîn kirine. Hindek lêkolîner we hizir dikin ku navê beyta kurdî li jêr kartêkira peyva beyta ‘Erebî da peyda bûye, ku ji ‘Erebî derbasî Farsî bûye. Lê pişkek zor ji lêkolêran li ser wê bîr û bawerîyê ne, ku beyta Kurdî û beyta ‘Erebî ne heman tişt in û her yek bi wateyêke cuda ji ya din hatiye holê. Çemk û wateyên wan jî cuda ne. Em ê di vê xebatê da vê tevliheviyê nîqaş bikin û behsa peyv û çemka beytê bikin.

Bi nav, naverok û mijarên cur be cur gelek beyt di zimanê Kurdî da hene, ku yek ji wan beytana *Memê Alan* e, ku ji hemûyên din bi nav û bangtir e. Em ê di vê xebatê da beyta *Memê Alan* hildin navendê û nîqaş û vehonîna çemka beytê bikin.

Ev gotar ji destpêkek û du pişkan pêk tê. Li dû destpêkê em ê li ser peyva beytê û wate û çemka wê bixebitin û li pişka duyem jî dê li ser *Beyta Memê Alan* rawestîn û ewê beytê bi hûrgilî bidin nasandinê.

- 1 Ev gotar ji teza min ya bi navê: *Berawirda Mem û Zîn a Kurmancî û Hewramî (Kurmancî ve Hevramî Mem ile Zîn Destanının Karşılaştırması)* hatiye vegirtinê.
- 2 Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bingolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. cihaniperwiz2020@gmail.com
- 3 Prof. Dr. Zanîngeha Bingolê, Fakulteya Fen-Edebiyatê, Beşa Edebiyat û Zimanên Rojhilatê, hciftci@bingol.edu.tr

Peyvên Kilîdî: Beyt, Memê Alan, Zîna Zêdan, Toreya Gelêrî, Oskar Mann.

Özet

Bu makalenin konusu, Kürt destanının ve kavramının tanımının yapılması; Kürtçedeki destan ile Arapçadaki destan arasındaki farkın incelenmesi ve *Memê Alan* destanının tanıtılmasıdır.

Kürt folklorunun en önemli dallarından biri şiirsel kısma giren destandır. Destan, Kürt folklorunda bağımsız bir türdür ve Kürt folklorunun en zengin koludur. Birçok araştırmacı Kürt sözlü kültürünü, özellikle de destanlar ve Kürt destanlarının konusu ile destanın adı ve kavramı hakkında araştırma yapmıştır. Bazı araştırmacılar Kürt destanının adının Farsçadan Arapçaya geçen destan kelimesinin etkisi altında olduğunu düşünmektedir Ancak araştırmacılar arasında, Kürtçedeki destan ile Arapçadaki destanın her birinin farklı anlamlardan türediklerine; kavram ve anlamlarının farklı olduğuna yönelik güçlü bir inanış var. Biz bu çalışmada yaşanan bu kavram karmaşasını tartışacağız ve destan kelimesini ve kavramını irdeleyeceğiz.

Kürt dilinde farklı isimleri ve içerikleri olan birçok destan vardır. Bunlardan biri *Memê Alan* destanıdır ve diğer tüm destanlardan daha ünlüdür. Bu makalede destan kavramının tartışması ve analizini *Memê Alan* destanını merkeze alarak yapacağız.

Bu makale bir giriş ve iki bölümden oluşmaktadır. Girişten sonra “destan” kelimesine, anlamına ve kavramına odaklanacağız. İkinci bölümde *Memê Alan* destanına odaklanacağız ve bu destanı detaylı olarak analiz edeceğiz.

Anahtar Kelimeler: Destan, Memê Alan, Zina Zêdan, Folklor, Oskar Mann.

Abstract

The topic of this article is the study of the Kurdish epic, its concept and definition and the difference between epic in Kurdish in Arabic and the introduction of the epic of *Memê Alan*.

One of the most important branches in the Kurdish folklore is the epic that is in the poetic branch. Epic is an independent genre in Kurdish folklore and the richest branch of the Kurdish folklore. Many researchers have researched the Kurdish oral culture, and in particular about the epics and the topic of Kurdish epics and the name and concept of the epic. Some researchers think that the name of the Kurdish epic has been coined under the effect of Arabic word for epic, which passed from Arabic to Farsi. But there is a strong belief among researchers that the word epic in Kurdish and Arabic isn't the same thing, each has a different meaning and their concepts are also different. In

this work, we will discuss this ambiguity of the concept and analyze the word and concept of epic.

There are a lot of epics with different names and contents in Kurdish language, one of which is *Memê Alan*, which is the most famous one. In this work, we will discuss concept of epic by taking the *Memê Alan* epic to the center.

This article consists of an introduction and two parts. After the introduction we will focus on the word “epic” and its meaning and its concept and in the second part we will focus on the epic of *Memê Alan* and will analyze the epic in detail.

Key Words: Epic, Memê Alan, Zina Zêdan, Folklore, Oskar Mann.

Destpêk

Gava ku mirov li ser toreya gelêrîya Kurdî dixebite û li hemû çiq û şaxên wê yên rengareng mêze dike û li ser wan hûr dibe, hînga ye ku mirov bi berfirehî û zengînîya vê toreyê agadar dibe. Ji ber vê rengarengî û zengînîya naverokî û berfirehbûna meydana mijaran e, ku hemû lêvekolên ku li ser toreya zarkîya Kurdî xebitîne, bi hevdengî zengînîya vê toreyê pejrîrandîye û ji rengarengîya wê zendegirtî mane.

Hecîyê Cindî (1908-1990) li ser zargotîna Kurdî weha dinivîse: “Zargotîna Kurmancîyê gelekî dewlemend e û pirjanr e. Gelek in beyt-serhatîyêd wê ye eyan, çawa “Memê û Zînê”, “Dimdim” û yê dinê. Gelek in hikayetêd wê ye hezarnavî, serhatî, mijûlîyêd wê. Bêhesab in kilamêd wê yê mêra, keçîka, xebatê, govendê, metelok û meselêd wê.”⁴

Toreya Kurdî ya zarkî di pileya yekem da li bara teşe û ruxsarê xwe va li ser du pişkînan tê parvekirinê: 1. Pişka helbestkî 2. pişka pexşankî.⁵ Heryek ji van pişkînan di nav xwe da li bara teşeyî û naverokî da dibin çendîn çiqan û di gelek biwaran da her çiqek jî li ser çendîn binçiqan têne parvekirinê. Yek ji çiqên here girîng û zengîn yê toreya gelêrî ya Kurdî beyt e, ku ew jî li bara teşeyî û naverokî da xudanê çendîn çiq û şaxên curbecur e.

Li ser peyva beytê gelek kesan lêkolîn kirine û her yekê bi şêweyekê û hindî zanîn û têgehîştina xwe peyva beytê şirove kirine. Bi pêka agadarîyên ku me ji jêderên peywendîdar bi dest xwe ve înanê, peyva beyt di zimanên Kurdî, Farsî û ‘Erebî da heye. Lê wate û çemkên wan ji hevdu cuda ne.

4 Hecîyê Cindî, *Hikayetêd Cimeata Kurda, I. Weşanxaneya Rûpelê*, çapa 1. Stenbol 2014, r. 13.

5 Ayhan Yıldız, *Hunera Vegotîna Bedew A Devkî û Nivîskî*, 2017, Van, 1, r. 121 - Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasik*, Çapa Duyem, Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 30

Di zimanê ‘Erebî da ji xanî yan malê ra beyt dibêjin. ‘Ereban yekîneyeke helbesta klasîk jî wekandine/şuandine mal yan xanî û bi şeweya mecazî ji wê ra jî beyt gotine. Ji nîvmalikeke helbestê ra jî misra‘ gotine. Beyt yanê xanî û misra‘ jî wate layek ji du layên dergehî. Çun mala ‘Ereban di binêşê da ‘kon bûye, li dû ra navên sing, û sitûn û hebinên ‘konanî⁶ jî li sê ruknên ‘Erûzê yên binêşeyî kirine.⁷

Lê “beyta kurdî ne malikeke helbestê ye, ew janreke ser bi xwe ye û navê çiçek ji toreya gelêrî ye ku hindek ji wan ji sedan malik û nîvmalikan pêk tên.”⁸ Tenê tiştê ku van herdu peyvana digehîne hevdu helbestbûna wan e. Em di edebîyata Farsî da jî rastî peyvaya beytê dihên, ku pêş da ji hemû helbestan ra hatîye gotinê, lê li dû serketina Îslamê û zalbûna ferhenga ‘Erebî li ser ya Îranîyan, Farsan jî weke ‘Ereban ji malikeke helbesta klasîk ra beyt gotine. Emê li dirêjaya vê gotarê da bi anîna şahid û serpelgeyan ronahîyê bêxin ser vê mijarê.

Bi pêka hemû kesên ku li ser toreya gelêrîya kurdî xebitîne, beyt yek ji zengîntirîn şax û çiqên toreya gelêrî hatîye hejmartinê.

Hebîbullahê Tabanî li ser beytên Kurdî weha dinivîse:

“Toreya gelêrî ya Kurdî zortir li ser şaxeya lawîje û beytan hatîye damezirandinê, ku ji cuwantirîn peyvên evîndarîyê û çîrokên atîfî yan efsane û çîrokên hemasî û qehremanî pêk tên, ku heryek efsaneyeke pehlewani yan bûyereke dîrokî vedigêrin û bi şeweyên helbestî û pexşanî ji nifşekê bo nifşa din tên veguhestîne. Yan jî di van du sedeyên dawîyê da hatine weşandinê.”⁹

Beyt weke janreke serbixwe ya toreya gelêrî di zaraveyên Kurmancî û Soranî da heye û hejmara beytan di van herdu zaraveyan da ji dusedî zêdetir e. Beyt weke janreke serbixwe di nav hemû Kurmancîaxêvan û di navçeyên Soranîaxêvan da jî di navçeyên Mukrîyan, Soran û Baban da heye.”¹⁰

Ji beytên kurdî ya here bi nav û bang ku bala gelek ji lêvekolên Kurd û bîhanî li ser xwe da rakêşaye û bûye mijara lêkolînên akademîk, beyta *Memê Alan* e. Beyta *Memê Alan* bi zareveyên Kurmancî û Soranî hatîye gotinê.

Beyta *Memê Alan* he ji mêj ve bala lêvekolên xoyî û bîhanî û helbestkarên kurd li ser xwe da rakêşaye. Yekemîn kesê kurd ku li ser vê beytê xebitîye û ew ji

6 Peyvên “Sebeb”, “Weted” û “Fasile” ku tên bi wateya: hebin, sing û sitûnê ‘kon, li ruknên ‘erûzê kirine.

7 Şemseddîn Muhemed Qeys-Elrazî, *Elmu’cem Fî Me’ayiri Eş’aril-’Ecem*, Beyrût, 1909, r. 15.

8 Ehmed Şerîfî, “Ustûreha ve Efsanehayê Kurdî” *Fesîlnameyê Ferhengê Merdumê Îran*, şomare-hayê 7 ve 8, behar 1386 hş. r. 104-106

9 Hebîbullah Tabanî, *Vehdet-ê Quwmî-yê Kurd ve Mad, Menşei-ê Nejad ve Tarîxê Temeddun-ê Kurdistan*, Neşr-ê Gusterdê, Tehran 1380 hş. r.433

10 Emîr Hesênî, “Beyt” *Danîşname-yê Cehan Islam, Iranika*, (made-yê Beyt2) cild 1. S. 2365

<http://lib.eshia.ir/23019/1/2365>

xwe ra kirîya mijara afirandina şahesera xwe, Ehmedê Xanî¹¹ ye. (1650/1-1707) Li dû E. Xanî ra du helbestkarên Hewramîaxêv jî bi navên Mîrza, ew beyta ji xwe ra kirine jêder û mesnevî li ser wê nivîsîne.¹²

Di vê gotarê da em dê li ser wate û çemka beytê bi giştî û li ser beyta Memê Alan bi taybetî rawestîn. Pirsra me ew e kanê beyta Kurdî xudan çi taybetmednîyan e û dikeve nav kîjan pişka toreya gelêrî û cudatî û peywenda nîveka beyta kurdî û beyta ‘Erebî çî ye. Ji bo vî karî me ji rêka lêkolîna li ser wan pirtûk û gotarên ku ta niha li ser vê mijarê hatine nivîsînê wec wergirtîye. Ev beyta Memê Alan ta niha nehatiye weşandinê û cara yekem e ku em li ser dixebitin.

Beyt, Çemk û Pênaseya wê

Beyt yek ji çiqên here zengîn û rengîn e di toreya gelêrîya kurdî da. Gelek kesan li ser vê peyvê û wate û çemka wê bîr û boçûnên xwe nivîsîne.

Di *Dairetu'l-me'arif-ê Bozorg-ê Îslâmî*, da li ser peyva beytê weha hatîye: “Beyt di edebîyatê da biçûktirîn yekîneya helbesta klasîk e. Her beytek ji du pişkên hevkeş pêk tên, ku jê ra misra’ dibêjin.”¹³

Em dibînin ku di vê şiroveyê da tenê çemk û wateya beyta ‘Erebî li ber çavên nivîskarî bûye, ne beyta kurdî.

Abdurrahman Adak li ser peyva beytê weha dinivîse: “Beyt peyveke bi erebî ye ku wateya wê ya ferhengî xanî ye... Wek têgeheke edebîyata klasîk beyt ew yekeya helbestê ye ku ji du misrayên hevkeş û hevgerî pêk tê.”¹⁴

Dîyar e A. Adak jî tenê li ser wate û çemka beyta’ Erebî rawestayê û çun mijara pirtûka wî ne edebîyata gelêrî ye ,berê xwe nedaye çemk û wateya beyta kurdî.

Hejar Mukrîyanî (1921- 1991) di ferhengê *Henbane Borîne* da, beytê weha şirove dike: “ çîrokî şê’ir, heway goranî.”¹⁵

-
- 11 Xanî di Mem û Zînê da 6 caran dibêje ku min ev çîroka ji zarê çîrokbêjên zana bihist: “*Danayê mu'emmerê kuhensal, Evrengehe go ji bo me e'hwal* “ Herwisan ew di destpêka Mem û Zînê da dibêje: “*Ne'xmê we ji perdeyê derînim, Zînê û Memê ji nû vejînim*” Wate çîroka Mem û Zînê berê jî hebûye û ez dixwazim wê ser ji nû vejînim. Di dawîya Mem û Zînê da jî amajeyî efsanebûna Mem û Zînê dike: “*Hindek ji fesaneyê di Bohtan, Hindek di behane hin di bohtan*” bnr. Mem û Zîna Xanî, şiroveya P. Cîhanî, Nûbihar, Istenbol 2010
- 12 Keyomers Nikreftar, *Keşkol*, Enistîtûti Kelepûrî Kurd- Silêmanî, salî 2013 Silêmanî - Babayî, Sedîq, *Memê Alan be Horamî*, Naşir Gote û Hafîz, Alman, Bonn, sal 2018, şabek: 9783940762535 -
- 13 Heyder Rîzâ Şâyegânfer, “*Beyt*”, *Dairetu'l-me'arif-ê Bozorg-ê Îslâmî*, XIII, rr. 271-272: <https://www.cgic.org.ir/fa/publication/entryview/8253> (Gihan: 04.11.2019/09:57)
- 14 Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, Istanbul 2019, r.98
- 15 ‘Ebdurrehman Şerefekendî Hejar, “*Beyt*”, *Henbane Borîne*, Intişarat-ê Sirûş, Çapî Yekem, Tehran 1369 hş. r.87

Ehmedê Şerîfî (1945-2015) li ser beyta Kurdî weha dinivîse: “Peyva beytê di zimanê Kurdî da di gel peyva beytê ya toreyî ku di zimanê Farsî da rayic e û bi wateya du misra’ên helbestê ye, cuda ye. Beyta Kurdî hindek caran mesnevîyeke dirêj e ku ji sedan dubeytîyan pêk tê... Her beytek ji çend bendan û her bendek ji çend misra’ên hevserwa, bi kêşeke kîteyî yan heceyî pêk tê. Di pişka zor ya wan da hejmara kîteyên misra’ên wan ne hindî hevdu ne. Tenê hevserwayîya wan e ku wana weke helbest nîşan didin...”¹⁶

Di Danişnameyê Cehanê Islam, Iranika, da bi qelesa Emîrê ‘Hesenpûr (1918-1985), li jêr madeya “Beyt” ê da weha hatiye:

“Beyt cureyek hunera gelêrî û xocîyî ya kurdî wekî (vegötina çîrokê bi miqam û awaz) e. Wekî çîrok yan hikayetên Azerbaycanî, istiranên gelêrî yên Înglîsî, Iskatlendî û... ye. Beyt dasitanke ku sîng be sîng (ji nifşekê bo nifşa dî) tê vegêranê û bi giştî weke istiran yan jî têkelawîyek ji istiran û gotinên asayî tîn vegotinê. Layê wê ye cuda ji dîtir istiranên kurdî yên lîrîk (Heyran û Lawik) di binêşê da û bi curekî asayî di taybetmendîya wê ya çîrokî û dirêjîya wê da ye. Ji ber hebûna teşeyê helbestkîya istirankî, bi curekî eşkere cuda ji dîtir çîrokên kurdî ye. Beytbêj berewajî hevtayê xwe ye Azerbaycanî “Aşiq” beytê bi sazê nabêje...”¹⁷

Marif Xeznedar di pirtûka xwe ya *Mêjûy Edebî Kurdî* da li ser beytê weha dinivîse: “Beyt be qeware zor dirêj e, zimanî millî ye we ristey sakar e, zorbey xelk lêy tê dega. Kêşî xomalî ye we qafiyey rengareng e. Le ser bincî bend dademezrê we be mebestî goranîgotin dadenrê... Beyt wekû babetêkî çîrokî şê’irî zîyatir be mebestî goranîçirîn dadenrê, xerîkî dildarî û xoşewîstî û siruşt e, herweha rûdawî mêjûyî û qaremanîyetî û palewanî netewe le şoriş û ceng û bergirî le nîştiman degêrêtewe...”¹⁸

Îsmailê Şems li ser peyva beytê weha dinivîse: “Beyta Kurdî: Menzûmeyên çîrokî yên Kurdî ku mijara pişka zor ji wan evîn û mêrxasî ye. Dengbêjên Kurd van menzûmeyana bi aheng dibêjin. Beytbêjîyê bermaya sunneta dengbêjîya Îrana mêjîn dizanin. Beyt ji giringtirîn û resentirîn hêmanên edebîyata zarkîya Kurdan e. (Kristensen, 58; Behrî, “beyt” pişka yekem, r. 26)... Beyta Kurdî têkelawîyek e ji helbest û peşşan û ahengê (Payaniyanî 501), Herçiqaş ku di nîveka beyta Kurdî û beyta Farsî da peywendek tuneye jî, lê wisan dîyar dike ku beyta Kurdî di gel meqama mûsîqîyê “beyat” ji yek reh û rîşeyê bin...”¹⁹

Di ferhenga Herman da li jêr navê beytê weha hatiye: “1- Çîrokeşêirî folklorî (Ayînî, Dildarî, Mêjûyî we...) le ser heway taybetî xoyan ke ahengsazekeyan

16 Şerîfî, h.b.

17 Hesenpûr, h.b. – (<http://lib.eshia.ir/23019/1/2365>)

18 Marif Xeznedar, *Mêjûy edebî kurdî*, Hewlêr 2001, r. 169

19 Îsmail Şems, “*Beyt-ê Kurdî*” Merkez-ê Dairetu’l-me’ârif -ê Bozorg-ê Îslamî, Gihan: 03.11.2019/22:13, (<https://www.cgic.org.ir/fa/article/153284/>)

dîyar nîye we piştawpişt geyîştote dest ême. 2- Her çîrokeşêirêk ke le ser heway beyt dandirawe we heman mebestî be duwa ye we danereke dîyar e ke kê ye, ya kê buwe: Beytekanî Elî Berdeşanî, Mem û Zînê Ehmedî Xanî²⁰ 3- Qisey dûr û dirêj û bêmana. Xetêk şêir ke birîti ye le dû misre'...Têbînî: wişey beyt qisey zor le ser e we hendêk birdûyanetewe ser beytî 'Erebî, taqimêkîş pêyan wa ye le wişey beyat kewtuwe. Mîn pê m wa ye beyt debê le pad î evêstayî be manay şêir kewtibê we le zimanekanî Orûpayîş da poet be manay şair her lew rîşe ye. Herwa dûr nîye ber le Islam beyt wek hore aheng û heway mezhebîş hebûbê we le duway ew beşey nemabê we be dûrîş nabînim ke beyat û beyt her yek bûbên, ya yek serçaweyîyan hebê."²¹

Em dibînin ku pişka zor a zimannas û levekolan li ser wê hindê ne ku beyta Kurdî û ya 'Erebî "beyt بيت" ji hevdu cuda ne. Tenê tişta ku bûye hegera peywenda wan ya rûveyî helbestbûna herduyan e.

Beyt di nav Mêjûya Wêjeya Farsî û Kurdî da

Jêderên mêjûya edebîyata Farsî û Kurdî yên berî Îslamê li ber destên me kê m in, lê di mêjûya wêjeya Farsî û Kurdî ya piştî Îslamê da dîyar dibe ku Kurdan û Farsan pêş da he ji hemû helbestan ra beyt gotine.

Bo nimûne Necmedînê Razî nivîskarê Îranî yê sedeya heftema hq. di pirtûka xwe ya bi navê *Mirsadul-îbadê* da, dema ku li ser helbestên 'Omerê Xeyyam dinivîse, li cîhê peyva şê'rê, yan ruba'iyê da peyva beytê bi kar diêne. Wate beyt li bal wî wateya helbestê bi giştî û gelemperî dide.²²

Nizamîyê Genceyî hozanê sedeya şeşem a hq. di mesnevîya xwe ya *Xosrew û Şîrînê* da di malikekê da peyva beytê bi kar diêne.

به یاد روی شیرین بیت می گفت چو آتش تیشه میزد کوه میسفت²³

"Di bîrîya Şîrînê da BEYT digohtin, Wek agir paç diweşand çîya dinohtin"

Nizamî di vê helbestê da peyva beytê durust bi wate û çemka wê ya kurdî bi kar dibe.

Di lêkolînên meydanî da em dibînin ku Kurdan zemanekî ji hemû helbestan ra beyt gotine. Ji bo mînak, em dizanin ku helbestên Feqîyê Teyran (ss.16. v. 1041 hq.) ji şeweya nivîskî ra derbasî şeweya zarkî bûne.²⁴ Ta roja îro jî ji hemû

20 Beyta Mem û Zînê ne ya Xanî ye, berewajî wê Xanî Mem û Zîna xwe li ber beyta gelêrî ya Mem û Zînê nivîsiye.

21 Elî Nanewazade, "Beyt", Ferhengî Herman, Bergî Yekem, Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2005, r. 466

22 Necmuddîn Râzî, *Mirsad'ul-îbadê*, Şirket-ê întişârât-ê 'İlmî ve Ferhengî, Tehran 1391 hş. s.18.

23 Nizamî Gencewî, *Kullîyat*, ts.We'hîd-ê Destgirdî, Çap-ê Dovum, Intişârât-ê Bêhzad, Tehran 1381 hş. s.193.

24 Bi pêka naveroka Mem û Zînê, Ehmedê Xanî şahesra xwe Mem û Zîn ji toreya folklorîk vergirtîye, lê berevajî wî, berhemên Feqî ji nivîskî ketine nav zarê gel û bûne toreya gelêrî.

helbestên wî yê çîrokî û qesîdeyên wî yê dirêj ra beyt dibêjin. Weke: Beyta Zembîlfiros, Beyta Bersîsê 'Abid, Beyta Şêxê Seni'anê, Beyta Dilî (Dilo rabe) û yêd mayîn.²⁵ Lê bere bere peyva beytê ku pêş da ji hemû cureyên helbestan ra dihate gotinê, tenê ji hindê qesîdeyên dînî û çîrokehelbestan ra hatîye gotinê û bûye çemkeke taybetî ji çîqeke toreya folklorîk ra. Herçiqas ku ta niha jî gel ji gelek qesîdeyên dînî ra jî beyt dibêjin, lê beyt weke çîqeke toreyê ya serbixwe ji curek ji çîrokehelbestên gelêrî ra tene gotinê û bûye janreke toreyî ya serbixwe û ji çiqên dî yê toreya gelêrî cuda bûye.

Beyt gelek caran ji bo nivîsê û lêvekolan bûne jêder û kanîya afirandina babetên hêja.

"...Peywendêke zindî di nîveka van beytana û edebîyata nivîskî da heye. Gelek ji helbestkarên sunnetî û nivîskarên îroyîn li afirandina berhemên edebî da ji vê gencîneyê îlham vergirtine... Wek mînak Mem û Zîna Xanî (1105) di binêşa xwe da beytek bûye ku bûye hemaseya neteweyîya Kurdistan. Herçiqasî ku naveroka hunera gelêrî cîhanî ye, û hindê (wekî Şêxê Sen'an, Mêhr û Wefa, Leylî û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa) ji edebîyata Farsî û 'Erebî serekaniyê verdigirin, lê pişka zor ji wan xocêyî ne..."²⁶

Mijara Beytên Kurdî

Mijarên beytên kurdî rengareng û cur be cur in. Çîqa beytan bixwe li bara naverok, mijar û babetan va dibe çendîn şaxeyên cur be cur. Mijarên beytan yê serekî ev in:

"Hemaseyên evîndariyê yê wekî (Mem û Zîn, Xec û Sîyamend, Şor Me'hmûd û Merzîngan), Yan şerên di nîveka mîrên Kurdistan û desthelatdarên Îranî û Osmanî (wekî Dimdim, Bapîr A'xayê Mengur) Şerê di nîveka mîrên Kurdistan û hoz û 'eşîretan (çîroka 'Ebdullah Xanê Mukrî). Mijarên ayînî (Colindî, Sailê Qebir). Hindê ji beytan li ser hunera istiranbêjîyê û jîyana beytbêjan e. (Pîvazan, Helketî û Xîrnal) ku hindê caran destpêk û encameke wan ya exlaqî heye û hindê jî tenê pêkenok in (Kurr û Kiç)"²⁷

Gowayê vê birokeyê ew beytên folklorîk in, ku metina wan weke beytên Feqî ne, lê li ber nexwandewariya beytbêjan gelek caran kêşa wan aloz û serwaya wan hatine têkelkirinê. Bnr. Ordîxanê Celîl- Celîlê Celîl, Zargotina Kurda II, Çapa Sêyem Amed 2013, "Feqîyê Teyran û av": Herê avê herê avê, Kê ra dikî vê t' uabê, r.76. – "Feqîyê Teyran û Evîntî": Ha hûn werin, lêzim werin, Cîran û xelqê hêcatê, r. 82. "Feqîyê Teyran û Şîretê dil": Dilo rabe ji vê lewmê, tu li nefesê bike t'ehmê, r. 86. (di van nimûneyana û gelekên dî da em dibînin ku helbestên Feqî ji layê kesên ku ew li ber kirine hatine destkarîkirinê û berhemên wî yê nivîskî kirine nav berhemên folklorîk da.)

25 Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqîyê Teyran*, Dezgeha Sipîrêz, Hewlêr, 2005, rr. 31-44.

26 Hesenpûr, h.b.

27 Hesenpûr, Emîr, h.b.

Taybetmendîyên Beytan

Em dikarin taybetmendîyên beytê li bara darêjka ruxsarî da weha pênase bikin:

Beyt çîrokekê vedigêre, lê ew çîrok devkî nîne bi deng e. Beyt weke istiranekê bi miqam û aheng û bi deng tê gotinê, lê istiran jî nîne. Herçiqas ku istiran jî çîrokekê vedigêre, lê barê çîrokî yê istiranê ji ya beytê kêmtir e. Beyt istiranek e, lê çîroka wê dûr û dirêj û şiroveya wê berfireh û qehremanên wê ji yê istiranekê zêdetir in.

Beyt weke qesîdeyekê dûr û dirêj e, lê ne qesîde ye jî. Çunku hemû malikên qesîdeyê hevkes û hevserwa ne, lê hevkesî di nav rêzikên hemû beytan da tune ye.

Beyt ne bi malik û misra'an lê bi bendan tên parvekirinê.

Serwa di beytan da rengareng e.

Zimanê beytê sade û sakar û gelêrî ye.

Bi giştî beytên Kurdî li ser van şax û çiqana par ve dibin:

Pehlewani (Hemasî/epîk/şerani/mêrani): Beyta Rosetemê Zal

Evîndarî: Beytên Mem û Zînê, Ferx û Sîtyê, Las û Xezalê,

Tirajîkî: Beyta Seydewani, Beyta Çûkele Suwar û 'Ayşe Gulê, Xec û Sîyabendî...

Mêjûyî: Beyta Dimdimî, Beyta Hemze Axayê Mengur, Beyta Şêx Şehabedîn²⁸

Ayîni: Sîseban, Mihemed Henîfî, Hespê Reş, 'Xewsê Gêlanî...

Irfani: Beyta Zembîlfiroş

Pêkenokî: Beyta kêçan, Beyta kîselan...

Temsîlî: Beyta Kel û Şêr,²⁹ Beyta Kewan³⁰

Beytên Kurdî li bara Ruxsarî va

Bi giştî em dikarin li bara ruxsarî da beytên Kurdî li ser sê pişkan par ve bikin:

Beytên yekkêş û çendserwa:

Beytên ku ji serî ta dawîyê wekî helbesteke nivîskî xudanê yek kêşê û serwaya azad in. Wekî: Sîseban,³¹ Kel û Şêr³² Yûsif Pêximber/Ûsibê Nebîya, beyta Hetem...³³

28 Ev beyta di nav gel da heye û bi vê şeweyê dest pê dibe: "Çûm Bilîsê gelî bi gelî, Jê derketin cotek welî, Şêx Şahedîn Seyid 'Elî...t.g."

29 Qadir Fetahî Qazî, "Menzûme-yê Kurdî, Kel û Şêr", Danişkede-yê Edebîyat ve 'Ulûm-ê Inslamî, Danişgah-ê Tebrîz, 1357 hş. şomare-yê 136

30 Kovara Sîrwe, hejmar 17, sermaweza 1366 hş. rr.18-19

31 h.b. hejmar 25, gelavêja sala 1367 hş. rr. 62-65

32 h.b. hejmar 52, xezelwea sala 1369 hş. rr. 58-61

33 Yaşar Kaplan, *Beyt û Destanên Kurdî*, Nûbihar, çapa yekem, İstanbul 2019

Beytên çend kêş û çend serwayî:

Hindek ji beytan jî ji çend bendan pêk tên û her bendeke wan xudanê kêş û serwayeke cuda ye. Kêşên bendan û rêzikan di van cure beytana da ne wekî hev in. Wek: Mêhr û Wefa, ³⁴Siwaro, ³⁵Şêx Mend û Şêx Reş...³⁶

Beytên niv helbest û niv pexşan:

Hindek beytên Kurdî jî hene ku beytbêj digel şeweya helbestkî di nav ra car û bar ji bo şiroveyê hindek agadarîyan devkî wate pexşankî jî dibêjin. Hindek caran jî he nivê van beytana bi deng û nivî jî devkî tene gotinê. Yan jî beytbêj di cîhê pêdivî da hindek şirveyan bi devkî dide. Wek: beyta Şêxê Seman, ya bi zareveyê Soranî, ³⁷Mem û Zîn, Sitî û Ferx...³⁸

Memê Alan û pênasayek kurt

Di nav hemû çîrok, beyt, serpehatî û istiranên Kurdî da Memê Alan ji hemûyê navdartir bûye. Ew di nav folklorê Kurdî da ji hemûyên di balkêştir e û bala gelek dengbêj, beytbêj û çîrokbêjan li ser xwe da rakêşaye û evê baldarîyê we lê kirîye ku ev serpehatîya bi nav û cur û celebên cuda cuda peyda bibe û li seranserî Kurdistanê da şax bavêje. Memê Alan bi celebên istiran, beyt û çîrok di nav gel da heye. Çunku ev serpehatîya bi curekî berfireh di nav gel da belaw bûye, li ber wê hindê navên curbicur lê kirine. Ew di nav gel da weke beyta Memê Alan, Memê Ala, Memê û Zînê, Mem û Zînê, Mem û Zîn, Memo û Zînê³⁹ û Memê Alîyan⁴⁰ hatîye nasandinê.

Gelek kesan li ser wê lêkolîn kirine û li ser pile û payeya wê ya toreyî bir û hizrên xwe ragehandine: Di Ansîkûlopediya Îranika da “Encyclopaedia Iranica” Li ser Memê Alan weha hatîye nivîsînê: “MEM-Ê ALAN (Romansa Kurdî) Muh-temelen ji navdartirîn dasitanên Kurdî û bi giştî weke nûnera hunera Kurdî ya zarkî hatîye pejirandinê. Di nav toreya gelêriya Kurdî da berî hemûyên di kar li ser celebên/versiyonên vê dasitanê hatîye kirinê û hatîye weşandinê. (bnr. Prym û Socin, 1890; Von le Coq, 1903; Mann, 1909; û Makas, 1926). (Chyet, 1991 rr.27-28) nîşan daye ku ew di forma xwe ya gelêrî da zortir di navçeyên

34 Qadir Fetahî Qazî, *Gencîney beytî Kurdî*, sercemî berhemekani, çapî yekem, Hewlêr, 2007, rr. 243-286

35 *Kovara Sirwe*, hejmar 2, havîna 1364 hş. r. 41.

36 hb. hejmar 3, payîza 1364, hş. r. 85.

37 Fetahî Qazî, , h.b. Hewlêr, 2007, rr.7-41

38 Kaplan, h.b.

39 M. L. Chyet, *And a thornbush sprang between them* Studies on Mem û Zîn: A Kurdish Romance. Vol. 1, UMI Dissertation Services, Ann Arbor.Michigan. 1 . 1991, r. viii

40 Di beyta ku Oskar Mann ji zarê Eyûb A`xa Temir berhev kirîye, navê wê weke “Memê Alîya” hatîye.

Kurmancîaxêv da bi rewak û baw e. (Herçiqaş ku versiyoneke wê ji Mehabadê ji layê Oskar Mann (1867-1917) va hatiye weşandinê)⁴¹

Hêmin Mukrîyanî (1921-1986) li ser Memê Alan/Mem û Zînê weha dibêje:

“Mem û Zîn be naw û bangtirîn çîrokî Kurdî ye.”⁴²

Û gelek kesên di li ser vê beytê û giringîya wê bîr û hizrên xwe ragehandine, ku anîna navê hemûyan dê bibîte hegera dirêjîya babetê.

Mijara evîna Mem û Zînê, evîna şehzadeyekî kurd û dotmîreke kurd li ber naveroka xwe ya balkêş ku pir e ji dildarîyeke efsûnawî bala gelek kesan li ser xwe da rakêşaye. Gelek kesan mijara vê evîna pak û asimanî ji xwe ra kirîye jêdera afirandina berhemên balkêş.

Yekemîn kesê ku ji vê beytê wec wergirtîye hozanê Kurd Ehmedê Xanî (1061-1119/1650-1707) ye.⁴³

M. Emîn Bozarşan di pêşgotina wergera Mem û Zînê da li ser vê hindê weha dinivîse: “Hozanê mezin Ehmedê Xanî jî ji çîroka Memê Alan îlhama xwe girtîye û bi wê îlhamê wê çîrokê li gorî jîna dema xwe xistîye kirasekî mişexxes, bi awakî hevdemî û modern nivîsiye. Bi vê yekê hem çîrokê ji windabûnê rizgar kirîye, hem jî ji bêjeyê Kurdî ra eserekî nemir⁴⁴ dîyarî kirîye.”⁴⁵

Li dû Xanî ra weke dîyar du hozanên Kurd yê di jî ev çîroka vergirtine û bi zaraveyê Hewramî vehûnane.⁴⁶

Oskar Mann (1867-1917) ê Almanî yek ji wan kesa ne, ku cara yekem varyanta Soranî ya vê beytê (sala 1903) û li dû ra jî varyanta wê ya kurmancî (sala 1906) berhev kirîye. Di vê lêkolînê da em ê wê beyta Memê Alan ya kurmancî ku Oskar Mann berhev kirîye, bidin nasandinê.⁴⁷ Li vir pêdivîye em li ser jîyana Oskar Mann agadarîyekê bidin.

41 Ansiklopediya Îranika, “Memê Alan”, <http://www.iranicaonline.org/articles/meme-alan>, (Gihan 27.11. 2019, 21. 56)

42 Hêmin Mukrîyanî, *Tu'hfey Muzeferîye*, pêşgotin, dezgay Aras, Hewlêr, sal 2011

43 Çunku Xanî navê Memê Alan di şahesra xwe da neaniye, hinek kes evê ji Xanî ra kêmasî dizanin ku çima navê Memê Alan neaniye. Lê Xanî navê Mem û Zînê li ber xwe da dernexistîye, ev beyta bi navê beyta Mem û Zîn û Memê û Zînê jî di nav gel da bi nav û bang e. Herwisan xudanê hemû mesnevîyên evîndarîyê navê herdu evîndaran li berehemên xwe kirine. Weke Şîrîn û Ferhad, Leylî û Mecnûn, Mêhr û Muşterî. Lê di gel wê hindê Xanî di destpêka Mem û Zîna xwe da dîyar dike ku berî wî Mem û Zîn hebûye û ew dixwaze wê Mem û Zîna ku ji ber guhnedanê lawaz û gewşek û nîvecanî bûye, ji mirinê rizgar bike û ser ji nû vejîne. Herwisan Xanî di dawîya mesnevîya xwe da Mem û Zînê weke efsaneyêke Bohtanê dide nasînê. Ji bilî wê Xanî çendin caran di Mem û Zînê da dibêje ku min ev çîroka ji zarê zana û temendaran bihistîye...

44 Di van hevokana da şaşîyên rêzimanî hene, lê li ber me emanetdarîyê dest li originala wê neda.

45 M. Emîn Bozarşan, *Mem û Zîn*, (bi turkî) Gün yayinlari Istanbul, 1968, r. 10

46 Nikreftar, h.b. - Babayî, h.b.

47 Lêvekol û kurdîzana Siwîsrî Barbara Strâuli yê ev beyta ji arşîva Oskar Mann bi dest xistîye û tîpguhêzî rênivîsa Kurdî ya latînî kirîye û berî weşandinê ew ji bo lêkolînê daye min.

Oskar Mann Komkerê Beyta Memê Alîyan

Oskar Mann (1867-1917) navê wî yê rastîn, Gottlieb Bernhard Oskar Mann kurê Rentiêrs Otto Mann e û li roja 18ê meha Septembara sala 1867an di malbateke şênîyê mêjînê Berlînê da hatiye cîhanê.

Oskar Mann piştî xwendekarîyê li sala 1890î li pirtûkxana şahî ya Berlînê da dest bi karî kir û li dû ra bû birêveberê pişka destnivîsên rojhelatî. Roja çarê meha Julî ya sala 1899an Oskar Mann daxwaznameyek bi nexşeyeke hûrgilî ji akademîya şahî ra nivîsî û tê da daxwaza destûrê ji bo seferê zanistî û dayîna amîrên pêdivî ji bo lêkolîna li ser zaraveyên Kurdî û Farsî ya nû ku ta wê demê kê li ser wan lêkolîn hatibûn encamdanê, kir. Daxwaza wî bi balkêşîyeke mezin hate pejirandinê.

Oskar Mannî du seferên zanistî kirin, ku li ser hev 5 salan domandîye. Herdu seferên wî jî seferên Îranê û li rojhelata nêzîk li Kurdistanê bûn. Ew gelek bajar û navçeyên Kurdistanê ji Kirmanşah û Mehabadê bigire ta Ruha û Mûşê geriyaye. Wî gelek beyt, çîrok, istiran û deqên Kurdî berhev kirin, ku yek ji wan ev beyta Memê Alîyan e ku sala 1906an li Ruhayê ji zarê beytbêj Eyûb A'xa Temir vergirtîye.⁴⁸

Akama kar û lêkolînên wî bûn çar pirtûkên li ser zaravên Farsîya nû û zarave û devokên Kurdî.

Yek ji berhemên kar û lêkolînên wî pirtûkeke bi navê *“Die Mundart Der Mukri-Kurden Grammatische Skizze, Text in phonetischer und Persischer Umschrift”* Ku sala 1906an li Berlînê çap bû, ku ji şeş kurteçîrokên folklorîk û 18 beyt û hindêk istiranên kurt pêk tên.

Oskar Mann li roja 5ê meha Desambara sala 1917an mir û roja 8ê wê mehê li Berlînê teslîmî axê bû...⁴⁹

Kurteyek ji Beyta Memê Alîyan

Li bajarê Mu'xribistanê sê bira hebûn, 'Alî Paşa birayê mezin bû. Mîrekî meqbûl bû. Lê Her sê bira jî korocax û warwenda bûn. Her tiştên wan hebû, tenê hesreta wan hebûna zarekê bû. Şevê birayê 'Alî paşa yê biçûk xewnekê dibîne. Di xewnê da Xocê Xizir dibêje, eger hûn ji 'Alî paşa ra qîzekê ji berê Qurêşîyan û ji sinsila hezretê Silêman bixwazin, Xudê dê kurrekî bide wî, ku pê ocaxê we şên bibe.

Giregirê bajarê Mu'xribistanê berhev dibin û ji 'Alî paşa ra qîzekê bi wî salixî ku navê wê Zelîxan e, peyda dikin û 'Alî paşa bi Zelîxanê ra dizewice û piştî neh

48 Mojtaba Kolivand, Persische und Kurdische Reiseberichte, Herausgegeben von Harassowitz Verlag, Wiesbaden 2014, Wiesbaden.

49 Kolivand, H.b. -Malpera ruwange: http://ruwange.blogspot.ch/2014/05/blog-post_4.html

meh û neh roj û neh saetan, Xudê kurrekî dide ‘Alî paşa û civata ‘Alî paşa navê wî dikin; Mem.

Memê didin ber destê murebî û mamostayan û Mem di deh salîya xwe da hemû zanistên serdema xwe fêr dibe. Memê xudanmuicize û keramat e jî. Destê wî dibe dermanê tawî û bawîyan.

Di deh salîya wî da bavê wî text û tacê xwe dide wî û ewî li cîhê xwe da dike mîr û paşa.

Di vê serdemê da di bajarê Mu‘xribistanê da masîgir torê davêjin behrê û li dewsa masîyan canîyekî behrî yê du salî dikeve torê. Canî tor e û ji bilî Memê nahêle kes lê siwar be. Memê wî canîyê dibe berdide tewlexana xwe û navê wî dikin; Bozê Rewan.

Rojekê heval û hogirên Memê daxwazê ji day û bavê Memê dikin ku destûrê bidin ew Memê bi xwe ra bibin nêçîrê.

Mem bi hezar û heşt sed suwarên derebegane va diçe nêçîrê. Di nêçîrgehê da sê kewok Memê li dû xwe ra dibin nav baxçeyekî efsûnawî. Memê di wî baxçeyî da rastî sê qîzên paşayê perîyan tê ku li nav hewza gulan da avjenîyê dikin. Mem kirasê ya biçûk direvîne. Li wir hersê qîzên paşayê perîyan li ser Memê û bedewîya Memê zendegirtî dimînin û dibêjin di dunyayê da kesek tune ye ku bibe hevtayê wî. Yek ji wan dibêje li bajarê Cizîra Botan, Zîna Zêdan, Xûşka Mîr ‘Azdîn, qîza Mîr Zêndîn ew hê ji Memê jî bedewtir e.

Hersêk biryarê digirin ku herin ji bajarê Cizîrê Zînê bînin û danin rex Memê û herduyan bidin ber hev û bibînin kanê kî ji wan ciwantir e.

Her sê qîzên paşayê perîyan şevêkê difirrin û diçin Zînê ji bajarê Cizîra Botan hildidin û diînin dadinên koşka Memê û nivînê herduyan didin ber hav. Li dû ra deng li Memê dikin û Memê çavê xwe vedike ku canikek bi textexew û nivînê xwe va wa ye li rex textê wî. Memê deng li Zînê dike û dibêje tu li qonaxa min çî dikî. Zînê jî ji Memê ra dibêje, tu çima hatî qonaxa min. Di dawîyê da Zînê dizane ku ew ne qonaxa wê ye. Li wir herduk dibin evîndarên hev. Lê qîzên paşayê perîyan dîsan wan di xew ra dikin û gustîlên wan li hevdu diguherin û dîsan Zînê hildidin û dibin dadinin cîhê wê.

Sibeya wê şevê Memê ji xew radibe û Zînê nabîne. Diçe tewlexanê ku Bozê Rewan siwar bibe û li dû Zînê here. Destebirayê wî tê û bi miarê agadar dibe û day û bavê wî pê dihesîne. Kes û karên Memê her çî dikin, nikarin berayîka Memê bigirin. Mem li Bozê Rewan siwar dibe û berê xwe dide Cizîra Botan.

Zîn jî ku ji xewê hişiyar dibe, nikare tiştêkî bike. Ji bo Memê dikeve şîn û behîyê û reş girê dide.

Dema ku Zîn reş girêdide û dikeve behîyê, Beko jî ku evîndarê Zînê bûye, pê dihesê. Beko bi arîkarîya qîza xwe ku navê wê jî Zîn e, agadar dibe ku tiştêk hatîye

serê Zînê. Beko pirtûkan li ber xwe dadine û li pirtûkan dinêrre û pê dihesê, ku Mem û Zîn bûne evîndarên hevdu û Memê dê roja îniyê were ber şetê Cizîrê û ji şet derbas bibe û were Cizîrê. Ew qîza xwe şîret dike û ewê bi heceta kirasşoyê dişîne ser rêya Memê û dibêje; karekî bike bila Memê te ji xwe ra birrevîne. Eger tu nerrevandî, wî bixapîne û bihurê şaş nîşanî wî bide, bila di gola mar û masîyan da bixeniqe.

Dema ku Mem digîje ber lêvara şetê Cizîrê, qîza Beko xwe wekî Zînê bi wî dide nasînê. Lê Mem wê ya nas dike û xwe jê xilas dike. Di wê demê da Xocê Xizir di hewara Memê da tê û bihurê şetê Cizîrê nîşanî wî dide. Mem ji şet derbas dibe û diçe nav bajarê Cizîrê. Diçe dibe mêvanê hersê Mêrxasên Cizîrê, Hesenê Celalî û herdu birayên wî.

Dema ku Mem dibe mêvanê hersê birayan, ew pê dihesin ku Mem evîndarê Zînê ye. Ew Mem û Zînê li ser kanîya Gulan digehînin hev. Mem û Zîn jivanê didin hevdu û qirarê xwe dadinên ku rojekê li qonaxa Sitîyê da hevdu bibînin.

Beko pê agdar dibe û diçe li cem Mîr fesadîya Memê û mazûvanê wî dike û pîlanekê dikêşe ku Memê bi heceta nêçîrê ji bajêr derîne. Roja ku dê biçin nêçîrê Mem di rê da qelemteraşê li zenda xwe dixê û zenda xwe birîndar dike û bi wê hecetê dizivire bajêr. Beko pê dihesê ku Mem zivirîye, ew Mîr tehrîk dike ku ew jî dev ji nêçîrê berdin û bizivirrin bajêr.

Mem xwe digehîn bajêr û ew û Zîn di koşka Mîr da digehine hevdu û piştî henek û laqirdîyan di xew ra diçin.

Gava ku Hesen û herdu birayên xwe dibînin, ku Mîr bi tehrîka Beko dev ji nêçîrê berda û ber bi bajêr zivirî, yek ji wan hespê xwe dibezîne ku were Memê û Zînê bi hatina Mîr agadar bike. Lê êdî dereng e. Mîr û Beko bi giregirên Cizîrê va li ser Memê û Zînê da peya dibin. Êdî rêya revê li ber wan namîne. Memê Zînê li jêr kurkê xwe da vedîşêre û dema ku Mîr dikeve hundur koşkê Mem nikare li ber va rabe. Hesen bi amaje jê dipirse. Ew gulîyên Zînê li bin kurk da nîşanî Hesen dide. Hesen radibe ji dîwana Mîr derdikeve û xwe dîntîyê dadine û agirî berdide mala xwe û dibêje Sitîyê gazî Mîr bike bila di hewarîya te da bê.

Sitî dike hawarî û Mîr û dîwanî hemû ji koşkê derdikevin û di hewarîya mala Hesen da diçin û Zînê jî ji bin kurkê Memê derdikeve û diçe alîyê heremserayê.

Dû ra Mîr bi mijarê agadar dibe û ji Beko dipirse, em çi bikin?

Beko dibêje gazî Memê bike û pê ra kişkanê bileyze. Eger te jê bir, wî bavêje zindanê, lê ewî ji te bir, Zînê bidê.

Mîr û Mem dest bi kişikanê dikin. Mem du destan ji Mîr dibe. Gava ku Beko dibîne Memê dê ji Mîr bibe, pîlaneke dî dikişîne. Diçe heremserayê û dibêje Zînê were li ber pencerê dîna xwe bide lezya Mîr û Mem. Dema ku Zîn dihê ber pencerê, piştî Mem li pencerê ye. Beko dibêje Mîr mercekî leystinê ew e ku

leyizkar cîhê xwe li hevdu diguherrin. Dema ku Mem û Mîr cîyên xwe li hevdu diguherrin, berê Memê dikeve alîyê pencerê û çavê wî bi Zînê dikeve û hiş di serî da namîne û şetrencê derdide. Mîr fermanê dide koleyan dest û pîyê Memê girê didin û davêjin zindanê. Hesen û herdu birayên wî jî ji Mîr dixeydîn û mala xwe jî cem Mîr bar dikin û diçin Şamê. Piştî sê salan serê Mîr dikeve belayekê û ihtiyacıya wî bi hersê birayên Celalî çê dibe. Peyayekî dişîne dû wan û dibêjê bêje wan bila bîn, ez ê Zînê bidim Memê.

Hersê birayên Celalî ji Şamê dizivirrin û hê negehîştine Cizîrê, Mîr Zînê dişîne ku here Memê ji zindanê derîne. Beko pê dihesê. Zû xwe bi mala xwe ra digehîne. Şeş henaran diîne. Hundurrê sisîyn tijî jehr dike û dide qîza xwe ku bibe bide Zînê bila ji Memê ra bibe. Zîn henaran dibe û yekê dide Memê û Memê henaran dixwe û ji hel dikeve. Hersê birayên Celalî di wê demê da digehin zindana Memê. Memê ji zindanê derdînin. Lê êdî dereng e. Mam bi jahriya henarên Beko dimire. Zîn jî li ser gorra Memê qelemteraşê li dilê xwe dide û xwe dikuje. Zînê û Memê li rex hevdu da çal dikin. Beko li nîveka herdu gorrên wan ra tê û diçe dikene. Mîr jî tevrekî li serê Beko dide û Beko dikuje.

Danasîna Beyta Memê Alîyan⁵⁰

Ev beyta weke romaneke rêk û pêk bi wesf û şirove û danasîna bajarê Mu'xribistanê û qehremanên sereke yên çîroka beytê dest pê dibe. Li dû ra qewimîn û bûyerên çîrokê û ho û hegerên bûyeran weke zincîrekê li dû hevdu ra tên. Hemû bûyer weke helqeyên zincîrekê bi hevdu va girêdayî ne.

Beytbêj evê beytê bi navê “Memê Alîyan” dide nasîn. Li seranserî beytê da ew qet navê Alan yan Ala bi kar nayne.

Ruxsar, Kêş û Serwa di vê Beytê da:

Beyta Memê Alîyan li bara ruxsarî da dikeva nav beytên niv helbest û niv pexşan.

Ev beyta ji 644 rêzikan pêk tê ku 502 rêzîkên wê xudanserwa ne û 142 rêzik jî pexşankî ne. Ji van 502 serwayan 350 rêzik bi serwaya “ane” diqedin, serewayên dî jî ev in:

“an- îne- êye- ano- înin/înim- anî- îmî- îne- ère/ere- eke- îne/înim- înin- eke- êye-

Balkêş e ku serwaya “ane” ji bilî hejmarên perakende, sê caran her carê 80 carî dubare dibe.

50 Lêvekolê Almanî Oskar Mann sala 1906an ev beyta li bajarê Rihayê berhev kirîye. Beytbêjê Kurd Eyûb A'xa Temir ew ji Oskar Mann ra gotîye. Oskar Mann ew bi rênivîseke taybetî anîye ser kaxezê. Lêvekol û kurdîzana Siwîsrî Barbara Strâuli yê ev beyta ji arşîva Oskar Mann bi dest xistîye û tîpguhêzî rênivîsa Kurdî ya latînî kirîye û berî ku wê beytê biweşîne ew da min ku li ser bixebitim.

Kêşek taybetî di vê beytê da tune ye û her rêzikeke wê xudanê kêşeke ser bixwe ye.

Cuwankarîyên Toreyî

Tewsîf (salixdan)

Di destpêka vê beytê da em rastî tewsîfeke balkêş ji bajarê Mu'xribistanê tîn.

9. *Sibe bû, bajarî Mu'xribistanê bajarekî gewrî mezinî giran e.*⁵¹

10. *Li ser sêsed û şêst û şeş me'helan e.*

11. *Li ser bîst û çar qapîyan e.*

12. *Her qapîyekî tê da runiştîye wezîrekî heft toqan e.*

13. *Bajarî Mu'xribistanê li ser etegê heft çîyan e.*

14. *Di ser ra belekî berfê ne, di bin ra be'hrî 'Umîyan e.*

15. *Di bin ra mêrg û kanî ne, li ser ra zozan, yaylî û çîyan e.*

Dema ku mirov vê salixdanê dibihîze yan dixwîne, mirov xwe di nav bajarekî pir xweş da hest dike û reng û çawanîya helketina bajêr li ber çavên mirovî mucedsem dibe. Tenê nivîskar yan helbestkarek yan jî beytbêjekî/e kirarî diakre wesfeke weha balkêş li hevdu biîne û vehûne.

Yan dema ku qesr û qonaxê 'Alî paşa şirove dike, mirov xwe di qesreke şahane da dibîne ku hemû xemil û dêkorasiyona wê şahane û şairane ye:

16. *Di bajarê Mu'xribistanê da tê da qasra 'Alî Paşa ne.*

17. *Qasreke sipî, birceke belek e, qabeke bilind e, odake tûncîn e, hewlîyake bole fireh li ser bîst û çar qeyinterman e.*

18. *Sêsed û şêst û şeş odan e.*

19. *Ji maqbûlî pê da berdane zincîrê zêrane.*

20. *Tê da sê kevirê maqbûldaşî ne, cewher e, şewqê xwe dane çar koşeyî bajarî Mu'xribistanê, li ser ra belekî yê berfê, mêrg û kanîyan e.*

Yan dema ku qîza Beko wesmê/wesfê bavê xwe dide:

313. *Ku tu ketî bajarî Cizîrê - bi bavî mi ra dibêjin Qumsî Beko- Tuyê bibêji: "Ez nas nakim nîşan û wesmê wî." Li serê wî seyidê şêxan e.*

314. *Di ustu da benî tizbîyan e.*

315. *Di nîga da solê keskîn, di desta ekazeyî derwêşane.*

316. *Malê wî bişewite, berîyê xwe tijê jar û derman e.*

317. *Siban û êvaran digere li navê malane.*

318. *Xera dike mabênê dilan û 'eşqîyane.*

319. *Îşê wî merî fizûlî şeytan e.*

320. *Peya mebe li qona'xê Bekoyî 'Ewan e.*

51 Hemû hejmarên ku li ber van rêzana da hatine, hejmarên rêzîkên beytên e.

Secî'

1. " 'Alî Paşa, birayê mezin bû, mîrê meqbûl û begê meş'xûl
2. Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn

Tenasub û Teraduf

4. dîterikandin taxt û tacê giran
6. qîzê wezîran û hakimînan
374. Sibe ji Memê ra vekin penceran û camane.
481. bera gerdenî sipî, li simêlê zerî sîyê bike,

Teşbîh û Istî'are

283. Dilê min xan e.
5. Hêstir dibarandin
- 179-180. mêze ke, li sing û berê min mîne xalî heft rengîn e. Mîne sîne Toqatê dor bi çîn e.
266. Min heram kirîye êmegî cotane.
274. insan mîne gulînan e.
316. Malê wî bişewite, berîye xwe tijê jar û derman e.

Mecaz

392. Mêze kir, bajarê Cizîrê li dora qesra 'Hesen civîyane.
411. Sibe da Zîne bejna zirav da elwanan.
440. Mi bi qurbanê çavê belek bejna zirav bigerînin.
445. Kostekê lahûrê giran bîfîltînim.
446. Xûnê li tarîq û zuwaxan bimeşînim.
470. Danzdeh gulîyan di ber kêr û maqesan datînim

Cinas

43. Destê Memê dibe sedemê bavîyan û tîvîyane.

Kinaye

356. Li terkîyê Bozê Rewan min şidandî qetîlê şanzdeh mîrane.
- 357-358. Îşî min bi qebzê şûran e. Bi ser da bi arî şeşxanan e.
408. sûwarê Bozê Rewan
426. Nîgî Memê erdê nagirî

Zerbulmesel

191. Go: Xwêngino! "aqilî li serîyan e, ne li salan e."

Motîvên Efsane û Çîrokan di vê Beytê da

Em di vê beytê da rastî gelek binmaye wate motîvên serdest yê efsane û çîrokan jî tên, ku hindêk ji wan motîvîna ev in.

- Şahê kurrîdûnda/korocax
- Bûyîna Zarrokê ya Esraramêz û derasayî

- Xewin
- Xocê Xizir (Derwêş Baba, Pîrê Kamil)
- Perî, Cin, qîzên şahê perîyan (Dêw, Pîr'hepok)
- Derasayîbûna Hêza Qehremanan
- Xeybzani û Pêşgoyî
- Derasayîbûna hêza hesp yan tajîyê qehremanan
- Nêçîr
- Şûrê di Nîveka du Dildaran da
- Revandina kirasê keçikan
- Bi hevdu guhorîna gustîlan
- Tebdîlî Qîyafe
- Cigir /Reqîb
- Xwekujî
- Dara li ser goran
- Ağir û Mom
- Veşartina Razan

Numad û Numadnasîya Hejmaran di vê Beytê da

Di vê beytê da hebûna hejmarên taybetî ku heryek numada bîr û bawerîyekê ne, ber bi çav in. Bi giştî pitir ji dused û deh caran hejmar di vê beytê da hatine, ku pişka zor hejmarên numadî ne.

Ji bo nimûne beytbêj dibêje: *“Bajarê Mu’xribistanê li ser sêsed û şest û şeş mehelan e.*

Qesra ‘Alî paşa li ser sêsed û şest û şeş odan e.”

Hejmara mihelên bajarê Mu’xribistanê û odayên qesra ‘Alî paşa beranber in digel hejmara rojên salê û ceşna sersala Êzdiyan ku Êzdî di wê rojê da 366 moman vêdixin.⁵²

Numad yan Symbol ji her nîşaneyekê ra ku wateyê taybetî bide, tê gotinê.⁵³ “Di pişka zor ya çand û ferhengên mêjin da hejmar bûne numad û sembola gelek çemkan...”⁵⁴

Gava ku em dîna xwe didin vê beytê, em dibînin ku di nav hemû hejmaran da hejmarên; 1, 2, 3, û 7 ji hemû hejmarên dî zêdetir hatine bi kar birinê. Lê di nav van hemû hejmaran da karbirda hejmara sê ji hemûyên dî balkêştir e û

52 Hejmara odayên qesra Ishaq Paşa jî 366 in. Ez li ser wê bawerê me, pêşniyaza E. Xanî ye, ku di wê serdemê da jîyaye û ew jî li jêr kartêkirna beyta Memê Alan da bûye.

53 Elî Ekber Dêhxuda, *Luxetname*.

54 Leyla Ehmedî, “Neqşê E’idad der Ayînha-yê Guzer-ê Îranî”, *Mecelle-yê Mutaliat-ê Îranî*, Danişkede-yê Edebiyat ve ‘Ulûm-ê Islamî, Danişgah-ê Şehîd Bahuner-ê Kirman, sal 14. Şomare-yê 28, payîz ve Zimistan-ê 1394 hş. s.2.

xîmê beytê li ser wê ava bûye û mirov dikare avabûna beytê li ser vê hejmarê û giringîya wê li bal beytbêjî bi pîrozîya wê hejmarê di bîr û bawerîyên Mîtraîsm û Zerdeştîyê va girê bide. Gava mirov avirekî dide beytê mirov dibîne xîmê beytê li ser hejmara sê ava bûye:

Bavê Memê û apên wî **sê** bira ne.

Qîzên paşayê perîyan **sê** xûşk in.

‘Hesen, Qere Tajlîn û Çeko **sê** bira ne.

Zîn û Sitî û Qîza Beko **sê** jinên sereke ne ku di vê beytê da neqşa wan ber bi çav e.

Xocê Xizir **sê** caran di vê Beytê da eşkere dibe.

Hejmara delalan hem li bajarê Cizîrê da û hem jî li bajarê Mu’xribistanê da **sê** ne.

Hejmara gewherên dîwanxana ‘Alî paşa **sê** kevir in.

Reşma Bozê Rewan avêtine serî **sê** tewlîyane.

Zîn dergistîya Çeko ya **sê** salan e.

Mîr û Mem bi hevra **sê** oyînan dilîzin.

Di celebên beytê yê dî da **sê** dar li ser gorên Mem û Zînê diruskin. Selvîyek, senewberek û dareke diriyê.

“Di jîyana civakî ya Kurdan da, sêyîne (trîlojî) pir tê bikaranîn. Ew demîngirtina li hemberî hejmara sisê, mîna refleksên jêrhişî ne. Yek nîşaneyê Xweda ye. Hejmara pêşîn ya piraniyê didu ye ($1+2=3$). Xweda di dumenda Adem û Hewa da bi sisê ra yeksan dibe...”⁵⁵

“Hejmara “yek” di dînen Îlahî da hejmareke pîroz e û remza ilahîyet û yekbûnê hatîye hejmarê. Hejmara “du” dikeve hemberî yekê û lewra nîşaneyê dijayetî, li hemberderketin, yan jî aramişê demkî ya hêzan û nîşaneyê bihorîna demê ye. Hejmara “du” li hemû ayînen sîrî da bedyûm hatîye nasandinê û nîşaneyê sîyê/sîberê ye. Hejmara “sê” jî ji wan hejmaran e ku di efsaneyên Îranî da ji hemû hejmarên dî geletir tê bi karbirinê. Hejmara “sê” li bal Îranîyên mêjin remza dîn û cadûyê bû.”⁵⁶

Di vê beytê da hejmara “1” bi terkîbên xwe va nod carî, hejmara “2” sî û şeş carî, hejmara “3» sî û pênc carî û hejmara “7” diwanzde carî hatîye. Mirov dibîne ku danerê beytê bi zanetî û bi li ber çavgirtina pîrozî û neqşa hejmaran beyt li ser hejmaran ava kirîye.

55 H. Mem, *Rastîya Destana Memê Alan*, we. Farqînî, Zana, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem, Rêbendan 2006, r. 47.

56 Asîye ‘Umran Zebîhnîya - Ferîba Qeyyûmîzade, “Berresî-yê Karburd-ê E’îdad-ê Yêk ta Penc der Efsane ha-yê Mektûbê Îranî”, *Fesilname-yê Pijûhişha-yê Edebî ve Belaxî*, sal-ê Pencum Şomare-yê 18, Behar-ê 1396 hş. s. 24.

Lîsteya hejmara sê çawa ku di vê beytê da hatîye:

1. *Li bajarê Mu'xribistanê sê bira hebûn, (rê.1.)*
2. *Her sê bira korocax, warê wan wenda bûn. (rê. 2.)*
3. *Her sê biran dîterikandin text û tacê giran. (rê. 4.)*
4. *Wê Xudê bi wê de ewladekî pê şên bibe ocaxê her sê biran. (rê. 8.)*
5. *Tê da sê kevirê maqbûldaşî ne, cewher e... (rê. 20.)*
6. *Sibe da berdane bajarî Mu'xribistanê sê delalane. (rê. 21.)*
7. *Rebbî 'alemê dide Zelîxê ewladekî pê şên dibe, ocaxî her sê birane. (rê. 33.)*
8. *Mem mezin dibe, salê Memê dikave salane. pê dike sisîyane. (rê. 37-38.)*
9. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayî pêriyane. (rê. 67.)*
10. *Dadixîne baxçeyî gulên û sêvana, baxçeyî her sê qîzê padişayê pêriyane (rê. 75.)*
11. *Memê dî li wî baxçeyî sê qîz dikevîne hewzî gulane. (rê. 77.)*
12. *Werîn, mêze kin ji me her sê xwêngan kîjan liyaqê vî camêrî xelqê ye? (rê. 97.)*
13. *Ber dide bajarî Cizîrê sê dellalane. (rê. 124.)*
14. *Kew kete sibê, her sê qîzê padişayê pêriyan bi der ketine navî qabristanê û merzelane. (rê. 129.)*
15. *Şeva li ya sisîyane. Dikine qîrînî li ser bask û perane. (rê. 134-135.)*
16. *Sa'at li sisîyan, peya dibin li ser qesr û qona'xa Zîna Zêdane. (rê. 137.)*
17. *Her sê qîzê padişayî pêriyan peya bûn li ser taxt û tacane. (rê. 147.)*
18. *Sa'at li sisîyan rakirin xelqê nazilî, dişidandin li ser qanad û baskane. (rê. 148.)*
19. *Her sê qîzê padişayî pêriyan helkişîyan teqan û pencerane. (rê. 151.)*
20. *Her sê diketine mehakimeke girane. (rê. 153.)*
21. *Bira bişewite mala her sê qîzê padişayê pêriyane! (rê. 187.)*
22. *pîrs ke qona'xê 'Hesen, Çeko, Qeretaclîn, her sê Celalîyan e.(rê. 321.)*
23. *Bavê te 'Alî Paşa, sê bira ne.(rê. 326.)*
24. *Wî xerîbî girt bi dizgîna Bozê Rewane. Kişande qesrê qona'xa her sê Celalîyane.(rê. 360-361)*
25. *Reşma Boz avêtine serî sê tewlîyane.(rê. 362.)*
26. *'Hesen û Çeko û Qeretaclîn her sê bira ne. (rê. 363.)*
27. *Zîn dergistîya min e sê salan e. (rê. 429.)*
28. *Di serê min û te ra sekînî(sekinîne) Celalîyê bajarê Cizîrê, sê peya ne. (rê. 477.)*
29. *'Hesen û Çako û Qarataclîn, sê peya ne (bira ne). (rê. 478.)*
30. *Zîn ne carîyak e, va sê sal in xwasteka birayî tê, ezê çito baxşîşe mîvanê te kim. (rê. 515.)*
31. *Sê oyîna bi Memê ra qewl û qeraran dînin. (rê. 584.)*

32. *Sê oyin şert kirin bi Memê ra. (rê. 587.)*

33. *Oyinê sisîya lîstin... (rê. 589.)*

34. *Suwar bûn û çûn welatê Şamê. Man semtê sê salan. (rê. 599.)*

35. *Beko şeş henar anîn, zikî henaran sisîyan ji ja'rê tijî kir. (rê. 605.)*

Gelo danerê beytê ev hejmara sê weha 35 caran bi vê rêkûpêkiyê hema wisan bi helkewt danîye, yan ew remz û numadeke istûreyî, dînî û efsaneyî ye? Ji bo bersiva vê pirsê emê serî li çend jêderan bidin.

Teymûrê Malmîr di gotarekê da dinivîse: “Darêjka binêşeyî ya çîrokên Îranî û Îslamî sêyîne ye, ku sê tişt yan sê qehreman tê da hene. Darêjka sêyîne di binêşa xwe da ji istûreya afirandinê hatîye vergirtin. Çîroka afirandinê di celeba xwe ya Samî da ji sê kesayetîyan pêk tê: Adem, Hewa û Iblîs. Ev sêyîne di ferheng û şaristanîyeta Îslamî da weke: Aşîq û Meîşûq û Dadokê xwe nîşan didin. Helqeya binêşeyî ya vê sêyîneyê kesa/ê sêyem e, ku dibe hegera pêkgehîştian aşîq û meîşûqê û jîyaneke nû diafirîne. Iblîs di biwarên nerînî da dikeve neqşa dadokê û di biwarên erênî da jî dibe navgîn û celebeke dî ya Cebraîl e. ...”⁵⁷

H. Mem li ser pîrozîya hejmara sê weha dinivîse: “Hejmara razî (sirî)

ya sisê ya di tesewufê da, sêyîneya di çanda olî ya ariyan da Ahûra Mezda, Hurmiz, Ehrîman û sêyîneya di xirîstanîyê da Xweda, Îsa û Ruhê Pîroz, zaniyarîyên pîvekî (krîterî) yên çanda bawerîyê ne. Ev ên hanê ku xwedî zemîneke dîn û ramanê ne, di sondxwarinê, qewildanên şahidî û peymanan da, sîstema pîvanê ne, ku bi pîranî tînan bi karanîn.”⁵⁸

Hejmara sê li bal Zerdeştîyan hejmareke pîroz e û ew helgirê sê gotinên Zerdeşt in, yên ku xîmê bîr û bawerîya Zerdeştîyan li ser wan ava bûye, ku jê ra sê bext/buxt wate sê rizgarîker gotine: gotara baş, ingara baş, kiryara baş.⁵⁹

Navê sê qîzên paşayê perîyan (di celebên dî yên beyta Memê Alan da)

beranber e di gel sê numadên pîroz yê Mîtarîsmê, wate Tav, Hîv û Istêr:

Mem H. li ser wan navana weha dinivîse: “Di beşa destanê ya xwedî estetîk da, sê keçên Padişahê Perîyan, mirov dibin ser bircên Êrûkê yê di destana Gilgamêş a Mezopotamyaya pîrxwedawend a berî Îsa. Mirov nikare xwe li nedîtina wan sêmendên xwedawendên roj, heyv û sitêrê deyne ku navê wan Tavbano, Heyvbano û Sitêrbano ne.”⁶⁰

57 Teymûr Malmîr, “Ca be cayî-hayê ‘Ededî-yê Ustûre-yê Aferîniş-ê Nimûne-yê Nexustîn Insan” *Mecelle-yê Danişkede-yê Edebîyat ve ‘Ulûm-ê Insanî-yê Meşhed*, Şomare-yê 160. Sal 1387 hş. s. 285.

58 H. Mem, *Rastîya Destana Memê Alan*, we. Farqînî, Zana, h.b. r. 48.

59 Huseyn Tewfîqî, *Aşinayî ba Edîyan-ê Bozorg*, Merkez-ê Cehanî-yê ‘Ulûm-ê Îslamî, r. 39.

60 H. Mem, h.b. r. 50.

Hejmara sê li bal Kurdan hejmareke taybet e. Weke sê sondê qesemê (wellahî, billahî, tellahî.) sê telaqê jinberdanê, sê dest leystin, sê kab leystin, sê caran gazîkirin (di istiranana da) hersê rojê felekê...

Mu'xên ku istêrka 'Îsa pêxember dîtîna û çûne dîtîna wî **sê** kes bûn.⁶¹

Sê li bal hindûyan jî hejmarek pîroz e û peydabûna zatê heq e: Berehma, Wîşno û Şîwa.⁶²

Sê numada demê ye, dem li ser sê paran hatîye parvekirinê: dema bihorî, dema niha û dema nehatî.

Sê hejmareke binyadîn e û xîmê hebûnê bi wê ava dibe. Day û bav û zarrok.

Bi van agadarîyan ra em dibînin ku danerê beytê di gel li ber çavgirtina giringî û pîrozîya hejmara **sê**, ew weha di beytê da bi kar birîye û rengê pîrozî û mezhebî û istûreyê daye beytê.

Hejmara 2 di vê beytê da 36 caran hatîye:

Hejmara du, li pêş her tiştî da numada dualîzmê ye ku xîmê Mîtraîsm û Zerdeştîyê li ser ava bûye. Du numada dijayetîya nîveka du kes, yan du tişt û du rewşên dijî hevbûnê ye. Nîşana gef û pîlangêrîyê ye. Du numada xaliq û mexlûq, reş û sipî, şev û roj, nêr û mê, made û can, mirin û jîn, çep û rast, erênî û nerênîyê ye.⁶³

Di ferheng/çanda Îranîyan da hatîye ku; hejmara du xudanê van numadan e: şev û roj, jêr û jor, jîyan ku xudanê du derîyan engaşte bûye, derekî ra mirov tê û derê dî ra diçe (dimire), endamên leşê mirovî ku pişka zor e wan cot in.⁶⁴

Lê di bîr û bawerîya gelêrî da du numada du kesan û du evîndaran û numada pêkgehîştinê ye. Kurd dema nifiran li kesekî/ê dikin dibêjin: "Xudê yeka te neke duyan."

Di beyta Memê alîyan da her carê ku hejmara du hatîye bi karanînê, weke numada bihvîgîhandin û pêşketin û yekbûnê ye.

Şeva **duduyan** qîzên paşayê perîyan biryarê digirin ku Memê û Zînê bigehînin hev. (bnr. bm. rê.133.)

Bozê Rewan canîkî **du salî** ye. Ev canîyê du salî dê bibe wesîla pêkgehandina Memê û Zînê. (bnr. bm. rê.53.)

Şetê cizîrê bi **du** firqan e. Herçiqaş ku di beytê da nehatîye, lê bi kontêkstê

61 Ehmedî, h.b. r. 5.

62 Xulamrêza Meisûmî, "Berehmen, Wîşno, Şîwa", *Dairetu'l-me'arîf-ê Esatîr ve Ayîn ha-yê Basitanî-yê Cehan*, nş. Dewre-yê Mêhr, sal 1394 hş. s. 142

63 Zebîhnîya 'Umran, - Qeyyûmîzade, h.b. s. 24- 36.

64 Jean Chevalier, - Alain Gheerbrant, , *Ferheng-ê Numadha*, Tercume ve Tehqîq, Fezayilî, Sûdabe, Intişarati Ceyhûn, Tehran, 1379 hş. s. 258

mirov dibîne ku Mem di wî cîhê ku şet bûye du firqan ra derbas dibe ku here bigîje bajarê Cizîra Botan. (bnr. bm. rê.286.)

Dema ku Mem dixwaze here ser Kanîya Gulan û Zînê bibîne, **herdu** bira xwe davêjin zengîya wî û arîkarîya wî dikin, ku here ser Kanîyê. (bnr. bm. rê.452.)

Dema ku Zînê cêrîyê dişîne here ava Kanîya Gulan jê ra bîne, beytbêj nabêje cêrîyê **du** satil hildan, dibêje: “*Carîyek rabû, kete mabênê satilane.*” (bnr. bm. rê.390.)

Di vir da jî **du** numada pêşketin û bi hevdu gîhandinê ye, lewra ku cêrî diçe û bi hatina Memê dihesê û tê mizgînîya hatina Memê dide Zînê.

Ji bilî hejmara du peyv û çemka cot jî di vê beytê da berzeq û xûya ye, cot jî dîsa numada cotbûn û pêkgeheştinê ye di vê beytê da.

Peyva **cot** du caran hatîye bi kar birine: “**Cotê** ipegan bişuxlînim.” (bnr. bm. rê.444.)

Zînê tas kire destê xwe, ber da îçî kanîyê, destî xwe avête cotî memikan.” (bnr. bm. rê.482.)

Lê ji bilî vê peyvê em di beytê bixwe da jî rastî çemka **cot** tên: Mem û Zîn- Mem û Bengîn- Sitî û Zîn- Beko û Mîr- evanan du bi du bi hevdu ra cotekê çê dikin. Dema ku Mîr dixwaze here nêçîrê, Beko dibêje: “*Mîr, bira werg ban neke, bira bibêje: “**sekman bi tîfangê xwe** va, **seyyadî bi tajîyê xwe** va, **her kes bi mîvanê xwe** va werin, em herine seyde”* (bnr. bm. rê.518.)

Hejmara dî ku hejmareke istûreyî ye, hejmara **heft** e ku di vê beytê da 12 caran hatîye:

Hejmara heft hejmareke ku wateya kutabûn û tekûzbênê dide. Heft rengê bûka baranê, heft rojên heftê, heft tebekên erdê, heft qatên asimanan, heft istêrkên asimanî, heft merheleyên kemalê, heftemîn roja hefteyê ku roja bêhnvedan û ceşnê ye, heft vadîyê êşq, heft caran tewafa Ke’beyê, bi heft qeleman xemilandin... (heftxwanê Rostem)

Di çîrokên da jî heft numada tekûzîyê ye: heft can, heft ser, heft kur, kela heft derî, xwe bi heft qeleman xemilandin, heft merheleyên silûkê...⁶⁵

Di bîr û bawerî û folklorê Kurdî da hebûna heft kuran nîşana bextewerîyê ye.

Encam

Beyta Kurdî û ya Erebi du mijarên ji hevdu cuda ne. Ev herdu peyv bi rûya yek û di wate û çemkên xwe da ji hevdu cuda ne. Peywenda beyta Kurdî digel peyvên beyat (miqameke mûsîqayê) û bayatî (çarîneyên folklorîk yên Azerî) û peyva pad

65 Chevalier–Gheerbrant, h. b. s. 557-575

ya Avestayî bi wateya helbestê û poeta Inglîsî ra heye. Lewra beyta kurdî xudanê meqam û ahenga mûsîqayî ye. Herwisan weke bayatîyan helbest e. Çawa ku bi nivîsîna Ebû Reyhanê Bîronî ‘Ereban zanista ‘erûzê jî ji Hindîyan vergirtine,⁶⁶ Dibe ku ‘Ereban ev peyva beyt jî ji Kurdan û Farsan vergirtibin û navê vê şaxa toreya Kurdî ku helbestên dûr û dirêj in, li rêzek ji helbesta xwe kiribin û li dû ra li ber hev wateyîya rûvayî/zahirî ya beytê di gel mal û xanî ew şubandibin xanî û biwêjên misra’ û sebeb û weted û fasileyê jê ra çêkiribin.

Beyt dibe ku weke gatan û horeyan sirûdeke ayînî ya berî Îslamê be û li dû serketina Îslamê li ser Kurdistan û Îranê ew sirûda jî weke gelek sirûden ayînî yên di ji bîr çûbe, lê bi kirasekî nû weke çîrokehelbestan derketibin holê. Hebûna numadên ayînî yên bawerîyên Mîtrayî, Zerdeştî û Êzdtîyê jî û bi taybet hejmara sê di vê beyta Memê Aliyan da jî evê hizrê xurttir dike.

Bi giştî roja îro beyt yek ji janrên here giring e di toreya gelêrîya Kurdî da. Di nava sedan beytên Kurdî da beyta Memê û Zînê -ku bi navê beyta Memê Alan û Memê Aliyan jî di nav gel da hatîye naskirin- bi nav û bangtirîn beyta Kurdî ye. Beyta Memê Alan serbihorîya evîna şahzadeyekî Kurd û dotmîrek Kurd e, ku bala gelek kesan li ser xwe da rakêşaye. Yekemîn kesê ku ev beyta ji xwe ra kirîye jêdera afirandina berhema xwe, Ehmedê Xanî ye.

JÊDER Û ÇAVKANÎ:

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasik*, Çapa Duyem, Nûbihar, Istanbul, 2014

Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasik de*, Nûbihar, Istanbul 2019

Ansiklopediya Îranika, “Memê Alan”, <http://www.iranicaonline.org/articles/meme-alan>. (Gihan 27.11. 2019, 21. 56)

Babayî, Sedîq, *Memê Alan be Horamî*, Naşir Gote û Hafîz, Alman, Bonn, sal 2018, şabek: 9783940762535

Bidlîsî, Şerefhan. *Şerefname*, bi ihtimami Wiladimir, Zêrnov, Peterburg 1860

Bozarşlan, M. Emîn, *Mem û Zîn*, (bi turkî) Gün yayinlari Istanbul, 1968

Celîl, Ordîxan, Celîl, Celîl, *Zargotian Kurda*, I, weşanên Aram, çapa Sêyem, Diyarbekir, 2013

Chevalier, Jean – Gheerbrant, Alain, *Ferheng-ê Numadha*, Tercume ve Tehqîq, Fezayilî, Sûdabe, Intişarati Ceyhûn, Tehran, 1379 hş.

Chyet, M. L. *And a thornbush sprang between them* Studies on Mem û Zîn: A Kurdish Romance. Vol. 1, UMI Dissertation Services, Ann Arbor. Michigan. 1 . 1991

- Cindî, Hecî - Evdal, Emîn, *Folklor a Kurmanca Avesta*, çapa yekem 2008
- Cindî, Hecî, *Hikyatêd Cimeata Kurda, I. Weşanxaney a Rûpelê*, çapa 1. Stenbol 2014
- Dêhxuda, Elî Ekber, “Numad” Luxetname.
- Dêreşî, Seîd. *Dîwana Feqîyê Teyran*, Dezgeha Sipîrêz, Hewlêr, 2005
- Ehmedî, Leyla, “Neqşê E’îdad der Ayînha-yê Guzerê-ê Îranî”, *Mecelle-yê Mutaliat-ê Îranî*, Danişkede-yê Edebîyat ve ‘Ulûm-ê Islâmî, Danişgah-ê Şehîd Bahuner-ê Kirman, sal 14. Şomare-yê 28, payîz ve Zimistan-ê 1394 hş.
- Fetahî Qazî, Qadir, “Menzûme-yê Kurdî, Kel û Şêr”, Danişkede-yê Edebîyat ve ‘Ulûm-ê Islâmî, Danişgah-ê Tebrîz, 1357 hş. şomare-yê 136
- Fetahî Qazî, Qadir. *Gencîney beytî Kurdî*, sercemî berhemekanî, çapî yekem, Hewlêr, 2007
- Gencewî, Nizamî. *Kullîyat*, ts. We’hid-ê Destgirdî, Çap-ê Dovum, Intişârât-ê Bêhzad, Tehran 1381 hş.
- Hesenpûr, Emîr, “Beyt” *Danişname-yê Cehan Islam, Iranika*, (made-yê Beyt2) cild 1. <http://lib.eshia.ir/23019/1/2365>
- Kaplan, Yaşar. *Beyt û Destanên Kurdî*, Nûbihar, çapa yekem, Istanbul 2019
- Kolîvand, Mojtaba. *Persische und Kurdische Reiseberichte*, Herausgegeben von Harassowitz Verlag. Wiesbaden 2014, Wiesbaden
- Kovara Sirwe*, hejmar 17, sermaweza 1366 hş.
- Kovara Sirwe*, hejmar 2, havîna 1364 hş.
- Lescot, R. *Memê Alan*, Istanbul, Orfeus, 1996.
- Malmîr, Teymûr, “Ca be cayî-hayê ‘Ededî-yê Ustûre-yê Aferîniş-ê Nimûne-yê Nexustîn Insan” *Mecelle-yê Danişkede-yê Edebîyat ve ‘Ulûm-ê Insanî-yê Meşhed*, Şomare-yê 160. Sal 1387 hş.
- Mann, Oskar. *Die Mundart der Mukri-Kurden, teil II* Berlin, Druck und Verlag von Georg Reimer, Berlîn 1909.
- Meisûmî, Xulamrêza, “Berehmen, Wîşno, Şîwa”, *Dairetu’l-me’ârif-ê Esatîr ve Ayîn ha-yê Basitanî-yê Cehan*, nş. Dewre-yê Mêhr, sal 1394 hş.
- Mem, H. *Rastîya Destana Memê Alan*, we. Farqînî, Zana, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem, Rêbendan 2006
- Mukrîyanî, Hêmin. *Tu’hfey Muzeferîye*, pêşgotin, dezgay Aras, Hewlêr, sal 2011
- Nanewazade, Elî, “Beyt”, *Ferhengî Herman*, Bergî Yekem, Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2005
- Nîkreftar, Keyomers, *Keşkol*, Enistîtûtî Kelepûrî Kurd- Silêmanî, salî 2013 Silêmanî
- Ölmez, Cumhur, “Mem û Zîneke bi Hewramî” (Tekst- Vekolîn) Lîsansa bi têz, Zanîngeha Artuklu Mardîn, 2018, r. 12.
- Qeys-Elrazî, Şemseddîn Muhemed, *Elmu’cem Fî Me’ayiri Eş’aril-’Ecem*, Beyrût, 1909

- Râzî, Necmuddîn, *Mîrsâd'ul-'ibâd*, Şirket-ê intişârât-ê 'İlmî ve Ferhengî, Tehran 1391 hş.
- Sabat û Sawên "Rolî Afret le Gotinewey Beyte Folklorîyekan da" *Kovara internetî sabat û Sawên*. www.rojikurd.net/sabatusawen/2017/05/18/ -
- Şâygânfer, Heyder Rızâ, "Beyt", *Dairetu'l-me'ârif-ê Bozorg-ê Îslâmî*, XIII <https://www.cgie.org.ir/fa/publication/entryview/8253> (Gihan: 04.11.2019/09:57)
- Şems, Îsmâîl, "Beyt-ê Kurdî" *Merkez-ê Dairetu'l-me'ârif-ê Bozorg-ê Îslâmî*, Gihan: 03.11.2019/22:13, (<https://www.cgie.org.ir/fa/article/153284/>)
- Şerefkendî, 'Ebdurrehman, Hejar, "Beyt", *Henbane Borîne*, Intişarat-ê Sirûş, Çapî Yekem, Tehran 1369 hş.
- Şerîfî, Ehmed. "Ustûreha ve Efsanehayê Kurdî" *Fesilnameyê Ferhengê Merdumê Îran*, şomare-hayê 7 ve 8, behar 1386 hş.
- Tabanî, Hebîbullah, *Vehdet-ê Quwmî-yê Kurd ve Mad, Menşei-ê Nejad ve Tarîxê Temeddun-ê Kurdistan*, Neşr-ê Gusterdê, Tehran 1380 hş.
- Tewfîqî, Huseyn, *Aşinayî ba Edîyan-ê Bozorg*, Merkez-ê Cehanî-yê 'Ulûm-ê İslamî
- Xeznedar, Marif, *Mêjûy edebî kurdî*, Hewlêr 2001,
- Yıldız, Ayhan, *Hunera Vegotina Bedew A Devkî û Nivîskî*, 2017, Van, 1
- Zebîhniya 'Umran, Asiye- Qeyyûmîzade, Ferîba, "Berresî-yê Karburd-ê E'idad-ê Yêk ta Penc der Efsane ha-yê Mektûbê Îranî", *Fesilname-yê Pijûhişha-yê Edebî ve Belaxî*, sal-ê Pencum Şomare-yê 18, Behar-ê 1396 hş.

TAYBETÎYÊN SEBKA IRAQÎ DI HELBESTÊN ÎBN ADEM (WACIM) DA¹ The Characteristics of Iraqi Style in the Poems of Ibn Adam (Wajim)

Îbn Âdem (Wacim)'in Şiirlerinde
Sebki Irakî Üslubunun Özellikleri

Hemin Omar AHMAD² - Nurettin ERTEKİN³

Kurte

Sebka an şewaz weke rê û rêbazên nivîsandina berhemên edebî di dîroka edebîyatê da cihekî giring digire. Di dîroka edebîyata Farsî da jî sebkên cûr be cûr derketine holê ku yek ji van sebkên Sebka Iraqî ye. Sebka Iraqî, di dawîya sedsala şeşem da derketîye holê û hetanî dawîya sedsala nehem berdewam kirî ye. Sebka Iraqî, guherînên girîng di şî'ra farsî da pêk anî ye. Herweha bandor li edebîyata Kurdî jî kirî ye. Di binê sîwana sebknasîyê da ev gotar bi sernavê (Taybetîyên Sebka Iraqî Di Helbestên Îbn Adem (Wacim) da) dixwaze bi giştî sebknasîyê û bi taybet jî Sebka Iraqî û taybetîyên Sebka Iraqî di helbestên Îbn Adem (1750-1822) da vekolîne. Îbn Adem, helbestên xwe bi zimanê Farsî û 'Erebî nivîsandine. Di helbestên wî da bi zelalî bandora Sebka Iraqî dixwuye. Bikaranîna paşserwa û dubare kirina bêjeyan, ziman û ûnsûrên tesewufî taybetîyên Sebka Iraqî ne.

Peyvên sereke: Sebka, Sebka Iraqî, Tesewuf, Paşserwa, Îbn Adem (Wacim).

-
- 1 Kurteya vê gotarê, di "Duwemîn Konferansê Destnûsxaney Zankoy Soran, Konferansî Zanistî Nivdewletî, Îbnî Ademê Balekî (24-25 Ağuostos 2019) " da hatiye pêşkêşkirin. Bi sedema ku me gotar bi tevahî ji Zanîngeha Soran ra neşandibû di nava teblîxên konferansê da nehate weşandin.
 - 2 Mamosteyê zanîngeha Soran û mamosteyê mêvan li zanîngeha Bingolê. hemin.ahmad@soran.edu.iq
<https://orcid.org/0000-0003-1985-9512>
 - 3 Xwendekarê doktorayê beşa ziman û edebiyata kurdî li zanîngeha Bingolê. nurettin.ertekin@hotmail.com

Abstract

Style was represented as one of the important method and form in the history of Literature. In the history of Persian literature, there were various styles, among them an Iraqi style, which started at the end of sixth century to the end of ninth century; it has particularly changed Persian poetry. This style has also influenced the Kurdish poets. Based on the stylistics, this research is entitled (**The Characteristics of Iraqi Style in the Poems of Ibn Adam (Wajim)**). attempts to define the characteristics of stylistics in general and Iraqi style in particular, and mainly the reflection and the effect of this style on the unpublished divan of Wajim (1750-1822). He, before the development of Kurdish Medieval Literature, wrote his poem in the Farsi and Arabic languages, and the Iraqi style is clearly reflected in the style of his writing. This can apparently be seen in terms of form such as rhyme scheme, repetition, aspects of language, and some elements of Sufism.

Keywords: Style, Iraqi Style, Sufism, Rhyme, İbn Adem (Wajim).

Özet

Üslup, bir edebi ürünün yazımında kullanılan kurallar çerçevesinde edebiyat tarihinde önemli bir role sahiptir. İran edebiyat tarihinde ortaya çıkan çeşitli üsluplardan biri de Sebki İrâkî'dir. Sebki İrâkî, 6. Yüzyılın sonunda ortaya çıkmış ve 9. Yüzyılın sonuna kadar devam etmiştir. Bu üslup, İran şiirinde önemli değişiklikler meydana getirmiş ve Kürt edebiyatına da etki etmiştir.

Bu makale genel olarak üslup, özel olarak da Sebki İrâkînin özelliklerini ve bu özellikleri İbn Âdem (1750-1822) in şiirlerinde irdelemeyi amaçlamaktadır. Şiirlerini Farsça ve Arapça kaleme alan İbn Âdem'in şiirlerinde Sebki İrâkînin özellikleri bariz görünmektedir. Redif kullanımı, kelimelerin tekrarı, dil unsurları ve tasavvufi argümanlar Sebki İrâkînin özelliklerindedir.

Anahtar Kelimeler: Üslup, Sebki İrâkî, Tasavvuf, Redif, İbn Adem (Wajim).

Destpêk

Bi nêrînek giştî dema em li dîroka edebîyatê binihêrin, edebîyat ji serdema Yûnanîyan hetanî roja me di gelek qonaxan da derbasbûye û gelek guherîn di şikl û naveroka wê da rû da ye. Herweha edebîyat di nav her gel û netewekî da jî taybetîyên çanda gel dixwe da girtî ye. Bi sedema ku edebîyat rengvedana jîyan û çanda neteweyan e, guherînên di jîyana gel û neteweyan da – çî erînî çî neyînî – bandor li guherînên edebîyatê jî kirî ye.

Edebîyata Farsî piştî hatina Îslamîyetê bi çend qonaxan têper bû ye. Di her qonaxekê da sebk û şewazek hetanî demekê weke teorî yan çerçove û rêbazek

giştî ji bo nivîsandina berhemên edebî û bi taybet ji bo honandina helbestan derketîye holê. Di edebîyata Farisan da di dawîya sedsala şeşem û destpêka sedsala heftem da şêwazek nuh bi navê Sebka Iraqî derdikeve holê. Ev şêwaz di demeka kurt da di nav edîbên Farisan da berbelav dibe û cih digire. Helbestvanên weke Hafîzê Şîrazî (792), Mewlewî (672), 'Ettar (627), û Se'dî Şîrazî (m 635), bi vê şêwazê helbestên xwe honandine. Ev şêwaz, bandor li ser helbestvanên Kurd û helbestvanên Kurdên farsîaxêv ji kirî ye û hetanî qonaxa dawî ya Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî berdawam kirî ye.

Bi sedema ku fikir û ramanên helbestvanî di çerçoweya şêwazê da cih digire, şêwaz amrazeke ji bo naskirina fikr û ramanên helbestvanan. Bi taybet ji layê naverokê va mirov dikare bigihêje fikra giştî ya civakê jî. Di bin sîwana zanista sebknasîyê ev lêkolîn bi sernavê (Taybetîyên Sebka Iraqî Di Helbestên Îbn Adem (Wacim) da) dixwaze bi giştî weke zanistekî li ser sebknasîyê bisekine û bi taybet Sebka Iraqî û taybetîyên vê sebkê di helbestên helbestvanekî Kurd yê farsîaxêv, Îbn Adem (1750-1822) î da, ku bi mexlesa "Wacim" helbest honandîye bisekine.

Du taybetî bûne sedemê hîlbijartina vê mijarê. Yek jê, mijara sebknasîyê û bi taybet Sebka Iraqî bi zaravê Kurmancî pir kêr hatîye nasandin. Ya din jî, xasma şa'îrekê weke Wacim; ku şa'îrekî Kurd e û bi 'Erebî û Farsî şî'r honandine, cara pêşî bi zaravê Kurmancî tê nasandin. Diwana wacim ku taybetîyên dîwanên murettab dixwe da digire hêj destxet e û nehatîye çapkirin.

Ev xebat, metoda şîrevekîrîne jê di xwe da digire û xwe bi lêkolîna li ser Sebka Iraqî û taybetîyên vê sebkê di şî'rên Wacimî da sînordar dike. Bi vê çerçoweyê ewê gotar ji sê beşan pêk were. Di beşa yekem da kurte jîyana Wacim, di beşa duyem da sebk, sebkên şî'rên Farsî û bi taybet Sebka Iraqî û di beşa sêyem da taybetîyên Sebka Iraqî di şî'rên Wacim da cih girtî ye.

Di beşa sêyem da bi mînakên ji malikîna xezel û qesîdeyên Wacim taybetîyên Sebka Iraqî di şî'rên wî da hate vekolandin. Di vê vekolînê da zêdetir li ser layê ziman, unsûrên tesewufî, paşserwa û dubarekirina bêjeyan hate sekinandin.

Di encamê da ew taybetîyên ku weke sitûn û bîngeha Sebka Iraqî ne û di şî'rên Wacimî da hatine destnîşankirin û bûne nîşan ku Wacimî ew bi agahî û hişyarî bi kar anîne û ew weke şêwaz şopandine û bûne taybetmendîyên şî'rên wî hatine derxistin.

1. Kurtejiyana Îbn Adem

Navê Îbn Adem, Mihemed e. Mihemed kurê Adem e, kurê 'Ebdullah e, kurê Mehemed e, kurê Yûsif e, kurê 'Usman e, kurê Elyas e, kurê Husên e. Îbn Adem bi Balekî û Rustayî tê naskirin.⁴

4 رشيد احمد رشيد و اخرون، ابن ادم البالكي حياته وأثاره، مجلة العلوم الانسانية لجامعة زاخو، ههژمار 4، 2018، ص 1003.

Îbn Adem, li gundê Rust ku dikeve bakûrê Gelale, nêzî çiyayê Hesarost ku anha girêdayî bajara Hewlêrê ye, di sala 1164 ê mişextî (1750yê mîladi) hatiye dunyayê. Pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kirîye. Piştî çûye ba <Ellame Mihemedê kurê <Ebdulahê Bayezîdî xwendîye. Ji bo xwendinê çûye Mahabadê û piştî Mehabadê çûye Rewandizê û di serdema mîrê Rewandizê da mijûlî dersdayîn û nivîsîna pirtukan bûye. Li Rewandizê dibe seydayê Mîr Mehemedê kurê Mîr Mistefa Beg û wî hînî xwendin û nivîsînê dike. Îbn Adem li ba mîr gelek xwedî rêz û hurmet bûye. Li Rewandizê dibe xudanê medreseyeke mezin.⁵

Îbn Adem piştî ku çend salan li Rewandizê dimîne ji ber hin sedeman navbera wî û Mîr Mihemed xirab dibe. Bi vê sedemê destê xwe ji Rewandizê berdide û diçe li gundê Dêlze bi cih dibe. Îbn Adem, di sala 1237 /1822 çûye ber dilovaniya xwedê û li gundê Dêlze hatiye defîn kirin.⁶

1.1. Hin Xwendekarên Îbn Adem

Mewlana Xalîdê Şehrezûrî, Mela Mihemedî Xetî, Mela ‘Elîyê Wesanî, Mela ‘Ebdulahê Gelalî Kurdî, Şa’ir Hacî Qadirê Koyî, Mela ‘Ebdullahê kurê Hacî Mela Es’edê Celî ji xwendekarên Îbn Ademî ne. Di nav xwendekarên Îbn Ademî da Hacî Qadirê Koyî pir ketîye bin bandora wî û di helbesteka xwe da behsa seydayê xwe kirîye.⁷ Hacî Qadirê Koyî Dema bi ne başî behsa şêxekî dike derbarê Îbn Adem da weha dibêje:

Sitte’eşer jinyetî be mezhebi hîmarî

Îbinadem nemawe serî pan ka wek marî⁸

Îbn Adem di zanistên Kelam, Mentiq, Belaxet, Sitêrnasî, Dîrok, Serf, Nehû, Hendese, Hîsab û Mîratê da ji sedî zêdetir berhem nivîsandine. Lê mixabin gelek berhemên wî wenda ne.ew berhemên ku niha man e gelek ji wan weke têz hatine kêkolinkirin. Wî berhemên xwe bi piranî li gundê Rust nivîsandine. Dîwaneke helbestan bi du zimanî (Farsi-’Erebî) nivîsandiye. Dîwan ji 148 helbestan pêktê. Helbesteke wî jî bi ziamnê kurdî di nav xelkî da belav e. Di helbestên xwe da mexlesa Wacim bi kar anîye.⁹

2. Danasîna Sebkan

Di berhemên edebiyatê de û di ferhengan de ji bo pênaseya sebkê lihevki- nek nayê dîtin. Kesên pênaseyên sebkê kirine li gorî fikr û raman û têgihiştinên

5 رشيد احمد رشيد و اخرون، ص ۱۰۰۳.
6 فايزى ملا بكر، تصحيح تاريخ وفاة العلامة ابن ادم، مجلة كاروان ژ ۸۲، ص ۱۴۰.
7 زبير بلال اسماعيل محمد، بن ادم البالكى، مجلة مجمع العلمى الكردى، مجلد ۵، ۱۹۷۷، ص ۴۵۰-۴۵۷.
8 مسعود محمدم، حاجى قادرى كۆيى، بهرگى دووم، چاپخانهى ئاراس، ههولنر ۲۰۱۰، رويپر ۸۱.
9 زبير بلال اسماعيل، ص ۴۵۰-۴۵۷.

xwe pênase derxistine holê. Di ferhenga *Mu'în* de sebk weha hatiye pênasekirin: “Rewşa taybet e ku şa'ir, an nivîskar, têgihîştinên xwe û hissên xwe rave dike, şêweya rewekirina dil e.”¹⁰ Yan bi awayekî din sebka her kesekî rewşa beyankirina hizir û ramanên wî ne.¹¹ Ango bi dahênan û afrandinê ku bi vê rewşê ji kesên din cuda dibe. Di edebiyata Farisan de kesê yekem car li ser sebk û sebkşunasiyê berhem nivîsandîye Meliku'ş- Şuarâ Mûhemmed Teqî Behar (1886-1951 z) e.¹² Behar, sebkê weha pênase dike: “Sebk, yek ji zanista edebiyata Farsî ye ku bi wateya terzekî taybet a helbest û pexşanê ye.”¹³ Sîrûs Şemîsa piştî dujwarîya pênasekirina sebkê dide berçavan, sebkê weha pênase dike: “Sebk, yekîtiya di berhemeka kesekî da dikeve ber çavan; yek rih ya taybetî, ya taybetîyên hevbeş û çendcar di berhemên kesekî de ye.”¹⁴

Sebk, şêweya taybet a berhemek edebî an gelek berhemên edebî ye. Şa'ir, an nivîskar bi hîlbijartina peyvên, şêweya têgehên, raveka bêjeyan û rewşa taybet di ravekirina têgihîştin û hestên xwe de şêweyek wusa hildibijêre ku berhema wî, ji berhemên edebî yê din cuda dike.¹⁵ Sebk di eslê xwe de, di gotin, nivîsîn, kar û bizava hizirîna însan derbarê cîhan û bûyeran de, peywendîya zihn û zimanê însan e.

Sebk, li gor gelek nêrînan dikare were dabeşkirin û hatiye dabeşkirin. Dabeşkirina herî kevn ya Arîsto ye ku wî, sebk dabeşî heft beşan kiriye.

- 1- Li gorî navê nivîskar. Wek sebka Melayê Cizîrî û sebka Homer.
- 2- Li gor dema nivîsandina berhemê. Wek sebka dema mîrektîyan û sebka nû.
- 3- Li gor zimanê di berhemê da. Wek sebka Îranî û Fransî.
- 4- Li gor mijarê. Wek sebka tesewufî.
- 5- Li gor serzemîna erdnîgarîyê. Wek sebka Iraqî û Xorasanî.
- 6- Li gor peywendîya muxateb. Wek sebka 'amiyane û 'alîmane.
- 7- Li gor hedef û armanca berhemê. Wek sebka fêrkirinê û sebka henekan, tinazî.

Di roja me da sebk wek zanistekê di edebiyatê de cihê xwe girtiye. Zanista ku pergala (Discipline) mijaran sebkê vedikolîne, sebknasî (Stylistics) jê re tê gotin.¹⁶ Ev zanist bi gelemperî dixwaze bigihêje sê armancan û li gor van armancên xwe berhemeke edebî dike mijara lêkolînê.

-
- 10 محمد معین ، فرهنگ معین، انتشارات ادنا، چاپ چهارم ، تهران ۱۳۸۱، برگ ۱، ص ۸۲۷.
 - 11 محمد جعفر محجوب، تاریخ مقدمه: سبک خراسانی در شعر فارسی، چاپ اول، تهران، ص ۴۹-۵۱.
 - 12 محجوب، ص ۲۴.
 - 13 محمود عبادیان، در آمدی بر سبک شناسی در ادبیات، انتشارات آوای نور، چاپ دوم، تهران ۱۳۷۲، ص ۱۵.
 - 14 سیروس شمیسا، کلیات سبک شناسی ، چاپ دوم، انتشارات فردوس، تهران، سال ۱۳۷۳، ص ۱۳-۱۴.
 - 15 محمد پارسا نسب، حسن ذالفقاری، مهرداد سنقری، ادبیات فارسی (قافیه، عروض، سبک شناسی و نقد ادبی)، وزارت آموزش و پرورش، سازمان پژوهش و برنامه ریزی آموزشی، تهران ۱۳۹۴، ص ۶۵.
 - 16 شمیسا، کلیات سبک شناسی ، ص ۱۳.

- 1- Naskirina sebkên serdemên cuda û kifşkirina taybetîyên her serdemekê.
- 2- Naskirina sebka yek şa'ir an nivîskarekî mezin ku bi qonaxek sebknasîyê va girêdayî ye.
- 3- Naskirina sebka edebî û naskirina taybetîyên wê li hember sebkên din.¹⁷

Herçend sebknasî zêdetir bi edebîyatê ve girêdayî be û dema sebknasî tê gotin, edebîyatê heşê mirovan jî, di heman demê de sebknasî di zimannasîyê da û di huner û xweşiknasîyê (Aesthetics) da jî wek beşeke zanistê tê pejirandin.¹⁸ Sebka şîrê ew taybetîyên giştî ne ku şa'irek, an gelek şa'ir di vegotina hizrên xwe û di bikaranîna bêjeyan de berê xwe dane wan. Di edebîyata Farisan de sebk li gorî serdeman bi heşt serdeman dabeş dibe.

- 1- Sebka Xoresanî.
- 2- Sebka navber an sebka dewra Selçûqîyan.
- 3- Sebka Iraqî.
- 4- Sebka navber an sebka Wu'qû û Wasuxt.
- 5- Sebka Hindî.
- 6- Sebka Navber an sebka Paş Vegerînê.
- 7- Sebka serdema Meşrûtiyetê.
- 8- Sebka nû.¹⁹

Emê li jêrê her sê sebkên mezin ên klasîk; sebka Xoresanî, Sebka Iraqî û Sebka Hindî bidin nasîn û taybetîyên wan û nûnerên wan ên navdar rêz bikin.

2.1. Sebka Xorasanî

Wek ji navê sebkên tê famkirin bi gelemperî dabeşkirin li gorî cihê destpêka sebkê hatine binavkirin. Piştî hatina dîne Îslamê yekem car berhemên nezm û pexşan, li navçeya Xoresana Mezin derdikevin holê bi vê sedemê navê vê serdemê bûye sebka Xoresanî. Ji vê sebkê re navê Turkîstanî û Samanî jî tê gotin.²⁰

2.1.1. Taybetîyên zimanî yê vê sebkê

- 1- Ziman gelek xwerû ye.
- 2- Pir kêr bêjeyên 'Erebî û bîyanî tên ditîn. Ev bêjeyên bîyanî jî bi taybet têgehên dîni û zanistî ne.
- 3- Di navbera zimanê vê sebkê û zimanê îroyîn de hin cudayî henin.²¹

17 شمیسا، کلیات سبک شناسی، ص ۷۰.

18 عبادیان، ص ۳۳.

19 سیروس شمیسا، سبک شناسی شعر، چاپ سوم، نشر میترا، تهران، سال ۱۳۸۶، ص ۱۲-۱۳.

20 شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۲۰.

21 محمد پارسا نسب و اخرون، ص ۶۷.

2.1.2. Taybetîyên Hizrî yên vê Sebke

- 1- Rihê şahî, şadî, xweşî û başîyê can daye şî'rê.
- 2- Şa'irên vê sebke rasteqînparêz (realist) in.
- 3- Hezkirî (me'sûq) ne di pêleyeke bilind da ye. Hin caran hezkirî, li ber dest e. Wek carina hezkiriya şa'irî, cêrî/qerwaş e. Ji ber hindê mijara goftûgoyê di nebera şa'ir û hezkirîya wî da gihastina hev e, ne dûrbûnîya ji hev e.
- 4- Ji hest û ramanan zêdetir aqil di şî'rê de tê dîtin.
- 5- Edebîyata mêrxasî û gernasîyê ye.²²

2.1.3. Taybetîyên Edebî yên vê Sebke

- 1- Teşeya nezmê qesîde ye. Musemmet û tercî'ê bend bi giştî rûnenişti ye.
- 2- Sûdwergirtina ji hunerên edebî bi şikleki asayî ye.
- 3- Di pesindayin û teşbîhan da zêdetir teşbîhên şênber (hissî) hatine bikaranîn.

Şa'irên navdar ên vê sebke: Nasir Xusrew (394-481), Qetran (m 465), Erzeqê Herewî (w 465), Esedê Tûsî (m 465), Fexreddîn Es'ed Gurganî (m 442) û Ebû Se'îd Ebu'l-Xeyr (357-420) dikare were jimartin.²³

2.2. Sebka Iraqî

Moxolîyan di destpêka sedsala heftan da (617) êrîşe ser herêma Xoresanê kir; piştra herêmên din ên Îranê xistin bin desthilatdariya xwe. Di vê dagirkirina Moxolîyan da çand, huner û edebîyata Farisan gelek zerer dît û bandoreke neyînî lê kir. Hemû berhem û pirtûkên wan hatin şewitandin. Şa'ir û nivîskarên ku ji ber êrîşa Moxolîyan direviyan, li bajar û bajarokên 'Iraqê civîyan û navendên edebîyatê ava kirin.²⁴ Ji ber vê edebîyata ku li van navendan derketiye holê, bi navê Sebka Iraqî tê naskirin. Hin ji sedemên guherîna ji sebka Xoresanî bi bal Sebka Iraqî ve ev in:

- 1- Têkiliya navbera gelên Xoresanê û 'Iraqa 'Ecem.
- 2- Fermîbûna zimanê Farsî ya dêrî (kevin) ji bo xwendin û nivîsandinê.
- 3- Çalakkûna mutesewufan di vê qonaxê da û têkiliya tesewufê û şî'rê.
- 4- Damezirandina medreseyên olî û belavbûna zanistên Îslamî.
- 5- Bê nirxîya şî'r û şa'irî di destpêka desthilatdariya Selçûkiyan da.
- 6- Cihguhertina navendên çandî ji Xoresanê bi bal 'Iraqê ve.

22 محمد پارسا نسب و اخرون، ص: 67-68؛ شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۶۲-۶۷.

23 شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۳۷-۵۹.

24 شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۱۹۲-۱۹۳.

2.2.1. Taybetîyên Zimanê Sebka Iraqî

- 1- Peyv û bêjeyên 'Erebî zêde dikeve nava şî'rê.
- 2- Peyv û bêjeyên Farsî yên resen ji holê radibin.
- 3- Ziman ji asanîyê ber bi dujwarîyê va diçe.
- 4- Bêjeyên Tirkî dikeve nav şî'ra Farsî²⁵.

2.2.2. Taybetîyên Hizra Sebka Iraqî

- 5- Belavbûna xezel û mesnewîyên 'aşiqane.
 - 6- Belavbûna tesewuf û 'îrfanê.
 - 7- Hezkirî Xweda ye.
 - 8- Zêdebûna pend û şîretan di şî'rê da.
 - 9- Xweparastina ji pesindayîna xwestekên nefsê û di encamê de bilindbûna 'îşqê.
 - 10- Binirxbûna hicîw û hezil (pêkenî) ê di şî'rê da.
 - 11- Binirxbûna ramanên dînî û lawazbûna ramanên neteweyî
 - 12- Bêzarîya ji hikmetên Yûnanî.
 - 13- Ketina mijarên ruhî, takekesî û alema drûnî di şî'rê da.
 - 14- Zêdebûna xwepesindayîne, gilî û gazin û rexneya civakî di şî'rê da.²⁶
- Sîrûs Şemîsa di berhema xwe da cudahîyên hizrî di navbera Sebka Xoresanî û Sebka Iraqî di çend xaşan da dîyar dike:

Sebka Xoresanî

- 1- Pesinandina hişî
- 2- Asayîya mubalexê
- 3- Tunebûna 'îrfanê
- 4- Fikra hemaşî
- 5- Şadî û şahî
- 6- Gihaştina hezkirîyê
- 7- Rasteqînî (Realizm)
- 8- 'Alema derûnîya însan
- 9- Qehremanîya neteweya Îranî
- 10- Îxtiyar û îrade
- 11- Mezinantî û xurûr
- 12- Nizmbûna asta hezkirîyê
- 13- Bêrexbetîya li hember zanistan

Sebka Iraqî

- 1- Pesinandina 'îşqê
- 2- Mubalexe û Xilû²⁷
- 3- Rewaca 'îrfanê
- 4- Fikra sirûdê (xina-Naxme)
- 5- Xem û keder
- 6- Dûrbûnîya ji hezkirîyê
- 7- Arezû, hêvî û hesret (Îdealizm)
- 8- Alema derveyî ya însan
- 9- Zanistên Îslamî
- 10- Qeza û qeder
- 11- Hejarî û bêhêzî
- 12- Bilindbûna asta hezkirîyê
- 13- Qedirdanîya zanistan²⁸

25 محمد پارسا نسب و اخرون، ص ۸۰.

26 محمد پارسا نسب و اخرون، ص 81-80 ; 258-260 شميسا، سبک شناسی شعر، ص ۸۱-۸۰.

27 Xilû=mubalexaya şa'ir an nivîskare ku di wesfê kesekî yan tiştekî de di astek nepêkan de, tiştekî dîrî ji eqil dibêje. Di zanista bedî'ê de ji bo pesindayîne sê ast heye. 1- Mubalexe, 2- Îxraq, 3- Xilû. (سیمادا، فرهنگ اصطلاحات ادبی، انتشارات مروارید، چاپ سوم، تهران ۱۳۸۱، ص ۳۵۶).

28 شميسا، سبک شناسی شعر، ص ۲۶۰.

2.2.3. Taybetîyên Edebî yê Sebka Iraqî

- 1- Teşeyên nezmê bi taybetî xezel û mesnewî di bandewê da ye.
- 2- Cureyên nezmê zêdebûne.
- 3- Newaya mûsikîya şîrê gelek xweştir bûye.
- 4- Hunerên edebî (bi taybetî bedî' û beyan) gelek hatîye bikaranîn.
- 5- Şî'r bi asanî nayê famkirin. hunerên wek kînaye, mecaz, îstî'are û îham zêde bi kar hatî ye.
- 6- Paşserwayên ji lêker û navan pêkhati pêwîst hatine dîtin.
- 7- Sûdwegirtina ji hunera muwazene, temsilê û ayet û hedîsan di şî'rê da.
- 8- Derketina mexles û nasnavan.²⁹

Nûnerên sebka Iraqî; Hafîzê Şîrazî (792), Selman Sawcî (778), Xwaco (752), Ewhedî (738), Iraqî (670), Mewlewî (672), 'Ettar (627), Se'dî Şîrazî (635), Enwerî (573), Xaqanî (595), Nîzamî (614) dikare bên jimartin.³⁰

2.3. Sebka Hindî

Dema Sefewî dibin desthilatê Îranê, mezhebe Şî'î jî dibe mezhebe fermî. Sefewîyan li hember dîn û mezhebên din azar û zulmeke mezin dikir. Ji ber vê zulmê, şa'îrên girêdayê bi dîn û mezhebên din û bi taybetî şa'îrên peyrewên ehlê sunnet wel cema'etê, ji Îranê revîyan û bi taybetî li Hîndîstanê civîyan; lewra li Hîndîstanê Babur Şah hem misliman bû û hem zimanê dewletê farsî bû. Sefewîyan di desthilatdarîya xwe da guh nedan şa'îrên bi Farsî şî'r dinivîsandin. Lewra Sefewî Tirk bûn û gelek ji wan bi Tirkî şî'r dinivîsandin.³¹ Ev yek jî sedemek bû ku şa'îrên farsîxêv, ji Îranê derkevin. Ew şa'îrên ku ji Îranê revîyan Hîndîstanê, li wir ji teref hukumetê piştvanîyeke mezin dîtin. Wan kesan li Hîndîstanê sebkeke nû ava kir in ku ji vê sebkê re Sebka Hindî tê gotin.

2.3.1. Taybetîyên Zimanê Sebka Hindî

- 9- Zimanê kuçe û sukan kete şî'rê.
- 10- Devjêberdana zimanê kevn û guhnedana parastina rêgezên rêzimanî.
- 11- Bikaranîna terkîbên xerîb û nenaskirî.

2.3.2. Taybetîyên Hizrî yê Sebka Hindî

- 12- Cihgirtina wate û têgehên azadîya ziman.
- 13- Negihaştina mirazan û bêhêvîti.
- 14- Rewaca hikmetên di nav nava gel, ketina şaşî û çanda gel di şî'rê da.

29 محمد پارسا نسب و اخرون، ص ۲۶۰؛ شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۸۱.

30 شمیسا، سبک شناسی شعر، ص ۲۱۲-۲۵۶.

31 محمد رضا عبدالملکیان، حمید کیانی، سبکهای شعر فارسی، جشنواره های فرهنگی و هنری شمس، جشنواره شعر و ادب، اداره کل فرهنگی شهرداری تهران، زمستان ۱۳۹۳، ص ۲۸۳۰.

15-Ravekirina rewşa takekesî û hestên girêdayî bi jin û zarokên şa'irî va.

16-Rasteqînî (Realizm) û wasuxtî^{32, 33}

2.3.3. Taybetîyên Edebî yên vê Sebke

17-Avagirina mezmûnên edebî, wateyên xerîb, hizreke rengîn û wateyên tevlihev.

18-Kêmbûna bedî' û beyanê, ji hunerên edebî teşbîh, bingeha sebkê ye.

19-Ji hemû hunerên edebî telmîh zêde bala şa'iran kişandiye û mezmûnên edebî bi vê hunerê hatine ava kirin.

20-Kinaye û îstî'reyên dûrî hiş zêde bi kar hatine

21-Teşeya nezmê xezel e, lê hejmara beytên xezelan ji sînore xwe derbas dike.

22-Tekrara serwayan di xezelan da.

23- Pir berhemî (şa'irên vê sebkê her yek xwedî çend dîwanin.)³⁴

Kelîm Kêşanî, Saîb Tebrîzî, 'Ebdulqadir Bêdil Dehlewî wekî nûnerên vê sebkê dikarin bîn nasandin.

3. Rengvedana Sebka Iraqî Di Helbestên Wacim Da

3.1. Tekrara Bêjeyan Di Çarçoveya Paşserwa Da

Wek ku tê zanîn Paşserwa, bêjeya piştî pîta rewîyê ye û di dawîya malika şî'rê da cih digire. Di eslê xwe da paşserwa tekrara bêjeya ne. Paşserwa sîmayeke helbestvanên Sebka Iraqîye. Ev tekrar ji xeyrî ku gelek caran wek hunereke ciwankariya bêjeyan tê hesibandin, ji alîyekî din va jî reng û rûyekî xweşik dide asta muzîka helbestê³⁵. Wek ku nivîskarê "Keşşafî Istilahatî'l- Funûn we'l-'Ulûm" jî dibêje, paşserwa/redîf taybetîyek şa'irên farisane. Paşserwa ew bêjeye ku piştî serwa yê tê û di dawîya malikê da bi cih dibe. Ji şî'rên bi vî rengî ra şî'ra "Mureddef (مُرَدَّف)" hatîye gotin. ³¹ Bi gelemperî paşserwa du cûrene. Yek, paşserwayên ku ji bêjeyan pêktên û ya din jî paşserwayên ku ji herfên dewsa cînavka digirin pêktên

Şî'rên şa'irên sebka Iraqî, serşar bi hest û kelecane rûhî dagirtine ku paşserwa ev hest, şewq, zewq û kelecana şa'irî bêtir derdixe holê û mûsikîya şî'rê derdixe asta kemalê. Lewra hest û ramanên şa'irane bi mûsikîyê digihêje

32 Wasuxt: di wateya ferhengî de tê wateya devjêberdan, rû jê zivirandinê. Di edebiyatê navê sebkê ji sebkê şî'rê ye. Di vê sebkê de şa'ir ji nazên me'sûqê bêzar ê, rûyê xwe jê dizivirîn e û beren xwe dide hezkiriyek din. (ص ۲۷۲).

33 محمد پارسا نسب و آخرون، ص ۱۰۵.

34 محمد پارسا نسب و آخرون، ص ۱۰۶ شميسا، سبک شناسی شعر، ص ۳۰۰-۲۹۸.

35 ماه نظری، ردیف در سبک عراقی، مجله فنون ادبی دانشگاه اصفهان، سال دوم، شماره ۱، تابستان ۱۳۸۹، ص ۱۳۴.

36 محمد علی التهانوی، کشف اصطلاحات الفنون، تقديم: رفیق العجم، مکتب لبنان، بیروت لبنان ۱۹۹۶، ج ۱، ص ۸۵۵-۸۵۶.

bandewê. Wehareng, şa'irên mahir û paye bilind, ji bo avakirina yekîtiya fikrê, ji bo bandora hêza mûsikîyê, ji bo berfirehkirina fikrê ramanên xwe di avakirina têgehên nuh da, ji bo derxistina hunerên şa'irane, ji bo hilibijartina têgehên deqîqtir, ji bo avakirina teşbih û 'istî'areyan ji paşserwayan gelekî sûd wergirtine. Digel wê hest û ramanên helbestvanan zêdetir di paşserwayan da dihête dîtin³⁷. Weke şa'irên Sebka Iraqî Wacim jî gelek helbestên xwe bi paşserwa nivîsandîye ku em bi asanî dikarin bêjin xezelên bi paşserwa ji yên bê paşserwa gelekî zêdetir in.

Di helbestên Wacim da, paşserwayên ji hawelanav, lêker, cînavk û hêmanên din yên rêzmanî mîna:

(حبيب، است، نیست، آمد، بیدید، این، بجو، نمی، کنجد، مینماید، نکنجد، نمی، باید، نهاد، خوش، لذیذ، دگر، پرس، در، خویش، دل، دل، تو، باشم، گذشتم، تو، تو، دیدم، میکنم، او، باشد، دلم، آمده، من، جوانان، دم، مز، از، وی)

hatine bikaranîn. Şayanê gotinê ye ku paşserwa «dil», di du helbestan da hatîye bikaranîn ku ev jî taybetîyek ji taybetîyên şa'irên Sebka Iraqî ne.

3.2. Saqî û Tecellîya Wî

Tu şek û şubhe tune ye ku bêjeya saqî bî wateya xwe ya 'irfanî (meczâlî) bi bandora sofi û 'arifan ketîye şî'ra farsî. Berîya ku tesewîf û 'irfan were nav îranê bêjeya saqî û bêjeyên bi saqî va girêdayî (têgehên mey û meyxanê) bî wateya xwe ya rasteqîn dihatin bikaranîn ku jê ra "Xemrîye Serayî" dihate gotin.³⁸ Piştî bîzava 'irfanî û geşebûna tesewîfê, bi taybet bî belavbûna Sebka Iraqî bêjeya saqî bî wateyên xwe yên meczâlî hatin bikaranîn di şî'ran da ku yek jî wateyên saqî Xweda û tecellîyatên Xweda ne.³⁹ 'Ettarê Nişabûrî û Fexredîne Iraqî nimuneyên herî balkêş dane ji bo vê mijarê. Van şa'iran bi taybet saqî di wataya tecellîya Xweda da bikaranîne⁴⁰. Wacim jî ku yek peyrewê Sebka Iraqîye têgeha saqî bi wateya 'irfanî bikaranîye di xezelên xwe da.

Wacim di xezela xwe ya jêr da saqî, mey, meyxwor, şerab bikaranîye ku ji xezelê bi asanî tê famkirin ku mebesta wî bi wan têgehên wateya wan ya 'irfanî ye.

بریز ای ساقیا بر جان حارث	میی باقی ره م از هر حوادث
بیا در مجلس مردان و میخور	که این می نیست چون ام الخبائث
شرابی این تحلی گر تو بادت	حیاتی جاودانی بو با عرش

37 ماه نظری، ص ۱۳۵.

38 مریم مشرف الملک، زمینه شناسی ادبیات خمیری و جلوه های آن در شعر عربی و فارسی، که نامۀ ادب پارسی، پژوهشگاه علوم انسانی و مطالعات فرهنگی، ۱ سال سوم، شماره دوم، پاییز و زمستان ۱۳۹۱، ص ۱۰۱-۱۲۰، ص ۱۰۶.

39 سیداحمد حسینی کازرونی، تبیین حقایق عرفانی و معرفت شناسی در ساقی نامه های ادبی، مطالعات ادبیات تطبیقی (ادبیات تطبیقی): ۱۳۸۶، دوره ۱، شماره ۲؛ از صفحه ۳۱ تا صفحه ۵۲، ص ۴۲.

40 شیدا روحانی، تجلی ساقی عرفانی در شعر فارسی و شاعران سبک عراقی، کنفرانس بین المللی ادبیات و زبان شناسی، شرکت زانیس آریا ایران، تهران، ص ۲۹-۳۰.

Berîz ey saqîya ber canî haris
 Meyê baqî rehem ez her hewadis
 Biya der meclisê merdan û meyxwor
 Ki î n mey nîst çun ummul xebais
 Şerabê î n tehellî ger tu badet
 Heyatê cawîdanî bû ba 'ers⁴¹

Di zezeleke din da Wacim têgehên bi saqî ve girêdayîne wek; meyxane, meyxor weha bikaranîye.

دلته میخانه خالی ز میخواران خوش حالی
 ز بیگانه نگارم خوسوی سیران و تفیکیک است
 ز خلوتخانه دل این چراغ جان روشن کن
 که تانیکان می آیند جای خوب و هم نیک است

Dilet meyxaneê xalî zi meyxworan xwoş halî
 Zi bîgane nîgarem xwo sûy seyran û tefkîk est
 Zi xelwetxaneê dil î n çiraxê canî rewşen kon
 Ki ta nîkan mî ayend çayê xwûb û hem nîk est⁴²

Wacim di helbesteke xwe de wusa ketîye bin bandora tecellayê, paşserwaya helbestekê bi temamî kirîye tecellî û berê xwe daye tecellayê.

خوشا دلبر کند بر ما تجلی
 بسانی زره باشم در تجلی
 رسیدم از شبی دیجور و ظلمت
 ز عکس و پرتوی نور و تجلی

Xwoşa dîlber koned ber ma tecellî
 Besanî zerre başem der tecellî
 Resîdem ez şebê deycûr û zulmet
 Zi 'eks û pertewî nûr û tecellî⁴³

3.3. Xem û matem

Xem, matem û girî taybetîyeke herî dîyar û berbiçav e di Sebka Iraqî da. Hem cudahîyek girîng e di navbera Sebka Xorasanî û Sebka Iraqî da. Di şî'rên şa'irên Sebka Xorasanî da wîsal, şadî, şahî û xweşî tê dîtîn lê, şî'rên şa'irên Sebka Iraqî tijîye ji xem, keder, nexweşî û firaqê.⁴⁴ Wacim, di şî'ra jêr da xem û kederên ji firqeta mehbûba xwe û hesreta xwe ya ji bo wîsalê anîye ziman.

گر کنم گریان و زاری در فراقه هیچ نیست
 گر شوم قربان این گلزار کویت هیچ نیست
 من پشیمانم نکردم جان فدایی جان تو
 گر کنم امروز فدایت جان و هم دل هیچ نیست
 در فراقه کشت ضائع زبده عمری عزیز
 لحظه در شربتی دردی وصال هیچ نیست

41 البالکی، ص ۲۰.

42 البالکی، ص ۱۹.

43 البالکی، ص ۷۳.

44 سیروس شمیس، سبک شناسی شعر، چاپ سوم، نشر میترا، تهران، سال ۱۳۸۶، ص ۲۴۸.

Ger konem giryan û zarî der fîraquet hîç nîst
Ger şewem qurbanê in gulzarê kûyet hîç nîst
Men peşîmanem ne kerdem can fîdayê canê tû
Ger konem emr û fîdayet can û hem dil hîç nîst
Der fîraquet geşt dayî' zubdeê 'umrê 'ezîz
Lehzeê der şerbetê derdê wîsalet hîç nîst⁴⁵

3.4. Mexles

Mexles yan texellus yan nasnav, bi helbestvanên Sebka Iraqî derketîye rewacê û cudahîyek berbiçav e di navbera Sebka Xorasanî û Iraqî da. Helbestvanê me jî mexlesa xwe Wacim danîye û di hemî helbestên xwe yê farsî û 'Erebî da bikaranîye. Tiştê balkêş ev e ku mexlesa şa'irî jî wî di de dest ku şa'irê me peyrewekî Sebka Iraqî ye. Lewra wateya wacim di ferhangên da bi wateya, kesê ku şiddeta xem û huznê di wechê wî da xwuya dike, wechê wî rûtirş û mirûzkirî ye û serê xwe bera jêr daye hatîye.⁴⁶

واجما بگذر ز خود بر فقر خویش تا شوی از مردمان حق شناس

Wacima bogzer zi xwûd ber feqrê xwîş
Ta şewî ez merdumanê heq şunas⁴⁷

3.5. Ziman

Di Sebka Xorasanî da ziman xwerû û asan e, bêjeyên bîyanî pir kêmtên dîtî. Di Sebka Iraqî da, ziman girane, bêjeyên bîyanî, bi taybet bêjeyên zimanê 'Erebî zêde hatîne bikaranîn. Wacim ne tenê bêjeyên 'Erebî bikaranîye, belkî di gelek xezelan da niv malik bi şikla mulemme'an bi 'Erebî nivîsandine. Tevî ku di nav xezalan da bêje û niv malikên 'Erebî tîne dîtî çend heb helbestên wî bi tevahî bi 'Erebî hatîne nivîsandin:

از خون دل نوشتم نزدیک او رساله
هلا يكون منكم نوع من الامال
این سرزنش که کردند یاران ما روا بو
اذا ما را بیت منه الا صدا الخجاله ۸
خورشید روی جانم گر بود رزق واجم
من بعد لا ابالی قتلا ولا ملاله ۹

Ez xwûnê dil newîstem nezîk û rîsale
Hela yekun mîmkum new'î mînel emale
În serzenîş ki kerdend yaranê ma rewa bû
Ez ma reeyte mînhû îlla sudel xecale

45 البالكى، ص ۲۰-۱۹.

46 لوييس معلوف، المنجد في اللغة، المطبعة الكاثوليكية، بيروت ۲۰۱۰، ص ۷۷۹.

47 البالكى، ص ۲۹.

48 Me tişteq nedî jê bilê şermê

49 Piştî wê ne mirin û ne lome ne liser bala mine.

Xurşîdê rûyê canem ger bûwed rızqê Wacim
Min be'dî la ûbalî qetlen we la melale⁵⁰

Di helbestek din da Wacim zimanê 'Erebî weha bikaranîye.

ای آخری هر اول وی اولی هر اخر
یا ظاهرا لباطن یا باطنا لظاهر
نور جمال رویت در دیده است مؤمن
ستر و جلال و ابهت در سینه است کافر

Ey axirê her ewwel wey ewwelê her axir
Ya zahîren li batin ya batînen lî zahir
Nûrê cemalê rûyet der dîdeest mumin
Sirrê celal û ebhet der sînest kafir⁵¹

3.6. Bandora nûnerên sebka Iraqî

Wacim bi aşkera ketîye bin bandorên nûnerên sebka 'Iraqî û bi taybet Hafzê Şîrazî. Di helbesteke xwe da wusa ketîye bin bandora Hafizê Şîrazî bi heman serwa û naverokê nêzî naveroka helbesta Hafiz ya meşhûr "Ela Ya Eyyûhessaqî (الاساقى آليه يا الا)" helbest hona ye. Malika Hafiz weha ye:

الا يا ايها الساقى ادر كاساً و ناولها
که عشق آسان نمود اول ولى اقتاد مشکلها

Ela ya eyyûhessaqî edir kesen we nawîlha

Ki 'işq asan nimûd ewwel welî oftad muşkîlha⁵²

Wacim jî weha nivîsandîye:

الا ای باد شبخیزم حدیث شوق بلبلها
بیر تقریر کن پیش نهالی غنچه و گلها

Ela ya badê şebxîzem hedîsê şewqê bulbulha

Beber teqrîrê kon pîş nîhalê xunçe û gulha⁵³

Di malikek heman xezelê da ji aliyê wateyê jî wacim xwe nêzî wateya malika Hafiz kirîye. Hafiz dibêje:

شب تاریک و بیم موج و گردابی چنین هائل
کجا دانند حال ما سبکباران ساحلها

Şebê tarîk û bîm mewc û girdabê çunîn haîl

Kuca danendî halê ma sebukbaranê sahilha⁵⁴

Wacim jî di heman wateyê da weha dibêje:

شب تاریک و دریایی کناری نیست در جایی
کجا دارد دل زارم رجای وصل ساحلها

Şebê tarîk û deryayî kenarî nîst der cayî

Kuca dared dilê zarem ricayê weslê sahilha⁵⁵

50 البالکی ، ص ۶۷ .

51 البالکی ، ص ۳۳ .

52 شمس الدین محمد شیرازی ، دیوان حافظ ، دفتر نشر معارف ، چاپ سوم ، قم ، ۱۳۹۱ ، ص ۶ .

53 البالکی ، ص ۵ .

54 شیرازی ، ص ۶ .

55 البالکی ، ص ۵-۶ .

3.7. Wehdetu'l Wucûd

Tesewuf û 'îrfan bi Sebka Iraqî ra ketiye şî'rê. Şa'îrên vê sebkê nêrînên xwe yên derbarê tesewuf û 'îrfanê, di şî'rên xwe da bi cih kirine ku nêrîna herî berbelav bûye û weke felsefeyekê nav girtiye, Wehdetu'l Wucûd e.

Felsefeya Wehdetu-l Wucûdê (yekebûn/yekîtiya hebûnê) hebûnek bi tenê, Xweda û kewn û kaînatê yek tiştêkî dibîne; baweriyê bi yekbûnî ya wan tîne, gerdûnê sîya hebûna Xweda dibîne. Wehdetul-wucûd, li ser nav û hesabê wucûda mûtleq ya Îlahî, her tiştî tune dihesibîne; tu tişt tune ye bes hebûna wucûda Mûtleq ya Xweda heye. Ango zanayên ku vê ramanê diparêzin li ser hesabê Xwedê hemû hebûn û gerdûnê înkâr dikin. Wucûd û hebûna her tiştî tecellî û sîya wî hebûna pîroz û ezeli dibînin, înkariya hebûna heqîqî ya her tiştî dike, dibêje ku: "Ji bilî Xweda wucûda heqîqî ji tu tiştî ra tune; her tişt (hemû kaînat) tecellî û sîya wê wucûda mûtleq a îlahî ye, ku ew wucûda pîroz jî, 'eynê zatê wî ye".⁵⁶

Di heman demê da li gorî nêrîna felsefa wehdetu-l wucûdê, zeman û mekan û mesafe jî têda, her tişt cîlveya (tecellîya) wucûda mûtleq a Îlahî ne, sîya wucûda wî ne; ji bilî wucûda Xweda ya ezeli û ebedî, di heqîqet da tu tişt nîne; her tişt te'eyyûnat û tecelliyatên Wî ne; îrade û îxtiyariya cuz î ya însan jî tecellîya îrade û meşîyyeta Wî ya giştîye; zanîna însana cuzî jî, tecellî û tecellîgaha 'ilmê wî ye kullî ye.⁵⁷ Em ê Wehdetu'l Wucûdê di binê çar beşên sereke yên giştî da dabeş-bikin. Ehedîyyet, Tecellî, Kenza Mexfî, Heqîqeta Mûhemmedî (Lewlake)

3.7.2. Ehedîyyet

Wehdetu'l Wucûd, shizra yekîtiya mutleq e. Li gorî vê, yekîtiya yekan di her heyînekî da derbasdar e û gerdûn di vê yekîtiyê da heyînê dibîne. Wacim, ev rewşa heyîna bi "Semediyet" ê dinasîne. Ev yek di malika Wacim da wiha derbas dibe.

در سرای لم یزل باشد ابد عین ازل در هم آید دائره از بیش برخیزد عدد
در جهان پر عدد واحد احد نبود ولی خطه‌ی ملک صمد واحد درو عین احد

Der serayê lem yezel başed ebed 'eynê ezel
Derhem ayed daîre ez bîş ber xîzed 'eded
Der cîhanê pur 'eded wahid ehed nebûd welî
Xutteê mulkê semed wahid der û êynê ehed⁵⁸

56 Abdurreahman Durre, Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jîyana Wî, Keskesor, İstanbul 2002, r 74-75.) ; Mustafa Ünver, Nesîmî ve Vahdet-i Vücut, A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Sayı 39, (Prof. Dr.Hüseyin Ayan Özel sayısı), Erzurum 2009, (537-552), r 538-539.

57 Durre, hb. r 66.

Di seraya Xweda da, ebed û ezel heman tişt in, ferqa wan tune. Hejmar ji zîvirandina daîreyan derketine holê ku ev di cîhana me da derbasdarin lê di vê cîhana ma ya pur hejmarî da wahid ne heman ehed e, di navbera wan da cudahî heye lê di mulkîyeta semedîyetê da wahid heman ehed e.

Di malikek din da derbarê Wehdetê da weha dibêje:

هر يکى از کثرتى عالم يکى است پس توان کردى ازین وحدت قیاس

Her yekî ez kesretê ‘alem yekîst

Pes tewan kerdî ez îh wehdet qîyas⁵⁹

Her yek ji pîrbûna (kesreta) ‘alemê, hemû tiştên di gerdûnê da henin, çî qas pîr û zêde bin hemû yek tişt in, hemû ji tişteki hatine. Menşe û mebea wan yek in. Kewn û kaînat yek tişt in. Madem rewş ev e, tu dikarî li ser vê rewşê wehdetê qîyas bikî.

Wacim, di derbarê yekîtiya hebûna Xweda, ji bilî zatê Wî û tunebûna tu tişteki da wiha dibêje:

در حقیقت واجما کس نیست غیر ذات او هر چه هست نیست جز مرات ذات ای بیخبر

Der heqîqet Wacima kes nîst xeyrê zatê û

Her çî hest nîst cuz mîratê zat ey bî xeber⁶⁰

Ey Wacim, di heqîqetê da tu kes tune ye ji bilî Zatê Xweda pê ve. Her tiştê ku heye di mesaba tune da ye. Ey Wacimê bê xeber, ev tiştên tu dibînî ayîneya zatê Wî ye. Dîsa di heman mijarê da di malikek din da wiha dibêje:

در هر جهان و عالم غیر تو کس نبود گر بود غیر رویت آیینه است مر تو

Der her cîhan û ‘alem xeyrê tû kes nebûd

Ger buwed xeyrê rûyet ayîne est mer tû⁶¹

Di hemû cîhan û ‘alemê da ji bilî te kes tune ye. Ger hebe ji ji xeyrê te hemû ji ayîneya wechê te ne.

3.7.2. Tecellî

Di Wehdetu’l wucûdê da hemû tiştên di gerdûnê da tèn dîtin tecellîyatên esma û sîfatên Xweda ne. Hemû tişt weke li jorê hate gotin sîya hebûna pîroz e. Wacim di vê biwarê da, di derbarê tecellîyatên cemala Xweda di gerdûnê da malika xwe wiha honandîye.

شد چهره‌ی رخسار تو در صوره‌ی اشیا

آن حسن تو در صوره‌ی ما کرد تجلی

59 البالکی، ص ۳۹.

60 البالکی، ص ۳۴.

61 البالکی، ص ۷۱.

An husnê tû der sûre ê ma kerd tecellî

Şod çehreê ruksarê tû der sûreê eşya⁶²

Ew xweşikahîya te bû ku di wechê me da tecellî kir. Xweşikahîya cemala te di şiklên eşya da, tiştan da derkete holê, zahir bû. Hemû tişt û eşyayên di gerdûnê da wêneyên cemala Te ne.

جز خط او نه بودر خط گلعداری

جز روی او ندیده در دلبران و یاران

نقش و نگار او بو هر نقش و هر نگاری

عکس جمال او بو هر حسن و هر جمالی

Cuz rûyê û nedîde der dîlberan û yaran

Cuz xettê û nebûd der xettê gul'îzarî

'Eksê cemalê û bû her husn û her cemalî

Neqş û nîgarê û bû her neqş û her nîgarî⁶³

Di dîlber û hezkirîyan da ji bilî wechê zatê Wî tişteke nehatîye dîtin. Di hemû xal û xettê gul'îzaran da ji bilî xal û xettê Wî tişteke tune. 'Eksa cemala Zatê Wî ye ku xuya dike di hemû xweşikahî û bedewan da. Hemû neqş û wêneyên Wî ne ku di hemû tiştan da xwuya dikin.

Her wiha di malîkek din da behsa tecelliyata Xweda dike û dibêje ku hemû kewn û gerdûn di nava tecelliyatên Wî da xerq bûye:

چو نور تو گرفته جمله آفاق

وجود آفتابت کرد اشراق

تنزل یافت در هر درب و هر طاق

چو خورشیدت تجلی کرد ای جان

Wucûdê aftabet kerd işraq

Çu nûrê tû girifte cumle afaq

Çu xurşîdet tecellî kerd ey can

Tenezzul yaft der her derb û her taq⁶⁴

3.7.3. Kenza Mexfi

Di mîjara Wehdetu'l Wucûdê da du hedîsên qudsî yên cenabê Pêxember henin ku hemû şa'îrên peyrewên vê felsefeyê di şî'rên xwe da anîne ziman. e⁶⁵. (kuntû (kuntû) "kuntu kenzen" (kenzen mexfiyyen, fe eredtû en 'urîfe fexeletu'l xelqe) Wate; "ez gencîneyek veşartîbûm, min xwest ez bêm naskirin, ji ber hindî min hemû heyîn afirand".

Wacim hem di şî'rek xwe da ev nêrîna xwe wiha anîye ziman.

کنز مخفی بو عرفانش نهان آمد پدید

بحر این غیبی هیئت موج در صحرا نهاد

62 البالکی، ص ۶.

63 البالکی، ص ۸۲.

64 البالکی، ص ۴۶.

65 دراسة في التجربة الصوفية، نهاد خياطة، دارالمعرفت، دمشق ۱۹۹۴، ص ۲۳.

Behre î n xeybê heyet mewcê der sehra nîhad
Kenze mexfî bû 'îrfaneş nîhan amed pedîd⁶⁶

3.7.4. Heqîqeta Mûhemmedî (Lewlake)

Hedîsa qudsî ya duyem jî hedîsa "Lew la ke" (لولاك و خلقك الأفلاك) ye.⁶⁷ Wate: Eger tu nebûya (ya Mûhemmed) mîn gerdun ne dîafirand. Lî gorî nêrîna Wehdetu'l Wucûdê hemu heyînên afirandî ji bo xatirê cenabê Pêxember û ji nûra cenabê Pêxember hatîye afirandin. Wacim di dîwana xwe da wiha dibêje:

وجود هر جهانی را غرض تو که مالا فلک و الاکوان لولاک

Wucûdê her cîhanî ra xered tû

Ki mala felak û wel ekwanû lewlak⁶⁸

Xered û mebest ji hebûna hemu cîhan û gerdûnê tu yî (ya Resûlullah). Eger tu nebûna ne felek ne kewn û mekan (gerdûn) ewê nehatîna afirandin.

Encam

Hunersazîya paşserwayê, zêdebikaranîna paşserwayê di helbestan da renkvedana Sebka Iraqî yê dîyar dike ku Wacim di gelek helbestan da paşserwayên cûr be cûr bikaranîye û ev yek bandora Sebka Iraqî nîşan dike.

Qonaxa Sebka Iraqî, qonaxa kamilbûna sîmayên 'îrfanî ye. tesewwuf û 'îrfan bi hemû rengên xwe di vê qonaxê da cih girtine. Bêjeya saqî têgeheke sereke ye ji bo şa'îrên mutesewuf û şa'îrên Sebka Iraqî ku em vê bêjeyê di gelek malîkên Wacim da bi wateya mecazî hatîye bikaranîn dibînin.

Durketina ji hezkirîyê (fîraq), xem, matem taybetîyek girîng yê qonaxa Sebka Iraqî ye. di helbestên Wacim da em bi şîklên cuda cuda hestên xemgînî, fîraq, nexweşî, bedbînî yê dibînin ku ev yek bandora vê qonaxê li ser helbestên wî eşkera dike.

Wacim, di bikaranîna mexlesan da peyrewîya Sebka Iraqî kirîye ku teqez di hemu helbestên xwe da; çî helbestên farsî û çî helbestên erebî, mexles bikaranîye.

Zîmanê helbestên Wacim bi têgehên tesewufî û 'îrfanî lebaleb dagirtîye. Bi vê sedemê helbest giranin û derenk tînan famkirin. Ev taybetî ji bandora Sebka Iraqî gîhaştîye Wacim.

Di tesewufê da Wehdetu'l Wucûd û têgeh û mijarên bi Wehdetu'l Wucûdê va girêdayî xîsletên helbestên şa'îrin Sebka Iraqî ne. Em di helbestên Wacim da hem Wehdetu'l Wucûdê û hem mijar û têgehên Wehdetu'l Wucûdê bi zelalî dibînin.

Bi van xalên ku jor hatin destnîşankirin em têdîgihîjîn ku Wacim di honandina helbestên xwe da û di fikr û ramanên xwe da peyrewê Sebka Iraqî ye.

66 البالکی، ص 23-24 .

67 ابي بكر دمیاطی، اعانة الطالبین علی حل ألفاظ فتح المعین، دار النوادر، دمشق 2013، ج 1، ص 13 .


68 البالکی، ص 49 .

ÇAVKANÎ

1. Abdurreahman Durre, Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jîyana Wî, Keskesor, İstanbul 2002.
2. Mustafa Ünver, Nesîmî ve Vahdet-i Vücut, A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Sayı 39, (Prof. Dr.Hüseyin Ayan Özel sayısı), Erzurum 2009.
1. ابن آدم (واجم) دیوان، مخطوطة لدى الشيخ محمد على القرداغی.
2. ابي بكر دمیاطی، اعانة الطالبین علی حل ألفاظ فتح المعین، دار النوادر، دمشق ۲۰۱۳، ج ۱.
3. دراسة في التجربة الصوفية، نهاد خياطة، دارالمعرفت، دمشق ۱۹۹۴.
4. رشید احمد رشید و اخرون، ابن ادم البالکی حیاته و آثاره، مجلة العلوم الانسانية لجامعة زاخو، العدد ۴، ۲۰۱۸.
5. زبیر بلال اسماعیل محمد، بن ادم البالکی، مجلة مجمع العلمی الكردي، مجلد ۵، ۱۹۷۷.
6. سیداحمد حسینی کازرونی، تبیین حقایق عرفانی و معرفت شناسی در ساقی نامه های ادبی، مطالعات ادبیات تطبیقی (ادبیات تطبیقی): ۱۳۸۶، دوره ۱، شماره ۲؛ از صفحه ۳۱ تا صفحه ۵۲.
7. سیروس شمیسا، سبک شناسی شعر، چاپ سوم، نشر میترا، تهران، سال ۱۳۸۶.
8. سیروس شمیسا، کلیات سبک شناسی، چاپ دوم، انتشارات فردوس، تهران، سال ۱۳۷۳.
9. سیما داد، فرهنگ اصطلاحات ادبی، انتشارات مروارید، چاپ سوم، تهران ۱۳۸۱.
10. شمس الدین محمد شیرازی، دیوان حافظ، دفتر نشر معارف، چاپ سوم، قم، ۱۳۹۱.
11. شیدا روحانی، تجلی ساقی عرفانی در شعر فارسی و شاعران سبک عراقی، کنفرانس بین المللی ادبیات و زبان شناسی، شرکت زانیس آریا ایران، تهران ۲۹، ۳۰ تیر ۱۳۹۷.
12. فایزی ملا بکر، تصحیح تاریخ وفاة العلامة ابن یدم، مجلة کاروان، العدد ۸۲.
13. لويس معلوف، المنجد في اللغة، المطبعة الكاثوليكية، بيروت ۲۰۱۰.
14. ماه نظری، ردیف در سبک عراقی، مجله فنون ادبی دانشگاه اصفهان، سال دوم، شماره ۱، تابستان ۱۳۸۹.
15. محمد پارسا نسب، حسن ذالفقاری، مهرداد رضا سنگری، ادبیات فارسی (قافیه، عرود، سبک شناسی و نقد ادبی)، وزارت آموزش و پرورش، سازمان پژوهش و برنامه ریزی آموزشی، تهران ۱۳۹۴.
16. محمد جعفر محبوب، تاریخ مقدمه: سبک خراسانی در شعر فارسی، چاپ اول، تهران.
17. محمد رضا عبدالملکیان، حمید کیانی، سبکهای شعر فارسی، جشنواره های فرهنگی و هنری شمس، جشنواره شعر و ادب، اداره کل فرهنگی شهرداری تهران، زمستان ۱۳۹۳.
18. محمد علی التهانوی، کشف اصطلاحات الفنون، تقدیم: رفیق العجم، مکتب لبنان، بیروت لبنان.
19. محمد معین، فرهنگ معین، انتشارات ادنا، چاپ چهارم، تهران ۱۳۸۱.
20. محمود عبادیان، در آمدی بر سبک شناسی در ادبیات، انتشارات آوای نور، چاپ دوم، تهران ۱۳۷۲.

۲۱. مریم مشرف الملك، زمینه شناسی ادبیات خمیری و جلوه های آن در شعر عربی و فارسی، که
 ننامه ادب پارسی، پژوهشگاه علوم انسانی و مطالعات فرهنگی، سال سوم، شماره دوم،
 پاییز و زمستان ۱۳۹۱، ص ۱۰۱-۱۲۰.
۲۲. مسعود محمد، حاجی قادری کوی، بهرگی دووم، چاپخانه‌ی ناراس، هملنیر ۲۰۱۰،
 ۸۱ ل.

NIMÛNE JI DESTXETA DÎWANÊ



بید که رحم فرمود بادم ز لطف خویش بنمود مهر رخ رو روشن کند ماله
 لیکن رقیب مردم ظلمت هر کند سادی دگر ز خشم او را خویش کند زاله
 و جسم ز درد جانش هر گز زبانه
 شاید که بار فرمود دیگر جیز نسوا
 هر کله به خود نوعی دگری خواهی در صورت دیگر شد معنی دگری خواهی
 در روی بر این آن رخ چون خورشید است در حالت باین هر حالات که می خواهی
 کفج تو شدم جانام فداست بهت بود شاید که گرم بادستان نیز خواهی
 کسرت ز لطفی تو بختی نه به هرگز چند آنکه بگو بر ترساک تو می خواهی
 بازلف دلا آرامت یکبار کجی کن تا فاند جان را مهری تو روا خواهی
 چرخ دهر سیه بختم باران عطوفت که کلشن نشکفتم کبر بر هم بچی خواهی
 عقل از تو چه در یاد تا وصف تو بجم کرد
 در عقد ز کجی در وصف ز خواهی
 چه شوخ بودی کجور سیه بای بیای زاده رویش بگو کردم ز مهر خویش شدم سیه
 هنوز با چه بود کاز اجا کوریش چه شوکلات مرشد متوقا و مت اجا نای وصله و ای سیه

۱۰۰۱

۶۷

بهری
 اگر هر روز در آتش یک گنجی را
 دله هر دو که صفت نیت خسار هم گنجند
 کند که از میسبان جهانی کارم
 نبرج کمان دلبردت بد کارم فرخنده
 بیاد غیب جان بشارت با درخت
 که این برزخ جانان خوبی دشوار هم گنجند
 چه خوشبختی که از جسم باطلی بیرون آید
 که جو ازین بیاید کلفت روم نیکبند
 زرقیبی و سیرت که دروغ او را بجه
 چه کنم پریشانی که زور او دو اوج
 بخندای خود پندارم ز شکیلی که کرده
 مددی نبود ما را مگر از خدا بر او
 اگر از شکلی او بر زبان بردن
 بیسان برزم جانان آرزو زو را بجه
 و اگر نشد بت غم زین غم نیمی گشتیم
 که ز شرم اینک گفت بپریشانی او بجه
 بشکلی زلف لاله ارقمی خوردی
 که ز نمان فرقی او بدرون جان بجه
 اگر ای شدت باور که از زو زیاد نمود
 بجه او بجه جانم طلبش کی سوا بجه
 بیسان شهر و جسم همه هستی یازند
 که جهان بزم آنها بعقول و هم تو را بجه
 رخت هر دم جامی بنماید
 چو قامت تو نه میسباید

۱۰۰۲

۶۸

دو دیده در میانی تو سحر او
 چرا خرد و رهلا میسباید
 لبی اعدت چرا بی زنده کانی
 در هر دم ز لاله میسباید
 شکسته طره زلفی درازت
 بشی پله ای عالم میسباید
 بچشمش مرزه فرمود ما را
 ازان راهی و صانع میسباید
 همیشه تبوه دارد بردی ما
 ازان بجه و دلاله میسباید
 چه شکر پرشید و جسم صحیح باطن
 مشایخ خط و خاله میسباید
 چه خوشبختی بودی و غم گنجند
 چه غم آنست شادی هم گنجند
 میانی او یاری همسری بجه
 اگر بشد جدایی دم گنجند
 حدیثی آرزو اینی را می است
 که اینی آرزو خدایم گنجند
 دو کوشش است پر از نغمه زارت
 که هرگز نغمه چنگ گنجند
 چه عالم خاطر گشتی هست
 سوا بی او در این خاطر گنجند
 دلا و فغان است از سوز و ماتم
 ازی در سوز همه تر گنجند
 ناله در هر یک است ای جان
 بی ناله عالم و آدم گنجند

ZAZAKÎ DE SEBEBÊ VURÎYAYÎŞÊ VENGAN Û CAVURÎNAYÎŞÊ VENGAN

Zazacada Ses Olaylarının Sebepleri ve Seslerin Yer Değişimi

Reasons of Voice Events In Zazaca and Replacement of Voices

Ahmet KIRKAN¹

Kilmnus

Hedîseyê vengan (rûdanên dengê) heme ziwananê dinyayî de bi şeklêko vila yenê meydan. Hedîseyê vengan prosesê ziwani de rewşa ke normale de yenê meydan. Her ziwani vurîyêno. Ziwani sey organîzmayêka ganî averşonê, kamil benê û mirenê. Vurîyayîş seba ziwanan çîyêko normal heta mecburî yo. Çunke ziwano ke nêvurîyêno, averşîyayê ci zî vindeno. Hedîseyê vengan vurîyayîşê ziwanan ra beşêk teşkil kenê. Zaf hete ziwanan estê. Ziwani tena hetê fonoloji, morfoloji ra nêyenê vurîyayene. Zafane gama ke behsê hedîseyê vengan yanî vurîyayîşê vengan beno, qesd hete fonoloji û morfoloji ra vurîyayîşo mekanik o. Labelê ziwani hete sentaks û semantikî ra zî yenê vurîyayene. Bitaybetî vurîyayîşo ke sentaksê ziwani de qewimiyêno, kokê ziwani xeribneno. Na xebate de hedîseyê vengan ra tena cavurînayîşê venganê zazakî ser o do bêro îzah kerdene. Seke yeno zanayene hedîseyê vengan hîrê beşan ra pê yenê. Nê beşan ra cavurînayîşê vengan û kê-m-zêdebîyayîşê vengan bedilîyayîşê mekanik ê; sey beşê hîrêyin vurîyayîşê vengan raste rast bedilîyayîşê artikulyasyonê vengan ifade keno. Na xebate de amanc cavurînayîşê vengan ra metatez û nobedarîye ser o vindertiş o. Xebate de sebebê vurîyayîşê vengan û têkiliya zazakî do bêro îzah kerdene. Seba na xebate metnê nuşteki û materyalê folkloriki ameyê kar ardene. Metnê ke standardîzebîyê seba xebatanê ziwannasiye doneyanê başan tedarik nêkenê. Mîyanê xebate de sebebê vurîyayîşê vengan ameyo îzah kerdene, babetê vurîyayîşê vengan rêze bîyê, metatez bi tabloyan û metnan reyde ameyo analiz kerdene. Metatez zaf ziwanan de esto. Heta zaf rey çekuya ke bi metatezi ya vurîyaya, çayê çekuya esile girewta.

Kilitçekuyî: Vurîyayîşê Vengan, Metatez, Nobedarîye, Zazakî, Ziwannasiye

1 Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, ahmetkirkkan@gmail.com

Özet

Ses olayları neredeyse dünyanın bütün dillerinde, yaygın bir şekilde meydana gelir. Ses olayları doğal bir süreçte meydana gelir. Her dil değişir. Diller canlı bir organizma gibi gelişir, tamamlanır ve ölürlür. Değişim bir dil için normaldir hatta mecburidir. Değişimi duran dilin gelişimi de durur. Ses değişimleri dillerin değişiminde bir bölümü meydana getirir. Dillerin birçok yönü vardır. Diller sadece fonolojik ve morfolojik olarak değişmezler. Çoğunlukla ses değişimi olarak bahsedilen fonolojik ve morfolojik değişimler mekaniktir. Ama diller sentaks ve semantik olarak da değişirler. Özellikle sentaksta meydana gelen değişimler, dilin kökten değiştirir. Bu çalışmada Zazacadaki ses olaylarından sadece seslerin yer değiştirmesi üzerinde durulacaktır. Bilindiği gibi ses değişimleri üç kısımdan oluşur. Bu bölümlerden, seslerin yer değiştirmesi ve seslerde artma-eksilme mekanik bir olaylardır; üçüncü bölüm olan ses değişimi ise doğrudan seslerde meydana gelen artikülasyon değişimidir. Bu çalışmadaki amaç seslerin yer değiştirmesi olan metatez ve nöbetleşmeyi izah etmektir. Çalışmada ses değişimlerinin sebepleri ve Zazacayla olan ilgisi açıklanacaktır. Bu çalışma için yazılı metinler ve folklorik materyaller kullanılmıştır. Çünkü standart hale getirilmiş olan metinler dilbilim için doğru veriler vermez. Çalışmada ses değişimlerinin sebepleri izah edilmiş, ses değişimlerinin çeşitleri sıralanmış, metatez durumu tablo ve metinlerle açıklanmıştır. Metatez birçok dilde bulunur. Hatta metateze uğramış birçok sözcük aslının yerini almıştır.

Anahtar Sözcükler: Ses Değişimi, Metatez, Nöbetleşme, Zazaca, Dilbilim

Abstract

Sound events occur widely in almost all languages of the world. Sound events occur in a natural process. Every language changes. Languages develop, complete and die like a living organism. Change is normal or even compulsory for a language. The development of the language that stops changing stops. Voice changes constitute a part in the change of languages. Languages have many aspects. Languages do not only change phonologically and morphologically. Phonological and morphological changes, mostly referred to as voice changes, are mechanical. But languages also change in syntax and semantics. Changes especially in syntax change the language radically. In this study, only the displacement of sounds from sound changes in Zaza language will be emphasized. As it is known, sound changes consist of three parts. Of these sections, the displacement of sounds and the increase-decrease in sounds are mechanical events; The third part, the voice change, is the articulation change that occurs directly in the sounds. The aim of this study is to explain

metathesis and seizure, which is the displacement of sounds. In the study, the reasons of voice changes and their relevance to Zaza will be explained. Written texts and folkloric materials were used for this study. Because standardized texts do not give correct data for linguistics. The causes of voice changes are explained in the study, the types of voice changes are listed, the metathesis status is explained with tables and texts. Metathesis is available in many languages. Many metathesis have even replaced the original word.

Keywords: Voice Change, Metathesis, Graduation, Zazaki, Linguistics

Destpêk

Têkilîya ke mabênê însanan û mewcûdatî de ya bedilbar a. Na bedilbarîye ziwani de zî xo mojnena. Ziwani hete mana û vengî ra na bedilbarîye xo de hewêneno. Bedilbarîya ke têkilîya mabênê insanî û mewcûdatî de ya, tena cayêk yan zemanêka sînardar nîya; ziwani heme grûban û kesan de xo nîşan dana. Ziwani her tim mîyanê vurîyayîşêk de yê. Qet yew ziwani, tu demêk de sabît û vurîyayîşî rê girewte nêmeno. Ziwani; veng, mana, binyad, mana-yewîne, şekil-yewîne, veng-yewîne ûsn beşan ra pê yenê. Labelê ziwani nê beşan ra hîna zêde manayan îfade kenê (Eker, 2015: 9).

Vurîyayîş seba ziwanan rewşêka normal a. Eke ziwani nêbedilîyo kes eşkeno vajo ke yan qalîkerdoxê nê ziwani çin ê yan zî ziwani merde yo. O semed ra ziwani mîyanê têkilîyanê ciwakî de û ferdî de vurîyêno. Taye parametreyê nê vurîyayîşî estê. Nuşte de nê parametreyî do bêrê îzah kerdene. Ziwani, heme dînamîk û hereketanê ciwakî ra û ferdî ra tesîrdar beno. No tesîrdar bîyayîş ge şeklê pozîtîfî ge zî şeklê negatîfî ya beno. Gama ke ziwani sewbîna ziwanan a keweno têkilî xezîneya çekuyanê xo dewlemend keno, goreyê îmkananê xo çekuyanê neweyan saz keno, semedê rewşanê neweyan manaya çekuyan hîra keno, vatişanê neweyan saz keno ûsn çîyan xo de zêdeneno. Labelê hîn xeterê na têkilîye zî esta. Ziwani na têkilîya ra sey hete fonolojî ra xirabbîyayîş, taye taybetîyanê xo vîndîkerdiş, hete semantikî ra tengbîyayîşî manaya çekuyan, hete sentaksî ra vurîyayîş ûsn çîyan ra negatif tesîrdar beno (Crystal, 2008: 266). Mîyanê nînan de vurîyayîşê sentaksî tewr zêde zirar dano ziwani.

Vurîyayîşê vengani, sey heme ziwanan, zazakî de zî yenê meydan. Nê vurîyayîşî bi şeklê tesadufî nêyenê meydan. Taye qaydeyê nê vurîyayîşan estê ke, mîyanê na xebate de nê qaydeyî û sebebê vurîyayîşan do tesbît bibê. Kes nêşkeno nê vurîyayîşan tena herfanê alfabeyî ser ra îfade bikero. Vokal û konsonantê zazakî wayîrê taybetmendîyan ê. Vurîyayîş, mîyanê heman grûba vengani de yeno meydan. Yanî her veng nêşkeno bi her vengî ya cayê xo bibedilno. Cêr ra na mijar ameya analîz kerdene. Ganî sifte ra bêro vatene ke, heme vurîyayîşê vengani sînoranê na meqale de nîyê. Vurîyayîşê vengani hîrê beşan rê teqşîm benê. Nînan

ra di beşi bi şeklêko mekanîk yenê meydan, vurîyayîşê vengana zî artîkulasyonê vengana bedilneno (Kirkan, 2018a). Na xebate de tena cavurînayîşê vengana, materyalanê folklorîkan û metnanê nuştekiyan reyde ameyo îzah kerdene.

1. Vurîyayîşê Vengana (Hedîseyê Vengana)

Binyadê ziwani yeknesak nîyo, ziwane ferdane ke heman dem de û heman cografya de cuyenê zî pê ra cîyayo. Çunke ferdê ke heman demde û heman cografya de cuyenê, ziwani bi şeklanê cîyayan a şuxulnenê. Çekuyan de manaya şexsî ra wetêr binyadê çekuyan hempar o. Labelê na hemparîye zêde biqewet nîya. Cîyayîya ke mabênê qalîkerdoxanê ziwani bingeyê vurîyayîşê vengana tesîs kena. Vurîyayîşê ziwani (vengana) verî mîyanê grûbêka hurdi de dest pêkeno, dima beno vila û sey qayde yeno qebul kerdene. Refleksê vurîyayîşê vengana yê nê grûbanê hurdiyan pergale vengane ziwani awan keno. No proses de fonemî benê allofon û allofoni benê fonem (Karaağaç, 2018; 48-49). Reyna no proses de vengane ziwani de karakterê ewilini vurîyênê benê karakterê diyinî û karakterê diyinî vurîyênê û benê karakterê ewilini. No vurîyayîşê refleksê xoseveknayîşê û xovurînayîşê ziwani ra neşet keno. Leziye û hete vurîyayîşê ziwani bi şeklêko kamil tesbîtkerdişê mumkun nîyo. Ziwani mîyan de no vurîyayîşê eşkeno zaf bilez zî bibo eşkeno zaf hêdi zî bêro meydan. Goreyê wextanê verênan ewro no vurîyayîşê, zaf dînamîkê ney estê, hîna bi şeklêko leze yeno meydan.

Ziwan sey bingeyê banderbîyayîşî û komunîkasyonî wezîfe vînenê labelê ziwani bi binyadê xo yê vengî ya vinderte-sabîti nîyo, her daîm mîyanê yew vurîyayîşê de yo. Vurîyayîşê vengana, goreyê vurîyayîşê manayî hîna çeşiddar û aloz o; nê tewir vurîyayîşî sînorkerde nîyê. O semed ra yo ke seba vurîyayîşê vengana sînoreko siruştî nêyeno tayîn kerdene. Tesbîtkerdişê vurîyayîşê vengana zî qandê cû zor o. Derheqê zazakî de dest de metnê tarîxî zaf çin ê. Metno tewr kan nêmeyê seserra 19.î de ameyo kom kerdene. Metnanê zazakî yê kanan de zî tesbîtkerdişê vurîyayîşê vengana zêde mumkun nêasenê. Nika dest de di hebî metnê klasîkî estê ke nînan ra yewê ci terefê Mela Ehmedê Xasî ra, o bîn zî terefê Muftî Osman Esad Efendi ra ameyo nuştene. Nê her di metnî zî bi terzêko klasîk ameyê nuştene û her di zî mewlîd ê. Nê her di berheman de zî çekuyê erebkî û fariskî zêde yê, o semed ra nê metnan de vurîyayîşê vengana tesbîtkerdişê zehmet o. Xêncê nê di hebî mewlîdan seserra 20.î de taye metnê klasîkî ameyê nuştene labelê nê metnî zî seba vurîyayîşê vengana korpusêk nêanê meydan (Kirkan, 2018b: 71-73). Malzemeyê vurîyayîşê vengana metnanê neweyan ra, metnanê folklorîkan ra, xebatanê akademîkan ra ûsn yeno peyda kerdene.

Vurîyayîşê ke ziwani de yenê meydan rehendanê mana û vengî de yenê meydan. Hetê nisbetî ra kêmbîyayîşê yan zêdebîyayîşê nê vurîyayîşan, fekkî yan nuşteki

şuxulnayîşê zıwanî ya eleqedar o. Ziwanêk çiqas zêde bêro şuxulnayîş veng, mana û deyngirewtîşê çekuye-manayî hende zêde yenê meydan. Çünke zıwanî bişuxulnayîşî reyde wazenê ke bivurîyê û barê xo şenik bikerê. Taye lehçeyanê kurdî de vîndî bîyayîşê ergatîvîteyî û zayenda gramatîkale, nêşuxulnayîşê hîn zemîran ûsn vurîyayîş û barê xo şenikkerdişî rê delalet keno. Herçiqas dest de metnê zazakî yê kanî çinbê zî, gama ke ma zazakîya newê û metnanê kanan muqayese bikerê vejîyêno meydan ke, zazakî de hete veng û manayî ra zêde vurîyayîş nêameyo meydan. Kes eşkeno ney, warê nuşteki de û komunîkasyonî de zêde kar nêameyîşê zazakî ya gire bido. Eke zıwan bibo zıwanê edebîyatî û komunîkasyonî, vurîyayîş bi şeklêko siruştî yeno meydan. Seke cor ra zî ameyo îfadekerdiş, nîsbetê nê vurîyayîşî frekansê şuxulîyayîşê zıwanî ya têkildar o. Tena zıwan nê, mîyanê zıwanan de zî binyadê ke nîsbetê frekansê şuxulîyayîşê zêde yo, hîna vêşî yenê vurîyayene; binyadê ke nîsbetê frekansê şuxulîyayîşê ci kêmo, zêde nêyenê vurîyayene.

Vengê talîyê ke aîdê ferdan yan grûbanê hurdîyan ê (sey allofonî) vurîyênê û sey foneman yenê qebul kerdene. Sey foneman a qebulkerdişê allofonan, bingeyê vurîyayîşê vengaz saz keno. Her qalîkerdox şuxulnayîşê zıwanî de vengaz goreyê xo vejeno, artîkulasyonê vengaz de şiroveyê xo zêde keno. Ferdî û grûbî, vengazê zıwanî goreyê xo vurînenê. Vurîyayîşê ke zamanêk û mekanêk de yenê meydan, pergale zıwanî saz kenê. Sayeyê nê vurîyayîşan a, pergale vengî yo senkronîk û şeklê tewr kanî yê zıwanî yenê tesbîtkerdene. Seba zazakî; peydakerdişê metnanê kanan, muqayesekerdişê metnanê kanan û neweyan, tesbîtkerdişê formê kanan yê çekuyan, formanê kanan û neweyanê çekuyan pîya nîrxnayene, formanê neweyanê çekuyan de vurîyayîşê mana, şekil û vengî tesbîtkerdiş ûsn xususiyetî, analizkerdişê vurîyayîşanê mîyanê zıwanî de doneyanê muhîman peyda kenê. Labelê seke ameyo îfadekerdiş zazakî de metnê kanî zêde nêyenê peyda kerdene, o semed ra tesbîtkerdişê vurîyayîşê vengaz de metnanê folklorîkan ra yeno îstîfade kerdene.

Vurîyayîşê vengaz zafane demêko derg de yeno meydan. Labelê ge gane mîyanê demêko kilm de zî vurîyayîşî vejîyênê meydan. Vurîyayîşê vengaz sey întizamî û bêîntizam di beş ê. Vurîyayîşê întizamî kesbkerdişê zıwanî ya eleqedar o, vurîyayîşê bêîntizamî zî şuxulnayîşê zıwanî ta têkildar o. Fonolojî de vurîyayîşê vengaz sey, vurîyayîşê talî û vurîyayîşê eslî zî yenê name kerdene. Vurîyayîşê esilî zafane sey metatezî xo nîşan danê.

Vurîyayîşê bêîntizamî, vurîyayîşê foneman îfade nêkenê, o semed ra nê tewir vurîyayîşî zıwanan de manaya çekuye nêvurînenê. Nê tewir vurîyayîşî çekuye virastîşî ra zêde, sey xeribnayîşê zıwanî qebul benê û vîyarteyê çekuye reyde têkildar ê. Vurîyayîşê bêîntizamî hete manayî ra cîyaker nîyê, labelê veng û şeklê çekuye vurînenê, xebatanê etimolojîkan de tesbîtkerdişê kokê çekuye de zehmetîye vejenê meydan (Karaağaç, 2018; 50-52). Zazakî de zî vurîyayîşê ven-

gan nê di beşan ser ra şêno bêro tedqîq kerdene. Na xebate de tena metatez û nobedarîye ameyê analîzkerdiş ke nînan ra metatez vurîyayîşêko bêîntizam o.

1.1. Vurîyayîşê Vengan (Hedîseyê Vengan)

Vurîyayîşê her fonemêk rewşêka fizyolojîke vejeno meydan. Vurîyayîşê vengane vokal û konsonantan manayî nêbedilneno, o semed ra hete manayî ra cîyaker nîyo. Badê vurîyayîşan, çekuya newê sey allofone yena qebul kerdene. Eke vurîyayîşê vengî, manaya çekuye zî bibedilno, çekuya newê sey allofone nêyena hesibnayene, a game sey fonema xosere qebul bena.

Vurîyayîşê vengane kes eşkeno sey vurîyayîşê vengane vokalan û vurîyayîşê vengane konsonantan dabeş bikero. Heman rewşe seba sorankî zî vîyartbar a. Xoşnawî vurîyayîşê vengane sorankî goreyê vokal û konsonant dabeş nêkerdê, sey *گۆرینی دهنگ, پیدابوونی دهنگ, تیچونی دهنگ, گونجانی دهنگ* tesnîf kerdê (Xoşnaw, 2015: 77-105).

Seke cor ra zî ameyo îfadekerdiş, hedîseye vengane 3 beş ê: cavurînayîşê vengane, vurîyayîşê vengane, kê-m-zêdebîyayîşê vengane. Nê beşan ra cavurînayîşê vengane û kê-m-zêdebîyayîşê vengane bêîntizam yeno meydan. Kes nêeşkeno nînan rê sebebêk yan şeklêko diyarkerde tesbît bikero. Labelê beşê vurîyayîşê vengane goreyê sebebane û şeklane diyarkerdeyan yeno meydan. Cêr ra sebebê vurîyayîşê vengane ameyo îzah kerdene.

1.2. Sebebê Vurîyayîşê Vengan

Tena yew sebebê vurîyayîşê vengane çin o. Nê vurîyayîşî zafane yew ra zêde sebebane ra yenê meydan. Ziwanane de vurîyayîş, mîyanê zemanî de bîla sebeb yenê meydan. Şeklê ke prosesê banderbîyayîşê ziwane de yenê musayîş zî heta peynîya emrî dewam kenê. Eslê xo de vurîyayîşê vengane, ziwane banderkerdiş yan banderbîyayîş de û neslane neweyan rê ziwane musanyîş de yenê meydan. Cêr ra taye sebebê ke tesîrê vurîyayîşê vengane ziwane kenê ameyê rêze kerdene. Seke cor ra îfade bî, vurîyayîşê vengane vokalan û konsonantan de yenê meydan. Artîkulasyonê fonemane de û cayê artîkulasyonî, şeklê ci seba her fonemî taybet o. Vengî, hereketane rîtmîkanê organane sazkerdoxane vengî ra dima vejîyênê meydan. Organê sazkerdoxê vengî tevger yan hereketo verên de vengêko cîya-taybet vejenê (artîkulasyonê ewil), tevgero dîyin de (artîkulasyonê dîyin) vengêko cîya vejenê meydan. Her tevgerê organane sazkerdoxane vengî vengêko cîya anê meydan, nê vengê cîyayî pergalê vengî yê cîyayî saz kenê. Vurîyayîşê vengane eslê xo de bîlasebeb zî yeno meydan. Xora ziwannasîye de têkilîya ke mabênê nîşan û nîşankerî de ya bîlasebeb a. O semed ra tîya de zî vurîyayîşê vengane bîlasebeb zî beno. Labelê seba vurîyayîşê kes eşkeno nê sebebane cêrênan bihûmarno. Labelê ziwane de kes nêeşkeno vajo, gama ke nê sebebî ameyî meydan, ganî vurîyayîşê vengane biqewimîyo. Ziwane ser o mecburîyetêka wina çin a. Sebebê vurîyayîşê vengane ziwane nê yê:

1.2.1. Tesîrê Irqî

Organê vengî sey sazkerdoxê corî û sazkerdoxê cêrî di cure yê û goreyê irqan şeklanê cîyayan de yê. No ferqo ke mabênê irqan de esto, artîkulasyonê vengî de sebebê vurîyayîşan beno. Dinyayî ser o komelî her tim kewenê têmîyan, hete genetîkî ra têkilîyêke yena meydan. Na têkilîya genetîke her war de tesîrê xo mojnena. Nê waran ra yew zî organê vengî û eşnawitişî yê (Karaağaç, 2018; 53). Organanê sazkerdoxanê vengî de herçiqas demêko kilm de vurîyayîş nêro meydan zî, demêko derg de vurîyayîş xo ramojneno. Mintiqayê ke zêde miletî kewtê pê mîyan de artîkulasyonê vengan taybetmendîyanê ziwanan (ziwanê ke na mintiqa de têkilî de yê) vîndî benê, taybetmendîyê neweyî yenê meydan. Nê taybetmendîyê neweyî heme ziwanan ra taye xasîyetan xo de hewênênê.

Dinyayî ser o irqê safî (öz, katışiksız, xwerû) çin ê, o semed ra vokal û konsonantî tena seba qewmêk-irqêk nêyenê texpîs kerdene. Vokal û konsonantî seba her ziwani cîya nêbê zî, her ziwani de vengê taybetî estê. Ziwan bi nê vengane taybetan renga xo belî keno. Taye vengê ke İngilizkî de vejîyênê, yew qalîkerdoxî hindkî nêşkeno vejo. O semed ra yo ke ziwanan de sey aksan (şêweyê qalîkerdişî) vejîyêno meydan. Cîya qewmî-irqî heman ziwani, bi şeklanê cîyayan a telafûz kenê. Mîyanê prosesê qalîkerdişî-tarîxî de hîn vokali yan konsonantî eşkenê tedawul ra werzê, hîn vokal û konsonantê verênî eşkenê newe ra tedawul bikewê (Üçok, 2007: 160-161). Na rewşêka normal a. Çünke ziwani tena mudaxeleyê qalîkerdoxanê xo qebul kenê. Xêncê qalîkerdoxan, mudaxeleyê ke teber ra benê ancax bi qebulkerdişê qalîkerdoxanê ziwani, eşkenê ziwani de ca bigîrê. Qalîkerdoxî goreyê ihtîyacanê xo ziwani de tesseruf kenê.

Zazayê ke mintiqayanê cîyayan de cuyenê, ziwani xo yê dayikî goreyê coğrafyaya ke tede heyatê xo dewam kenê vurînaya, fonetîkê ziwani xo goreyê miletanê derûdorê xo adapte kerdo. Yanî zazayî, heman zazakî, sebebê dînamîkanê bînan ra, bi şeklêko pê ra cîya qali kenê. O semed ra qalîkerdişî de û vurîyayîşê ziwani de tesîrê irqî esto labelê qaso ke yeno fehm kerdene, no ziwani ser o hende tesîrdar nîyo.

1.2.2. Tesîrê Cografyayî

Cografya iklim û şeklanê erdî ser o tesîr keno. Çina, kinc û kisvetî, dîn, rewşa fîzîkî ya irqî, werdiş û şimitene ûsn taybetî cografya ra tesîrdar benê. Heman şekil de ziwani, ziwannasiye û hedîseyê ziwani rê zî cografya tesîr kena (Karaağaç, 2018; 54). Cografya seba ziwanan zî qeder a. Çünke kamcîn mintiqa de ziwani bêro qalîkerdiş, derûdorê xo ra tesîrdar beno û çorşmeyê xo rê tesîr keno.

Derheqê cografya û ziwani de teorîyêk esto. Goreyê nê teorîyî, ziwani însananê mintiqayanê serdan zafane konsonantan ra; ziwani însananê mintiqayanê german zafane vokalan ra teşekul keno. Taye ziwannasi nê teorî îdia kenê labelê no teorî nêyeno qebul kerdene. Üçok ifade keno ke ke, cografya ziwani însani ser o

tesîr keno. Frekansê vengî û şîdetê vengî bi cografya ya eleqedar o. Labelê heta nika vurîyayîşê vengî ser o tesîrê cografyayî nêameyo tesbît kerdene (Üçok, 2007: 160-161). Labelê ver eksê ney zî kes eşkeno çîyan vajo. Hete cografyayî ra irqê ke nêzdîyê yewbînan ê, artîkulasyonê vengî de nêzdîyê yewbînan vengî vejenê. Mîsale zazakî de fekê Sêwregî nêzdîyê sînorê ereban o, o semed ra fekê Sêwregî goreyê fekanê bînan taybetmendîyatanê erebkî xo de hewêneno. Yanî fekê Sêwregî de vengî goreyê fekanê bînan hîna qirpiçe ra vejîyênê. Heman şekil de soranê ke mîyanê sînoranê Iraqî de cuyenê goreyê sorananê mîyanê sînoranê Êranî de cuyenê, sorankî hîna zêde qirpiçe ra yanî bin tesîrê erebkî de qiseyî kenê. Yanî cografya vurîyayîşê zîwanî rê tesîr keno. Na rewşe mintiqayanê mozaîkî yê zîwanan de hîna eşkera xo nîşan dana.

1.2.3. Tesîrê Zîwanê Dayike

Vurîyayîşê ke zîwanan de yenê meydan, neslanê neweyan rê zîwanî banderkerdiş de xo nîşan danê. Prosesê benderkerdiş yan banderbîyayîşê zîwanî de amadebîyayîşê ferdan û perwerdeyê zîwanî, vengî de vurîyayîşan rê bingeyêk saz keno. Zîwano ke bi şeklêko durust nêameyo banderkerdiş, badê cû terefê ferdî ra rastbîyayîşê mumkun nêbeno û zîwanî de vurîyayîşê vengî yeno meydan. Heman dem de zîwano ke terefê ferdî ra xelet bander bibozî telafî nêbeno (Karaağaç, 2018; 55-56). Çünke her di halan de zî ferd, formê banderbîyayîşê xo sey esilî ya qebl keno. Gedeyî zafane zîwanê dayike, goreyê vengê ke mîyanê malbatî de yenê qalîkerdiş ra musenê.

Seke cor ra zî ameyo îfadekerdiş, domanî reya ewil formanê zîwanî, malbata xo ra (xususen dadîya xo ra) eşnawenê û goreyê nê eşnawitişî pergalê zîwanî hişê domanan de yeno viraştene (Üçok, 2007: 163-164). Domano ke eşnawitişî ya banderê zîwanî bîyo, eke xeletîya telafûzî rast nêkero, nê xeletî şeklêko umûmî gêne û zîwanî de vurîyayîşêko fonetîkî rê sebeb benê. Eke mabênê di neslan de vurîyayîş nêro meydan, o wext kes eşkeno vajo ke vurîyayîşê vengî nêqewimîyayo.

Zîwan dayîke pergalêko fekkî bîbo zî, seba perwerdeyê zîwanêko nuşteki zî hewce yo. Zîwano nuşteki, zîwanî de nîsbetê vîndîbîyayîşî kêmineno. Zîwano nuşteki veng, şekil û binyadanê talanan ra zîwanî pak keno. Sayeyê zîwanê nuşteki, vurîyayîşê zîwanî asta xo ya normal de seyr keno. Yanî zîwanî de vurîyayîşê ke nişkê ra û zaf benê, sayeyê zîwanê nuşteki nêyenê meydan.

1.2.4. Faktorê Cîwakî û Sîyasalî

Her vurîyayîşo ke mîyanê cîwakî de qewimîyêno; zîwanê komel de, binyadê vengê zîwanî de, sentaksê zîwanî de, manaya zîwanî de ûsn waran de tesîrê xo ramojneno. Faktorê cîwakî û sîyasalî vurîyayîşê zîwanî rê tesîr kenê (Karaağaç, 2018; 56-57). Eslê xo de zîwan her hedîseyî ra tesîrdar beno û goreyê rewşa newê xo adapte keno. Vurîyayîşê komelkî, hema tesîrê xo zîwanî de mojnênê. Çünke zîwan sey eynikê komelkî wezîfe vînenê.

Mîyanê komelan de serdemê hereketinî, aktîfî û serdemê sabîtî, bêhereketî estê. Hereketîye yan bêhereketîya komelan, zıwanî de zî xo nîşan dana. Serdemanê hereketinan de vurîyayîşê zıwanan hîna şeklo aktîf yeno meydan. Nê serdeman de zıwanî eke hereketê ciwakî ver bi pozîtîfîye bibo, xezîneya xo ya çekuyan dewlemend kenê, sînorê zıwanî hîra benê; eke hereketê ciwakan ver bi negatîfîye bibo zıwanî reyna zî xezîneya çekuyan zêde kenê labelê demêko derg de nê hereketî zıwanî ser o tesîrêko negatif virazenê.

Mîyanê sinifanê ciwakî de pêgirewtîşî yan cîyabîyayîşê ke ameyê meydan, zıwanê ciwakî bedilnenê. Nê vurîyayîşê ke yenê meydan, vurîyayîşê fonetîkî yê. Vurîyayîşê gramatîkalî û semantîkî teberê nê sebebana de ganî bêre analîz kerdene (Üçok, 2007: 164-165). Çünke sebebê vurîyayîşanê gramatîkalî û semantîkî zafane xêncê nê sebebana benê.

Metnanê ewilanê zazakî de, ortamê ciwakî yê nuştoxan medrese û mekanê dînî yê. Nuştoxî nê ortaman de resayê û cuyayê. Qandê cû berhemanê nê serdemî de zıwanêko erebkî û fariskî ya mûnite xo nîşan dano (Kirkan, 2018a). Serranê mabênê 1970 û 1980î de mîyanê ciwakî de hawayêko sosyalist hakim bîyo. Nê hawayî, sîrayetê berhemanê nê serdemî zî kerdo. Seba nê tewir nuşteyan û zıwanê nê serdemî nuşteyê M. Malmîsanîjî ke kovara *Tîrêjî* de ameyê çapkerdiş nimûneyê baş ê (Tîrêj, 1979). Tena zazakî de nê, kurmanckî de zî kes eşkeno nê tesîrî tesbît bikero. Ortamo ciwakî, livdarîya sîyasî ûsn dînamîkî zıwanî ser o tesîr kenê. Mîsale heman deyîrê kurdî yê ke terefê sunî û êzîdîyan ra yenê vatene, mîyanê deyîran de cîya motîfan a yenê mûnitene. Çünke zıwan dînamîkanê ciwakî ra tesîrdar beno, dînamîkanê ciwakî rê rîayet keno.

1.2.5. Tesîrê Qatmanê Serî û Binî (Linguistik Substrat-Superstrat)

Çekuyan deyngirewtîş mîyanê komelan de her daîm yeno meydan. Grûbê ciwakî û komelkî pîya kewenê têkilî û na têkilî tewr baş zıwanî de vejîyêna meydan. Kontaktê zıwanî sayeyê dîn, bazirganîye, têkilîyê ciwakî, komunîkasyon, nêzdîyîya genetik, ewrenselya zıwannasîye ûsn dînamîkan a yeno meydan (Yaylagül, 2015: 268). Nê taybetmendîyî yan dînamîkî her komel de estê labelê her komel de sey yewbînî wezîfe nêvînenê. Her komel de dînamîkê zereyî estê, dînamîkê ewrensely goreyê nê dînamîkanê zereyî yenê kar ardene.

Seke cor ra îfade bî, her komel de têkilî estê. Na têkilîyî de di terefê estê ke nînan ra yew dayox, o bîn girewtox o. Terefo ke hete xezîneya çekuyan ra dewlemend o zafane dayox, terefo bîn zî girewtox o. Goreyê nê krîterî mîyanê zıwannasîye de şêwe fekî ra, fek lehçeyî ra, lehçe zıwanê ortaxî ra, fekê qatmanê binî fekê qatmanê serî ra, zıwano rojane zıwanê standardî ra ûsn çekuyan gênê. Labelê tam eksê ci zî yeno meydan (Porzig, 1986: 61-62). Eke tebeqeya cêrî, tebeqeya corî rê tesîr bikero sey *substrat*; tebeqeya corî tesîrê tebeqeya cêrî bikero sey *superstrat* yeno name kerdene (Üçok, 2007: 165).

Komelî bi şeklêko siruştî kewenê têmîyan û ziwanan de hemkarîgerîye yena meydan. Komelê ke ziwane xo yê dayîke bander nêkenê, çiqas qatmanê serî (fetihtar, îstîlakar, kedewer ...) bê zî, mîyanê qatmanê binî de helîyênê, vîndî benê û şonê. Labelê rewşêka wina nadîr yena meydan. Çünke ziwane qatmanê serî, ziwane sinifa hegemone, wayîrê meslegî û statuko yo. Qatmanê serî, qatmanê binî rê tena ziwane xo bander nêkeno; bi zanistî ya, heweskerdişî ya ûsn qatmanê binî asîmîle keno. Bi no şekl a qatmanê binî nê asîmîlasyonî ra tesîrêko xirab vînenê, ziwane qatmanê binî de vurîyayîşî yenê meydan (Karaağaç, 2018; 57-58). Dinyaya moderne de îmkanê komunîkasyonî û koçerîye zêde biyê. Qandê cû nika ziwane qatmanê binî zêdetir ziwane qatmanê serî ra tesîrdar beno. Xêncê ney, statuko zafane destê qatmanê serî de yo. Nê zî goreyê politikayanê ziwani ya tesîrê ziwane qatmanê binî kenê. Bi no şekl a ziwani de vurîyayîşê vengano yeno meydan.

1.2.6. Moda

Terefê qalîkerdoranê ziwani ra teqlîdkerdişê ziwani û vatişê kesane muhîman, îtîbarinan, meşhuran, grûban û cematana sey moda ya yeno name kerdene. Moda û teqlîdkerdişê qalîkerdoranê ziwani de nuqtêya muhîme, vatişêko nemukemel heta xelet qalîkerdoran ser o tesîr keno û qalîkerdixê nê vatişê xeletî xo rê sey rol-model gênê. Nê rol-modelî ya pîya ziwani de vurîyayîşê vengano yeno meydan (Üçok, 2007: 166). Seke cor ra zî amebî îfadekerdiş, seba vurîyayîşê ziwani û vengane ziwani gani demêko derg derbas bibo. Tîya de kes eşkeno behsê dî nuqtêyan bikero. Nuqtêya ewile de rol-model demêko derg nê wezîfeyê xo bîyaro ca. Raste rast no mîyanê komel de cayê xo vînenê û vengane ziwani ser o tesîrêk keno.

Nuqtêya dîyine de rol-model demêko kilm de û taye kesane ser o tesîr keno. Badê demêk tesîrê ney werzeno. Çekuyê ke sayeyê wesayîtê komunîkasyonê girseyan yan muzîk yan kesane namdaran reyde kewenê ziwani mîyan, sey moda ya yenê qebul kerdene û demêko kilm de mîyanê şarî de vila benê. Labelê badê demêk nê çekuyî vîndî benê, orte ra werzenê û vera nînan sewbîna çekuyî sey moda ya vila benê. Mîsale her serre hamnanî, mîyanê muzîko populer de taye deyîrî bi sernameyê *hitî* ya meşhur benê û vila benê. Çekuyê ke nê deyîren de yenê şuxulnayene heta vatişê deyîrbazî xususe mîyanê ciwanane komel de yenê teqlid kerdene. Labelê emrê nê çekuyan û vatişê deyîrbazî bi demêk a sînorkerde yo. Kes eşkeno ney sey moda ya name bikero.

1.2.7. Keda Tewre Kêmi-Keda Tewre Zêde

Ziwani de pêbestişê çekuyan de *keda tewre kêmi* û abirnayîşê çekuyan de *keda tewre zêde* vîyartbar a. Têkilîya vurîyayîşî ke mabênê insanî de mewcûdîyetî de esta tesîrê ziwani zî kena. Encamê na têkilîye ziwani de hete manayî ra vurîyayîşî yenê meydan. Ziwani nê vurîyayîşan ra heta ke çekuyanê neweyan îstîhsal bikero,

taye çekuyan rê yewe ra zêde manayan bar keno. Allofon, allomorf, manaya talî, mecaz ûsn goreyê keda tewre kêmi yenê meydan. Keda tewre kêmi sey *ekonomîyê ziwani* yeno name kerdene (Bussman, 1998: 945). Keda tewre kêmi sey sentaktîk û fonolojîk di babetî ya. Her di babetan de zî vurîyayîşê vengyan yeno meydan (Demirci, 2014: 86-88). Zazakî de nameyan de xususen yasaya ekonomîyê ziwani zêde yena şuxulnayene. Taye nameyî estê ke miyanê şarî de yenê kilm kerdene. Mîsale; Heme< Mehemed< Muhemmed, Îb<Îbo< Biro<Bira hîm<Îbra hîm ûsn. Seke aseno keda tewre kêmi yan ekonomîyê ziwani vurîyayîşê vengyan rê sebeb beno. Ekonomîyê ziwani de şeklo sentaktîk hîna zêde yeno şuxulnayene.

Rewşanê eynîyan ra îmtinakerdiş, her mana û vengî cîya mefhuman a îfadekerdiş sey keda tewre zêde yena name kerdene (Karaağaç, 2018; 54-55). Goreyê na yasa nêzdîyîya vengana û manayî yeno îhmal kerdene. Mantiqê ziwanan de kêmi kerdiş, asankerdiş û eslê xo de goreyê keda tewre kêmi hereketkerdiş esto. Goreyê keda tewre kêmi vurîyayîşê vengyan yê sey *asîmilasyon*, *monoftongîzasyon*, *konsonantî ra derbasê vokalî bîyayîş* ûsn yenê meydan. Ziwanan de meylêko zor ra ver bi asanbîyayîşî esto, o semed ra keda tewr kêmi şuxulnayîşê ziwanan rehetir kena. Zafane na yasa de fonemanê zoran ra derbasê fonemanê rehetan sey qayde yeno qebul kerdene. Labelê ziwanan de fonemanê zoran û asanan tesbîtkerdiş ge gane mumkun nêbeno (Üçok, 2007: 162-163). İxtilafê nuşteyî û ziwani de (fekki) de her daîm delîlê nuşteyî yeno qebul kerdene.

1.2.8. Tesîrê Îşaretanê Xalbendîyan

Nuşte herfan-sembolan şuxulneno labelê ziwani vengî ra îstîfade keno. Nuşte çiman rê xîtab keno labelê ziwani goş û ziwani ya xo îfade keno. Nuşte ziwani bi şeklêko pêroyî îfade keno û baqî mendîşê ziwani tesîs keno. Şeklê ke derbasê nuşteyî bîyê zîhnê ma de sey fonemî ya ca gênê. Nuşte ziwani tenzîm keno û neqlbîyayîşê ziwani rê îmkân dano. Çünke nuşte materyalanê şenberan bikar ano labelê ziwani zafane razber o (Karaağaç, 2018; 60-61).

Xêncê nê delilan, nuşteyî (bi kamcîn alfabe ya bêrê nuştene wa bêrê) tu rey heme dewlemendîya ziwani nêşkenê tesbît bikerê û derbasê nuşteyî bikerê. Ziwani gama ke derbasê nuşteyî beno hîn taybetmendîyanê xo vîndî keno yan hîn taybetmendîyî terefê ziwannasan ra yenê îhmal kerdene. Ziwani nuştekiyo ke ameyo standard kerdene de fonemê segmentalî heta radeyêk şênê bêrê temsîl kerdene labelê fonemê suprasegmentalî derbasê nuşteyî nêbenê. O semed ra gama ke ziwani bi nuşteyî ya yeno îfadekerdiş, hîn taybetîyanê xo vîndî keno û hîn taybetîyê ziwani zî vurîyênê.

Sebebanê vurîyayîşê ziwani ra çend hebê ci cor ra ameyê hûmaritene. Labelê kes nêşkeno nê sebebani bi nînan reyde sînardar bikero. Vurîyayîşê ziwani hîrê beşan rê yeno dabeş kerdene. Na xebate de do tena cavurînayîşê ziwani do bêro îzah kerdene.

1.3. Cavurînayîşê Vengan

Mîyanê çekuye de bedilîyayîşê foneman sey cavurînayîşê vengano yeno name kerdene. No vurîyayîşo ke yeno meydan, mabênê fonemanê nêzdîyan de yan fonemanê dûrîyan de şeno biqewimîyo. Eke cavurînayîşê vengano fonemê ke pê hete nîyê bêro meydan sey dûrî, mabênê fonemê ke pê taqîb kenê de biqewimîyo sey nêzdî yeno name kerdene. Xususen kurdî de nimûneyê cavurînayîşê vengano zêde yê. Seba ke na xebate senkronîk a, tîya de tena zazakî rê nimûneyî deyayê. Sayeyê cavurînayîşê vengano, seba heme hedîseyê vengano kes eşkeno ney îfade bikero, zaf çekuyê ke heman kok ra zêdeyayê şênê bîrê tesbît kerdene. Na xebate de cavurînayîşê vengano ra metatez û nobedarîye do bêro îzah kerdene. Xususen nimûneyê metatezî zazkî de zêde yê. Nê nimûneyî kitabano ra ameyê tesbît kerdene.

1.3.1. Metatez (Metathesis, Göçüşme)

Metatez hedîseyê vengano yê bêîntizaman ra yo û wayîrê taybetmendîyanê mekanîkano o. Metatez qasê hedîseyano bînn vîla nêbo zî, hema hema heme zîwananê dinyayî de esto. Metatez çarçoweyêka hîra de sey cavurînayîşê foneman yeno name kerdene (Crystal, 2008: 303; İmer&Kocaman&Özsoy, 2011: 219). Metatez fonemo ke verî bivejîyo dima vetîşî îfade keno, manaya çekuye nêvurînenê û mîyanê hedîseyanê vengî de sey mekanîkano yeno qebul kerdene. Metatez heman dem de sey *neqlkerdişê vengî* yan *cavurînayîşê vengî* zî yeno name kerdene. No hedîse zafane mabênê fonemanê embiryanan vokalan yan konsonantan de qewimîyêna. Seke cor ra zî ameyo îfadekerdiş eke metatez fonemanê embiryanan de yeno meydan sey metatezo nêzdî, mabênê fonemanê cîyayan de yeno meydan sey metatezê dûrî yeno name kerdene (Özkan, 2009: 192-193). No hedîseyê vengî goreyê binyadê vengî nêyeno meydan; kotî de çekuye de û goreyê kamcîm qaydeyî do bêro meydan dîyar nîyo, o samed ra sey vurîyayîşêko bêîntizam yeno qebul kerdene. Metatez tu zîwanêkê dinyayî de sey cîyakerê manayî nêyeno xebitnayene, no zafane seba konsonantê ke kewenê tîmîyan pê ra abîrnê û zorîya telafûzkerdişî îzale bikerê yeno şuxulnayene (Korkmaz, 2010: 107).

Metatez zafane fonemanê konsonantan de yeno meydan labelê ge ge heceyan de yan vokalan de zî yeno tesbît kerdene. Derheqê kokê çekuye de hîn xetayî û şaşîye metatez ra neşet kenê labelê metatez derheqê zîwanasîya tarîxî ra doneyanê muhîman zî dano. Yanî kes eşkeno vajo ke metatez yanî cavurînayîşê vengano bi etîmolojî reyde tîkildar o.

Zazakî de zafane vengano sey /n/, /l/, /q/, /y/, /w/, /r/, /s/, /ş/, /m/, /ç/, /x/ de metatez yeno meydan. Malbata zîwananê Hind-Ewropayî de metatezê vengano /r/ > /l/ yî sey qaydeyêko umûmî esto. Sorankî de no hedîseyê vengî yanî metatez sey جیگورین یاسای yeno name kerdene (Yunis Mihyeddîn, 2013: 110). Cêr ra di beşê metatezî bi nimûneyan reyde ameyê îzah kerdene. Seba her beş tabloyî

amade bîyê, seba nimûneyanê umûmî zî kitabana ra taye cumleyî weçîneyayê û bi çimeyan reyde deyyayê.

1.3.1.1. Metatezo Dûrî (Incontiguous Metathesis, Uzak Metatez), mabênê vengê ke pê ra çiyayê de yeno meydan sey metatezê dûrî yeno name kerdene. No tewir metatez de konsonantî yan vokalî kêleka pê de nîyê, sewbîna veng mabênê nê fonemana de ca girewto (Korkmaz, 2010: 220; Karaağaç, 2018; 77). Tesbîtkerdişê metatezê dûrî goreyê metatezê nêzdî hîna dîqet wazeno. Çünke metatezê nêzdî de fonemî embiryanê pê yê labelê metatezê dûrî de sewbîna fonemî zî kewtê mîyane. Cêr ra zazakî de metatezê dûrî rê taye nimûneyî deyyayê. Nimûneyan de çekuye eşkenê bivurîyê û şeklê yewbînan bigîrê. Kamcîn şekil rast o, ney sero ganî xebatêka etîmolojîke bêro kerdene. Çünke ge gane çekuye winî vurîyêna ke, şeklo ke metatez bîyo sey şeklê esilî ya yeno zanayene.

No tablo de nimûneyê metatezê dûr deyyayê. Mîyanê çekuyan de sey “> <” sembolêk deyyayo ke no şekil bi manaya “vurîyayîş her di terefan ra zî mumkun o” yeno.

Tablo 1: Zazakî de Metatezo Dûrî

Zazaca		Zazaca	Türkçe
andal	> <	aldan	yüklük
bangîri	> <	bargîni	loğ
mîl	> <	lom	kaldıraç
nuski	> <	kunês	itme
şekal	> <	lekaş	eski ayakkabı
xizal	> <	zixal	kömür
vînceli	> <	vilînce	sakız
şilawundî	> <	şuwalendî	uçkur
erşawitiş	> <	şirawitiş	gönderme
xexebî	> <	şexabî	matkap (Malmîsanij, 2013: 15-18)

1.3.1.2. Metatezo Nêzdî (Contiguous Metathesis, Yakın Metatez), mîyanê çekuyan de fonemê ke nêzdîyê yewbînan de cavurînayîşê vengana sey metatezo nêzdî yeno name kerdene (Korkmaz, 2010: 237; Karaağaç, 2018; 78). Tesbîtkerdişê metatezê nêzdî goreyê metatezê dûrî hîna rehet o. Çünke no tewir metatezî de fonemê ke nêzdîyê yewbînan ê cavurînenê, o semed ra bi şeklêko asan metatez yeno fehm kerdene.

Cêr ra zazakî de metatezê nêzdî rê taye nimûneyî deyyayê. Xususîyeto ke cor ra amebî îfadekerdiş seba ney zî vîyartbar o, her di şeklî zî eşkenê bivurîyê û cayê yewbînan bigîrê.

Tablo 2: Zazakî de Metatezo Nêzdî

Zazaca		Zazaca	Türkçe
arye	> <	ayre	değirmen
bezra	> <	berza	çekirdek
emşo	> <	eşmo	bu gece
helwa	> <	hewla	helva
nerm	> <	nemr	yumuşak
nizm	> <	nimz	alçak
tenya	> <	teyna	sadece, yalnız
sifre	> <	sirfe	sofra
xeylêk	> <	xelyêk	bir hayli
zîl	> <	lîz	filiz, kamış (Malmîsanij, 2013: 15-18)

Her di tewir metatezan de metatez zafane mîyanê konsonantan de beno. Cor ra tena çekuyêke de beyntarê vokalan de metatez ameyo meydan, ke na çekuye zî erebkî ra derbasê zazakî bîya. Xususe xebatanê cigêrayîşanê fekan de, zaf nimûneyê metatezî yenê tesbît kerdene. Seba ke nê materyalê folklorîkê nê metnan de metatezî nêyenê serrast kerdene.

Cêr ra nimûneyê metatezî ke metnan ra ameyê tesbîtkerdiş, bê tesnîfkerdişê dûrî û nêzdî, ameyê rêze kerdene. Tîya de nimûneyî cîya mintiqayanê zazakî ra ameyê weçînayene û mudaxeleyê alfabeya nuştoxan nêbîyo. Çünke fonolojî de muhîm tesbîtkerdişê vengana o, alfabe nîya. O semed ra îmla û alfabeya nuştoxan ameya seveknayene.

“Ez şorî Xizirî **qîrar (îqrar)** do mi ez endî xo rê raşt qesê bikerê.” (Çîçek, 2014: 38)

“**Arwûnçî** têna kiştê yew dewi di aryê xwi di mûnenû.” (Kuriy, 2014: 37)

“Mî ra zur, Humay ra raşt;

Mî yo taway **helaw** virast,

Mî cemaat ra kerdî raşt.” (Kuriy, 2014: 42)

“Ez **ehend** pak a, temîz a la hûnc şima xatirê mi nizûnî.” (Kuriy, 2014: 51)

“Erê ez gerek tu xwi rî bêrî, ti gereka pê destûn xwi **şilamûndê** mi akirî.” (Kuriy, 2014: 138)

“Yî **xêliyek** waxt şinî, qefilîyênî, sêr yew koy a yew yênî owk seri nişênî rue.” (Kuriy, 2014: 59)

“Nê **dewrêşî** wertê xo de qesî kenê.” (Ballikaya, 2010: 51)

“Nafa kî dora **afşançî** ya. Şonê lewê **afşançî**. **Afşançî** vano.” (Çîçek, 2014: 56)

“**Barzîgançi** şodir şavaq ra rew wurzeno ra êno vano,” (Çîçek, 2014: 58)

“-Lelê mi ma kincanê **dewrêşa** xo ra dîme, şopê şîme bifetelîme.” (Çîçek, 2014: 60)

“Heto bîn ra **mordemêde** nondayox bî.” (Çem, 2002: 11)

“-Ez xapitû dune ra dest, hen vano ke ey kî bîyarê bikîsêne. Nêzon ke **Dewrêşi** ra se vano?” (Çem, 2002: 260)

“Pasayêde **barzîgan** ve cinîya xo ra benê.” (Guntaş Aldatmaz, 2014: 201)

“Weli: Ma **sîlxet** bime, bao, bao. Dewi-mewi, dorme de pêro kerdi top berdi.” (Çağlayan, 2003: 326)

“Mot bi vake: “Rindeka dina, pê mı **xezelîna**?” (Mükan, 2017b: 53)

“Vake: “Yewela tercubanê to zof **dorğîyo**.” (Mükan, 2017a: 33)

“Be na tore ki, to çiqas biwaştêne, hende **muğurbe** diyene.” (Saint-Exupéry, 2017: 27)

“Sirê mi kî, boverê çemî de, filan ko de, hîrê **gorgeçînû** der o, **gorgeçînî** zere qutîye der ê.” (Guntaş Aldatmaz, 2013: 58)

“Ey kî winî vat, aye yawaşek **şîlpaxê** da dest ro, hetê ra kî huye.” (Çem, 2007: 497)

“**Esmo** mêymanê daye yîme.” (Çem, 2002: 215)

“Mezatdi **sîlxeteyênda** bol vêşî estbî.” (Ayyıldız, 2014: 50)

“Cambazî, pêro mezatdi zeyde **mocilana** geyrayên.” (Ayyıldız, 2014: 53)

“Gîna nê ardan **alewena** û kena nan pewjena.” (Adabeyi, 2005: 99)

“Pers keno, vanê; “nê **pantolî** yê” Bol şino mêrdekî weşte ci.” (Adabeyi, 2005: 109)

“Ew nê qewlê xo kenê. **Ardwan** poça dano ci ew nê danê pîro şînê.” (Hayıg, 2007: 33)

“Maya ci qey vana **dorxî** yo.” (Adabeyi, 2005: 97)

Goreyê nê nimûneyan û doneyan kes eşkeno vajo ke metatezî, çi dîrî çi nêzdî bo, heme mintiqayanê zazayan de xo rê ca vînayo. Ganî bêro îfadekersîş ke ziwanî no nuştêkî de, sey heme hedîseyanê vengî, nîsbetê metatezî kêmî beno. Ziwanî fekkî de no hedîseyê vengî hîna zêde yeno tesbît kerdene. Çekuyê ke ziwanî de bîyanîyan ra kewtê zazakî mîyan de metatez hîna zêde yeno meydan. Beno ke sebebê ney xelet telafûzkerdişê qalîkerdoxan ra yan goreyê fonolojîyê zazakî rewîzekerdişê çekuyê ra neşet bikero. Qalîkerdoxî telafûzê çekuyê xerîbe eke xelet fehîm bikere metatez yeno meydan yan zî reyna qalîkerdoxî çekuyê xerîbe goreyê fonetîkê zazakî rewîze kenê û şeklê tewr asanî ya vanê. Nê her di halî zî metatezî rê sebeb benê. Tena çekuyanê bîyanîyan de nê, çekuyanê zazakî de zî metatez yeno meydan, labelê xebatê standardizasyonî metatezî orte ra wedarnênê.

1.3.2. Nobedarîye (Graduation, Nöbetleşme)

Yewineyê ziwani ra, unsurê ke cîyakerê manayî, vurînayoxê manayî yan vurînayoxê fonksiyonî niyê eke mabênê xo de cayê xo bivurînê sey nobedarîye yeno name kerdene. Nobedarîya vengane de sey *nobedarîya şeklan* û *nobedarîya binyadî* çend hebî binbeşe xo estê. Malbata ziwane ê Hind-Ewropayî de vokalî derece derece vurîyênê û no zî sey nobedarîya vokalan yeno name kerdene. Morfolojî de mabênê morfeman de nobedarîye yena meydan û heman şekil de sentaks de zî beyntarê unsuranê cumle de nobedarîye esta (Karaağaç, 2018; 84-86). Zazakî de fonemê /ç/ û /c/, fonemê /p/ û /b/, fonemê /t/ û /d/ bi şeklê nobet yenê şuxulnayene.

1.3.2.1. Nobedarîya Vokalan (apophony), terefê Jacob Grimmî ra ameyo îfadekerdiş û no term malbata ziwaneê Hind-Ewropayî de seba prosesê tarîxî îzahkerdişî yeno şuxulnayene. Destpêk de no term tena seba fonolojî şuxulîyayê labelê dima no term seba binbeşanê morfolojî û sentaksî zî ameyo teşmîl kerdene (Bussman, 1998: 3). Eke çekuyan de fonemê vokal yê kokî bêro bedilîyayene û cîya şeklê çekuyî bêre meydan sey nobedarîya vokalî yan cavurînayîşe vokalê kokî yeno name kerdene. Ziwaneê Hind-Ewropayî de karî zemananê cîyayan de formanê cîyayan a îfade benê ke, no sey nobedarîya vokalan name beno. İngilizkî de karo ke nuştene îfade keno sey *write-wrote-written* yeno nuştene. Reyna erebkî de kokê **كتب** ra çekuyê sey kîtab, katib, mektub ûsn yenê zêde kerdene (İmer&Kocaman&Özsoy, 2011: 182). Zazakî de kokê karan de (şîyayene>şîna>şo) vurîyayîşe nê tewirî yenê meydan.

Encam

Na xebate de sebebê vurîyayîşe vengane û cavurînayîşe vengane ameyo tedqîq kerdene. Yeno fehmkardiş ke seba vurîyayîşe ziwani û vengane ziwani zaf sebebî estê. Xora mantiqê ziwani de vurîyayîş û seba vatişan varyantan peydakerdiş esto. Rewşa normale de ziwani yenê vurîyayene. Labelê taye sebebî estê ke nê vurîyayîşan rê îvme danê û vurîyayîşe ziwane hîna bileze yenê meydan. Mîyanê xebate de ameyo tesbîtkerdiş ke sebebê komelkî, sîyasalî ûsn zêde tesîre kenê. Labelê reyna zî nê vurîyayîşî ancax bi qebulkerdişê qalîkerdixan a mîyanê ziwani de ca gêne.

Her ziwani de vurîyayîşî yenê meydan. Vurîyayîşe ke demêko kilm de yenê meydan reyna demêko kilm de orte ra werzenê. Labelê vurîyayîşe ke demêko derg de û goreyê sruştê ziwani yenê meydan ziwani de ca gêne. Seke cor ra zî îfade bî, qalîkerdixî ganî nê vurîyayîşan qebul bikerê. Çünke vurîyayîşe ke mîyanê odeyan de terefê ziwannasan ra ameyê viraştene zafane mîyanê ziwani de ca nêgêne. Vurîyayîşe ziwani sey talî û esilî yan zî sey vurîyayîşe întizamîni û bêîntizamî yenê dabeş kerdene. vurîyayîşe ke înrizamî ameyê meydan de qaydeyî

estê. Goreyê nê qaydeyan kes eşkno nê vuriyayîşan tesbît bikero. Labelê hîn vuriyayîşî zî bêîntizam ê. Mîyanê xebate de nê tewir vuriyayîşan ra metatez ameyo analiz kerdene.

Metatez cavurînayîşê vengane zıwan yo. Metatez de zafane konsonantî cayê xo vurînenê. Hem metatezê dûrî rê hem zî metatezê nêzdî rê zazakî de zaf nimûneyî estê. Metatez qandê zorîya telafûzî orte ra wedarnayîşî yeno meydan û çekuyanê xerîban de hîna zêde yo. Ge gane çekuya ke metatez a vuriyaya, mîyanê qalîkerdoxan de winî yena qebulkerdiş ke, şeklê esile yê çekuye nêyeno vatene. Ma eşkenê vajê ke zazakî herçiqas îmkananê zıwanî ra zêde îstîfade nêkero zî, goreyê doneyanê ke ma dest de yê, mîyanê prosesê mormalî de mewcûdiyetê xo dewam kena.

ÇİMEYÎ

- Adabeyî, F. (2005). *Estanekanê Sêwreği Ra*, İstanbul: Vate.
- Ahanov, K. (2013). *Dil Biliminin Esasları*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Aksan, D. (2015). *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Ayyıldız, Z. (2014). *Hersê Zerrî*, Şanhurfa: Elif Matbaası.
- Ballıkaya, H. (2010). *Dêvo Kor Estanikanê Gimgimî Ra*, İstanbul: Vate.
- Banguoğlu, T. (2011). *Türkçenin Grameri*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Başkan, Ö. (2003). *Lengüistik Metodu*. İstanbul: Multilingual.
- Bayraktar, N. (2014). *Dilbilim*, Ankara: Nobel.
- Bussman, H. (1998). *Routledge Dictionary of Language and Linguistics*, New York: Routledge.
- Crystal, D. (2008). *A Dictionary of Linguistics and Phonetics*, Oxford: Blackwell.
- Çem, M. (2002). *Hotay Serra Usivê Qurzkizî*, İstanbul: Deng.
- Çem, M. (2007). *Gula Çemê Pêrre*, İstanbul: Vate.
- Çiçek, M. (2014). *Mêşa Dengize Estanikanê Gimgimî Ra*, İstanbul: Vate.
- Demirci, K. (2014). *Türkoloji İçin Dilbilim, Konular Kavramlar Teoriler*. Ankara: Anı.
- Ebdullah Xoşnaw, N. (2013). *Zımanî Standardî Kurdî*, Hewlêr: Hêvî.
- Eker, S. (2015). *Çağdaş Türk Dili*, Ankara: Grafiker.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2005). *Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)*, İstanbul: Vate.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2011). *Ferhengê Tirkî-Kirmanckî*, İstanbul: Vate.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2016). *Ferhengê Kirmanckî-Tirkî*, İstanbul: Vate.
- Guntaş Aldatmaz, N. (2013). *Sanikanê Mamekiye ra (Mamekiye Masallarından)*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Guntaş Aldatmaz, N. (2014). *Folklorê Kirmancan Ser o*, Dîyarbekir: Roşna.
- Hayıg, R. (2007). *Mahmeşa*, İstanbul: Vêjyayîşê Tiji.
- Karaağaç, G. (2013). *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Türk Dil Kurumu.

- Karaağaç, G. (2018). *Türkçenin Ses Bilgisi*, İstanbul: Kesit.
- Kerimoğlu, C. (2016). *Genel Dilbilime Giriş*. Ankara: Pegem Akademi.
- Kıran, Z., Eziler Kıran. A. (2013). *Dilbilime Giriş*. Ankara: Seçkin.
- Kirkan, A. (2018a). "Goreyê Peymanê Fonetîkî Analîzê Kirmanckî ya Sêwregî", *Dil Bilimleri Klasik Sorunlar-Güncel Tartışmalar*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Kirkan, A. (2018b). *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman esad Efendî û Despêkê Edebîyatê Klasîk Yê Kirmanckî*, İstanbul: Vate.
- Korkut, E. Ayırır, İ. (2015). *Dil Bilimleri ve Dil Öğretimi*. Ankara: Seçkin.
- Kovara *Tîrêj* (1979).
- Kurij, S. (2014). *Arwûn û Lûy Sonikî Çoligî*, İstanbul: Nûbihar.
- Kurij, S. (2014). *Deyirî Çewlîgî*, İstanbul: Nas.
- Lezgîn, R. (2012). *Dersê Ziwani /Kirdki, Kirmanckî, Zazakî-Dimilkî*, Diyarbekir: Roşna
- Malmîsanij, M. (1992). *Ferhengê Dimilkî-Tirkî*, İstanbul: Deng.
- Malmîsanij, M. (2012). *Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmanckî)-Tirkî*. İstanbul: Rûpel.
- Malmîsanij, M. (2013). *Kürtçede Ses Değişimi*, İstanbul: Vate.
- Mükan, M. (2017a). *Sanukê Ma-1*, İstanbul: Fam.
- Mükan, M. (2017b). *Sanukê Ma-2*, İstanbul: Fam.
- Pamukçu, F. (2001). *Gıramerê Zazakî*, İstanbul: Tij
- Porzig, W. (1986). *Dil Denen Mucize II*, Çev: Vural Ülkü, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- Toklu, O. (2013). *Dilbilime Giriş*. Ankara: Akçağ.
- Uçan, H. (2015). *Dilbilim, Göstergibilim ve Edebiyat Eğitimi*, İstanbul: İz
- Vardar, B. (Ed.). (2002). *Açıklamalı Dilbilim Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Multilingual.
- Xoşnaw, N. A. (2014). *Zimanê Standardê Kurdî*. Hewlêr: Hêvî.
- Yunis Mihyeddîn, B. (2013). *Peywendîyî Astî Morfolocî be Astî Fonolocî û Sîntaks*, Hewlêr: Çapxaney Mukriyanî.

WEKÎ NIMANDINA ZANAVÊ; RANÊZIKIYA ZIMANÎ Û WÊJEYÎ DI KOVARA REWŞENÊ DE¹

Dilaver DÖĞER² - Canser KARDAŞ³

Puxte

Piştî sala 1991ê, di nav sînoren Komara Tirkîyeyê (K.T) de gelek kovar û rojnameyên bi Kurdî diweşin. Hin ji wan rengê xwe didin ser pêşketina ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî. Kovara *Rewşenê* ya yek ji wan weşînekan e ku di sala 1992yan de dest bi derçûnê dîke û hewla bipêşxistina Kurdiya Kurmancî dide. Kovara *Rewşenê*, di periyoda derçûna xwe de, bi rabûneke fêrgehî, dikeve nav hewldana cîbicîkirina ziman û wêjeya Kurdiya Kurmancî ku ji ciyê xwe şiqitiye û dûr ketiye. Û di heman demê de, bi nivîsarên ku di kovarê de weşiyane, nîşan dide ku Kurdiya Kurmancî xwedî kelepûreke wêjeyî ya klasîk û folklorî ye û dikare di asteke rasertir û di şûngeha wêjeya modern de jî were nimandin û temsîlkin.

Bêjeyên Sereke: Kovara Rewşen, Ziman, Wêje, Çand, Zanav

Özet

1991 yılından sonra, Türkiye Cumhuriyeti sınırları içerisinde bir çok Kürtçe dergi ve gazete yayın hayatına başlamıştır. Bunlardan bazıları Kürtçe'nin Kurmancî lehçesi ve bu lehçeyle yapılan edebiyatın gelişmesinde önemli bir rol oynamıştır. 1992 yılında yayın hayatına başlayan *Rewşen* dergisi bu gelişimde rol oynayan dergilerdendir. Yayınlanma sürecinde, bir dil ve edebiyat okulu gibi davranan dergi, Kürtçe'nin Kurmancî lehçesini kayıp uzaklaştığı zeminden alıp tekrar yerine yerleştirme çabası içerisine girmiştir. Bununla beraber, *Rewşen* dergisi, Kürtçe'nin Kurmancî lehçesinin folklor ve klasik edebiyat alanlarında zengin ve kayda değer bir birikime sahip olduğunu

- 1 Ev nivîsar; ji beşeke hîm û naveroka teza doktorayê ya bi navê “Geşedana Ziman û Wêjeya Kurmancî ya Di Kovarên Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşen-Nameyê De” hatiye amadekirin.
- 2 Dilaver DÖĞER: Xwendekarê doktorayê ya Enstîtuya Zimanê Zindî ya Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Bingolê ye.
- 3 Doç. Dr. Canser KARDAŞ: Perwerdekarê Ziman û Edebiyata Tirkî ya Fakulteya Fen û Edebiyatê ya Zanîngeha Alparslanê ya Muşê ye.

yayınlanan yazılar ile gösterip bunun modern edebiyat düzeyinde de temsil görebileceğine işaret etmiştir.

Anahtar Kelimeler: Rewşen Dergisi, Dil, Edebiyat, Kültür, Kimlik

Abstract

After 1991, many Kurdish language magazines and newspapers started being printed in Turkey. Among these, some were published in the Kurmanji dialect of Kurdish, which played a significant role in the development of the literature written in this dialect. Published for the first time in 1992, “*Rewşen*” was one of these magazines. Throughout its existence, the magazine acted as a school of language and literature and aimed to revive and restore the status of Kurmanji. In addition to this, *Rewşen*, through published articles, proved not only that the Kurmanji dialect of Kurdish possessed a rich heritage in the fields of folklore and classical literature that was worthy of discussion, but also that it could be represented in modern literature.

Key Words: Rewşen Magazine, Language, Literature, Culture, Identity

Destpêk

Piştî ku di sala 1991ê de, li Tirkiyeyê, wekî qanûneke sererastkirî, “Qanûna bi hejmara 2932yan, ya ku ji bilî zimanê Tirkî axaftina bi zimanên dîtir qedexê û derbend dikir”⁴, ji meriyetê rakir, mijarên wekî mafên zanav û nasnameya çandî û zimanî û xebat û çalakiyên di vî warî de bêtir ket rojê Kurdan û cî û girîngiya xwe pê da. Wekî encama vê girîngîpêdanê, di sala 1991ê de, li Stenbolê, saziyeke çandî ya bi navê xwe yî Tirkî Mezopotamya Kültür Merkezî (NÇM: Navenda Çanda Mezopotamyayê) hat damezirandin. Vê saziyê, digel xebat û çalakiyên sînema, şano, muzîk, govend (dansên gelêrî) girîngiyeke taybet da çand û zimanê Kurdî û wekî nîşaneyê vê girîngîpêdanê; di bin banê NÇMyê û di Sibata sala 1992yan de yekem hejmara kovara *Rewşenê* weşiya.

Di hejmara yekem de, wekî xwediyê kovarê İbrahim Gürbüz tê daxuyandin. Her wiha, digel serkara karên nivîsan û berpirsê karên weşanê, sazûmana (redaksiyona) nivîsî jî heye ku ji navên wekî, Hasan Bildirici, Feqî Huseyn Sağnıç, Ali Temel, Abdurrahman Dürre, Hüseyin Kaytan, Mehmet Gemsiz û İbrahim Genç pêk tê. Û wekî periyoda weşana kovarê, tê daxuyandin û gotin, “*REWŞEN*, Kovara Çandê, Mehê carekê tê weşandin.”⁵ Çendî ku di hejmara yekem de periyoda weşanê ya kovarê wekî mehane tê diyarkirin jî, hejmarên kovarê gelek caran dereng derdiçin û kovar, piştî hejmara 13emîn, êdî du hejmaran bi hev re der diçe. Di nivîsa sergotariyê ya hejmara 14-15an de tê gotin, “Me vê mehê du hejmar bi hev

4 Kubilay, Çağla (2004) Türkiye’de Anadillere Yönelik Düzenlemeler ve Kamusal Alan, İletişim Araştırmaları Dergisi, İstanbul, sayı 2, c, 2, r, 56

5 Rewşen (1992) Kovara Çandî, Hunerî, Wêjeyî, MKM (NÇM), Stenbol, Metinler Matbaacılık, hej, 2

re derxist. Ji ber sedemên aborî, ta çend mehên din jî, dê *Rewşen* du hejmar bi hev re bê weşandin.”⁶ Digel vê yekê jî, ji bilî sedemên aboriyê, her wekî ku di nivîsara sergotariyê ya hejmara 20-21ê de tê daxuyandin û tê gotin, “Hejmarên me yê 18-19’an hatin berhevkirin.”⁷ Ji ber ku rêveberiya li Tirkîyeyê astengiyan bo kovarê çêdikin û kovarê berhev dikin, kovar nagihîje ber destê xwendevanan. Loma kovar, carinan wekî du mehane û carinan jî wekî du hejmaran digel hev û dereng derdiçe. Kovara *Rewşenê* ku hejmara wê ya yekem di meha Sibatê ya sala 1992yan de diweşe û bi temamî 23 hejmarên ne sererast û ne lidûhev û yek bi yek derdiçe, piştî ku di Ocak (Çileyê)⁸ 1996an de bi hejmarên 22-23yan ya digel hev derdiçe, bêyî ku di kovarê de bê diyarkirin û daxuyaniyek bê belavkirin, piştî hejmara 22-23yan dawî li weşana xwe tîne.

Em dikarin statîstîka weşana kovara *Rewşenê* bi awayê li jêr nîşan bidin:

Statîstîka periyoda weşanê ya kovara *Rewşenê*

Hej	Meh	Sal
1	Sibat	1992
2	Adar	1992
3	Nîsan-Gulan	1992
4	Hezîran	1992
5	Tîrmeh	1992
6	Tebax	1992
7	Îlon-Cotmeh	1992
8	Mijdar-Berfanbar	1992
9	Kanûna paşîn-Sibat	1993
10	Adar-Nîsan	1993
11	Îlon	1993
12	Sibat	1994
13	Adar	1994
14-15	Avrêl-Gulan	1994
16-17	Pûşper-Tîrmeh	1994
18-19	Berfanbar	1994
20-21	Ağustos	1995
22-23	Ocak	1996

Di nivîsa sergotariyê ya kovara *Rewşenê* de ku bi du zimanan (Kurdî û Tirkî) ye û bi sernava Kurmancî ya “Çima Rewşen” hatiye nivîsîn, wekî sedema weşandina

6 Rewşen (1994) hb. hej, 14-15

7 Rewşen (1995) hb. hej, 20-21

8 Me dest neda navê mehan, wekî çawa li ser rûpelên Kovara *Rewşenê* hatiye nivîsîn, me jî wek wisa nivîsî.

kovarê, pêşî tê gotin, “Çanda me Kurdan, çanda berxwedaniyê ye” û bal tê birin ser berxwedana ku li pêşberî pêkanînê qedexekirinê hatiye dayîn û bi gotina “Hê jî çanda me ber bi kemilandinê ve rê dikudîne.”⁹ tê destnîşankirin ku ji ber tûşbûn û dûçarmayîna qedexekirinê, bi qasî ku karibe hewcetî û pêwîstiyên dabîn bike û ji roja xwe re bibe bersiv, nekemiliye. Bi domana nivîsê re, wekî armanca *Rewşenê* wiha tê gotin, “Armanca me ya yekemîn ev e ku em di waleya gelemperî de bibin neynika(eynika) çanda Kurdî.”¹⁰ û bal tê birin ser wateya giştî ya Kurdî ku kovar dê bi rola awênayî rabe ku çalakiyên ‘nîşandan’ û ‘dîtin’ê lê disepîne. Di pêdeçûna daxuyandina armanca kovarê de, tê gotin, “Em girîngiya herî mezintirîn didin zimanê Kurdî” û em bi vê hevokê fam dikin ku kovara *Rewşenê* li xwe dike armanc ku zimanê Kurdî ji rewşa xwe ya ku tê de xelas bike, an jî wekî armanca dide ber xwe da ku karibe Kurdî bigihîne asta wê ya zimanê komeke etnîk an jî zimanê neteweyekê. Lê belê, hema bi dû re tê gotin, “Dibe ku di hêjmarên me yê peşîn de nivîsarên bi Tirkî hebin. Lê em hinekî neçar in. Di nava demê wê kovara we bi tenê zimanê Kurdî bê weşandin.”¹¹ Em bi van hevokan pê dizanin ku piştî pêkanînê qedexekirinê yê 12ê Îlona 1980yî, Kurdên di nav sînorê K.T.yê (Komara Tirkiyeyê) de dijîn, kêr zêde bûne duzimanî an jî zimanê wan ê yekem bûye Tirkî. Loma jî dibe ku beşek ji nivîskar û xwendevanên kovarê hebin ku nikaribin bi Kurdî binivîsin û bixwînin. Her çend tê diyarkirin ku dê piştî çend hejmaran kovara *Rewşenê* bi tenê Kurdî biweşe jî, heta hejmarên dawî (22-23) jî kovar bi du zimanî, (Kurd û Tirkî) derdiçe. Wekî domandina daxuyandina armanca kovarê, tê gotin “em dixwazin eniyeke zanîst-çand û hunerê çêbikin.”¹² Em bi rêya van gotinan dizanin ku kovara *Rewşenê*, di hîm û esasa xwe de li xwe kiriye armanc ku di biwara çand û ziman û zanîstê de ‘eniyeke’ ava bike da ku zor û stema asîmîlasyonîst ku li ser çanda Kurdî hatiye meşandin, biqede an jî ji hêz û pêkanîna xwe qels bikeve. Û ji bo çibicîanîna vê yekê jî behsa qadeke rabûna bo xebatê ya di biwara çandî û zimanî de tê kirin ku bi gotina, “*Rewşenbîr* li pêşberî gelê xwe berpirsiyar e. Îro gelê Kurd li pêşberî qirkirinan e. Divê *rewşenbîrên* Kurd van tiştan binin ber çavên xwe û bi hêza xwe bi xwe van astengan ji holê rakin.”¹³ amaje bi rol û rista kirin û çalakgeriya bîreweriyane û *rewşenbîriyane* tê kirin û bar û binbariya vê rabûnê li ser milê *rewşenbîran* tê kirin ku wekî xwendeyên gelê xwe, dikarin bi nivîsîna xwe ve balê bikişînin ser çand û zimanê neteweya xwe ya ku maye bindest û şûnde; û xwendeyên vî zimanî, dikarin çand û zimanê xwe ku ber bi windabûn û tunebûnê ve diçe, ji nav diranokên çerxa asîmîlasyonê derînin.

9 Rewşen (1992) hb. hej, 1

10 waleya: wateya

11 Rewşen (1992) hb. hej, 1

12 Rewşen (1992) hb. hej, 1

13 Rewşen (1992) hb. hej, 1

1. Zanav

1.1. Ranêzikiya Zanavî di Kovara Rewşenê de

Herçî helwêst û ranêzikiya zanavî ye, di kovara *Rewşenê* de bi çarçoveyeke giştî li ser zimanî ye. Di rûpelên kovara *Rewşenê* de, nivîsarên bi sê zaravayan; Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Jêrîn (Sorani) û bi Kirmanckî (Zazakî) cî dane xwe. Gava em bala xwe li ser vê yekê hûr digerin, em dibînin ku kovara *Rewşenê* ne tenê ji bo Kurdiya ku di nav sînorên K.T.yê de pê tê axaftin weşanê dike; digel wê yekê jî bi helwêst û ranêzikiyeke amajepêkirina terîtoryaya giştî radibe. Û em vê yekê di zincîrenivîsên bi navê 'Niştimana Xwe Binase' de dibînin ku ji hejmara yekem heta hejmara dawî, bajar bi bajar, hemû beş û parçeyên ku Kurd lê dijîn, ax û warê Kurdan hatiye nasandin.¹⁴ Loma jî em li ser vê helwêst û ranêzikiya kovarê ya zimanî û çandî û terîtoryayî dikarin bêjin; kovara *Rewşenê* li ser çand û zimanî xwedî taybetiyeke niştimanî ye.

Ev taybetî û ranêzikî di gelek nivîsarên wê de didin der. Di nivîsa bi navê 'PARASTINA ZIMANÊ KURDÎ JÎ BÎREKE GIRÎNG JI PARASTINA NETEWA KURD E' de ku ji alî Hogir Ehmed ve hatiye nivîsîn, bi hevoka destpêkê ku dibêje, "Zimanê Kûrdî, hebûna netewa Kurd, ta îro parastî ye."¹⁵ hema ji serî de hemû sedem, angaşt û palderên nivîsarê dide der ku hebûna neteweyekê bi temamî bi hebûna zimanê wê neteweyê ve dibestîne ku Umut Özkırmımlı radiguhêzîne me ku Herder jî dipirse û dibêje, "Gelo ji bo neteweyekê, tişteki jî zimên hêjatir û giranbihatir heye ku ji bavûkalê wê maye jê re? Di nava zimên de, hemû nerît û kelepûr, dîrok, ol û rêgezên hebûniyê dijîn; ziman dil û gîyan e."¹⁶ Destpêkeke bi vî rengî berê me dide sedema avabûnê, yanî zimanê ku bi pêkanînen asîmîlasyonîst di wê qonaxê de negihîştiye bext û armanca xwe. Loma jî nivîsar bi hevoka "Bi rastî, (...) di gelek waran de gihane pêkhanîna armanca xwe" balê dibe ser pêkanînen û qonaxa ku polîtîkayên asîmîlasyonê gihîştiye û rewşa mirovê Kurd datîne rastê ku zimanê wî di hemû aliyên 'qada giştî' de hatiye qedexekirin. Û pê re jî, bi ranêzikiyeke navxweyî, bi gotinên, "...bi rastî em îro bi zarokên xwe re bi Kurdî deng nekin, Kurdî zimanekî yê xwe nebînin..." bala me dibe ser 'meşrûbûna zimanekî qanûnî' ku Kurdî ne ew ziman e û divê bi awayekî navxweyî di nava Kurdan de wekî zimanekî meşrû yê xwezayî û heq bê dîtin û li ser vê yekê girîngî pê were dayîn. Loma jî ev ranêzikî, di hevoka dawî de bi gotinên, "Divêt em zimanê xwe, mîna xwîna jiyanê, ya di reh û damarên xwe de, di jiyana xwe de bi kar bînin û bidin pêş" helwêsteke xwebûniyê dide nîşan ku digel gotina

14 Di hejmara 13emîn ya kovara *Rewşenê* de, nivîsa danasîna bajaran ya bi navê 'Niştimana Xwe Binase' cî negirtiye.

15 Rewşen (1992) hb. hej. 1

16 Özkırmımlı Umut (1999) Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış, Sarmal Yayınları, İstanbul, s, 15

Nigûgî Wa Thiong’o ya, “Ziman di xwebûniya min de pêbestînek e.”¹⁷ digihîje rengûawayê xwe yê esasî.

Digel vê helwêsta ku hemû awayên asîmîlasyonê û kartêka zimanekî dîtir ya li ser zimanê Kurdî, red û neyîn dike û berê xwe dide rê û rêbazên ji xelasbûna kartêkên asîmîlasyonê jî, nivîsara bi navê ‘BO ŞÊRÎN Û XWEŞKIRINA ZIMANÊ KURDÎ’ ku ji alî Xelîl BIRÎNÎ ve hatiye nivîsîn. Nivîs balê dibe ser çend tîpên elfabeyê û bi palderiya ku Kurdî zimanekî ji malbata Hîndî-Ewropî ye û di zimanên Hîndî-Ewropî de tîpa ‘î’ ya bi kumik nîn e û digel çend pêşniyazên xwe, bi gotina “Pêşnêrîna min ev e: 1) Tîpa(î), (i) bila mîna elfabe Tirkî be.”¹⁸ pêşniyaza ‘wek Tirkîkirin’ a tîpên ‘î û î’ yê dike. Ranêzikiyêke bi vî rengî, bi giştî helwêsta Hawarê û bi taybetî ya C. A. Bedirxan datîne aliyekî. Digel wê jî, gava em bala xwe didinê, em dibînin ku ji nivîsarên hemû hejmarên kovara *Rewşenê* xuya ye ku *Rewşenê* bi awayekî giştî elfabe û gramera ku Celadet daniye, li xwe kiriye rêber. Û di heman demê de, pêşniyazêke bi vî rengî, yek ji armanca sereke ya pêkanînên asîmîlasyonîst ya ‘wekxwekirin’ê ye. Digel vê jî, nivîsara bi navê “DIVÊ EM XWE JI ALFABETÎZEBÛNA TIRKÎ XELAS BIKIN” ku ji alî S. RÊVÎNG ve hatiye nivîsîn, piştî ku ji gelek aliyên ve behsa taybetiyên zimanê Kurdî (û bi taybetî Kurmanciya jorîn) dike, bi gotina “Lewra sedem çî bin bila bibin, di wê alfabe a rastnivîsandine de, cudayî û problem derketine pêşiya me.”¹⁹ arîşeyên heyî qebûl dike, li ser gelemşeyên heyî disekine û di pêdeçûna nivîsara xwe de li dijî pêşniyaza bikaranîna tîpên ‘î û î’ yê ya wekî ‘î û î’ ya Tirkî radişe û dibêje,

“...kesên ku bi tenê tîpên î-i yê Celadet Bedirxanî diguherin û bi awayên î-i dinivîsînin jî, ji vî karê xwe re, bi ya min sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş: “*Hêsantir e*” Çima? “*Çunkî nêzî alfabeya Tirkî ye û piraniya Kurdan li Kurdistana Tirkîyê dijîn.*”²⁰

Nivîsar, palder û angaşta ku wekî ‘*hêsantir e*’ tê kirin, bi awayekî ne rast û durist û ne di cî de qebûl dike ku bi gotina ‘sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş’ nanakirina xwe qayîm dike û di dawiya nivîsara xwe de, bi gotina “Alfabeya Bedirxanî hem ji aliyê dengên Kurdî, hem ji aliyê şiklên tîpan ve ji bo nivîsandinê bersiva xusûsiyetên zimanê me dide. Pêwîstiya guhertina wê alfabe niha tune.”²¹ li ser helwêsta dij-asîmîlasyonîst û dij-wekxwekirinê ya Hawarê dimîne û piştgirî bi rêbaza dij-asîmîlasyonîst dike ku di heman demê de, govaniya serdestiyê ya ku Fanon diyar kiriye û dibêje, “Çanda ku di statuya serdestiyê de

17 Thiong’o Wa Nigûgî (2017) *Zihni Sömürgeden Azad* (Afrika Edebiyatında Dil Politikası), (Çev. Şebnem Mantu), Hece Yayınları, Ankara, s, 43

18 Rewşen (1992) hb. hej, 2

19 Rewşen (1992) hb. hej, 6

20 Rewşen (1992) hb. hej, 6

21 Rewşen (1992) hb. hej, 6

hatiye westarkirin, (...) li dijî mirovên xwe govaniyê dike.”²² bi wê de dike û pê re jî, di ser zimên re zanava neteweyî destnîşan dike ku ji alî C. A. Bedirxan ve bi rêya ziman û bi danîna elfabeke cuda hîma wê hatiye danîn; û bi helwêsteke ku ‘jihevcihêtiya zanavan’ diparêze û digel destnîşankirina “Zanav, derbar hebûniya me ya polîtîk ya xwedî dorhêleke berfireh de ye; hevyeke û jihevcihêti, jêbûnî û xweserî, ewlehî û azadî, pişkî û gerdûnî tê de cî bi cî dibin.”²³ bi ‘jihevcihêkirina’ elfabeya zimanê xwe ya ji elfabeya zimanê serdestê xwe, helwêsta xwe ya dij-asîmilasyonîst datîne rastê; û di heman demê de, bi pûçkirin û qebûlnekirina gotina ‘*hêsantir e*’ jî, ‘durehî’ ya negatîf ku bi awayekî bêhişberî di giyanê mirovê marastî de pêk tê jî, ji helwêsta xwe dûr dike.

2. Ziman

2.1. Ranêzikiyên Zimanî di Kovara Rewşenê de

Kovara *Rewşenê*, hê di hejmara yekem de ranêzikiya xwe ya zimanî dide der û hem bi elfabe û awayê zimanê ku di nivîsara sergotariyê de hatiye bikaranîn hem jî bi nivîsa bi navê ‘DERSÊN ZIMANÊ KURDÎ’ ku ji alî FARQÎNÎ ve hatiye amadekirin, bi me dide nîşan ku ew ê di periyod û qonaxa weşana xwe de li ser elfabe û gramera C. A. Bedirxan bimîne. Ji bo vê yekê jî, gava em bala xwe didin nivîsa FARQÎNÎ ya li ser dersên Kurmancî, em dibînin ku hem ji alî denganî hem jî ji alî tîpan ve yek bi yek jêgirtina elfabeya C. A. Bedirxan e. Digel vê yekê jî, FARQÎNÎ, di dersên zimanê Kurdî de, bi mînakdayîna “A-drêj e: al (bayrak), afir (yemlik), agir (ateş), av (su...)”²⁴ bergînda Tirkî ya peyvên Kurdî li beranberî tîpan û peyvên dinivîse. Em ji ber vê awayê amadekirina dersên zimanê Kurdî, dikarin destnîşan bikin û bêjin; 1) dema ku C. A. Bedirxan elfabe amade kiriye û ji bo danzanîna dengên tîpan peyv li beranberî wan nivîsiye, pêwîstî pê nedîtiye ku bi zimanekî dîtir (bi taybetî bi zimanê neteweyekê ku serdestî Kurdan e) rave bike û wateya wan binivîse, 2) lê belê, FARQÎNÎ pêwîstî pê dîtiye ku wateya Tirkî ya peyvên Kurdî li beranberî wan binivîse; ji ber ku di dema derçûna *Rewşenê* de, Kurdî êdî bi tevayî ketibûn ber çerxa asîmilasyonê û Kurdî jî êdî li bajaran ne zimanê yekem bû; û digel vê yekê jî, wê hingê tenê nexwendeyên Kurd dikaribûn xweşîkî bi Kurdî biaxivin û herçî xwendeyên Kurd yê wê hingê bûn; ji ber ku ew di dibistanan de bi Tirkî hatibûn perwerdekirin û êdî zimanê wan yê fikirîna li ser zanist û agahiyê bi Tirkî bû, her çend karibûn bi Kurdî biaxivin jî, pêwîstî pê didîtin ku di ser zimanê Tirkî re dengên Kurdî û tîpên ku beranberî wan dangan

22 Fanon Frantz (1967) *Toward the African Revolution, (Racism and Culture)*, (Wer bo îng. H. Chevailler), Pelican, London, p, 44

23 Mollaer Fîrat, (2018) *Kimlik, Tanınma Mücadelesi ve Şarkıyatçılık*, Metis Yayınları, İstanbul, s, 31

24 *Rewşen* (1992) hb. hej, 1

tên, nas bikin. Loma jî, rêbaza ku FARQÎNÎ di vî warî de pêk aniye, tevî ku di hînkirina zimanan de rêbazeke zanistî ye û di hînkirina zimanê dayikê de hinekî absurd û eletewş xuyanî dibe jî, rêbaza ku hatiye bikaranîn ji aliyekî din ya taybet ve rasterast berê me dide 'durehiya bi hişberî'ya ku "demajoya berevajîkirina neyînkirina fermî."²⁵ dide destpêkirin û bi vê destpêkê ve jî, ev rêbaz; zimanê duyem, - yanî zimanê serdestan-, yê ku bi lêsepandina qanûnî hatiye meşrûkirin, ji ciyê wî dişiqitîne; pê re jî jihevcihêbûna her du zimanan datîne rastê û durehiya ku bi vî awayî tê rûniştandin hem "...daxwazên narsistîk û lasayîker ên hêza serdest li hejê dixe."²⁶ û hem jî zimanê bindestan yê qedexekirî di ser zimanê serdestan re dike xwedî meşrûbûneke xwezayî û jiyani.

Digel vê jî, kovara *Rewşenê*, di du hejmarên dîtir de nivîsarên bi navê, 'Di Kurmancî de Tewandina Navan'²⁷, 'Di Kurmancî de Çewt Bikaranîn an ji Ziman Avêtina hin Daçekan'²⁸, ku ji alî Felat dilgeş ve hatine amadekirin û taybetiyên gramerî yê Kurdiya Kurmancî rave û şîrove dikin û zincîrenivîsên Feqî Huseyn Sağrıç ya bi navê 'Zman, Zman û Rastnivîs'²⁹ û pê re jî di her hejmara xwe de ferhengokeke bi du zimanî (Kurmanciya jorîn û Tirkî) belav dike û hem di biwara perwerdehiya Kurdî ya di ser peyvên re hem jî di biwara hevrûkirina du zimanan de keys û derfetê derpêşî xwendevanên xwe dike da ku karibin li zimanê xwe yî ku bi kartêka pêkanînen asîmîlasyonîst jê dûr ketine, vegerin.

2.2. Mînakên ji Ranêzikiya Zimanî di Kovara *Rewşenê* de

Digel ku bi du zimanî weşiyaye jî, di kovara *Rewşenê* de hejmareke zêde ji nivîsarên bi Kurdiya Kurmancî ku hêjayî gotinê ye, weşiyane. Ji bo ku em karibin ranêzikiyên zimanî ya di kovara *Rewşenê* de xweşikî daynin rastê; bibînin û pê bizanin ka reng û awayê Kurmanciya ku di kovara *Rewşenê* de weşiyaye, çi ye û çawa ye, em ê bala xwe bibin ser çend mînakên.

Ji nivîsara bi navê 'Dîroka Wêjeya Kurdî'

"Mîrov dikare wêjeya Kurdî li du beşan pareve bike. Yek jê nivîsarî, yê din jî zargotinî ye. Mixabin ku piraniya berhem û helbestên zargotinî hunda bûne, an jî derheqa wan di dest de zêde agahdarî nîn e. Bi gelemperî mirov dikare bibêje ku wêjeya Kurdî, bi du zaravên Kurdî hatine nivîsandin."³⁰

Zimanê nivîsarê, ew ziman e ku li ser zimanê pêaxaftinê ya ku di kovara *Rojî Kurd* û *Jînê* de saz bûbû û di *Hawarê* de gihîştibû standardiya xwe ya giştî. Her

25 Bhabha Homi K. (2016) Kültürel Konumlanış, (Çev. Tahir Uluç), İnsan Yayınları, İstanbul, s, 219

26 Bhabha, hb. s, 223

27 Rewşen (1992) hb. hej, 3

28 Rewşen (1992) hb. hej, 4

29 Rewşen (1992) hb. hej, 4

30 Şefîq M. (1992) 'Dîroka Wêjeya Kurdî', Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 3, Nîsan-Gulan, r, 21

wiha, ji alî bikaranîna paşdaçekên bazinedaçekan ve jî nivîsar li ser xeta *Hawarê* ye ku li şûna awayê bikaranîna 'di...da' ya *Rojî Kurd* û *Jînê* ku li ser zimanê pêaxaftinê û folklorîk e, bazinedaçekên 'di...de' hatiye tercîhkirin.

Ji nivîsara bi navê 'Çarşem'

"Ew roja ku jêra "Roja bê bereket" dıgotın, ew çı roje û çra bê berekete? Ew roja ku jêra "Roja bê oxır" dıgotın, ew çı roje û çra bê oxire? Ew roja ku seydayên medresan ji suxtên (telebên) xwera "Roja çarşemê dest bı sey û pirtûkên nû bıkın da zû bıqedın. Jı ber bê bereketiya wê rojê, sey û pirtûk kurt dıbın û mrov zû jı wan dıfılite" dıgotın"³¹

Di vê nivîsarê de, serê pêşîn bala me diçe ser elfabeya ku ji elfabeya C. A. Bedirxan cuda û wekî elfabeya Latînî ya Tirkî hatiye bikaranîn. Lê digel wê jî, tîpên bi kumik wekî qaydeya ku Celadet daniye, hatine nivîsîn. Digel wê jî, hin peyvên ku ji *Hawarê* û şûnde awayê wan ên nivîskî wekî standard hatine qebûlkirin, cuda hatine nivîsîn. Wekî mînak, peyva 'çira' wekî 'çra', peyva 'mirov' wekî 'mrov' hatiye nivîsîn. Em ji vê nivîsê û nivîsên din yên F. Huseyn Sağniç tê digihîjin ku ew nivîsên xwe elfabe û rastnivîseke taybet daniye û bi wî awayî dinivîse. Loma jî, em ê nikaribin nivîsên Sağniç wekî mînak hildin û bêjin, qebûla kovara *Rewşenê* li ser vê yekê heye û loma jî van nivîsan wisa diweşîne. Belkî em karibin bêjin, ev yek nîşaneyê qebûla fikrên cuda ya kovara *Rewşenê* ye ku her wekî di hejmarê kovarê ya yekem û di nivîsa sergotariyê de hatiye gotin, "Kovara me platforma gotubêj û gengîşiyana e."³²

Ji nivîsara bi navê 'Veşîna Teralekî'

"Çavên xwe ji xewê vekir. Serê wî lê giran bûbû. Bi giranî her du destên xwe bir serê xwe di nav destên xwe de guvaşt. Serê wî jan dikir, westiyabû. Nikaribû li ser kêleka xwe vegere. Çavên wî ji delavê xwînê, ji ber şevê tirs û xof derbazdibûn, sor dibûn. Çend şev û rojan ji nav ciyê xwe derneketibû. Bi destên xwe çavên xwe paqij dikir."³³

Nivîsa ku wekî çîrokeke honaksazî hatiye weşandin, bi zimanekî pêaxaftinê lê belê sererastkirî hatiye nivîsîn. Gava em bala xwe didin ser hevokan, em dibînin ku di vegotinê de hevokên kurt hatine nivîsîn û herçî awayê nivîsîn û zimên e, bi temamî li ser xeta C. A. Bedirxan e ku em dikarin bêjin, êdî ji vê hejmarê û şûnde kovara *Rewşenê* gihîştîye reng û awayê standard yê Kurdiya Kurmancî ku di roja îroyîn de jî Kurmancî bi heman awayî tê nivîsîn.

31 Sağniç F. Huseyn (1994) ÇARŞEM, Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 12, Sibata, r, 41

32 Rewşen (1992) hb. hej, 1

33 Eksen Berçem (1994) 'Veşîna Teralekî', Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 18-19, Berfanbar, r, 18

2.3. Ranêzikî û Hewldana Fêrgehênê ya di Kovara Rewşenê de

Di nivîsa sergotariyê ya kovara *Rewşenê* de, bi taybetî bal tê kişandin û tê gotin, “Zanîn îro hin bêhtir ji bo me Kurdan pêwîst e.”³⁴ Ev balpêdan, rasterast fikrên wekî, em ji zanîne bêpar mane, an jî me nekariye zanîn bi kêrî xwe bînin û fikrên wekî wê tîne bîra mirov ku; gava em ji berevajiyê ve difikirin em ê hay jê dibin ku armanca vê gotinê peyamek e ku dixwaze bêje, kovara *Rewşenê* ji bo peydekirin û belavkirina vê zanîne li ber destê we ye. Û ev zanîn, dê ne yekalî be û di ser rêbaza perwerdehiya giştî re bê belavkirin.

Pergala perwerdehiya K.T.yê ku li ser ‘yekzimanî’ ye û tenê encama asîmîlasyonê dide û bêyî daxwaz û tercîha wan, mirovan ‘durehî’ û li xwe neban dike, di 24ê Îlona 1925an de bi Plana Îslehkirina Şerqê hat danîn ku “...di meclîsê de hat qebûlkirin û çî kesê ku ji bilî Tirkî bi zimanekî din xeber dida, ceza lê dibirî.”³⁵ Û bi vî awayî bêyî ku navê Kurdî were hildan, Kurdî hat nexuyakirin û bi awayekî filî hat qedexe û derbendkirin. Vê qanûnê, tenê zimanê Tirkî kir zimanê qanûnî û zimanê komên etnik ên din jî qedexe kir; û wekî encama vê pêkanîne, ‘yekzimanî’yekê saz kir. Û vê pergala yekzimanîyê, ‘yekagahî’yê jî bi xwe re anî û her mirovê ku di nav sînorê K.T.yê de li jiyanê xweş bû, tenê dikaribû bi rêya zimanê Tirkî bibe xwedî zanîn û agahî. Loma jî, Kurdên ku piştî girêdana peymanê Lozanê di nav sînorê K.T.yê de mabûn, ketibûn ber bayê vê çerxa asîmîlasyonê û -her çend, piştî sala 1970yî pey der pey hejmareke hindik be jî pirtûkên bi Kurdî weşiyabûn û kovara *Tîrêjê* jî di sala 1979an de derçûbû jî-, qedexekirina heyî tu carî ji şidiyayîbûna xwe neketibû û du nişên ku heta sala 1980yî kêmkirî zêde li bajaran bi Kurdî diaxivîn û li ber pêkanînen asîmîlasyonîst li ber xwe dabûn, zêde keys û derfet nedîtibûn ku zanîn û agahiya ku di ser Tirkî re peyde dibû biqulîbînin ser Kurdî û wê agahiyê di zimanê xwe de belav bikin.

Demajoya perwerdehiya ku bi vê pêkanîne û sepandinê dest pê dike, pey der pey berê xwe dide qonaxa avabûna zanaveke çandî a li ser nîrx û zimanê serdest ku bi xwendin û şuştina hiş û mêjiyê mirovê din û bi pûçkirina çanda wî a xwecihî dest pê dike. Navê vê demajoyê asîmîlasyon e ku takekesê di fêrgehan de bi perwerdehiyê yekzimanî zimanê qanûnî û serdest hîn dibe, “xwe bi tiştên ku hîn dibe re dike yek.”³⁶ Ev xweyekkirin, di heman demê de, di asta zanîn û agahiyê de jî pêk tê. Loma jî, kovara *Rewşenê* bi vê hayjêbûnê di sergotariyê de dibêje, “Em dixwazin eniyê zanişt-çand û hunerê çêbikin.”³⁷ Û ji bo zimanê vê eniyê jî, zimanê Kurdî tê hilbijartin û danîn. Ev awa hilbijartin û arastekirin, ji

34 Rewşen (1992) hb. hej, 1

35 Akçura Belma (2009) Devletin Kürt Filmi, 1925-2009, Kürt Raporları, New Age Yayınları, İstanbul, s, 56

36 Zehar Renat (1999) Sömürgecilik ve Yabancılaşma, (Çev. Bayram Doktor), İnsan Yayınları, İstanbul, s, 27

37 Rewşen (1992) hb. hej, 1

destpêka xwe ve helwêsteke dij-asîmîlasyonîst e; yanî di asteke ramanî de amade ye ku demajoyê berevajî bike. Ev ranêzîkî, wekî bivênevêtiyekê, barê vê eniyê li ser milê rewşenbîran dike û dibêje, “Rewşenbîr li pêşberî gelê xwe berpirsiyar e. (...) Divê rewşenbîr van tiştan bînin ber çavên xwe û bi hêza xwe ve van astengan ji holê rakin.”³⁸ Û xuya ye ku ‘Rewşenbîr’, di naveroka vê ranêzîkiyê de, wekî xwendeyên neteweyekê, bi taybetî hatine hilbijartin; ji ber ku dikarin di nav zimanan de pêwendîyan daynin, zanîn û agahiyan ji zimanekî derbasî zimanekî dîtir bikin û bi vî awayî jî bi rola ‘çalakger û aktîvîstên fêrgehî’ rabin û di biwara zanîn, agahî û hunerê de nûnertiya gelê xwe bikin.

Di hewldan û ranêzikiya kovara *Rewşenê* de, daxwaza lêvegerandina tiştê ku bi qasî heştê salan ji dest çûye û Kurd pê kar nekirine, heye. Ev daxwaz di heman demê de daxwaza ‘vegerîna li zimanê xwe’ ye jî. Loma jî, kovara *Rewşenê* hay jê heye ku; tiştê li Kurdan û zimanê Kurdî hatî qewimandin, ne ji ber ‘şemirandina’ wan e ku her wekî Thiong’o radiguhêzîne me ku Chinua Achebe dibêje, “Gelo gava mirovekî ji bo zimanê mirovekî dîtir zimanê xwe bişemirîne, ev yek rast e?”³⁹ Lê belê, tiştê li Kurdan hatî qewimandin, ‘lêsepandin û lêferzkirina şemirandina zimanê xwe’ ye. Û ev yek jî bi rêbazên wekî ‘yekzimanî’ û ‘yekagahî’ yê hatiye pêkanîn. Ji ber hindê ye ku kovara *Rewşenê*, bi hewldan û ranêzikiyeke fêrgehî radibe û nivîsên ku di nav rûpelên kovarê de belav bûne her yek ji hêlekê û ji dîsîplînekê ve bal û hêza xwe dide ku tiştê lê hatî qewimandin pûç û bêbandor bike û dibêje, “...eger em (...) bi ramiyarî û çandî (...) bisekinin, pêwîst e em zimanê xwe jî biparêzin.”⁴⁰ Û parastina zimên li xwe dike armanca pêşî û sereke û bi nivîsareke wergerê, agahiya zanistî ya li ser kok û bingeha zimanê Kurdî; “Cara yekê, destnivîsa Avista ji aliyê Fransizekî ve ku navê wî Anquetil Duperron e, ji Hindistanê, di sala 1762 de hate Ewrûpa û wergerandina wê di sala 1771 de hate belav kirin.”⁴¹ belav dike û dîsa bi nivîsareke wergerê ya bi navê, ‘Wêje bi Farisiya Navîn’ ku dibêje, “Li gor girêkiyan, gelek deq ji **Avista** hatine girtin. Ev deqin wergerîne Farisiya Navîn, paşê bi ser ve zêde bûn û bûn pirtûk.”⁴² Agahiyeke zanistî belav dike ku zimanê Avestayê pêşî li Farisiya kevn hatiye wergerandin. Digel vê jî, ji alî dîrok û dîroka çandê ve jî berê xwe dide zanist û agahiya ku bi qedexekirinê ji Kurdan hatiye veşartin ku di nivasara bi navê “ROJJIMÊR (SAL-NAME)” de tê belavkirin û tê gotin “Ji Kasîtan heta Medan, hezar û sed û çil û heft (1147) sal derbas bûye. Ji Medan vir de jî, **rojijimêr** bi gelemperî dom dike”⁴³ Û bal pê dayîn ku ji dema Medan ve ku bavûkalên Kurdan in, salname û ‘rojijimêr’

38 Rewşen (1992) hb. hej, 1

39 Thiong’o, hb. 31

40 Rewşen (1992) hb. hej, 1

41 Rewşen (1992) hb. hej, 3

42 Rewşen (1992) hb. hej, 8

43 Rewşen (1993) hb. hej, 9

heye. Pê re jî bi agahiya, “Kurd ji berê de, bircan nas dikin. (...) Rojijimêra Kurdî ya berê (b.z.) heyvî, lê rojijimêra îro ya rojê ye” tê diyarkirin ku rojijimêra taybet ya Kurdan hebûye ku wan ew salname li ser jimêra heyvê daniye bi kar aniyê. Di nivîsa bi navê “Konevaniya Bişaftinê ya li ser Kurdan”⁴⁴ de jî li ser zanîna ku hatiye veşartin û agahî tê dayîn ka Kurdî kengê û bi çi awayî hatiye qedexekirin û pêkanînên K.T.yê, yên her cure, -aborî, siyasî, çandî û zimanî- Kurd dane ber çerxa asîmilasyonê. Û digel çend nivîsên bi vî rengî, zîncîrenivîsa ku bi navê ‘Niştimanê Xwe Binase’, -ji bilî hejmara 13emîn- di hemû hejmaran de belav dibe, wekî beşa cografya û etnografyaya fêrgehekê zanîn û agahiya li ser ax û warê ku Kurd lê dijîn, radigihîne Kurdan. Û bi nivîsarên li ser çandê ku bi giştî li ser zanîn û agahiya folklorê Kurdan disekine û hê di hejmara yekem de bi nivîsa ‘FOLKLOR’, bi gotina, “...ku nîrxên gel ên folklorîkî ji mirovnê Kurd û axa ku ew li ser hatine afrandin dîrdixin, bênasname dikin û bikartînin...”⁴⁵ tê ragihandin ku pêkanîn û polîtîkayên asîmilasyonîst di heman demê de mirovê bindest yê marastî jî çand û nîrxên wî yên folklorî jî dîrdixe û wekî encama vê yekê ku Said jî dibêje, “Sedema esasî a jihevparvebûna komên etnîk ew e ku; çand kan û jêderkeke zanavê ye.”⁴⁶ Kurd jî zanava xwe ya etnîk û neteweyî dîrdikevin. Digel nivîsara navborî, hejmarek nivîsarên din jî tê weşandin di kovara *Rewşenê* de ku balê dibe ser pêkanînên li ser biwara folklorê hatiye meşandin. Herçî biwara zimên e, ji hejmara yekem û şûnde, hem bi weşana sê zaravayîbûna xwe ve hem bi nivîsarên ku li ser dersdayîn û hînkirina gramera Kurdiya Kurmancî bela dibe û hem jî bi beşa ferhenga Kurdî-Tirkî ku hînkirina Kurdiya Kurmancî li xwe dike armanc, kovara *Rewşenê* bi roleke wekî fêrgeha zimên radibe.

Digel ranêzikiyên di biwara zimên de, kovara *Rewşenê* di biwara wêjeyê de rûpelên xwe wekî şûngeheke fêrgehî saz kiriye û bala xwendevanên xwe biriye ser borîroj, do û îroja wêjeya Kurdî û nivîsar di biwara wêjeyê de weşandine.

3. Wêje

3.1. Ranêzikiyên Wêjeyî ya di Kovara *Rewşenê* de

Her çend di sergotariya hejmara yekem a Kovara *Rewşenê* de behs jê nayê kirin ka kovar di biwara wêjeyê de xebat û çalakiyeke çawa datîne pêş xwe jî, di hejmara duyemîn de em rastî hejmarek nivîsaran tên ku li ser dîroka wêjeya Kurdî û li ser şair û wêjekarên Kurdiya Kurmancî sekinîne. Nivîsara bi navê ‘Şairên Kurd û Cûrên Helbestan’, bi gotina “Di her demê de, ji Kurdan pir şair (hozan-biwêj) rabûne...”⁴⁷ çespendineke pêşekî dike û pê re jî bi destnîşankirinekê li ser naverok û awayê helbestên klasîk, bi gotinên,

44 Rewşen (1994) hb. hej, 16-17

45 Rewşen (1992) hb. hej, 1

46 Said Edward (1998) *Kültür ve Emperyalizm*, (Çev. Necmiye Alpay), Hil Yayınları, İstanbul, s, 14

47 Rewşen (1992) hb. hej, 2

“Eliyê Herîrî, gelek helbestên dilsoj û hêja nivîsiye. Feqiyê Teyran jî, Qewlê Hespên Reş û Destana Şêxê Senaniyan nivîsîne. Mele Ehmedê Batê (1414-1495) mewluda kurmançî nivîsiye. Mele Ehmedê Cizîrî jî, dîwana xwe ya şahane ji wêjeya gelê Kurd re pêşkêş kiriye... Gava ku hezretî Xanî (Ehmedê Xanî 1651-1707) dest bi wêjeya netewî dike...”⁴⁸

Nivîsar, di naveroka xwe de bi giştî destnîşanê dike li ser dîroka wêjeya Kurdiya Kurmançî. Nivîsê ne tenê destnîşanê dike, di heman demê de, wekî nivîsa destpêkî ya kovarê ya di vê mijarê de, bi hewldaneke fêrgehî û hînkirinê radibe ku peyta Hroch ya ku dibêje, “...neteweyên biçûk, di zimanê xwe yî wêjeyî de jî ne xwedî kelepuşkê ne ku karibin seraqetiyê di berhênanên çandî de pêk bînin.”⁴⁹ jî bi vê nivîsarê û bi nivîsare bi navê ‘Dîroka Wêjeya Kurdî’⁵⁰ re, di çarçoveya neteweya Kurd de pûç dibe û nivîsar, bi vî awayê xwe ve hebûna wêjeyêke klasîk digihîjîne şûngeha zanava neteweyî ku kakileke stewardî ye. Di heman hejmarê de, nivîsa bi navê ‘CIGERXWÎN’, bi giştî ser şairiya Cegerxwîn disekine û bi gotina, “Cîgerxwîn di ware toreyê de deryayeke zanistê bû, zimanê Kurdmançî li ser lêvên wî dihat senakirin li gel pênuşê wilo baxek li deştê bi her û şorên renga reng avdikir û derî ji gel re vedikir ku her kes here bêna xwe pê veke.”⁵¹ bi temamî hewlê dide da ku bide nîşan ‘kelepûra wêjeya Kurdî stewiyayî ye.’ Cegerxwîn ew şa’îr bû ku dengê peyvê yê ji bo pîvera arûzê û ahenga ş’ira klasîk di helbesta xwe de şikandibû û dengê ş’ir û helbestê û ahenga hêma û wateyê bi hev gihandibû. Hewldaneke bi vî rengî ku di ser Cegerxwîn re tê dayîn, bi gotina ‘deryayeke zanistê bû’ bale dibe ser agahiya di naveroka helbesta modern de heyî û bi gotina, ‘zimanê Kurdmançî li ser lêvên wî dihat senakirin’ jî hebûnî û zanava zimanî ku di wêjeya neteweyekê de xuyanî dike. Digel vê yekê jî, hevpeyvînek digel Osman Sebrî tê kirin ku wê hingê O. Sebrî hê li jiyana xweş e û wekî ku J. Assman radiguhêzîne me û dibêje, “Nivîskarekî Misrî dibêje, ‘Neteweyekê bes dikare bi jiyandina borîroja xwe bijî.’”⁵² kelepuşkê û borîroja wêjeya Kurdî bi hebûna nivîskarekî ku ji borîrojê tê, car din tê jiyandin. Dîsa çîroka bi navê ‘APÊ HISO’⁵³ çîroka yekem a honaksaziya modern e ku bi şewaza vegotina modern hatiye nivîsîn û di kovara *Rewşenê* de hatiye weşandin. Her wiha, helbestên bi navê “‘PEVÇÛN’ û ‘EZIM’”⁵⁴, ji alî bikaranîna dengê peyvên ya ji bo dengê helbestê û ahenga hêmayê û ji alî naveroka helbestê ve yekem mînakên ji helbestên modern in ku di kovara *Rewşenê* de weşiyane. Her çî qas em di her du helbestan de jî rastî beşavend û ahenga di rengê forma

48 Rewşen (1992) hb. hej, 2

49 Hroch Miroslav (2011) Avrupa’da Milli Uyanış, (Toplumsal Koşulların ve Toplulukların Karşılaştırmalı Analizi), (Çev. Ayşe Özdemir), İletişim Yayınları, İstanbul, s, 30

50 Rewşen (1992) hb. hej, 3

51 Rewşen (1992) hb. hej, 2

52 Assmann Jan (2018) Kültürel Bellek, (Çev. Ayşe Tekin), Ayrıntı Yayınları, İstanbul, s, 142

53 Rewşen (1992) hb. hej, 3

54 Rewşen (1992) hb. hej, 2

çarîn û dûrikan têtên jî, gava em bala xwe didin dengê helbestan; ne ji bo ahenga peyv û pîveran ku di şîra klasîk de heye, hatine sazîkirin, lê ji bo dengê hêma û naveroka helbestê hatine sazîkirin. Loma jî, dengê di zimên de heyî, ne di xizmetî pîvera arûzê de ye û xizmetî wî dengî nake ku helbestkar dixwaze saz bike; helbestkar di van helbestên xwe de, dengên di zimên de heyî, di helbestê de car din saz dikin û bi rêya sazîkirina metaforên zimanî û hêmayên wêjeyî wî dengî car din li zimên vedigerînin. Û helbestên weşiyayî, bi awayê xwe yê vegotinê, “Wextekê barbengê/Li lotika çiya/Bizrê gulên kesk û sor û zer/Zêvî fetiqandin/Mezin bûn, kulîlk dan/Û şax vedan li çar aliyên/Di ba de/Di bahozê de.”⁵⁵ ku di rengê vegêrana pevaxaftinê de ye û domdariyekê bo vegêranê saz dike, bi me didin nîşan ku; tevî ku di kovara *Rewşenê* de hejmareke hindik helbestên di reng û teşeya modern de hatine belavîkirin jî; û her çend “...zimanê hindikaniyan bi kelepûr û paşdemayînê ve tê biyekîkirin û wisa tê pênasekirin.”⁵⁶ jî, dê wêjeya Kurdiya Kurmancî, di hewldan û ranêzîkiya fêrgehî ya kovara *Rewşenê* de berê xwe bide siberojêke dîtir wêjeyî û zimanî; û li ser xet û paşxaneyê ku bi *Hawarê* dest pê kiriye û bi *Tîrêjê* domdarî daye xwe, bikude.

Encam

Di kovara *Rewşenê* de, ranêzîkiya bo ziman û zanava çandî tercîh û berpêbûneke yekem û sereke ye û ranêzîkiya wêjeyî jî di ser vê ranêzîkiya zimanî re ava dibe. Wêje, di politikaya weşanê ya kovarê de wekî berhema çand û zimanê neteweyekê tê dîtîn û qebûlîkirin ku dê di çarçoveya wêjeya neteweyî de li kar bikeve û bi rola xwe ya avakariyê rabe. Digel vê yekê jî, di helûmercên ku kovara *Rewşenê* diweşe de zêdetirî Kurdên xwendewar li bajaran dijîn û pêkanînen asimilasyonîst bi temamî li ser wan kar kiriye û zimanê wan ê zanî û agahiyê yê yekemîn zimanê Tirkî ye û di biwara lixwenebanbûnê de gihîştine ast û qonaxa jortirîn. Loma jî kovara *Rewşenê*, di van helûmercan de, bi ranêzîkiya xwe ya vejîyandinî û avakarî, ji warên din zêdetir giranî dide ser mijarên zimanî û bi nivîsarên ku bi taybetî li ser zanînen zimanê Kurdî ne û hewlê didin zimanê Kurdî hînî xwendevanên xwe bikin, dibe şûn û warekî fêrgehiyê û wekî encam; nîfşa duyem û nîfşa sêyem ya Kurdên di nav sînorê K.T.yê de dijîn, bi hev digihîne.⁵⁷ Ev bihevgihandina hanê, kartêkeke taybet dike di biwara çand û ziman û wêjeyê de. Û ev kartêk dibe sedem ku di fêrgehiya kovara *Rewşenê* de, ji her du nîfşan nîfşeke hevpar a taybet peyda bibe ku xwedî rengekî arizî xwe ye. Ev rengê arizî

55 Dilgerm Dara Azadî (1992) ‘PEVÇÛN’, Kovara *Rewşen*, Stenbol, hej, 2, Adar

56 Durgun, İ., (2014) *Ulus İnşası ve Milliyetçilik*, Binyıl Yayınevi, Ankara, s, 130

57 *Nîfşa duyem ya Kurdan ku di nav sînorê K.T.yê de dijîn û li bajaran bi Kurdî diaxivin, ew kes in ku di salên 1935-1965an de ji dayika xwe re çêbûne û li bajaran, zimanê rojane yê pêaxaftinê kêm zêde bi Kurdî ye. Nîfşa sêyem jî ew kes in ku di salên 1965-1990î de ji dayika xwe re çêbûne û li bajaran zimanê rojane yê pêaxaftinê hema bêje êdî ne bi Kurdî ye.*

xwe, bi taybetî di biwara zimên de xuyanî dibe ku; Kurdiya nivîskî, wekî qadeke hevpar, nêzikîrî yekrengî û standardiyê dibe û kovara *Rewşen* jî; ji bo vê yekê dibe wargeheke zimanî ku bi rola fêrgehiyê radibe.

ÇAVKANÎ

- Akçura, Belma, (2009) *Devletin Kürt Filmi, 1925-2009, Kürt Raporları*, New Age Yayınları, İstanbul
- Assmann, Jan (2018) *Kültürel Bellek*, (Çev. Ayşe Tekin), Ayrıntı Yayınları, İstanbul
- Bhabha, Homi, K. (2016) *Kültürel Konumlanış*, (Çev. Tahir Uluç), İnsan Yayınları, İstanbul
- Dilgerm, Dara Azadî (1992) *Pevçûn*, Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 2, Adar
- Durgun, İ., (2014) *Ulus İnşası ve Milliyetçilik*, Binyıl Yayınevi, Ankara
- Eksen, Berçem (1994) *Vejîna Teralekî*, Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 18-19, Berfanbar
- Fanon, Frantz (1967) *Toward the African Revolution, (Racism and Culture)*, (Wer bo îng. H. Chevailler), Pelican, London
- Hroch, Miroslav (2011) *Avrupa'da Milli Uyanış, (Toplumsal Koşulların ve Toplulukların Karşılaştırmalı Analizi)*, (Çev. Ayşe Özdemir), İletişim Yayınları, İstanbul
- Kubılay, Çağla (2004) *Türkiye'de Anadillere Yönelik Düzenlemeler ve Kamusal Alan, İletişim Araştırmaları Dergisi*, İstanbul, sayı 2, c, 2
- Lacan, Jacques (2013) *Psikanalizin Dört Temel Kavramı*, Metis Yayınları, İstanbul
- Mollaer, Fırat (2018) *Kimlik, Tanınma Mücadelesi ve Şarkıyatçılık*, Metis Yayınları, İstanbul
- Özkırımlı, Umut (1999) *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış*, Sarmal Yayınları, İstanbul
- Rewşen (1992-1996) *Kovara Çandî, Hunerî, Wêjeyî*, MKM (NÇM), Stenbol, Metinler Matbbacılık, hej, 1-2-3-4-6-8-9-14-15-16-17-20-21
- Sağnıç, F. Huseyn (1994) *Çarşem*, Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 12, Sibat
- Said, Edward (1998) *Kültür ve Emperyalizm*, (Çev. Necmiye Alpay), Hil Yayınları, İstanbul
- Şefîq, M., (1992) *'Dîroka Wêjeya Kurdî'*, Kovara Rewşen, Stenbol, hej, 3, Nîsan-Gulan
- Thiong'o, Wa Nigûgî (2017) *Zihni Sömürgeden Azad (Afrika Edebiyatında Dil Politikası)*, (Çev. Şebnem Mantu), Hece Yayınları, Ankara
- Zehar, Renat (1999) *Sömürgecilik ve Yabancılaşma*, (Çev. Bayram Doktor), İnsan Yayınları, İstanbul

e-mail: dilaverdoger@gmail.com

KURTENÊRÎNEK LI TÊGEHÊN EDEBİYATA DINYAYÊ, EDEBİYATA BERAWIRDÎ Û NÊRÎNÊN DAVID DAMROSCH

Türkan TOSUN¹

Kurte

Edebiyat zanistekê dewlemend e, ji ber hin hewcedariyan bi têgeh û binbeşên nû ve di nav demê de qada xwe fireh kiriye. Di vê nivîsê de wê behsa du têgehên edebiyatê yên ku wek zanist li cihanê êdî bi nav û deng in bê kirin; edebiyata berawirdî û edebiyata dinyayê. Di vê gotarê de li ser wate, dîrok û naveroka her du tégahan wê bê sekinandin. Pişt re nivîskar û teorîsyen David Damroschê amerîkî hat nasandin, xebat, nêrîn û fikrên wî yên di vê qadê de hatin nirxandin. Armanc di edebiyata kurdî de balkişandina li ser van mijaran e. Ji bilî vê, xebatên David Damrosch çawa dikare rê nîşanî me bide û em çawa dikarin ji wan sûd werbigrin jî xaleke din a vê gotarê ye.

Bêjeyên sereke: Edebiyata Berawirdî, Edebiyata Dinyayê, David Damrosch, Werger

Abstract

Literature is a rich science and has expanded its scope with new terms and sub-branches overtime due to necessities. In this article two literature terms, that are established as important terms in the world, comparative literature and world literature is mentioned.

The study firstly focuses on meanings of these terms, their contents and history. Then American writer and theorist David Damrosch is introduced, his studies and ideas in this field is evaluated. The article aims to draw attention to this issue in Kurdish literature. In addition, to show how David Damrosch's work can guide us and how we can benefit from them is another goal.

Key words: Comparative Literature , World Literature, David Damrosch, Translation

1 Xwendekara Doktorayê, Zanîngeha Bingöl/Mûşê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî,
e-mail:tosunturkan@gmail.com

Destpêk

Di sedsala 19emîn de li cihanê çawa ku di gelek qadan de fikr û nêrînên cuda dest pê kirin, di edebiyatê de jî rêbaz, perspektîf û dîsîplînên nû derketin holê. Têgehên edebiyata dinyayê û edebiyata berawirdî jî di vê sedsalê de navên xwe dane bihîstin. Edebiyata berawirdî wek sîstemeke rexneyê û dîsîplîneke akademîk gav avête qadê û ji hêla rexnegir, helbestvan û nivîskaran ve hat pêşvebirin.

Bi frensî *littérature comparée*, almanî *vergleichende literatur* û îngilizî *comparative literature* yanê edebiyata berawirdî ji wê demê pê de her ku diçe qada xwe fireh dike û geş dibe. Di bingeha edebiyata berawirdî de fikra Johann Wolfgang von Goethe (1749-1832) ya “Weltliteratur” yanê edebiyata dinyayê heye (Aytaç, 2013:11). Her du têgehên wê behsa wan bê kirin bi hev re têkildar in. Ji ber ku di teoriyên edebiyatê de guherîn çêdibin, rêbazên nû tên lêkolînkirin ev qad jî bêtir xurt dibin. Lê mixabin di edebiyata kurdî de ev têgeh bi têra xwe nayên zanîn û xebatên li ser wan jî pir kêman in.

Di vê gotarê de têgehên edebiyata berawirdî û edebiyata dinyayê hatin terîfkirin û bi kurtasî behsa naveroka wan hat kirin. Ji bilî vê profesore amerîkî David Damroschê ku bi salan e di vê qadê de pirtûk, maqale, werger, dersdayîn, konferans û xebatên din ve navê xwe daye bihîstin hat nasandin. Behsa fikr, teorî û xebatên Damrosch hat kirin da ku di edebiyata kurdî de hay ji wî çêbibe û ji xebatên wî sûd bê wergirtin.

1. Têgeha Edebiyata Berawirdî

Edebiyata berawirdî wek şaxeke edebiyata giştî li cihanê balê dikşîne li ser xwe û her roj diçe bêtir girîng dibe. Lewra mijara vê zanistê navneteweyî (international) ye, li ser netewan e (supranational), di nav qadeke teng a neteweyî û heremî nameşe. Edebiyata berawirdî cara ewil di sala 1827an de ji hêla Villemanin li Fransayê hatiye bikaranîn (Enginün, 1992: 12). Ji sedsala 19emîn pê ve di nav dîroka edebiyatê de cihê xwe edilandiyê û wisa xuya dike xebatên li ser wê di dahatûyê de wê zêdetir û xurttir bin.

Ji bo terîfa vê tegehê Aytaç dibêje du berhemên bi zimanên cuda hatine nivîsandin ji hêla mijar, fikr an jî awayê (şekil) ve tên lêkolînkirin, aliyên wan ên hevpar, yên dişibin hevdu û yên cuda tên tespîtkirin û li ser sedema van şîrove tê kirin ku ji vê ra dibêjin edebiyata berawirdî (2015: 9). Li gor Henry Rémak jî edebiyata berawirdî edebiyatekê bi edebiyateke din ra muqayesekirin, edebiyatê bi qadên din ên ku însanan derxistiye holê ve berawirdkirin e (Enginün, 1992: 17).

Wek ku ji van terîfan jî tê dîtin, edebiyata berawirdî hunereke rêbazî ye û armanca wê du berhemên edebî yên bi zimanên cuda hatine nivîsandin bi rêya analojî, nêzîkatî û hevbandorî muqayesekirin e. Dema li ser metnan muqayese

tê kirin, metin bi hurgilî tên lêkolînkirin. Cure, ziman, şêwaz, bikaranîna peyvan, kesayetiya lehengan, axaftina wan, hest, fikr, îmaj, metafor hemû tiştên bi vî rengî tên veçirandin û li gor vê muqayesekirinê şîrove tên kirin.

Hellmut Ritter jî ji bo balê bikşîne ser girîngiya têkiliya di navbera edebiyatan de dibêje girêdana dîroka edebiyatê ya bi neteweyekê ra ne rast e, lewra edebiyat her tim bi hev ra têkildar in, tesîrên wan yên erênî û yên neyînî hene (Ritter, 2011:13).

Her çiqas edebiyata berawirdî wiha bê zanîn jî hin kes li hemberî vê fikrê di-sekinin û dibêjin du berheman zêdetir berhem jî dikarin bên berawirdkirin, heta wisa ku ne mecbur e ew bi du zimanên cuda bin jî, di nav edebiyata neteweyî de jî berawirdkirin dikare bê kirin (Evecen, 2013: 120). Ji vê bêtir du berhemên heman nivîskarî jî dikarin bên berawirdkirin û li ser wan şîrove dikarin bên kirin.

Di edebiyata berawirdî de hin ekolan li dinyayê navê xwe dane bihîstin. Yek ji van ekola marksîst e ku bingeha xwe ji fikra marksîzmê hildide. Li gor vê ekolê her tişt divê li gor bûyerên civakî û aboriyê bên nirxandin. Civak her çiqas li ser erdnigariyên cuda bijîn û ji dûrî hevdu bin jî li gor geşedan û bûyerên wan ên civakî û aboriyê berhemên bi heman rengî di van civakan de derdikevin holê û divê edebiyat wiha bê berawirdkirin. Viktor Sirmunskiy û I. G. Neupokoeva wek serkêşên vê ekolê dikarin bên nîşandan. (Uçar, 2015).

Ji bilî ekola marksîst di zanista edebiyata berawirdî de du ekolên din jî hene. Yek ji wan ekola frensî, ya din jî ekola amerîkî ye. Li Fransaya ku ev têgeh lê zaye girîngiyê dide hêmanên civakî û polîtîk (Aytaç, 2015: 94). Li gor ekola frensî edebiyatên xweser, yên neteweyî û di nav xwe de girtî hene, divê li ser van lêkolîn bên kirin.

Ekoleke din jî ekola amerîkî ye ku îro pir pêş ketiye. Ji ber Şerê Cihanê yê 2yemîn gelek zanyarên edebiyatê yên alman û frensî xwe spartine Amerîkayê û li wir xebatên xwe domandine, ji ber vê pir zimanî û çanditiyê Amerîka ji hêla edebiyata berawirdî de bûye navendeke girîng (Aytaç, 2015: 84). René Wellek di vê ekolê de kesekî girîng e. Li gor vê ekolê edebiyat giştî ye, divê berawirdkirin zêdetir li ser çand û mirovan bên kirin. Li gor nêrîna Fransayê nêrîna Amerîkayê bêtir rasteqînî û rehet e. (Enginün, 1992: 17)

Edebiyata berawirdî çima bûye disîplînek? Çima li ser xebat tên kirin? Hewcedarî bi zanistek wiha heye gelo? Çi feydaya vê zanistê digîhîje me? Ev pirs dikarin bên zêdekirin. Mirov dikare bibêje edebiyat zanistekê berfireh û xurt e. Ji ber vê dewlemendiya xwe ew êdî bi tena serê xwe têra xwe nake û zorê dide sînoren xwe yên heyî ku firehtir bibe. Ev jî dibe sedem ku di bin banê vê zanista giştî de binbeşên cuda derkevin holê û her yek li gor metodolojiya xwe vê zanistê dewlementtir bike. Her çiqas di vê şaxa edebiyatê de xebatên xweser bên kirin jî, mirov nikare di navbera edebiyata giştî û edebiyata berawirdî de sînoreke sînî

xêz bike. Lewra ew bi hev ra têkildar in û heke sînorek bê xêzkirin dibe ku xebat negîhîjin armancên xwe.

Nexwe çî feydeya berawirdiya edebiyatan heye, divê hinekî li ser vê mirov bi-fikire. Di vê dewra em tê da dijîn da edebiyat jî di nav de hema bibêje hevbandorî (interaction) di hemû qadên jiyanê de heye, tu kesek an jî tiştêk nikare halê xwe yê resen biparêze, miheqeq tesîrê dike an jî tesîr li ser çêdibe. Di nav vê rewşê de naskirina edebiyata civakên din dibe sedema peydabûna fikr û nêrînên têr û tije. Mirov xwe nas dike, yên din nas dike û hevdu baştir fêm dike, xweşbînî derdikeve holê, di navbera berheman de navbermetnanî (intertextuality) çêdibe, însan dikarin bi asoyeke fireh tevbigerin. Lê sedema herî girîng û sereke xurt-kirin û geşkirina edebiyata neteweyî ye. Lewra di navbera edebiyatên cuda de têkiliyek çêdibe. Helbestvan, nivîskar, wergêr, rexnegir û kesên din ên li ser edebiyatê ked didin bi naskirina edebiyatên din bi xwe dihesin, dikevin li ser şopa berhem û çandên din ku ji wan sûtê werbigrin û xwe bêtir pêş ve bibin. Di bingeha destpêkirina xebatên li ser edebiyata berawirdî de jî ev rastî heye. Ji ber vê xebatên muqayesekirina edebiyatê her ku çûye dewlemend bûye. Li hember neteweperestiyê teng û xwe serdest dîtîne ev hewldaneke girîng e. Lê ji hêla hin lêkolîneran ve dîsa ketiye halekî parastina cureyek neteweperestiyê (Enginün, 1992:16).

2. Têgeha Edebiyata Dinyayê

Dema behsa têgeha “edebiyata berawirdî” hat kirin ji bo destpêka wê, hat destnîşankirin ku ev têgeh cara ewil di sala 1827an de ji hêla Villemanin ve li Fransayê hatiye bikaranîn. Têgeha “edebiyata dinyayê” (bi almanî weltliteratur) jî cara ewil ji hêla nivîskarê alman Goethe ve di sala 1827an de hatiye bikaranîn. Wek ku balê dikşîne, her du têgeh di heman salê de li welatên cuda hatine bilêvkirin û paşê li cîhanê belav bûne. Goethe dema bi xwendekarê xwe Johann Peter Eckermann re diaxive (gespräch mit Goethe in den letzten Jahren seines Lebens) vê gotinê bilêv dike, dibêje êdî tu meneya têgeha edebiyata neteweyî nemaye, heyama edebiyata dinyayê nêzîk e û ji bo ku em vê heyamê zûtir bînin, çî ji dest tê divê her kes wê bike (Aytaç, 2015: 29).

Ev têgeh him ji hêla wesf (qualification) û him jî ji hêla kemiyetê (quantity) ve tê bikaranîn. Ji aliyekî ve hemû berhemên bi qîmet ên edebiyata neteweyên dinyayê, ji aliyekî din ve jî her berhema ku di qada edebiyatê de li dinyayê mew-cud e di xwe de dihevwîne (Aytaç, 2015: 223).

Goethe dema ku van gotinan dibêje ji edebiyata Çînê, Îtalyayê (Tasso), sirban, Îranê (Hafîzê Şîrazî), Îspanyayê û Îngilizan (Samuel Richardson) re eleqedar dibû. Ji ber tesîra Hafîzê Şîrazî di sala 1819an de Dîwana Rojhilat û Rojavayê (West-Östlicher Divan) weşandiye. Gotiye şûna edebiyateke di nav neteweyêkî de hatiye

nivîsandin, edebiyateke çandên cuda bi hevdu re têkildar dike girîngtir e. Bi van gotinan nîqaşa li ser mijara wergerê jî daye destpêkirin (Îbrişim: 2016, 4)

Tesîra edebiyata Îranê, welatên din û tesewufê her çiqas li ser Goethe çêbibe jî, wek Murat Belge jî tîne ziman Goethe li ser vê qadê sistemeke rêk û pêk ava nekiriye (Belge: Kadim, 2). Lê piştî van gotinên wî li cihanê rêyek vebûye û kesên di qada edebiyatê de dixebitin gav avêtine vê qadê û bi xebatên xwe ve ev zanist pêşve birine. Têgeha edebiyata berawirdî her çiqas li Fransayê, têgeha edebiyata dinyayê jî li Almaniyayê dest pê kiribin jî, bi taybetî li Amerîkayê pêşve çûne. Di çend salên dawîn de hin kesên ku li ser vê qadê serê xwe pir êşandine jê yek jî David Damrosch e.² Niha emê hinekî behsa xebatên wî û nêrînên wî yên li ser van têgehan bikin.

3. David Damrosch, Xebatên Wî Yên Li Ser Edebiyata Berawirdî û Edebiyata Dinyayê

3.1. Jiyan û Berhemên Wî

Piştî agahiyên der barê têgehên edebiyata berawirdî û edebiyata dinyayê divê hinek behsa David Damrosch bê kirin ka ew çima dibe mijara vê xebatê? Ji bo bersiva vê pirsê mirov bi rehetî dikare bibêje navê David Damrosch û têgehên edebiyata berawirdî û edebiyata dinyayê bi hev ra têkildar in. Lewra Damrosch bi salan di her du qadan de wek teorîsyenekî bi pisporî xebitiye. Teorî, fikr, xebat û berhemên wî yên li cihanê belav bûne, divê bên nasîn.

Piştî fikra Goethe ya edebiyata dinyayê hin kesan xwestiye wek qadeke sistematîk vê tegehê disîplîne bikin û li ser xebatan bikin ku yek ji wan jî Dawid Damrosch e. Damrosch li Zanîngeha Harvardê profesore Edebiyata Berawirdî ye. Li Zanîngeha Yaleê perwerde dîtiye û di sala 1975an de mezun bûye. Di 1980an de jî li Zanîngeha Harvardê lîsansa xwe ya bilind xilas kiriye. Ji sala 1980an heta sala 2009an (29 sal) di Zanîngeha Columbiyayê beşa Edebiyata Berawirdî de ders daye. Ji heyama antîk bigre heta roja me li ser edebiyata cihanê û edebiyata berawirdî gelek maqale û pirtûk nivîsandine, konferans û ders dane, endamê gelek sazî û komelehan e.

Berhemên wî li gelek zimanan hatine wergerandin, wek erebî, tirkî, polonkî, vîetnamkî, çînî, japonî, spanîkî. Damrosch demekê serokatiya Komeleya Edebiyata Berawirdî ya Amerîkayê kiriye û ew di heman demê de avakerê Enstîtuya Edebiyata Dinyayê ya Zanîngeha Harvardê ye ku ev enstîtû di sala 2010an de hatiye avakirin. Li gelek zanîngehan ders daye, beşdarî gelek konferans û sem-

2 Berfirehî wê li ser jiyan, behrem û xebatên wî yên der barê edebiyata berawirdî û dinyayê da bê sekinîn

pozyuman bûye.³ Damrosch dikare bi zimanê îngilizî, almanî, frensî û îspanyolî bixwîne û biaxive. Lê zimanên yewnanî, îtalyanî, latînî, hiyeroglîfên Misirê, îbranîkiya încîlê, zimanê aztekan (Nahuatl), zimanê skandînavyayê ya berê (Old Norse) û zimanê akadî ya ku ji hêla asurî û babiliyan ve dihat axaftin (Akkadian) dikare bixwîne. Ji bilî vê amadehiya pirtûkeke ku mijara wê nivîsên kurewî (global) çawa tesîrê li ser edebiyata neteweyî dikin ku ew derkevin holê û dîsîplîna edebiyata berawirdiyê dike.

Hin berhemên wî yê sereke ev in; *The Narrative Covenant: Transformations of Genre in the Growth of Biblical Literature*, 1991 (Peymana Vebêjê: Veguherîna Şeweyê Di Mezinbûna Lîteratura Încîlê De), *We Scholars: Changing the Culture of the University*, 1995 (Em Akademîsyen: Guherandina Çanda Zanîngehê), *Meetings of the Mind*, 2000 (Hevdîtînen Zîhnî), *What Is World Literature?*, 2003 (Edebiyata Dinyayê Çi ye?)⁴, *The Buried Book: The Loss and Rediscovery of the Great Epic of Gilgamesh*, 2007 (Pirtûka Binaxkirî: Windabûn û Jinûvedîtina Destana Mezin a Gilgamêşê), *How to Read World Literature*, 2009 (Edebiyata Dinyayê Divê Çawa Bê Xwendin?)⁵

Damrosch ji bilî pirtûkên bi tena serê xwe nivîsandine bi hin kesên din ra jî pirtûk û antolojî amade kiriye. Di nav van xebatên ku bi komî hatine amadekirin de hin caran wek edîtor berpirsyarî hildaye li ser xwe. Mînak di antolojiya bi navê *The Longman Anthology of World Literature*, 2004 (Longman Antolojiya Edebiyata Dinyayê) de Damrosch edîtorî kiriye. Ev antolojî ji 6 cildan û 6500 rûpelî pêk tê û tê de ji rojhilat û rojavayê behsa gelek berheman tê kirin. Ji bilî vê Damrosch di amadekirina van pirtûk û antolojiyan de wek pisporekî di nav koma amadekaran de xebitiye; *“Teaching World Literature”*, 2009 (Hinkirina Edebiyata Dinyayê), *Princeton Sourcebook in Comparative Literature From The Europea Enlightenment To The Global Present*, 2009, (Pirtûka Çavkanî ya Prîncetonê ya Di Edebiyata Berawerdî de Ji Ronahîbûna Ewropayê Heta Heyama Global), *The Longman Anthology of British Literature* 2009, (Longman

-
- 3 David Damrosch di navbera 18-20 çileyê pêşîn a 2008an de li Stenbolê beşdarî sempozyuma “Di Çileyê Pêşîn de Edebiyat” bûye. Ev sempozyum ji ber salvegera 75emîn a kovara *Varlık* bi hevkarîya Zanîngeha Bilgiyê, Wezareta Çand û Turizmê, Kûltür A.Şyê û Şirketa Lêkolînê KAYê hatiye li darxistin. Danezanên encama vê konferansê bi navê *“Dema Edebiyata Dinyayê Tê Gotin: Di Çileyê Pêşîn de Edebiyat” (Dünya Edebiyatı Deyince: Aralıkta Edebiyat)* wek pirtûk hatiye amadekirin û ji Weşanên Varlıkê hatiye weşandin.
 - 4 Weşanên Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê di sala 2011an de ev pirtûk wek *“Dünya Edebiyatı Nedir?”* wergerandiye zimanê tirkî. Ji bilî tirkî ev pirtûk bi japonî (2011), çînî (2011) û zimanê tîbedî (2003) jî hatiye weşandin. Gelek agahiyên ku me di vê gotarê de behsa wê kir ji vê pirtûkê hatin hildan.
 - 5 Weşanên Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê di sala 2010an de ev pirtûk wek *“Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı?”* wergerandiye zimanê tirkî. Ji bilî tirkî bi zimanê çînî (2012), îtalyanî (2012) û vietnamî (2012) jî wergera vê pirtûkê hatiye kirin. Ev pirtûk zêdetir der barê rê û rêbazê de ye. Agahiyên ku me di vê gotarê de behsa wê kir jê qismek jî ji vê pirtûkê hatin hilbijartin.

Antolojiya Edebiyata Îngilîzan), *Masters of British Literature*, 2007 (Hosteyên Edebiyata Îngilîzan)⁶ *World Literature in Theory*, Modern Language Association, 2009 (Edebiyata Dinyayê Di Teoriyê De).

Ji jiyana wî ya akademîk a têr û tije bi tenê behsa çend xebatên wî hatin kirin, lê ji bilî van Damrosch hin werger jî kirine, di gelek zanîngehan de ders daye, maqale nivîsandine, di konferansan de pêşkeşî kiriye û hê jî bi eşqeke mezin li ser edebiyata berawirdî dixebite. Heke niha hinekî behsa rêbaz û zimanê Damrosch a di berhemên wî de bê kirin mirov dikare bibêje Damrosch di berhemên xwe de bi eşkere ewil pirsan dipirse û paşê bi mînak ve bersivên wan dide. Teoriyên wî balkêş in û di hişê xwîneran de dibin sedema pirs û meraqan.

Damrosch li dû berhemên cuda yê heyamên berê dikeve. Çawa ku tiştêkî bi qîmet ê wek zêr û zeberatan li bin erdê dimîne, haya tu kesî jê tune, lê paşê tê dîtîn û qîmetê dibîne, Damrosch jî dixwaze berhemên cuda ên herêmî, yê berê an jî yê kevnare qet nehatine bihîstin derxe holê. Wek dedektîfêkî, arkeologekî etnografekî li dû ziman, çand û edebiyatan digere. David Damrosch di hevpeyvîneke xwe de dibêje berhemek çiqas li cihanê bigere, bê xwendin ew dibe edebiyata dinyayê û wek mînak behsa wergerandina helbestên aztekan dike. Dibêje heke wergera van helbestan nehata kirin ji bilî Meksîkayê tu kesî wê ev helbest nexwenda, heta wisa ku li Meksîkayê jî hema hema tu kes wan naxwîne û wiha dewam dike: “Min hin helbestên aztekan bi xwe wergerand û di antolojiyên ku ji demeke dirêj e tînin çapkirin de weşand. Bi vî awayî edebiyateke biçûk a ku demeke dirêje kesî li rûyê wê nedinêhêrî derkete holê.” (Suher: An interview with David Damrosch, 13).

Wek ku wergerandina helbestên aztekan jî tê dîtîn, Damrosch metin û mijarên xwe ji zemanên berê, metnên qedîm hildibêjere û dixwaze nîşan bide ku edebiyata dinyayê çiqas girîng û dewlemend e. Li ser vî mijarê jî ber ku erdnigariya em lê dijî dîsa mirov dikare mînakeke din nîşan bide. Damrosch di pirtûka xwe “Edebiyata Dinyayê Divê Çawa Bê Xwendin? de di beşa “Li Ser Şopa Gilgamiş” de dema behsa dîtina tabletên Destana Gilgamêş dike navê du îngilîzan Edward Mitford û Austen Henry Layard dike. Dibêje ew di 1839an de ji malbatên xwe vediqetin ku herin Seylanê, behsa rêwîti û xebatên Mitford û Layard dike. Layard tê Nemrudê û Mûsilê, li ser rêya Dicleyê xebatên arkeolojiyê dike. Paşê hevalê wî Hormuzd Rassam 25 hezar tabletan li qesra Qral Asurbanipal li binê erdê dibîne (1853) lê kes nikare bixwîne. Ciwanekî bi navê George Smîth li British Museumê nivîsên li ser van tabletan dixwîne. Dema Damrosch behsa Smîth,

6 Di vî pirtûka ku ji hêla tîmekî ve hatiye amadekirin de behsa nivîskarên îngilîz yê wek Barbauld, Blake, Wollstonecraft, Wordsworth, Coleridge, Keats, Barret Browning, Browning, Tennyson, Yeats, Woolf, Joyce, Eliot, Walcott, Heaney ve Rushdî û berhemên klasîk ên ku tesîr li ser edebiyata îngilîzan kirine hatiye kirin. Di vî antolojiyê de rewşa çandî, dîrokî û edebî ya ku ev berhem derketine holê jî dikare bê dîtîn.

xebatên wî û gera wî ya li ser axa Mezopotamyayê dike, navê tirk, kurd, çand û jiyana osmaniyen, rewşa siyasî ya wê serdemê di vê qismê pirtûkê de derbas dibe (2016: 51-67).

3.2. Nêrînên Wî yên Derheqê Edebiyata Berawirdî De

David Damrosch dema behsa edebiyata berawerdî dike dibêje divê xebatên li ser vê edebiyatê zûtir bihatana kirin, li gor wî ev qad qadeke dereng mayî ye, lê her ku diçe berfireh dibe. Damrosch tîne ziman ev xebat berê bi destê çend hêzên mezin ên li Ewropaya Rojava ve dihatin kirin ku ew jî edebiyata frensî, almanî, îngilîzî û hinek jî ya amerîkî bû. Damrosch fikrên xwe wiha tîne:

“Gelemperiya Ewropayê bi xwe jî ne di navê nîqaşê de bû. Edebiyata Ewropaya Rojhilat jî zêde nehat nîqaşkirin. Ji Endulusê edebiyata ereban nehat nîqaşkirin. Hema bibêje edebiyata Îzlandayê qet nehat nîqaşkirin. Ji ber vê nîşkek berê kesê zimanê îzlandî, portekizî heta zimanê lehî dixwend, berawerdî dikir û li ser van xebat dikir kêmbûn, pir zehmet bû. Ev mijar û kevneşopên girîng in. Bi ya min ev qadeke derengmayî ya ku fireh dibe ye.” (Suher: An interview with David Damrosch, 15).

Piştî vê rexneya Damrosch divê li vir behsa du rexneyên din jî bê kirin ku yek ji wan a Cemil Meriç û ya din jî rexneya Franco Moretti ye. Cemil Meriç fikra edebiyata dinyayê rexne dike, dibêje ew bi nêrîneke navendî ya Ewropayê ve tê meşandin û qet naxwaze Asyayê bibîne (Aytaç, 2013:77). Teorîsyen û rexnegirê îtalyanî Franco Moretti jî di nivîseke xwe ya bi navê “Conjectures on World Literature” (Feraziyeyên Li Ser Edebiyata Dinyayê) de behsa gotinên Goethe û Marks dike. Moretti dibêje Marks di sala 1848an de ev gotin anîye ziman “Yekalîbûna neteweyî û tengfikirî her ku diçe ji holê radişe û ji gelek edebiyatên herêmî û neteweyî edebiyateke dinyayê dizê”. Moretti balê dikêşîne li ser fikrê van her du kesan û dibêje ya di hişê Goethe û Marx de derbas dibû Weltliteratur yanê edebiyata dinyayê bû û edebiyata berawirdî rexne dike:

“Edebiyata berawirdî di rastiyê de hewldaneke entelektuelî ya mutewazî ye ku bi Ewropaya Rojavayê ve sînorkirî maye, gelemperî li der û dora çemê Rhineyê (filologên alman ên li ser edebiyata fransîzî dixebitîn) divizîre. Ji vê zêdetir meneşe wê tune. Ev encamek e û min li gor formasyona xwe ya entelektuelî derxist. Lewra xebatên zanistî her tim xwedî sînoran in. Lê sînor jî diguherin û ez dibêjim êdî wext hat ku divê em bizivirin wê xala berê ya Weltliteratur ya ku dengvedanên biîdîa derketibû holê.” (Moretti: 2000, 1)

Dema behsa edebiyata berawirdî tê kirin du têgehên girîng ên çend salên berê ketine nav edebiyatê û bala pisporên edebiyata berawirdî dikêşînin hene. Yek ji wan “glocal” û ya din jî “kurewîbûn” (globalization) e. Damrosch dema behsa têgeha glocal dike dibêje ev têgeh di salên 1990î de di nav teşkilatên civakî yê sîvil de hatiye bikaranîn û armanca wê jî “bi fikreke kurewî herêmkî tevgerîn e”. Damrosch destnîşan dike têgeha glocalê di edebiyatê de bi du şiklên sereke der-

dikeve holê. Yek ji wan nivîskar girseyên kurewî didin ber çavên xwe û meseleyên herêmî wisa dinivîsin. Ya din jî nivîskar heremîbûna xwe wek mîna keke biçûk a guherîna kurewî pêşkeş dikin, yanê dikarin ji dinyaya derva ber bi hundir çûyîne derxin pêş. Ji bo nivîskarê kurewî yê ewil jî “Kipling” (Hindistan-1865) mînak nîşan dide û dibêje Kipling him wek nivîskarekî herêmî û him jî wek nivîskarekî biyanî nivîsiye (2016: 126- 128).

Ji bo kurewîbûnê (globalization) jî Damrosch dibêje tesîra wê ya herî mezin ew e ku fikra “welat” tevlihev dike. Lewra kesên koçî cihekî din dikin têkiliyên xwe bi her du civakên (civaka berê ya lê dijiya û ya nû) ji hev cudatirin diparêzin, bi rêya înternet, telefona bêrikê û seferên balafiran têkiliya xwe ya nêzîk didomînin (Damrosch, 2016: 135). Bi nêrîna David Damrosch kurewîbûn sînoren neteweyî şêlû dike, îstiqrara kodên exlaqî xirab dike, nasnameyên herêmî tevlihev dike (2016: 143).

3.3. Nêrînên Wî yên Derheqê Edebiyata Dinyayê De

Edebiyata dinyayê bê serî û bê binî ye, ew bi milyonan berhemên devkî û nivîskî di xwe de dihevin. Ji gelek ziman, çand û berheman pêk tê û ji ber vê çavê mirovan ditirse ku ew gava xwe biavêjin vê qadê. Lê hin kes dibêjin hemû berhem û metin yek metnek e û divê li ser vê metnê xebat bên kirin. Yên vê fikrê qebûl dikin jê yek jî David Damrosch e. Damrosch dibêje ev ne têgehek û qadeke wisa ye ku sînoren wê nikare bê xêzkirin û zeftkirin. Bi nêrîna Damrosch edebiyata dinyayê her ku diçe bi hev ra tê girêdan, ev qad ne qadeke wisa ye ku xebateke heta hetayî di xwe de bihevin, lewra sînoren wê fireh e.

Ji bo terîfa edebiyata dinyayê Damrosch profesor Vinay Dharwadkerê ji Hindistanê referans nîşan dide û wiha dibêje: “Heke em fikra Vinay Dharwadker ji xwe ra bikin palgeh em edebiyata dinyayê dikarin wiha terîf bikin ‘ew (edebiyata dinyayê) montajeke nexşerêyên hereket dikin e ku ev nexşerê wek ku li ser hevdu sîwar bûne xuya dikin’ (Cosmopolitan Geographies, r.3) û ev hereket (ya nexşerêyan) him der barê dîroka edebî û him jî der barê hêza çandî de têkiliyên guherbar di xwe de dihevin. (2013: 26).”

Wek ku Damrosch jî tîne ziman edebiyata dinyayê nikare bi pênaseyek navendî ve bê sînorkirin. Lewra edebiyata dinyayê perçekirî ye, sînoren wî yên madî û manewî yên ku diguherin hene, ji hêla dîrokî ve dikare bi nêrînên cuda bê nirxandin. Damrosch dibêje edebiyata dinyayê nivîsa ku di wergerê de meneyê qezenc dike ye (İbrişim, 2016: 7). Yanê dema berhem ji zimanekî derbasî zimanê din dibin, ji wê çanda jê derbas dibin tiştan hildide, edebiyat dewlemend dibe û xwe derdixe holê.

David Damrosch ji bo edebiyata dinyayê dibêje her yek berhema ku ji welatê xwe derdikeve û xwe digîhîne cih û warên cuda êdî dikeve nav sînoren edebiyata dinyayê û wiha behsa vê mijarê dike: “Sînoren wê her çiqas wiha bê xêzkirin jî, ew

ji kuliya teke berheman a gewre pêk tê. Ev berhem qismêke mezin a rehên xwe ji civakên cuda yên xwedî dîrokên cuda, çarçoveya referansên çandî û poetikayan digire (2013: 5).”

Damrosch li ser têgeha “weltiliteratur” ya ku Goethe aniye ziman disekine, dibêje ev têgeh di akademiye de bûye sedema nîqaş û panîkê, lê ev ne fikreke şaş e. Li gor nêrîna Damrosch edebiyata dinyayê rêbazeke xwendinê ye ku mirov dikare vê rêbazê ji bo her yek berhemê an jî tevahiya berheman bisepîne. Ew rêbaz wek klasîkan ji bo xwendina tiştên nû jî rêbazeke kêrhatî ye. (2013: 6).

Li gor Damrosch edebiyata dinyayê pîrçandî û pîrzemanî/pirdemkî ye (2013: 17). Li ser rûyê dinyayê bi hezaran zimanên tîn axaftin hene. Li gor texmîna UNESCOyê ew şeş hezar in. Lê ji wan hinek her ku diçe ji ber sedemên cuda êdî kêr tîn axaftin, hinek jî ji bilî bikaranîna çend kesan nayên axaftin û hindik maye koka wan biqele û ew êdî ji holê rabin (Grotefels: 2017,1). Ji vê agahiyê jî eşkere ye ku li ser rûyê erdê çawa gelek zimanên cuda hebin, wisa jî edebiyatên cûr be cûr hene. Edebiyata hin civakan ji ber ziman û çandên serdest derfetê nabînin xwe bi tîra xwe bidin nasîn, haya civakên din ji wan çêbibe, lê her yek li gor civaka xwe biqîmet û dewlemend e. Ne mumkun e ku mirov hemû zimanan bizanibin û berhemên hemû civak û welatan bixwînin. Ji ber vê werger rêya herî girîng e ku mirov berhemên din ên edebiyata dinyayê bixwînin, çand û welatan binasin, bi hev ra danûstendinê bikin ku edebiyata cihanê geştir bibe.

Li gor Damrosch edebiyata dinyayê gelemperî ji van sê şiklan yekî an jî her sê şikl bi hev re derdikevin pêşberî me:

- Koma klasîkên êdî rûniştine (ne bi tenê berhemên Rojavayê, berhemên ku ji helbetsa Misir, îbranî û Çînê bigre heta roja me hatine)

- Kanona şaheseran a tekamûlbûyî (Hin berhem demekê dibin şaheser lê di nav demê de cihê wan diguhere û ew ji nav rêza şaheseran derdikevin, wek Kafka. Di destpêkê de ew wek semboleke ji sînorên çandê derbasbûyî dihat dîtin, lê paşê wek “cihûyekî ji Pragê” hat binavkirin)

- Pîrpaceyî yên ku paceyên wan ji dinyayê re vedibin (berhemên bi wezîfeya xwe ya ku ji alemên biyanî re paceyên xwe vedike û dikeve nav edebiyata dinyayê). (2013: 16) Bi nêrîna Damrosch destana “Aeneîs” ya ku nivîskar Vergîliusê ji Romayê nivîsandîye van her sê taybetmendîyan di xwe de dihewîne û ji ber vê berhemeke edebiyata dinyayê ye. Lewra ew him klasîk e, him şaheser e û him jî paceyêke ji dinyaya împaratoriye ya Romayê re vedibe ye (2013: 17).

Bi fikra Damrosch berhemek di nav pêvajoyeke xwedî du astan de dikare bikeve nav edebiyata dinyayê. Asta yekemîn ew e ku divê ew wek berhemeke edebî bê xwendin û ya din jî ji bilî ziman û çanda xwe divê di dinyayeke fireh de bigere û bê xwendin (2013: 17). Li vir jî dîsa girîngiya wergerê derdikeve holê. Bi nêrîna Damrosch di rastiyê de qismêke mezin a edebiyata dinyayê edebiyata

wergerî ye (2016: 77) ku ew jî xwedî hin pirsgirêkan e wek gramer, deşîfre, koma peyvan, nêrîna wergêr, çarçoveya çandî û hwd.

3.4. Nêrînên Wî Yên Derheqê Wergerê De

David Damrosch ji bo wergerê dibêje werger him projeyeke çandî û him jî ya rêzimanî ye. Damrosch tîne ziman dema werger tê kirin divê li gor eslê metnê û serbestiyê bi awayekî baş bê nixandî ku bibe wergereke baş (2013: 78). Damrosch girîngiyê mezîna dide wergerê û haya wî ji edebiyata tirkî jî heye.⁷ Di edebiyata tirkî de hin kes henin ku navê wan bi saya wergerê li cîhanê belav bûne yek ji wan jî nivîskar Orhan Pamuk e.⁸ Damrosch bi Orhan Pamuk re pir eleqedar e û di pirtûkên xwe de gelekî behsa wî dike. Di destpêka pirtûka “Edebiyata Dinyayê Divê Çawa Bê Xwendin?” de Damrosch wextê spasiya hin kesan dike dibêje: “Vê pirtûkê ji wan hevdiştinên semînarên ên me bi Wiebke Denecke, Orhan Pamuk, Sheldon Pollock û Pauline Yu bi hev re amade dikir, gelek sûd wergirt” (2016: vii).

Li gor teoriya Damrosch qîsmeke mezîna ya edebiyatê ya ku li cîhanê, edebiyata wergerê ye. Ev jî tê wê meneyê ku werger karekî zehf girîng e. Damrosch balê dikşîne berhemên bi zimanên kêmtên axaftin ve hatine nivîsandin û ji bo girîngiya wergerê nîşan bide dîsa behsa Orhan Pamuk dike:

“Heke werger nebûya romannûs Orhan Pamuk wê li dervayî Tirkiyeyê nehata nasîn. Bi saya wergerê romana Pamuk Kar (Berf) a ji hişê mirovan dernakeve bi navê Nieve li balafirgeha Mexico Cityê tê dîtin; bi navê Schnee ji pirtûkfiroşên Berlînê tê kirîn; bi wergera îngilîzî Snow dikare li ser navnîşana Amazon.comê bê siparîşkirin. Wergerê derfet da ku Orhan Pamuk Xelata Nobelê ya Edebiyatê ya 2006an bigre. Him Pamuk û him jî gelek nivîskar di pêşbirkên edebiyatê yên dinyayê de gelemperî bi tenê ji wergerên xwe tîne xwendin” (2016: 77).

Damrosch behsa dîroka Tirkiyeyê dike û dibêje piştî împaratoriyeke mezîna welatê modern ya ku artêş, alfabe, perwerde û rêvebirîya xwe guherandiye ava dibe ku li vir gelek nivîskar derdikevin û romanên dinivîsin yek ji wan jî Orhan Pamuk e û ji bo romannivîsina wî wiha dibêje: “Pamuk ji hêla referansên edebî û nêrînê ve bi temamî yekî ewropî ye, lê ji hêla melzeme hîlbijartinê ve bi awayekî îstiqrar romanûsekî herêmî ye.” û dîr û dirêj behsa romanên wî, lehengên wî û rêbaza nivîsandina Pamuk dike (2016: 131-132). Damrosch Orhan Pamuk dişîbîne Borges û dibêje wek Borges, Pamuk jî li hember çanda Rojavayê û çanda xwe ya neteweyî bi azadiyeke hukûmran tevdiqere” (2016: 134).

7 Damroschê bi edebiyata dinyayê ra evqas eleqedar e hatiye Tirkiyeyê, beşdarî konferansan jî bûye. Têkiliya wî bi civaka tirkî û Orhan Pamuk re heye. Lê der barê edebiyata kurdî de gelo çî difikire û haya wî çiqas jê heye me xwest ku em vê mijarê zelal bikin. Ji ber vê me jî şexsê wî re peyamek şand, lê mixabin tu bersivê ji wî nehat.

8 Di sala 2006an de bû xwediyê Xelata Oscarê ya Edebiyatê

Ji mînaka Orhan Pamuk jî tê dîtin ku werger çiqas girîng e û di edebiyata cihanê de ji bo ku berhemek bê nasîn û bigîhîje gelek kesan çiqas ferz e. Bi nêrîna Damrosch wergereke bê qûsur metnê cardin dide axaftin, dibe danûstendineke çandî ya berbiçav û ji bo berhemeke ji mala xwe derketiye ku ber bi dinyayê diçe ve dibe sedema merhaleyê nû. Werger him projeyê zimannasiyê û him jî ya çandî ye (2016: 78).

Herî dawîn ji bo meseleya wergerê ji bilî Damrosch li vir çend hevok heke ji nivîskarê navdar Jorge Luis Borges bîn dayîn, ew dema behsa xwendina pirtûka Dante ya bi navê “Komediyaya Îlahî” û beşên cehennem (îtalyanî: inferno), araf (îtalyanî: purgatorio) û bihûştê (îtalyanî: paradiso) dike, dibêje pirtûkê tesîreke pir mezin li ser wî kiriye. Borges balê dikîşîne li ser wergera pirtûkê û dibêje li ser rûpelên çepê bi îtalyanî, li aliyê rastê jî bi îngilîzî nivîs hatine nivîsandin û piştî xwendina wan wî fêhm kiriye werger tu carê nikare cihê metna orjînal bigre, bi tenê alîkariyê dide xwîneran ku ew nêzîkî metna resen bibin (2015:45).

Her çiqas wek ku Borges jî tîne ziman werger ji sedî sed nikaribe cihê metna orjînal bigre û tahma zimanê ku pê hatiye nivîsandin bide mirovan jî ji bo edebiyata dinyayê dewlemend û xurt bibe mecbur e ku bê kirin. Lewra li ser rûyê erdê bi hezaran ziman û edebiyat hene û ne mumkun e însan hemû zimanan bizanibin û wan berheman bi zimanê hatine nivîsîn bixwînin. Lê wergerek divê çawa bê kirin ev mesele her tim tê nîqaşkirin û wê bê nîqaşkirin jî.

Encam

Tegehên edebiyata berawirdî û edebiyata dinyayê yên ku behsa wan hat kirin di edebiyatê de du tegehên girîng in û qîmeta wan her ku diçe zêde dibe. Ji bo ev têgeh baş bîn fêmkirin du pirtûkên David Damrosch ên mijara vê gotarê ne dikarin bîn xwendin ku fikr û nerînên wî yên li ser van meseleyan baş bîn fêmkirin.

Edebiyatên li dûrî kanon û patronajê di vê qada serdest de ji bo ku navê xwe bidin bihîstin û gavê bavêjin vê alemê divê teqez girîngiyê bidin wergerê, bi ziman û edebiyatên din re tîkiliyê daynîn. Lewra civak û şaristan bi tîkiliyên civakên din re li xwe mikur tîne û pêşve diçin. Fikr û edebiyat bi saya wergerê li cihanê xwe digîhînin girseyên mezin û tesîrê li ser wan dikin. Werger dikare ji bo pêşveçûna ziman roleke erênî bilîze, lê di heman demê de dikare tesîreke neyînî li ser ziman û çandê jî bike, qîmeta wê kêmkirî bike. Ev girêdayî mijara werger gelo çawa hatiye kirin e. Ji bo wergereke baş jî divê mirov him ziman û him jî çanda wê berhema ku tê wergerandin baş bizanibe.

Edebiyata dinyayê û qada berawerdiyê wek Damrosch jî dibêje ji bo li ser xebatê bê kirin qadeke derengmayî ye, lê her diçe firehtir dibe û pêşve diçe. Helbet pirsgerêkên wê jî hene, lê girîngiya wê ji pirsgerêkên wê zêdetir in. Kurd çawa

ku di gelek mijaran de dereng mane, mixabin di vê mijarê de jî dereng mane û divê zêdetir bixebitin. Helbestvan, nivîskar, wergêr, rexnegir û akademîsyenên kurd yanê bi kurtasî dildarên edebiyata kurdî dikarin hewl bidin ku ev qad di nav edebiyata kurdî de jî pêşve here. Ev jî ancax bi nasîna edebiyata xwe û nasîna edebiyata dinyayê dibe.

Li cihanê çawa di her qada jîyanê de serdestiyek hebe, di qada edebiyatê de jî (patronaj û kanon) heye. Kurd li hember vê divê edebiyata xwe û edebiyatên din baş nas bikin, zimanên cuda hîn bibin, welatên din bigerin û bi rêya wergerê xwe bi cihanê bidin nasîn û wan nas bikin.

ÇAVKANÎ

- Aytaç, Gürsel. (2013), *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, İstanbul: Say Yayınları.
- Borges, Jorge Luis. (2015), *Yedi Gece*, İstanbul: İletişim Yayınlar. 2.Baskı
- Damrosch, David. (2013), *Dünya Edebiyatı Nedir?* İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Damrosch, David. (2016), *Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı?*, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Enginün, İnci. (1992), *Mukayeseli Edebiyat*, İstanbul: Dergah Yayınları.
- Evecen, Doğan. (2013), *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi Çerçevesinde Bir Nazîre Geleneği Örneği: Şeyh Gâlib'in Nedîm'e Yazdığı "Sen" Redifli Gazel*, İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi, Cilt: 2, Sayı: 4, 2013.
- Moretti, Franco. (2000), *Concejtures On World Literature*, New Left Review Magazine, 1 January-Februart, 2000.
- Ritter, Hellmut. (2011), *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi*, Ayrıntı Yayınları.
- Uçar, Ezgi. (2015), *Marksist Karşılaştırmalı Edebiyat*
<https://prezi.com/3js8hbig2lsv/marksist-karsilastirmali-edebiyat-ekolu/>
27.10.2017/18.00
- <https://oggito.com/dunya-edebiyati-kavramina-kisa-bir-bakis-0220161167708.10.2017/18.41>
- Belge, Murat. *Kadim ve yepyeni: Dünya edebiyatı*.
<http://www.milliyet.com.tr/kadim-ve-yepyeni-dunya-edebiyati-kitap-1323967/07.10.2017/22.54>
- Grotefels, Sina (2017), *Diller Ölüyor*.
<http://www.dw.com/tr/diller-%C3%B61%C3%BCyor/a-3765299125.10.2017/20.11>
- Gündoğan İbrişim, Deniz. (2016), *Dünya Edebiyatı Kavramına Kısa Bir Bakış*.
<https://oggito.com/dunya-edebiyati-kavramina-kisa-bir-bakis-0220161167708.10.2017/18.41>

<https://scholar.harvard.edu/daviddamrosch/biocv> 08.10.2017/10.25

http://www.forex.ntu.edu.tw/files/news/1834_b11e101f.pdf 09.10.2017/22.15

www.iwl.fas.harvard.edu 08.10.2017/ 12.18

Suher, Dylan. An interview with David Damrosch.

<https://www.asymptotejournal.com/interview/an-interview-with-david-damrosch/>
10.10.2017/19.56

NAZIM Û ŞA'İR MELA ZAHİD ZEHERÎ (BAŞER): JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

**Nazım ve Şair Molla Zahid Zeherî (Başer):
Hayatı, Eserleri ve Edebi Kişiliği**
Poet Molla Zahid Zeherî (Başer):
His Life, Works, And Literary Persona

Nurettin ERTEKİN¹

Kurte

Îro jî nivîskarên Edebiyata Kurdî ya Klasîk û berhemên wan derdikevin holê û xebat li ser wan tîn kirin. Ji ber vê egerê Edebiyata Kurdî ya Klasîk zindî ye û tradisyona xwe berdewam dike. Yek ji nivîskarê Edebiyata Kurdî ya Klasîk ku li jîyanê ye Mela Mûhemmed Zahid Zeherî (Başer) ye. Mela Zahid, ji gundê Nêrçik a Pasûr (Qulp) a Amedê ye. Di medreseyan da perwerde bûye û kesayetekî zanistên Îslamê û zimanê 'Erebî ye.

Mela Zahid ji aliyê din va kesayetekî edebî ye. Bi nivîsandina 26 berheman beşdarî edebiyatê bûye ku ji van berheman 20 heb bi Kurdî ne. Hem şa'ir e û hem nazim e. Şeş dîwanên muretteb nivîsandine û xwediyê 17 menzûmeyên dînî ye. Îhtîmal e ku cara yekem '*Erûzname* û *Silsilenameya Terîqetan* wî nivîsandibe di Kurdî da.

Ev gotar kesayetiya Mela Zahid a edebî vedikole, herwiha berhemên wî jî cara yekem bi vê nivîsarê tête polînkirin û nasandinê. Bi giştî nivîsara me li ser sê beşan hatîye terxan kirin. Jiyanê Mela Zahid, berhemên wî û kesayeta wî ya edebî.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Mela Zahid Zeherî, Dîwanên Muretteb, Menzûme, Cûreyên Nezmê.

1 Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bingölê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. nurettin.ertekin@hotmail.com

Özet

Gönümüzde dahi Klasik Kürt Edebiyatının ürünleri ve yazarları ortaya çıkmakta ve onlar hakkında çalışmalar yapılmaktadır. Bu nedenle Klasik Kürt Edebiyatı canlı bir şekilde geleneğini devam ettirmektedir. Klasik Kürt Edebiyatının yaşayan yazarlarından birisi de Molla Mûhemmed Zahid Zeherî (Başer) dir. Molla Zahid, Diyarbakır'ın Kulp ilçesinin Karabulak (Nêrçik) köyündendir. Medreselerde yetişen bir İslam âlimi ve Arap dili uzmanıdır.

Molla Zahid edebi bir kişiliğe sahiptir. 26 edebi eserle edebiyat dünyasına katkıda bulunmuştur. Bu eserlerden 20 tanesi Kürtçedir. Hem şair ve hem de nazim özelliklerini kendinde barındıran Molla Zahid, 6 müretteb divan ve 17 dini manzume yazmıştır. Muhtemeldir ki Kürt Edebiyatında edebi türlerden *Aruzname* ve *Tarikat Silsilenamesini* ilk kez kendisi yazmıştır.

Bu makale ile ilk kez Molla Zahid'in edebi kişiliği araştırılıp, eserlerinin tasnifi yapılacaktır. Üç bölümden oluşacak makalemizde Molla Zahid'in hayatı, eserleri ve edebi kişiliği incelenecektir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Molla Zahid Zeherî, Muretteb Divanlar, Manzume, Edebi Türler.

Abstract

Even today, works and authors of Classical Kurdish Literature emerge, and studies are carried out on these. Thus, Classical Kurdish Literature maintains a vivid tradition. One of the contemporary writers of Classical Kurdish Literature is Molla Mûhemmed Zahid Zeherî (Başer). Molla Zahid is from Karabulak (Nêrçik) village in Kulp district of Diyarbakır province. He is an Islamic scholar and Arabic language expert who was trained in madrasahs.

Molla Zahid is a literary individual. He contributed to the world of literature with 26 works. Twenty of these are in Kurdish language. Molla Zahid, who is a poet, wrote 6 complete diwans and 17 religious manzuma. He is probably the first to write in literary genres *Aruzname* and *Silsilename of Sect* in Kurdish Literature.

The present article investigated the literary persona of Molla Zahid and classified his works for the first time in the literature. Molla Zahid's life, works and literary persona was investigated in the current article that included three sections.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Molla Zahid Zeherî, *Muretteb Diwans*, verses, literary genres.

Destpêk:

Her berhemek edebî, her nivîsek edebî, her helbestek çîrokek xwe heye. Tu

berhemên edebî û berhemên zanistî jî, bê sebeb nayête nivîsandin. Di Edebîyata Kurdî da jî ev rêgez derbasdar e. Sedemên nivîsandina berhemên edebî cûr be cûr in di Edebîyata Kurdî da. Hin berhem, ji bo pêdivî bi berhemên neteweyên din nemîne hatine nivîsandin. Wek ku Melayê Cizîrî (1570-1640) dibêje: *Ger lu'luê mensûrî ji nezmê tu dixwazî / Wer şî'rê "Melê" bîn, te bi Şîrazî çî hacet.* Hinekan, xemên dilên xwe bi hunerek edebî anîne ziman. Wek ku Şêx Ehmedê Xanî (1651-1707) dibêje: *Şerha xemê dil bikim fesane / Zîne û Memê bikim behane.* Hin berhemên edebî ji bo perwerdehiya zarokan tene nivîsandinê. Weke ku Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843) di dawîya *Nehcu'l-Enam* a xwe da tîne ziman: *Du sê lefzî gotin ji bo zarûwan / Ku xwe pê vedin ew ji xerbazîyan.* Hin ji wan ji bo li hember edebîyata neteweyên din serbilindîya edebîyat û şa'îrên xwe bipeyitîne hatine honandinê. Weke ku Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî (1854/1910) dibêje: *Ku Tirk û 'Ecem qet nebên carekê / Nehîn kurdî şa'ir di misra'ekê.* Hin berhem ji bo xizmeta civakê ji destên nivîskarê xwe derketine. Wek Seydayê Tîrêj (1923-2002) dibêje: *Ma rûmeta şî'rê çî ye? / Ned xidmeta millet de bî.* Bêguman dema lêkolîn bên kirin ewê hin sedemên din jî ji bo nivîsandina berhemên edebî derkevin holê.

Weke ku tê zanîn di dema me da Edebîyata Klasîk ji nava edebîyata hin netewan bi tevahî ji holê rabûye, weke Edebîyata Tirkî. Di Edebîyata Kurdî da Edebîyata Klasîk zindî ye û hetanî roja îro jî dijî. Nûner û nivîskarên wê jî zindî ne û berhemên xwe yê klasîk dinivîsin. Di vî warî da rola medreseyên kurdî nayê mandelekirin. Lewra nûnerên berê jî û yên li jîyanê jî perwerdehiya xwe di medreseyan da dîtine.

Mela Mûhemmed Zahid Zeherî (Başer), yek ji şa'ir û nazimê Edebîyata Kurdî ya Klasîk e ku li jîyanê (Sibat-2020) ye û nivîsandina berhemên xwe yê klasîk didomîne. Mela Zahid, xemxurê dîne Îslamê û bîr û baweriyên Ehlê Sunnet û Cema'etê ye. Ji bo civak emr û fermanên dîne Îslamê pêk bîne û li ser baweriyên Ehlê Sunnet û Cema'etê bimeşe berheman dinivîse. Hem şî'rên xwe, hem menzûmeyên xwe û hem wergerên xwe ji bo armanca xwe weke amraz bi kar anîye/tîne.

Mela Zahid, bi Kurdî, 'Erebî û Tirkî şî'r honandine, menzûme nivîsandine û ji zimanê 'Erebî hin berhem bi nezm wergerandine. Bi van xebatên xwe hem di warê teşeyên nezmê da, hem di warê cûreyên nezmê da û hem di wergera berheman da rengînîyek û dewlemendîyek daye Edebîyata Kurdî ya Klasîk.

Gotar ji sê beşan pêk hatiye. Di beşa yekem da kurtejiyana Mela Zahid hatiye dayin. Di beşa duwem da hemû berhemên Mela Zahid bi nêrînek giştî – lewra ji bo nixandina hemû berhemên Mela Zahid gotarek têrê nake – hatiye nasandin. Beşa sêyem ji bo Kesayeta wî ya edebî hatiye terxankirin.

1. Kurtejiyana Mela Zahid Zeherî²

Navê wî Mûhemmed Zahidê lawê Enwerê lawê ‘Umerê Axayê lawê Mirze Axayê lawê ‘Ebdel Axayê lawê Têlî Axayê lawê Hecî Axayê lawê Têlî Axayê lawê Hecî Axayê lawê Hecî Qadir e. Malbata wan bi mala “Têlê Axa” tên nasîn li herêmê. Ev malbat xwe digihînin ‘Ebasîyan. Mela Zahid di sala 1958an da li gundê Nêrçikê ku girêdayî bi navçeya Pasûra (Qulp) Amedê hatîye dinê.

Bavê Mela Zahid, ji gundê Nêrçikê mala xwe dibe gundê Mûşê, Kavarê. Mela Zahid li vî gundî dest bi xwendinê dike. Piştî ku mala xwe vedigerînin Pasûrê, Mela Zahid, pêşî li ba Mela Hesenê Çemi, paşê li gundê Duderya (Pasûr) li ba Şêx Mûhemmed Selîm, li gundê Sadiqa (Pasûr) li ber destê Mela ‘Ebdulhelîm *Qurana Pîroz, Mewlûda Bateyî, Nûbihara Biçûkan û Nehcu’l Enamê* dixwîne. Li gundê xwe li cem Mela Ferman *Xayet’ul-İxtîsarê* dixwîne. Li mezra Malê Hecîya ku mezra gundê Şêx Hemza (Pasûr) ye li ba Seyda Mela Sedreddînê Qemikî ji *‘Izzî yê heta Şerhu’l-Muxnîyê* dixwîne. Li heman gundî *Se’îdîni û Hellê* li cem Seydayê Mela ‘Elîyê Barinî dixwîne. Piştê li cem Seydayê Mela Reşat li gundê Qurtê (Farqîn-Silvan) xwendina xwe didomîne. Herî dawî li Farqînê li gundê Huseyna li cem Seyda Mela Mehemed Şerîfê Heldewî xwendina xwe kuta dike û di sala 1976an da îcazeya ‘ilmî werdigire.

Di heman salê da li gundê Malê Hecîya (Pasûr) dest bi melatîyê dike. Piştî ku ji leşkerîyê vedigere li gundê Memela (Erxenî - Ergani) du sal, li gundê Qerecan (Erxenî) sal û nîvek melatîyê dike.

Piştî ewqas tecrûbeyê melatîyê bi qasî sal û nîvekê navberê dide melatîyê, li navçeya Bismilê di navbera salên 1985-86an da pirtûkfiroşxaneyê vedike û dest bi firotina pirtûkan dike.

Di navbera salên 1986-89 li gundê Cîrzê (Stewrê - Savur), di navbera salên 1989-92 Xorozlî (Bismil), di navbera salên 1992-96 li gundê Hucetîyyê (Xana Axpâr - Çınar), di navbera salên 1996-2002 li Botika (Xana Axpâr), di navbera salên 2002-2012 li Ziyareta Qubê (Qerejdax), di navbera salên 2012-13 Mermer (Amed), di navbera salên 2013-14 li navenda Amedê Mizgefta Raxibîye melatîyê dike. Piştê dibe wa’îz û li Navçeya Sûr a Amedê dest bi peywira wa’îztîyê dike.

Mela Zahid, perwerdehiya fermî di dibistanan da nedîtîye. Dibistana seretayî, yên din û Zanîngeh jî (Beşa Îlahîyatê) jî derva kuta kiri ye.

Mela Zahid, perwerdeya tesewufê jî Seyda Şêx Mûhemmed Se’îdê Taxikî (1926-)³ werdigire û di sala 1994an da dibe xelîfe.

2 Hemû agahiyên derbarê Jiyan, xwendin û helbestvaniya Mela Zahid ku di vê gotarê da hatîye nivîsandin, di dîroka 16.06.2019da û 22.09.2019 da li Amedê li mala Seyda ji devê Seyda hatîye wertgirtin. Piştî gotar hate nivîsandin, di dîroka 11.02.2020da gotar bi giştî ji Seyda ra hate xwendin, agahiyên ku hatibû dayîn bi pesendkirina wî hatin piştrastkirin û destûra weşandinê jê hate wergirtin.

3 Şêx Mûhemmed Se’îdê Taxikî bi navê “Muhammed Said El-Amedî” jî tê naskirin. Di sala

Mela Zahid, du cara zewicîyê. Ji hevîna wî ya yekem sê law û çar keçên wî henin. Piştî wefata hevîna wî cara duwem zewicîye lê ji vê zewacê tu zarokên wî nehatine dinê.

Mela Zahid, li Amedê rûdinê û di Miftigeha navçeya Sûr a Amedê da peywira wa'iztîyê didomîne.

2. Berhemên Mela Zahid Zeherî

Mela Zahid bi 26 berhemên beşdarî edebîyatê bûye. Ji wan 4 (Çar) berhem bi zimanê 'Erebî ne. 2 (Dudu) bi Tirkî û 20 berhem jî bi Kurdî nivîsandine. Ji 26 berhemên yek pexşan e, yê din hemî nezm in. Mela Zahid, hemû berhemên xwe di kompîtorê xwe da diparêze. Heta niha bi çapek fermî tu berhemên wî nehatine çapkirin. Tenê *Dersa Geda* wek fotokopî hatîye çapkirin û di sala 1999 an da hatîye belavkirin.⁴ Mela Zahid, hemû berhemên xwe wek du nusxeyan jî kompîtorê daxistine ser kaxîzê ku ebada kaxîzê A4 e. Hejmara rûpelên her nusxeyekê 752 ye.⁵ Li ser bergê nusxeyan navê berhemê hem bi 'Erebî, hem bi Tirkî û hem jî bi Kurdî nivîsandîye ku bi Kurdî wehaye: *Dengê Ehlê Sunnet û Cema'et*.⁶ Li jêrê emê yek bi yek bi kurtasî danasîna van berhemên bikin.

2.1. Berhemên 'Erebî

2.1.1. Dîwan I (El- Xewarîqû Fî Medhî Xeyrî'l-Xelâîqî)

Di dîwanê de 28 helbest hene û her helbestek jî 10 malik e. Mijara helbestan bi giştî hezkirina cenabê Resûlê Xweda ye (s.x.l). Bi hemû herfên elîfbaya 'Erebî serwa hatine ristîn ku ev yek jî dîwanê dike murettib. Bi sedema ku helbest hemû Ne't in dîwan dibe Dîwanek Nu'ûtan.⁷ Piştî her helbestekê şerha helbestê bi 'Erebî

1926an da li Taxika Farqîna Amedê hatîye dunyayê. Şêx Mûhememd Se'idê hê li heyatê ye. Fiqihnameyek menzûm bi navê "Delail'us-Selat" nivîsandîye û weke fotokopî hatîye çapkirin û belavkirin ku yek li berdestê me ye jî. Derbarê Şêx Mûhememd Se'idê Taxikî, Bnr: Abdulvahit Yıkılmaz, Molla Muhammed Said El-Amedî (Yıkılmaz) Hayatı, İlmi Ve Tasavvufi Yönü, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-sarkiyat.com/ - ISSN: 1308-9633 Sayı: IV, Kasım 2010, r 137, 155.

4 Ji bo wêneya bergê vê berhemê bnr: Pêvek 2.

5 Seyda Ji van herdû nusxeyên berhemên xwe yek dîyarîyî me kir. Hemû berhemên wî bi halê dijital jî li cem me nin. Ji bo vê qencîya Seyda em spasîyên xwe ji cenabê wî ra pêşkêş dikin.

6 Di vê gotarê da hemû mînakên ku ji berhemên Mela Zahid ewên bên dayîn weke jêder ji vê berhemê hatên wergirtin. Hejmara rûpelan, hejmara rûpelên vê berhemê ne.

7 Nû'ut bêjeyek 'erebî ye û pirjimara Ne'tê ye. Bnr: (Serdar Mutçalı, *Arapça - Türkçe Sözlük*. Dağarcık Yayınları, İstanbul 2015, r 921.) Ne't, ew cûre berhemên edebî ne ku di wan da pesnên Cenabê Pêxember (s.x.l.) hatine dayîn. Bnr: (Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1992, r 257.) Dîwanên ku mijara hemû helbestên wan Ne't be ji wan ra *Dîwana Nu'ûtan* tê gotin. Avakirina dîwanên Nu'ûtan di edebiyata Klasika Tirkî da weke tradisyonekê cih girtîye. Bnr: (Yunus Mucan, *Tanzimat'tan Bugüne Divan Şiiri Geleneğinde Yazılmış Na'tlerin İncelenmesi*, Yüksek Lisans Tezi, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, İstanbul 2015, r 50.)

hatîye dayin. Di dawîya dîwanê da ji bo her helbestekê cuda cuda ferhengokek bi ‘Erebî hatîye amadekirin.⁸ Ji hemû dîwanan tenê nav li vê dîwanê hatîye kirin.

2.1.2. Dîwan II

Dîwan ji 28 helbestan pêk hatîye. Ev dîwan jî weka dîwana yekem muretteb e. Her helbestek ji 10 malikan pêk hatîye. Di serê her helbestkê da kêşa ‘erûza helbestê hatîye destnîşankirin. Mijara vê dîwanê bi gelemperî Ne’t e. Şerh û ferhengok ji bo vê dîwanê nehatîye amadekirin.⁹

2.1.3. Dîwan III

Di nava dîwanên ‘Erebî da hem ji layê hejmara malikan û hem ji layê hejmara helbestan dîwana herî mezîn e. 39 helbest cih girtîye di vê dîwanê da. Hejmara malikên helbestan ne weka hev in. Qesîdeya bi navê *Ma ‘Ezeme’l Quranu’l Kerîm* ji 156 malikan, qesîdeya bi navê *Cetî Cetî* jî 125 malikan pêk hatîye. Ji bo qesîdeya *Cetî Cetî* û ji bo qesîdeya *Elem Ye’hed* ferheng bi ‘Erebî hatîye amadekirin. Mijarên cur be cur weke; Qurana Pîroz, ehlê beyt, tobe, medhîye, navên cenabê Resûlê Xweda (s.x.l), navên Xweda (Esmau’l- Husna), hec û ‘umre, tèn dîtin di dîwanê da.¹⁰

2.1.4. Fihri’su’l Quranu’l Kerîm

Mela Zahid, di vê berhema xwe da hemû bêjeyên Qurana Pîroz bi alfabetîk dinivîsîne. Em dibêjin dinivîsîne, lewra berhem xilas nebûye, li ber xilasbûnîyê ye.

2.2. Berhemên Tirkî

2.2.1. Dîwan

Di dîwanê da 67 helbest cih bigire jî ne dîwanek muretteb e. Mijara sereke di vê dîwanê da bîr û bawerîyên Îslamê bin jî, hin helbestên sîyasî jî tê da tèn dîtin. Du taybetîyên vê dîwanê derdikevin pêş ku yek jê heyşt (8) herfname¹¹ têda bicih bûne. Taybetîyek din jî ev e ku di vê dîwanê da Ne’tek dirêj cih girtiye. Ev ne’t bi teşeya musemmeta muxemmes hatîye nivîsîn û ji 60 bendî pêk hati ye.¹²

2.2.2. Bir Kasidem Var Ki

Menzûme ji 956 malikan pêk hati ye. Serwaya hemu misrayan *Q* ye. Em dikarin wek qesîdeyek *Qafî* ye bihesibînin.¹³ Mijara menzûmeyê pend û nesîhetên

8 Mela Zahid Zeherî, *Dengê Ehlê Sunnet û Cema’et*, berhema neçapbûyî, r 21-48.

9 Zeherî, hb, r 51-65.

10 Zeherî, hb, r 70-104.

11 Herfname (Elifname) ew cureyên nezmê ye ku yek ji pênaseya wê ev e; ku pîtên serê misrayan an malikan li gorî rêzika elifbayê hatibin rêzkirin Herfname yan Elifname tê gotin. (Abdurrehman Güzel, *Dinî-Tasavvufî Türk Edebiyatı El Kitabı*, Akçağ Yayınları, Ankara 2019, r 247.) ; (Lokman Taşkesenlioğlu, *Divan Edebiyatında Elifnameler Ve Bilinmeyen İki Elifname Örneği: Memi Can Saruhânî Ve Ömer Karîbî Elifnameleri, Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi [Taed]*, 58, Erzurum 2017, r 160.)

12 Zeherî, hb, r 642-752.

13 Yek ji cûreyên navlêkirina qesîdeyan ji layê herfa serwayê ye. Li gorî herfa serwaya

derbarê bawerîyên ehlê sunnet û cema'et da ye. Seyda, naveroka menzûmeya xwe li ser beşên *Riyadu's-salihîn*¹⁴ê û *ez-Zewacir 'an iktirafî'l-Kebair*¹⁵ê ava kiriye.

2.3. Berhemên Kurdî

Emê berhemên Mela Zahid yê Kurdî di binê du beşan da binasînin. Şi'r û Menzûme.

2.3.1. Şi'r

2.3.1.1. Dîwan I

Dîwan ji 40 helbestan pêk hatîye û dîwanek muretteb e. Helbesta herî dirêj 14 malik e. Mijara dîwanê *Ne't* e. Ango Dîwan, Dîwanek Nu'ûta ye. Dîwan bi teşeya xezelê hatîye nivîsîn. Taybetîya vê dîwanê ev e ku di hemu helbestan da pîta serê malikê û pîta dawîya malikê heman pît e. Ev taybetî di edebîyata Kurdî da hatîye bikaranîn. Dîwana Mela 'Ebdulletîfê Berwarî¹⁶ ku hem dîwanek muretteb e û hem *Dîwana Nu'ûta* a ye bi vê uslûbê hatîye nivîsîn. Pêkan e mirov vê uslûbê weke hunera *Reddu'l-'Ecuzi 'Ele's-Sedr a Herfi* û *Reddu's- Sedrî 'Ele'l-'Ecuza a Herfi*¹⁷ binavbike û hunereke herfi li rewanbêjîya edebîyata Kurdî zêde bike. Weke mînak ji helbesta bi pîta *d*;

qesîdeyan nav li qesîdeyan têne kirin. Qesîdeya “Elfiye” (herfa serwayê “A” e), qesîda “Nûniye” (herfa serwayê “N” e), qesîda “Lamiye” (herfa serwayê “L” ye) qesîda “Baîye” (herfa serwayê “B” ye)...ûwd. (Celaleddîn Humayî, *Funûnê Belaxet û Sina'atê Edebî*. Çapxane ê Stare, Qûm, Îran 1373, r 105.

- 14 *Riyadu's-salihîn* ji teref Ebû Zekerîyya Yehya b. Şeref b. Murî en-Newewî (w. 676/1277) hatîye nivîsandin. Derbarê jîyan û berhemên Îmamê Newewî bnr: M. Yaşar Kandemir, “Nevevî”, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/nevevi> (pêgehîn: 21.01.2020).
- 15 *ez-Zewacir* ji teref Ebu'l-'Ebbas Şehabeddîn Ehmed İbn Hacer El-Heytemî ((w. 974/1567) hatîye nivîsîn. Ji bo agahîyên berfireh derbarê *ez-Zewacirê* bnr: Bekir Topaloğlu, “ez-Zevâcir an İktirâfî'l-Kebâir”, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ez-zewacir-an-iktirafil-kebair> (pêgehîn: 13.02.2020).
- 16 Mela Ebdulletîfê Berwarî, *Dehdehê Evinê*, Amadekar: Yakub Aykaç-Hanifi Taşkın, Weşanên Lorya, Van 2020.
- 17 Ev huner bi navê *Tesdîrê* jî tê nasîn. Edîbên Farisan jî vê hunerê ra *Tîbaq* gotine. Hin berhemên tirkî jî jî vê hunerê ra *Î'ade* gotine. Reddu's- Sedrî 'Ele'l-'Ecuza ew hunera rewanbêjîyê ye ku bêjeyek di dawîya malikê da hatibe di serê malika piştî xwe da were tekrar kirin. Reddu'l-'Ecuzi 'Ele's-Sedr jî; bêjeya serê malikê di dawîya malikê da bête tekrar kirin e. (Humayî, hb, r 67-72. ; M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belâgat, Gökkuşbu Yayınları*, İstanbul, 2014, r 263-266.) Em van herdû hunera bi hev ra di helbestek Mela da dibînin. Lê ne di tevahîya helbestê da di hin malikan da;

Sosinan sed rengi avêhtin kemend
Wan nego, dil bendê tayek *sunbul* e

Sunbulan seywan li dêmê taze kir

Afitab iro di burca *sunbul* e (Mela Ehmedê Cizîrî, *Dîwan*, Latînzekirin: Z. Abidin Kaya, M. Emîn Narozî, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1987, r 192.)

Durrê yekta î tu bê şek hem tu yî Xeyrul 'îbad

Sahibê kubra şefa'et her tu yî roja mî'ad¹⁸

Di vê helbesta jêr da jî, pîta *v* hem di serê malikê da û hem di dawîya malikê da hatîye

Veke dergê xwe li min ey rehmeten lil 'alemîn

Ta li cennet her şev û rojê bibînim te bi çav¹⁹

2.3.1.2. Dîwan II

Ev dîwana Mela Zahid di nav dîwanên wî yê Kurdî da ji layê zêdebûna helbestan û malikan dîwana herî mezin e. Ji layê teşeyên nezmê jî dîwana herî dewlemend e. Xezel, Qesîde, Musemmet, Qit'e, Terkîbî Bend di dîwanê da hatine bikaranîn. Ji layê naverokê jî dîwanek rengîn e. Mijara sereke Evîna Cenabê Pêxember (s.x.l.) û 'Eqîdeya Ehlê Sunnet û Cema'et e. Ji bilî her dû mijarên sereke gelek mijarên din û cûreyên edebî jî di vê dîwanê da bi cih bûne. Hemû hunera Mela Zahid ya edebî ji layê naverok û cûreyên edebî va di vê dîwanê da civîya ye. Du helbestên li ser arûzê ku bi *'Erûzname* tên binavkirin di vê dîwanê da bi cih bûne.

Silsilameya Terîqeta Neqşebendî jî ku dikeve nav cûreyên Silsilame yan yek ji mijarên vê dîwanê ye. Wehareng, ev silsilame ya terîqetê dibe ku yekem silsilameya menzûm ya serbixwe be bi Kurdîya Kurmancî. Lewra hetanî roja me, me ne peyitandîye ku bi Kurmancî silsilameyek menzûm û serbixwe hatibe nivîsandin.²⁰

Ji cûreyên edebî, li ser Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî (1878-1960) û li ser şêxê xwe Şêx Mûhemmed Se'îdê Taxikî *Medhîye*, derbarê meha Remezanê da *Remezanname*, li ser poşmanîyên xwe yên derbarê kêmasîyên xwe di warê kirin û nekirinên dîna da *Tewbename*, derbarê cîhad û mucahidan da çend *Cîhadname* jî hatine nivîsîn. Wehareng, hin fikr û ramanên Mela Zahid yên derbarê rewşa axirê zeman, derbarê rewşa Kurd û Kurdistanê jî di hin şî'ran da dane der.

Malika yekem ji helbestek 'erûznameyê weha ye:

18 Zeherî, hb. r. 291.

19 Zeherî, hb. r. 298.

20 Berîya Mela Zahid, Şêx Muşerrefê Xinûkî silsilameya terîqetê nivîsandîye. Tiştê ku tê fam kirin Şêx Muşerref, menzûmeyek dirêj wek nameyekê ji mirêdê xwe Hecî Ehmed ra nivîsandîye. Di vê menzûmeye da ji bilî silsilameya terîqetê derbarê tesewufê û derbarê hin 'alimên Îslamê agahî hatine dayin û ji bo murîda hinek pend û nesîhet jî cih girti ne. (Yusuf Batar, Şeyh Müşerref'in Hayatı, Eserleri ve Eğitim-Öğretimle İlgili Görüşleri, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler, Muş Alparslan Üniversitesi Yayınları*, Muş 2018, Berg 2, .r 773.) Ji agahîyên ku hatine dayin tê famkirin, menzûme ne xwerû silsilame ye, di nava vê menzûmeye Şêx Muşerref da silsilame yê jî cih girtî ye. Bi vê sedemê em dikarin bibijên ku Silsilameya Mela Zahid helbestek serbixwe ye di vê mijarê da û bi gumanek mezin ewê helbesta yekem ya serbixwe be di vê cûreyê da.

Fe'ûlun mefa'îlun fe'ûlun mefa'îlun
Tewîl bû şazde weznê behrê didan şî'r²¹

Herdû malikên pêşîn ji medhîya li ser Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî;
Hemd ji bo Ellah selat ser efdelê pêxembera
Kevkeba 'ilmê heqîqet kir tulû' wî bo me ra

Vî zemanê pur 'ecîb dewra fiten 'esra xerab
Nursî ustadê Bed'î 'ilmê îman kir eşkera²²

Herdû malikên pêşîn yên silsilenameya terîqeta neqşebendî weha nin;
Îlahî bi cahê eslê 'alem ji yek ketrê
Ku bû Mustefa weqta qelem çêdikir setrê

Îlahî bi yarê xar kî Siddîq Ebû Bekrê
Tu daîm me mehfûz kî ji her hîle û mekrê²³

Malika yekem ji helbesta li ser Kurd û Kurdistanê ev e;
Bi çavê dînê Îslamê dinêrim Kurd û Kurdistan
Bi çavê dînê peyxember Mûhemmed Mustefa zîşan²⁴

Taybetiyên dîwanê gelek zêde nin. Qesîdeyek dirêj ku bi 101 malikan hatîye honandin evîna Cenabê Pêxember (s.x.l.) kirîye mijar. Qesîde du hunerên rewanbêjîyê di xwe da digire. Di qesîdeyê da hem hunera *Reddu'l-'Ecuzî 'Ele's-Sedir* û hem hunera *Reddu's- Sedrî 'Ele'l-'Ecuz* hatîye bikaranîn. Ev huner ne di hinek malikan da, di seranserê helbestê da hatîye bi kar anîn. Herdû malikên pêşî weha hatine honandin;

Mûhemmed pir dikim hemdê Xwuda Rebbê Mûhemmed
Selatê pur herin rûh û beden qelbê **Mûhemmed**

Mûhemmed ez ji qewmê wî pirî dost û muhibbim
Li ser çavê min in qewmê 'ereb şe'bê **Mûhemmed**²⁵

21 Zeherî, hb. r 378.

22 Zeherî, hb. r 404.

23 Zeherî, hb. r 408.

24 Zeherî, hb. r 473.

25 Zeherî, hb. r 361.

Qesîde bi vê malikê bi dawî dibe;
Mûhemmed ya Xwuda hubba wî tîkî qelbê Zahid
 Ku bimrim ez bi wê hubbê bi wê hubbê **Mûhemmed**²⁶

Dîsa di vê dîwanê da Terkîbî Bendek heye ku ji 20 benda û her bendek ji 22 misrayan pêk tê. Herdû misrayên benda yekem weha ne;

Bi qurbanê te Quranê bi qurban bim di her anê
 Bi qurbanê bi qurbanê digo Yûnis di hûtanê²⁷

Destpêka misrayên benda heştta jî weha ye;
 Di ber zulmê di ber cebrê di da sebra me der sebrê
 Di kir bîra me wê qebrê de ma gotî nekin kibrê²⁸

Di vê helbesta ku bi teşaya Terkîbî Bend hatîye nivîsîn misraya tekrarê ku jê ra tê gotin *Benda Terkîbê* yan *Malika Wasîteyê*²⁹ ya benda heştta weha ye;

Ji verta çîn û yabanê wekî Quran ne îmkanê
 Bibin guhdarê Quranê te Quranê bi qurbanê³⁰

Taybetîyek din ya vê dîwanê ev e ku Mulemme'ek sê zimanî; Kurdî, Tirkî, 'Erebî, têda bi cih bûye. Di heman demê da ev Mulemme', Musemmeta Muselles e ku di edebîyata Kurdî da kêma hatîye bikaranîn. Mulemme' ji 12 bendan pêk hatîye. Benda pêşî weha dest pê dike;

Kullê Musulmana hemî hem kal û pîr her xort û can³¹
 Bu çağriyi tam dinlesın kadın ve erkek Müslüman
 Ya eyyûhel îxwanû qûmû wensurû Quranena³²

26 Zeherî, hb. r 365.

27 Zeherî, hb. r 498.

28 Zeherî, hb. r 501.

29 Restgar Mensûr Fesaî, *Enwa'ê Şî'rê Farisî*. Întîşaratê Nuwêd, Şîraz, Îran 1380, r 555.

30 Di ev malika Wasîteyê da tenê nîveka misraya yekem di dawîya her bendê da diguhere. Nîveka duwem ji misraya yekem û tevahîya misraya duwem di dawîya hemû malikan da dubare dibe. Bi sedema ku malik bi giştî nayê dubarekirin me wekî Terkîbî Bend hesiband. Eger ku Tercî'î Bend ne bi malikekê bi misrayek dubareyê were pênasekirin ev helbest dibe Tercî'î Bend. Herçend di pênaseyên Terkîb û Tercî'ê da jî bo dubareyê malik hatibe bikaranîn jî Terkîb û Tercî'ên ku dubareyên wan an Wasîteyên wan ji misrayan pêkhatine jî tînin. Bnr: Fesayî, hb. r 555-564.

31 Zeherî, hb. r 483.

32 Gelî birayan rabin arîkarîya Qurana me bikin.

2.3.1.3. Dîwan III

Dîwan ji 124 helbestan pêk hatiye û dîwanek e murettêb e. Mijara sereke hezkirina Xweda, nav û sîfetên Xweda ye. Digel van mijaran, tewbe, cîhad, evîna Cenabê Pêxember (s.x.l.), tesewuf jî bûne mijarên helbestan. Wehareng, du helbest li ser kelha Amedê hatine nivîsîn.

Du taybetîyên vê dîwanê henin ku yek ji yekê girîngtir e. Mela Zahid Zeherî, malikên helbestên vê dîwanê bi terzek cuda honaye. Misrayên her helbestê di nava xwe da bi yek serwayê hatine honandin. Ango pergala serwaya helbestan weha ye: a-a, a-a, a-a, a-a...³³ bi vî şiklî didome heta helbest bi dawî dibe. Mînak ji musemmetek musellesa dîwanê;

Tu (Seyda³⁴) pir bibînî rojê ‘**îda**
(Şerîf) bî tim li cennet hem dinê **da**
Tu yî bilbil di baxê (Heldewê) **da**³⁵

Ev taybetî di paşserwayan da jî derdikeve holê. Hemû misrayên helbestê bi yek paşserwayê hatiye honandin. Mînak;

Ellah tu min ‘aşîq bikî min ji bikî bin barê ‘**îşq**
Parê mezin parê mezin Ellah bidî min parê ‘**îşq**³⁶

Di malika jorîn da bêjeya “îşqê” paşserwa ye û “arê” serwaya dewlemend e. Mela Zahid di dîwanê da hemû cûreyên serwayê; serwaya nîvco, serwaya tam û serwaya dewlemend bi kar anîye ku mînakên serwaya tam û ya dewlemend li jor hate dayin.

Taybetiyek din ya vê dîwanê ev e ku di dîwanê da 6 çarîn (rûba’î) bi cih bûne. Di çarînan da jî heman rêbaza serwayê hatiye şopandin. Ango pergala serwaya rûba’îyan “a-a-a-a” ye. Lê di edebîyata Kurdî da bi vê pergale rûba’î hatine nivîsîn.³⁷ Yek ji rûba’îyên Mela Zahid ev e;

Tobedar im ez ji her sûc û gunaha tobedar
Sûc û ‘îşyan û xetaê min hezar in sed hezar

33 Ev taybetî di dîroka edebîyatê da heye. Ji qesîdeyên bi vî rengî ra “Qesîdeya Temam Metle” hatiye gotin. (Fesaî, hb. r 112-114)

34 Ev helbest li ser Seydayê Mela Zahid, Mela Şerîfê Heldewê hatiye nivîsîn. Mela Zahid, navê seydayê xwe ji bo ku bête zanîn di nava kevanokan da nivîsiye. Me jî lewma di nava kevanokan da nivîsi.

35 Zeherî, hb. r 533.

36 Zeherî, hb. r 562.

37 Ew mesxerey zemanê be şah û wezîrî kird a
Ew ketne qet melle be geda û feqîrî kird a
Kilkêkî pêwe kird û berewjûrî jûrî bird a
Tey heldeda şeqêk û serewjêrî jêrî kird a (Mehwî, *Dîwan*, Latînzekirin: M. Z. Ertekin & H.‘U. Xoşnav, Lîs, Diyarbakır 2018, r 241.)

Ya Xweda min jî bikî bin perdeya ‘efw û sitar
Da li heşrê ez nemînim rû siyah û şermezar³⁸

2.3.2. Menzûme

Mela Zahid 17 menzûme nivîsandine. Hemû menzûmeyên wî dînî ne. Hemû bi kêşa ‘erûzê hatine nivîsandin, tenê yek berhem; *Dersa Geda* bi kêşa xwomalî ya Kurdî hatîye honandin. Menzûmeyên Mela Zahid di binê çar beşan da dikare werin polînkirin.

- a- Menzûmeyên ku wî bi xwe nivîsandine.
 - b- Menzûmeyên ji berhemên Kurdî yên menzûm hatine wergirtin.
 - c- Menzûmeyên wergera ji berhemên ‘Erebî yên pexşan.
 - d- Menzûmeyên wergera ji berhemên ‘Erebî yên menzûm.
- Li jêr emê van menzûmeyan bi kurtasî bidin nasandin.

2.3.2.1. Mewlûda Me Ya Nû

Mewlûd, bi kêşa ‘erûzê, bi behra Remela şeş pêngavî li ser wezna “*Fa’îlatun, Fa’îlatun Fa’îlat*” hatîye nivîsandin. Bi tevahî ji 49 beş û 1482 malikan pêk hatîye. Di serî de weke rûpelekî bi pexşan bersîva pîrsa *Çi ma Mewlûd tê xwendin* hatîye dayin û paşê derbasî mijara sereke bûye. Di dawîya Mewlûdê da beşa dû’ayê nehatîye bicihkirin. Bi vê rengê xwe herçend navê berhemê *Mewlûda me ya Nû* be jî, ji mewlûdnameyek bêhtir dişibihe *Sîyername* yê. Malika yekem ya Mewlûdê ev e;

Hemdê bê hed bû Xwedayê ‘alemê
Xaliqê erdû sema û Ademê

Malika dawî weha ye;
‘Ewr li ser şemsê hebin nabîne kes
Perdê ser dil rake jî bû kafi bes

Di Mewlûdê da malika selat û selamê weha ye;
Ger dixwazî dûrî agir bî sibê
Esselat û wesselam daîm bibê³⁹

2.3.2.2. Mewlûda Zat’uş-şîfa

Ev berhem, wergera berhema *Zātu’ş-şîfâ fi sîretî’n-nebiyyî ve’l-xûlefâ*⁴⁰ ye ku ji teref Ebu’l-Xeyr Şemsuddîn Mûhammed b. Mûhammed b. Mûhammed

38 Zeherî, hb. r 534.

39 Zeherî, hb. r 178-237.

40 Ji bo Mewlûda Zatu’ş-şîfa bnr: Ebû’l-Hayr Muhammed b. Muhammed b. Muhammed İbnû’l-Cezerî, “*Mukaddime*”, *Zātu’ş-şîfâ fi sîretî’n-nebiyyî ve’l-xulefâ*, tehqîq: Hâyif en-Nebhân, Dâru’l-Zâhiriyye, Kuveyt, 2017.

b. 'Elî b. Yûsuf el-Cezerî (w. 833/1429) va hatîye nivîsandin.⁴¹ Mela Zahid, ev berhema menzûm wergerandîye Kurmancî. Di edebiyata Kurdî da, li gorî jêderê ber destên me duwem Mewlûdnameya werger e. Berya vê Mewlûdê, Mela 'Elîyê Baqustanî (1917-1993), Mewlûda Îbnî Hecer wergerandîye.⁴² Cudahîya navbera her dû Mewlûdên werger eve; Mewlûda Mela 'Elîyê Baqustanî ji pexşan hatîye wergerandin û nezim kirin, ya Mela Zahid wergera ji nezmê ye.

Mewlûd bi du Mûqeddîmeyan dest pê dike. Di 11 beşan da sifet, ceng û mu'cizatên Cenabê Pêxember (s.x.l.) hatine ravekirin. Beşa 14a hatîye terxankirin ji bo *Merheba* yê. Piştîre bi pexşan dû'a ya Mewlûdê cih digire. Piştîre di 5 beşan da menaqîbnameyên her çar xelîfeyên Cenabê Pêxember (s.x.l.) û Hezretî Hesên (r.x.l.) cih digire. Berhem bi du beşên bi navê *xatîme -1* û *xatîme -2* bi dawî dibe.

Mewlûd ji 21 beşan (beşa dû'ayê bi sedem ku pexşan e nehate jimartin) û 567 malikan pêk hatîye. Ji mevlûdekê bêtir nêzîkê *Sîretnameyê* hatîye amadekirin. Bi kêşa 'Erûzê bi behra Remela şeş pêngavî li ser wezna *Fa'îlatun, Fa'îlatun Fa'îlat* hatîye nivîsîn. Nivîskar, hem di serê berhemê da û hem di dawîya berhemê da bi me dide zanîn ku wergera kîjan berhemê ye. Malika pêşî ya berhemê weha ye;

Hemdê bê hed bo Xwedayê kâinat

Wî Mûhemmed Mustefa kir 'alî zat⁴³

Malika selat û selamê di Mewlûdê da weha cih girtîye;

Ummeta Pêxemberê xeyrul enam

Pir bibêjin esselat û wesselam⁴⁴

Mewlûda Zatu'ş-şîfa bi vê malike bi dawî dibe;

Murşîd û seyda û dostê nasîh e

Hem kesê xwendî ji bo min fatîhe⁴⁵

2.3.2.3. 'Eqîda Şêxê Xanî ('Eqîda Ehlê Sunnet û Cema'et)

Mela Zahid li gorî naveroka 'Eqîdenemeya Şêx Ehmedê Xanî⁴⁶ ango li ber eqîdeya Şêx Ehmedê Xanî eqîdanameyek nû nivîsandîye, bi uslûb, şêwaz û Kurmancîya xwe. Berhem bi beşa Mûqeddîmeyê ku ji 8 malikan pêk hatîye dest pê dike. Di vê beşê da eşkere dike ku 'Eqîdenemeya Şêx Ehmedê Xanî ji nûve nivîsandîye. Ev ramana xwe di malika dawî ya vê beşê da weha anîye ziman;

41 Ji bo agahîyên berfireh bnr: Tayyar Altıkulaç, "İbnü'l-Cezerî", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-cezeri> (pêgehîn:19.01.2020). <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-cezeri> (19.01.2020).

42 Ji bo Mewlûda Mela 'Elîyê Baqustanî bnr: M. Zahir Ertekin, *Mewlûda Mela 'Elîyê Baqustanî (Metn û Lêkolîn)*, Lorya, Van 2015.

43 Zeherî, hb. r 153.

44 Zeherî, hb. r 153 - 167.

45 Zeherî, hb. r 178.

46 Ji bo 'Eqîdenemeya Şêx Ehmedê Xanî bnr: Şêx Ehmedê Xanî, *'Eqîdeya İmanê*, Analiz ve Şerh: Kadri Yıldırım, Avesta, İstanbul 2008.

Ji vir pê va bibin guhdarê Xanî ew dibêje

Bi lefzê min be jî van cewherê ha ew dirêje⁴⁷

‘Eqîdename bi teşeya mesnewî bi behra Hezeca heşt pêngavî li ser wezna *Mefa’îlun, Mefa’îlun, Mefa’îlun, Fe’ûlun* hatîye nivîsandin. Mela Zahid malikek du’ayê li dawîyê zêde kirîye. Bi şiklê xwe ‘Eqîde ji du beşan û 79 malikan pêk tê. Malika dawî weha ye;

Kesê amîn dibêjin ya Xweda min jî digel wan

Li dunyayê li ‘uqbayê me kêfxweş kî di her an⁴⁸

2.3.2.4. Nehcu’l Enama Sanî:

Mela Zahid, *Nehcu’l-Enam* a Mela Xelîlê Sêrtî ji nû ve nivîsandîye. Heman wateyên malikên *Nehcu’l-Enamê* di malikên Mela Zahid da rû dane. Mela Zahid kêşa malikan guherandîye. *Nehcu’l-Enam* bi behra Muteqariba mehzûf; *Fe’ûlun, Fe’ûlun, Fe’ûlun, Fe’ûl* hatîye nivîsandin. Mela Zahid ji bo ku bikaribe wateya malikan berfireh bike bi behra Hezecê; *Mefa’îlun, Mefa’îlun, Mefa’îlun, Fe’ûlun* nivîsandîye ku ev kêş, derfet dide bi sê kîteyan misra dirêjtir bibin.

Nehcu’l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî ji 22 beşan û 271 malikan pêk hatîye.⁴⁹ Mela Zahid sê beş li *Nehcu’l-Enam* a Mela Xelîlê Sêrtî zêde kirîye ku yek jê di destpêkê da ye û navê *Mûqeddîme* yê lê danîye û beşek jî bi navê *Xatîme* yê li dawîya berhemê nivîsiye. Wehareng, Mela Zahid malikên dû’ayê ji beşa dawî veqetandîye û bi navê *Dû’a* yê beşek ava kirîye. Bi vî şiklî berhema xwe bi 25 beşa avakiri ye. Di hejmara malikan da tenê di beşa *Wezîfeya ‘E’da* da du malik li berhema Mela Xelîl hatîye zêdekirin, hejmara malikên beşên din weka hev in. Tevî beşa *Mûqeddîme* û *Xatîme* yê hejmara malikên berhema Mela zahid 308 in. Malika pêşî ji beşa *Ferd* û *Eyn* weha ye;

Bibin guhdarê van nutq û beyanê xweş fesîh in

Di behsa ferdê ‘eynê da bi elfazê melîh in⁵⁰

Mela Zahid, di dawîya berhemê da mexles, kêşa berhemê û dîroka nivîsandinê dîyar dîke.

Eva Sanî bi vî şiklê xwo bû mensûb û ‘aîd

Bi bal vî ‘ebdê pir ‘asî *Mûhemmed* paşê *Zahid*

Mefa’îlun, Mefa’îlun, Mefa’îlun, Fe’ûlun

Çi xweş weznek ‘erûdê bû li ba ehla qebûlun

47 Zeherî, hb. r 127.

48 Zeherî, hb. r 129.

49 Ji bo *Nehcu’l-Enam* a Mela Xelîlê Sêrtî bnr: Ehmed Hilmî el-Qoxî, *Rehberê ‘Ewam, Şerha Nehcu’l-Enam*, Mektebetî Seyda, Çapa Pêncem, Dîyarbekir 2017.

50 Zeherî, hb. r 114.

Di sala *bû hezar û çarsed û sî heştê* hicret
Sefer îro ku *nozde bû*⁵¹ evê nehca me temmet⁵²

2.3.2.5. Amentû

Ev berhem, 'Eqîdename ye. Cudahîya vê berhemê ji menzûmeyên din ev e ku bi teşeya *Terkîb-î Bend* hatîye nivîsandin. Berhem bi tevahî ji 60 bendî pêk hatîye ku her bendek ji 11 misrayan û bi tevahî ji 660 misrayan pêk tê. Mela Zahid, di vê berhemê da ji bilî mijarên 'eqîdeyî hin mijarên din weke; nimêj, rojî, hec, îxtîlaf û mezheb jî anîye ziman. Berhem bi kêşa 'erûzê bi behra Muteqariba mehzûfa heyşt pêngavî bi wezna *Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûl* hatîye nivîsandin. Benda yekem weha dest pê dike;

E'ûzû bi Ellah ji şeytan recîm
 Bi isme wî Ellahê rehman rehîm
 Dikim hemdekî bê hêsab û 'emîm
 Ji bo rebbê 'alem Xwedayê kerîm
 Ewî xaliqê erd û 'ersê 'ezîm
 Ku çêkir ye 'alem ji la şey 'edîm
 Xwedaê ezel sermedî bû qedîm
 Beyanî kirî menhecê musteqîm
 Li dunya dida ni'metê pur cesîm
 Dida nutqê herfa elîf lam û mîm
 Qîyamet de wê sax ke hestî remîm⁵³

2.3.2.6. Dersa Geda

Berhem ji bo zarokan hatîye nivîsandin. Berhemek kurt e. Di vê berhemê da bawerîyên Îslamê yên sereke ji bo zarokan hatîye nivîsandin. Girîngîya bawerîya her şeş ruknê Îmanê, Cenabê Pêxember (s.x.l.) û her pênc ferzên Îslamê cih girtine di berhemê da. Berhem ji 52 malikan pêk hatîye. Bi kêşa xomalîya Kurdî, bi 8 kîteyî û bi teşeya mesnewî hatîye nivîsîn. Di dawîya berhemê dîroka nivîsandinê bi 06.07.2012 hatîye dîyarkirin. Malika serî weha ye;

Ellah Xweda ye bismîllah
 Hemdê Wî elhemdû lillah⁵⁴

2.3.2.7. Pêsed "Taîye" ta Medhê Resûlullah (s.x.l)

Menzûme bi teşeya qesîdeyan hatîye nivîsandin. Ji cûreyên nezmê Ne't e. Taybetîya qesîdeyê ev e ku qesîdeyak *Taîye* ye. Lewra serwaya malikan bi pîta *T*

51 Li gorî vê dîrokê berhem 19 Kasim 2016an da hatîye nivîsandin

52 Zeherî, hb. r 126.

53 Zeherî, hb. r 443.

54 Zeherî, hb. r 132.

diqede. Bêjeya serê her malika vê qesîdeyê *Ellah* e ku ev jî taybetîyek vê qesîdeyê ye. Weke ji navê wê jî tê famkirin ji 500 malikî pêk hatiye. Malika serî ya vê qesîdeyê ev e;

Ellah bi navê wî bivê nezmê dikim bîdayet
Da pir mubarek bikit bo min digel nîhayet⁵⁵
Malika dawî jî ev e;
Ellah, Xwuda hemd û sena vê medhîyê tamam bû
Elhemdû lillah ya Xwuda der mebde û temamet⁵⁶

2.3.2.8. Pêsed Beyta Mekke û Medîne

Menzûme ji 500 malikî pêk hatiye û derbarê herdû bajarên olî yê pîroz Mekke û Medîne yê da ye.

Destpêka qesîdeyî weha ye;
Jê têr nebûm wellahî ez jê têr nebûm wê lezzetê
Ez çûm Medîne têr nebûm ez têr nebûm çûm Mekketê⁵⁷
Qesîde bi vê malikê bi, dawî dibe;
Îsmen Mûhememd Zahid im lakin ‘emel da fasid im
Keslan û sist û qa’id im vala kelamim qewletê⁵⁸

Di dawîya qesîdeyê da dîroka nivîsandinê hatiye dayin ku 18.10.2008 e.

2.3.2.9. er-Rîsalet’un-nefi’e

Şêx Mûhemmed Se’îdê Taxikî bi navê “er-Rîsalet’un-nefi’e derbarê mezhebên şîîa da reddîyeyek nivîsandîye. Mela Zahid ev berhem bi heman navî bi wezin wergerandîye kurdî. Berhem ji du beşan pêk hatiye. Beşa bi navê *şîî* ji 27 malikan pêk hatiye ku ev wergera berhema Şêx Mûhemmed Se’îdê Taxikî ye. Beşa bi navê *Wehabî* ji 29 malikan pêk tê ku Mela Zahid ev beş honandî ye. Berhem bi giştî ji 56 malikan pêk hatiye. Berhem bi teşeya mesnewî bi kêşa ‘erûzê bi behra Remela nesalima 8 pêngavî bi wezna *Fa’îlatun, Fa’îlatun, Fa’îlatun, Fa’îlat* hatiye nivîsandin. Malika pêşî weha ye;

Hemdi Ellah hemdi Ellah hemdi Rebbê ‘alemê
Ya Xweda pir pir bibarînî selat û sellemê⁵⁹

2.3.2.10. Hîkmetname

Berhem, wergera *el-Hîkemu’l-‘Etâiyje* ye ku ji teref Ebu’l-‘Ebbâs (Ebu’l-Fazl) Tâcuddîn Ehmed b. Muhammed b. Abdilkerîm b. ‘Etâillâh eş-Şâzelî el-

55 Zeherî, hb. r 316.

56 Zeherî, hb. r 336.

57 Zeherî, hb. r 338.

58 Zeherî, hb. r 357.

59 Zeherî, hb. r 129.

Îskenderî (w. 709/1309)⁶⁰ va hatiye nivîsîn. Berhem pexşan e û tê da 264 gotinên bi hikmet cih girtîye.⁶¹ Mela zahid ev berhema pexşan bi nezm wergerandiye Kurmancî. Mela Zahid, ji bo her gotinek 'Etâillâh el-Îskenderî malikek an du malik an sê malik terxan kirîye. Herî zêde gotina 249a rave kirîye ku ji bo vê gotinê 7 malik ava kirîye.

Berhem bi teşeya mesnewî, bi kêşa 'erûzê bi behra Remel, li ser wezna *Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlat* hatiye nivîsandin. Berhem ji Mûqeddîme, beşa hîkmetan, çar name, dû'a û beşa xatîmeyê pêk tê ku bi tevahî heyşt beş e. Beşa hikmetan bi 353 malikan hatiye nivîsandin. Beşa du'ayê jî wergera *el-Münâcâtü'l-'Aâtâ'iyye* ye ku ji teref 'Etâillâh el-Îskenderî ye ku bi nezm hatiye nivîsîn û ji 36 malikan pêk hatiye. Mela zahid ev menzûmeya du'ayê bi 74 malikan wergerandiye Kurmancî.

2.3.2.11. Wesîyeta Min

Mijara berhemê pend û şîretên olî ne. Mela Zahid, di derbarê bîr û bawerîyên Îslamê da tewsiyeyên xwe anîye ziman. Weke pendnameyek mijarên olî da dikare were hesibandin. Nivîskar bi beşa Mûqeddîmeyê ku ji 19 malikan pêk hatiye dest bi berhemê dike. Mijarên eslî; bawerîya bi Xweda û Resûlê Xweda (s.x.l), nimêj, hec, rojî di 15 beşan da bicih bûne. Yekîtiya Musilmanan, terîqet, heqîqet, şerî'et, şiklê de'wetên Musulmana, şiklê cil û bergên Muslumana jî wek mijar cih girtîne di menzûmeyê da.

Berhem bi teşeya mesnewî hatiye nivîsandin. Bi kêşa 'erûzê li ser behra Mu-teqariba Mehzûf a 8 pengavî bi wezna *Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûl* hatiye nivîsandin. Bi tevahî ji 520 malikan pêk hatiye. Malika yekem weha ye;

Bi navê Xweda ez dikim îbtida

Dikim hemd û şukr û senaê Xweda⁶²

Berhem bi vê malikê bi dawî dibe;

Ji fetha mezin ra bikin pir şukur

Bi tekbîr; bi Ellah û ekber zikir⁶³

60 Ji bo agahiyên berfireh bnr; Mustafa Kara, "İbn Atâullah el-İskenderî", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-ataullah-el-iskenderi> (pêgehîn: 21.01.2020).

61 Ji bo berhema "el-Hikemu'l-'Etâiyye" bnr; Ibn 'Etâillâh Iskenderî, *el-Hikemu'l-'Etâiyye*, şerh: Ibn 'Ebbad en-Nefezî er-Rundî, Metabi'il-Ehram, Qahîre-Mısır, 1988.

62 Zeherî, hb. r 238.

63 Zeherî, hb. r 258.

2.3.2.12. Rîyada Me

Berhem, wergera hinek Ayetên Qurana Pîroz û Hedîsên Cenabê Pêxember (s.x.l.) in ku di berhema *Riyadu's-salihînê* da derbasdibin.⁶⁴ Mela Zahid ji serê *Riyadu's-salihînê* 72 mîjar bi nezm wergerandîye Kurmancî.

Berhem bi beşa Mûqeddîmeyê dest pê dike. Di vê beşê da dîyar dibe ku menzûme wergera berhema Îmamê Newewî ye. Piştî mûqeddîmeyê 11 beş derbarê Îman û Îslamê Mela Zahid nivîsandîye. Jî bo her beşêkê sernavê mijarê daye û derbarê mijarê da Ayet û Hedîsan watedar dike. Bi vî şiklî berhem ji 83 beş û 410 malikan pêk hatiye. Berhem bi kêşa 'erûzê hatiye nivîsandin. Wezna berhemê *Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun Fa'îlat* e ku behra Remelê ye.

Taybetîyek vê berhemê ev e ku nazimê berhemê di teşeyê da terzek cuda bikaranîye. Di beşa Mûqeddîmeyê da hemû misra bi yek serwayê hatiye honandin (Qesîda Temam Metle') ku me ev taybetî di dîwana Kurdî ya sêyem da dîti bû. Mînak ji herdû malikên beşa Mûqeddîmeyê;

Ya Xweda Ellah tu rehman û rehîm î ya şekûr

Ya Xweda Ellah tu fettah û 'elîm î ya sebûr

Ya Xweda Ellah tu wehhab û kerîm î ya xefûr

Ya Xweda Ellah bi her navê xwe tev tev nûr î nûr⁶⁵

Di beşên mayîn da serwa tenê di dawîya malikan da tèn dîtin ku heman serwaya beşa mûqeddîmeyê ye. Weke ku nazim beşa mûqeddîmeyê malika qesîdeyê ya yekem ji xwe ra hesibandibe û malika xwe muserre⁶⁶ honandibe û her beşek berhemê jî wek malikek qesîdeyê hesibandibe. Bi vê terza xwe malikên berhemê hemî bi serwaya "r" hatiye nivîsîn. Bi vî şiklî dibe berhemek "Raîyye". Wek mînak malikek ji beşa "Dê û Bav";

Ka ji dêw bavê xwo ra baş bin bi wan qencî bikin

Hûn ji wan ra (of) nebêjin ew ku bûn pîr û kebûr⁶⁷

2.3.2.13. Roj û Şev

Kesekî Musilman di şev û rojekê da pêwîste çî kar û kirinên dînî bike di vê berhemê da hatiye ziman. Nivîskar berhema xwe ji destpêk û 6 beşan ava kiriye ku bi tevahî ji 341 malikan pêk hatiye. Berhem bi teşeya Mesnewî hatiye nivîsandin.

64 Ji bo van hedîsên Pêxember (s.x.l.) bnr: en-Nevevî, *Rîyâz 'ussâlihîn*, (tercûme ve Şerhi, İhsan Özkes), İslamoğlu Yayıncılık, İstanbul, 1991.

65 Zeherî, hb. r 381.

66 Ji ew malika ku herdû misreyên wê bi yek serwayê be ew malika "muserre"⁶⁶ e û ji vî karî ra "tesrî"⁶⁶ tê gotin. Bi taybet di xezel û qesîdeyan da malika yekem bi vî rengî ye û taybetîyek xezal û qesîdeyane. (Fesayî, hb. r 301-302)

67 Zeherî, hb. r 394.

Di beşa destpêkê da nivîskar piştî Besmele, Hemdele û Selweleyê navê berhema xwe weha dîyar dike;

Weha nav me lê kir ye bû *Roj û Şev*
Çi xweş bû Musilman bixwûnin ji dev⁶⁸

Di beyta dawî ya vê beşê da nazim behr û qalibê êrûza xwe dîyar dike;
Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûl
Teqarub di behrê dida wî qebûl⁶⁹

Di dawîya berhemê da nazim navê xwe û mexlesa xwe weha anîye ziman;
Mûhemmed Zeherî me ez Zahid im
Ku van dersê dînê Xweda ez didim⁷⁰

2.3.2.14. Burdîya Kurdîya

Berhem wergera qesîdeya Ebû 'Ebdillâh Şerefuddîn Mûhammed b. Se'îd b. Hammâd b. Muhsîn el-Bûsîrî (w. 695/1296 [?])⁷¹ ye. Qesîde, derbarê medhên Cenabê Pêxember (s.x.l.) hatiye nivîsîn. Navê qesîdeyê *el-Kevâkibu'd-durrîyye fi medhî xayrî'l-berîyye* ye lê bi *Qesîdeya Burde* nav daye. Qesîde bi tevahî ji 160 malikan pêk hatiye.⁷² Mînakên wergerên vê qesîdeyê di Edebîyata Kurdî da tê dîtîn. Di sala 1957an da Muftîyê Cizîrê Mela Mehmûdê Hoserî (Bilge) (1904-1974) ev berhem wegerandîye. Mela 'Elîyê Baqustanî jî li ser wergera Mela Mehmûd texmîs nivîsandîye.⁷³

Mela Zahid, ev berhema navdar û giranbeha malik bi malik wergerandîye Kurmancî. Di serî da destpêkek ku 13 malikan pê ktê cih girtîye. Wergera qesîdeyê ji 160 malikan pêk hatiye ku her malikek 'Erebî bi malikek Kurdî hatiye wergerandin. Mela zahid di dawîyê da beşa xatîmeyê nivîsandîye ku ev beş 6 malik in. Bi tevahî berhem ji 179 malikan pêk tê. Malika yekem ji wergerê weha ye;

Qey bi bîra te ketin cîranê tey zî selemê
Der girî lew te d kirî tev hev ji çav av û demê⁷⁴

68 Zeherî, hb. r 258.

69 Zeherî, hb. r 259.

70 Zeherî, hb. r 272.

71 Ji bo agahîyên berfireh derbarê jîyana Bûsîrî da bnr; Mahmut Kaya, "Bûsîrî, Muhammed b. Saîd", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/busiri-muhammed-b-said> (pêgehî: 23.01.2020).

72 Derbarê qesîdeya Burde bnr: <https://www.kutub-pdf.net/book/%D8%A8%D8%B1%D8%AF%D8%A9-%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%AF%D9%8A%D8%AD%D9%84%D9%84%D8%A5%D9%85%D8%A7%D9%85-%D8%A7%D9%84%D8%A8%D9%88%D8%B5%D9%8A%D8%B1%D9%8A.html> (pêgehî: 23/01/2020)

73 Mehmet Zahir Ertekin, *Dîwançeya Baqustanî (Metn û Lêkolîn)*, Lorya, Van 2015, r 61-64.

74 Zeherî, hb. r 458.

Malika dawî jî ev e ji beşa xatîmeyê:
Sal hezar û çarsed û sî heşt nivîsî qelemê
Hemdê Ellah hemdê Wî der mebdê û muxtetemê⁷⁵

2.3.2.15. Ibnu'l-Werdîya Kurdîya

Mela Zahid, qesîdeya navdar *Lamiyyetû* ya Ebû Hefs Zeynuddîn 'Omer b. el-Muzaffer b. 'Omer el-Bekrî el-Qureşî el-Me'errî (w. 749/1349)⁷⁶ bi nezm wergerandîye Kurmancî.⁷⁷ Ev qesîde bi Tirkî jî hatîye wergerandin.⁷⁸

Qesîde bi giştî ji 77 malikan pêk hatîye.⁷⁹ Mijara qesîdeyê pend û şîret in. Mela Zahid, pêşî bi şeş malika beşek Mûqeddîmeyê ava kirîye û paşê qesîde malik bi malik wergerandîye Kurmancî. Di dawîya qesîdeyê da du malikên selat û selaman li ser hatîye zêdekirin. Bi vî şiklî berhem ji du beş û 85 malikan pêkhati yê. Malika pêşî wehaye;

Dûr here j behsa kilama ê dila şî'r û xezel
Heq bibê, dûr be ji şexsê pir henekvan û hezel⁸⁰

2.3.2.16. Texmîsa Ibnu'l-Werdîya Kurdîya

Ev berhem, wergera texmîsa qesîdeya *Lamî* ya Ibnu'l-Werdî ye ku 'Ebdurrehman b. Yehya el-Mellah (w. 1634 koçî)⁸¹ ew texmîs kirîye. Mela Zahid ev texmîsa el-Mellah wergerandîye kurmancî. Ew menzûme ji du beşan pêk tê. Beşa yekem Mûqeddîme ye. Beşa Mûqeddîmeyê ji du benda pêk hatîye. Beşa duwem texmîs e ku ji 77 bendan pêk hatîye. Bi tevahî dibe 79 bend. Benda pêşî weha ye;

Hûn bibin daîm ji bo Ellahê jor 'ezze wecel
Ey kesê hûn xafilin der tirs û an e'la ecel
Guh bidin van qewlê xweş hetta ku bûn derbê mesel
Dûr here j behsa kilama ê dila şî'r û xezel
Heq bibê, dûr be ji şexsê pir henekvan û hezel⁸²

75 Zeherî, hb. r 465.

76 Derbarê jîyan û berhemên Ibnu'l-Werdî bnr; Ali Şakir Ergin, İsmail Durmuş, "İbnü'l-Verdî, Zeynüddin", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-verdi-zeynuddin> (pêgehîn: 23.01.2020).

77 Ev berhema Ibnu'l-Werdî ji teref Mela Husnî Hezîn (1943- ...) bi nezm hatîye şerhkirin. Şerha Hezîn ji 167 malikan pêk hatîye. (Yakup Aykaç, *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)*, Teza Lîsansa Bilind ya neçapbûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanîsta Ziman û Edebiyata Kurdî, Çewlîg – 2015, r 333-349.)

78 Ji bo wergera Tirkî bnr: Ömer Yıldız, *Lâmîyyeler ve Manzum Çevirileri*, Kitaparası yayınları, İstanbul 2019, r 10-44.

79 Selaheddîn ez-Zemakî, *'Ewnu'l Etfal Şerhî lamîyyetî Ibnu'l-Werdî*, Daru'l Kutûbu'l 'İlmîyyetî, Lubnan 2006.

80 Zeherî, hb. r 426.

81 Derbarê el-Mellah da bnr: 'Omer Rida Kehale, *Mu'cemu'l Muellifîn*, Muessesetî'r-Rîsaletî, Beyrut- Lubnan 1993, berg 2, r 126.

82 Zeherî, hb. r 429.

2.3.2.17. Cewşena Me

Cewşen, navê berhemekê ye ku naveroka wê munacat û dû'a ye.⁸³ Derbarê bingeha wê da nîqaş hebin jî⁸⁴ hatîye pejirandin ku Cenabê Pêxember ev dû 'a fêrî ummetê kirîye. Bi taybet di berhemên Bedî'uzzaman Se'îdê Kurdî da gelek behsa vê munacatê hatîye kirin.⁸⁵ Mela Zahid ev berhema pexşan ji zimanê 'Erebî wergerandiye Kurmancî. Berhem bi teşeya qesîdeyê hatîye honandin. Bi tevahî jî 206 malikan pêk hatîye. Malika yekem ev e;

Hezar nav in ji bo Ellah di Cewşen tev de îman e

Evan navê Xweda tev da di vê nezma me da va ne⁸⁶

LÎSTEYA BERHEMÊN MELA ZAHID					
Cüreyên Berheman	Rêz	Nav	Ziman	Hejmara Helbestan	Taybeti
Şîr	1	Dîwan -1-	Kurdî	40	Muretteb
	2	Dîwan -2-	Kurdî	134	Muretteb
	3	Dîwan -3-	Kurdî	124	Muretteb
	4	Dîwan -1-	Erebî	28	Muretteb
	5	Dîwan -2-	Erebî	28	Muretteb
	6	Dîwan -3-	Erebî	39	Muretteb
	7	Dîwan	Tirkî	67	Dîwance
Hejmara Helbestan				460	
				Hejmara Malikan	
Menzûme	1	Mewlûda Me Ya Nû	Kurdî	1482	Te'lif
	2	Mewlûda Zat'us-şîfa	Kurdî	567	Wergera Ji 'Erebî
	3	'Eqîda Şêxê Xanî	Kurdî	79	Wergera Navzîmanî
	4	Nehcû'l Enama Sanî	Kurdî	308	Wergera Navzîmanî
	5	Amentû	Kurdî	660	Te'lif
	6	Dersa Geda	Kurdî	52	Te'lif
	7	Pêsed "Taîye" ta Medhê Resûlullah (s.x.l)	Kurdî	500	Te'lif
	8	Pêsed Beyta Mekke û Medîne	Kurdî	500	Te'lif
	9	er-Risale't'un-neffe	Kurdî	56	Wergera Ji 'Erebî
	10	Hikmetname	Kurdî	502	Wergera Ji 'Erebî
	11	Wesîyeta Mîn	Kurdî	519	Te'lif
	12	Rîyada Me	Kurdî	410	Wergera Ji 'Erebî
	13	Roj û Sev	Kurdî	341	Te'lif
	14	Burdîya Kurdîya	Kurdî	179	Wergera Ji 'Erebî
	15	Ibnu'l-Werdîya Kurdîya	Kurdî	85	Wergera Ji 'Erebî
	16	Texmîsa Ibnu'l-Werdîya Kurdîya	Kurdî	197	Wergera Ji 'Erebî
	17	Cewşena Me	Kurdî	206	Wergera Ji 'Erebî
Hejmara Malikan				6643	
Pexşan	1	Fihrişu'l Quranu'l Kerîm			

83 Mehmet Toprak, "Cevşen", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/cevşen> (pêgehî: 23.01.2020).

84 Abdullah Aydınlı, Cevşen Duası -Kaynakları Hakkında Bir İnceleme-. *Usul İslam Araştırmaları* 15 / 15 (Haziran 2011): 7-29.

85 Bediüzzaman Saîd Nursî, *Sözler*, Yeni Asya Neşriyat, İstanbul 1996, r 302. ; Bediüzzaman Saîd Nursî, *Mesnevî-i Nûriye*, mütercim: Abdülmecid Nursî, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2003, r. 186. ; Bediüzzaman Saîd Nursî, *Emirdağ Lâhikası*, Sözler Yayınevi, İstanbul 1993, r. 150.

86 Zeherî, hb. r 484.

3. Kesayeta Wî Ya Edebî:

3.1. Poetîka Mela Zahid

Mela Zahid, perwerdehîya xwe di medreseyan da dîtîye. Ji ber hindê di warê zanistên Îslamî da zana ye û di zimanê 'erebî da jî pispor e. Ev perwerdehî bandor li fikr û ramanên wî jî kirîye ku ev yek di berhemên wî da rû daye. Hem ji naveroka şî'r û menzûmeyên wî û hem jî ji cûreyên berhemên wî ev yek xwuya dibe.

Mela Zahid, xwestîye ku bîr û bawerîyên Ehlê sunnet û cemaet ji gel ra rave bike, van bîr û bawerîyan di nava gel da belav bike û qaîm bike. Ev, poetîka Mela Zahid e ku di şî'r û menzûmeyên wî da cih girtîye.

Piştî dîwanên 'Erebî bi dawî dibin, Mela Zahid, di destpêka berhemên Kurdî da destpêkek kurt bi pexşan nivîsandîye. Ev destpêk li ser pirsra *Min çima nivîsî?* hatîye avakirin. Di bersîvê da Mela Zahid poetîka xwe weha dîyar dike:

"Heta ku saxbim bi zimanê xwe, bimrim jî bi deng û qelema xwe ezê teblîxa Îslamê bikim. Belkî însanê xafil qelbê wî nerm bibe. Ji dunyayê pirtir bibe muşterîyê axretê. Qelbê wî bi îmanê bibe mêrga cennete, bibe ehle kar û menfî'etê. Hem ji bo xwe hem ji bo milletê belkî (ne întîhar, xelet e) întîhar⁸⁷ neke, xwe navêje felakete."⁸⁸

3.2. Zimanê Şî'r û Helbestan

Mela Zahid, ji bilî Kurdî, zimanê 'Erebî û Tirkî jî dizane. Ji xwe bi hersê zimanan jî berhem nivîsandî ye. Di berhemên Kurdî da bêjeyên 'Erebî gelek tên dîtîn. Bi sedema ku mijarên berhem û şî'rên wî olî ne, têgih û bêjeyên Îslamî zêde cih girtine. Ji van bêjeyên 'Erebî gelekî wan di nava gel da, di axaftina rojane da tên bi karanîn; weke bêjeyên *'Îd, Matem, Xerîb, Mefxer, 'Alem* di malika jêr da derbasdibin;

Di *îdê* da çewa kêf kim ne kim şîn û ne kim *matem*

Di gel dûr û *xerîbim* ez ji te ey *mefxerê 'alem*⁸⁹

Hin bêjeyên 'Erebî jî ji bo kêş û serwayê hatine bikaranîn ku bi piranî di nava gel da nayên bikaranîn û têgihîştina wan hebekî zehmet e. Weke bêjeya *la berah* ku di malika jêr da derbas dibe.

Daîm li dergahê restûl bin roj û şev

Daîm li dergahê biseknin *la berah*⁹⁰

87 Mela zahid bi pîtên 'Erebî weha nivîsandîye: (نه إنتهار, غلطة) انتحار). Seyda di bêjeya «întîhar»ê da pîta «h» weke şaşî dipejirîne û pêwiste bi pîta (ح) bête nivîsandin. Mel Zahid, di heman demê da li ser Etîmolojîya bêjeyan jî dixebite û gelek alav berhev kirine. Lê ta neha derbarê vê zanistê da tu berhem ne nivîsandîye. (Hevpeyvîn bi Mela Zahid ra 21.01.2020)

88 Zeherî, hb. r 112.

89 Zeherî, hb. r 309.

90 Zeherî, hb. r 359.

Mela zahid di helbestên xwe da bêjeyên tirkî û bîyanî (ne 'erebî û farsî) jî bikaranîne. Lê hejmara wan ne zêde ne. Weke di malika jêr da bêjeyên *Binlerce* û *Kilometre* ji Tirkî û Firansî hatine wergirtin.

Ez 'aşiqê husna ferîd ez 'aşiqê husna wehîd

Ahîn dikim jê mam be'îd *binlerce kilometre*⁹¹

Mela Zahid, bi zimanê Farsî nizane. Lê di şî'rên wî da gelek bêjeyên Farsî jî derbasdibin. Tevî ku bi Farsî nizane û bi Tirkî dizane bikarnîna bêjeyên Farsî jî yên Tirkî gelekî zêdetir in. Ev jî weke bandora Melayê Cizîrî, Şêx Ehmedê Xanî, Mela Xelîlê Sêrtî û berhemên klasik xwuya dike. Weke di malikên jêr da bêjeya *Golzara*, *Bende*, *Rûsîyah*, *Şermende*, *Perakende* ku ji zimanê Farsî bideyn hatine sitendin.

Bi golzara cemala xwe qebûl kî min ez im bende

Li heşrê da neminim rûsîyah û jar û şermende

Bes e ez mam e 'ebdal û perişan û perakende

Ji ber şewqa wîsala te dile min tev xem û derd e⁹²

3.3. Bandora Kesayetên Edebî û Dînî

Di berhemên Mela Zahid da em bandora Melayê Cizîrî, Şêx Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî (1680 – 1760), Mela Xelîlê Sêrtî, Bedî'uzzaman Se'îdê Kurdî û şêxê Mela Zahid, Şêx Mûhemmed S'êdê Taxikî bi zelalî dibînin.

Di şî'rên Mela Zahid da bandora Melayê Cizîrî eşkere xwuya dibe. Di malika jêr de di warê 'işqê da xwe dişibihîne Melayê Cizîrî û dibêje Cizîrîyê vê demê ez im;

Îro jî ez bûm Cizîrî Zahid Mûhemmed Zeherî

Her kî xwendî vê eserî wî daye min tesdîqetê⁹³

Mela Zahid helbestek Melayê Cizîrî "Tezmîn"⁹⁴ kirîye ku hem bandora melayê Cizîrî eşkere dike û hen rengînyek daye helbesta wî. Destpêka helbestê weha ye;

Cizrewî Ehmed Mela sultan û şahê 'aşiqîn

Xweş beyan kir halê 'işqa dilbirîn û xem revîn

Tev heyata wî ku bû 'işqa ezel Heqqelyeqîn

Hem di go der kêf û şahî hem di go der huzn û şîn⁹⁵

*Hêj li ser 'ehda elestim ta biroja axirîn*⁹⁶

Ji layê bîr û bawerîyan Mela Zahid, şopînerê Şêx Ehmedê Xanî û Mela Xelîlê

91 Zeherî, hb. r 352.

92 Zeherî, hb. r 309.

93 Zeherî, hb. r 357.

94 Tezmîn eve ku şa'irek di helbestek xwe de misrayekê yan beytekê şî şa'irekî din bi deyn bistîne. Lê di vê navê şa'ir bête gotin ji bo ku bêhna dizîyê û întîhalê jê neyê kirin. Fesaî, hb. r 565.

95 Zeherî, hb. r 585.

96 Ev misraya Melayê Cizîrîye. Bnr; Cizîrî, *Dîwan*, hb. r 147.

Sêrtî ye. Bi vê sedemê nêrînên wan yê bawerîyê pejirandîye û bi vê bandora herdû kesayetên, berhemên wan ji nû ve bi zimanê rojane nivîsandîye.

Bê şik, Mela Huseynê Bateyî di Edebîyata Kurdî da damezrînerê *Mewlûdnameyan* e.⁹⁷ Bi taybet *Mewlûdnameyên Kurmancî* hemû di bin bandora *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî* da hatine nivîsandin. Mela Zahid jî yek ji wan nivîskarê *Mewlûdnameyan* e ku bi vê bandorê du *Mewlûdname* li Edebîyata Kurdî zêde kirî ye.

Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî, hem bi ramanên xwe û hem bi şiklê nivîsîna berhemên xwe tesîrek mezin li Mela Zahid kirî ye. Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî ji bo belavkirina bawerîyên Îslamê berhem nivîsandîye û xwestîye ku ummet li ser wan bawerîyan bimeşe. Weke ku di poetîka Mela Zahid da hate gotin, Mela Zahid jî li ser vê yekê xemxwar e û bi vê egerê şî'r û nezm honandîye.

Di serê beşên berhemên Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî de beşek Mûqeddîmeyê bi cih bûye. Herweha Mela Zahid jî di serê berhemên xwe da beşek bi navê Mûqeddîmeyê terxan kirîye ku ev bandora terza rîsaleyên Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî ye. Lewra di Edebîyata Klasîk da bi taybet di serê qesîdeyan da beşên Mûqeddîmeyan nayên dîtin.

Şêx Mûhemmed S'êdê Taxîkî, Şêxê Mela Zahid e û di derbarê bawerîyên selefî û şî'î da berhemên reddîye nivîsandîye. Mela Zahid, weke şêxê xwe difikire ku ev bawerî di nava civaka wî da belav dibe û di derbarê van bawerîyan da civaka xwe hişyar dike. Hem bi wergerandina berhemên şêxê xwe û hem bi honandina şî'rên di vî biwarî da bandora şêxê wî eşkere dibe.

Wehareng, Mela Zahid, herî zêde di bandora sê kesayetên dînî da maye. Di warê tesewîfê da Îmamê Xezalî (w. 505/1111)⁹⁸, di warê hezkirina Cenabê Pêxember (s.x.l.) Nebhanî (1849-1932)⁹⁹ û di warê teblîxa bawerîyên Îslamê da Bedî'uzzeman Se'îdê Kurdî¹⁰⁰ ji Mela zahid ra sê kesayetên girîng in.

97 Bnr. M. Zahir Ertekin, "Di Edebiyata Me de Mewlûd û Danberheva Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî", Gotarên Konferansa Kurdolojîyê, Edt. İbrahim Seydo Aydoğan, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî 2011, r. 123-137.

98 Navê wî Hucetü'l-İslâm Ebû Hâmid Muhammed b. Muhammed b. Muhammed b. Ehmed el-Xezâlî et-Tûsî ye. 'Alimekî Îslamê ye giring e. Di zanistên kelam, fiqhî û tesewîfê da gelekî pêşketîye. Bi navê Îmamê Xezalî tê nasîn. Derbarê Îmamê Xezalî da bnr: Mustafa Çağrıncı, "GAZZÂLÎ", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gazzali#1> (pêgehî: 13.02.2020).

99 Navî wî Qadî Ebu'l-Mehasin Yûsif b. İsmâ'îl b. Yûsif eş-Şâfî'î en-Nebhanî ye. Ji bo agahîyên berfireh bnr: M. Sait Özervarlı, "Nebhânî, Yûsuf b. İsmâîl", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/nebhani-yusuf-b-ismail> (pêgehî: 13.02.2020). Nebhanî derbarê pesnên Cenabê Pêxember da berhemek 4 bergî nivîsandî ye. Derbarê vê berhemê da bnr: en-Nebhanî, *El Mecmû'et'ul- Nebhaniyyeti Fî Medaîhî'n- Nebewîyeti*, Daru'l Kutub, Beyrut-Lubnan 1996.

100 Hevpeyvîn bi Mela Zahid ra, 22.09.2019.

3.4. Teşe û Cûreyên Nezmê

Mela Zahid, ji teşeyên nezmê Xezel, Qesîde, Rûba'î, Musemmet ên cûda, Qit'e, Mesnewî, Terkîb-î Bend, Tezmîn û Mulemme' bi kar anîye ku bi me dide zanîn di bikaranîna teşeyên nezmê da serkeftî ye. Mela Zahid, dî helbestên xwe da navên teşeyên nezmê bi kar anîye ku ev yek jî bi me di de zanîn ku Mela Zahid ji edebîyatê agahdar e.

Bi soz be ta ku ez sax bim li دنیاê ezê bêjim

Medih û wesf û şanê te bi **texmîs** û bi **tesdîsa**

Herweha, weke li jor hate gotin, hebûna serwayê di hemû misrayan (Qesîdeyên Temam Metle') da û dubarekirina pîta serê malikê di dawîya malikê da di seranserê yek dîwanekê da di honandina şî'rê da serdestîyek girîng e. Honandina qesîdeyên dirêj – 500 malik – û herfiye şarezabûna şa'irî derdixê holê.

Ji layê cûreyên nezmê va dîwanên Mela zahid ne yek alîye. Gelek cûreyên nezmê hatine bikaranîn ku *Medhîye*, *Mersîye*, *Şîretname*, *Remezanname*, *Tewbenname*, *Munacat*, *Cîhadname*, *Silsilename* û *Erûzname* ji wan in. Li jor di danasîna dîwanê da mînak ji malikên "*Erûzname*" û "*Silsilename*"yê hatine dayîn. Wehareng honandina *Elîfname* û *Herfname* yan jî taybetîyên cûreyên helbestên Mela Zahid in.

3.5. 'Erûz

'Erûz, hêmanekî sereke ye di şî'r û nezma Edebîyata Klasîk da. Mela Zahid, pisporê 'Erûzê ye. Li gorî ramanên Mela Zahid, şî'r û menzûmeyên bê kêşa 'erûzê hatibin nivîsandin bê çêj e. Lewra 'erûz, ritm û melodîyê dide şî'r û nezmê û hêza şî'rê xurt dike.¹⁰¹ Ji bo vê Mela zahid berhemek tenê (*Dersa Geda*) û çend şî'rên xwe (yên di xortanîya xwe da nivîsandine) bi kêşa xomaliya Kurdî nivîsandiye û yê mayî hemî bi kêşa 'erûzî honandîye.

Herçend di Edebîyata Kurdî da Şêx Ehmedê Xanî di serê her beşek Nûbeharê¹⁰² da, Şêx Mûhememd Kerbelayî di serê her beşek Mîrsad'ul Etfal/ Şahrahê Kûdekan¹⁰³ da behr û qalibên beşan diyar kiribin, Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepi¹⁰⁴ û Seyid 'Elîyê Findikî¹⁰⁵ di serê hin helbestên xwe da wezna kêşê nivîsandibin jî, em dibînin ku Mela Zahid, du helbest xwerû terxankirî ye ji bo 'Erûzê û di helbestan da 16 behr û qalibên 'erûzê dîyarkirî ye. Ev girîngîya 'erûzê ji bo Mela Zahid derdixê holê.

101 Hevpeyvîn bi Mela Zahid ra, 22.09.2019.

102 Ehmed Hilmî el-Qoxî, *Rehberê 'Ewam, Şerha Nehcu'l-Enam*, Mektebetî Seyda, Çapa Pêncem, Dîyarbekir 2017.

103 Ramazan Pertev, *Ferhenga Kerbelayî: Mîrsad'ul Etfal/ Şahrahê Kûdekan*, Nûbihar, İstanbul 2012

104 Şêx 'Evdirehmanê Aqtepi. *Dîwana Rûhî*, Uppsala: Weşanên Roja Nû, 1988.

105 Seyîd 'Elî Findikî, *Dîwan*, Amadekar Selman Dilovan, Nûbihar, İstanbul 2004, Çapa Sêyem.

3.6. Wergerên Mela Zahid

Werger bi xwe karekî gelek dijwar e û qabilîyetek mezin û pisporîyekî dixwaze. Berhemek pexşan bi pexşan were wergerandin heta astekê asan e. Lê wergera berhemek pexşan bi nezm dijwar e û wergera berhemek menzûm bi nezm dijwartir e. Bi taybet ku ji bo her malikekê malikek wergerê bête terxankirin.

Çi divê bila wergera navzimanî/navmetnanî be û çî divê bila wergera navbera du zimanan be. Mela Zahid, du berhem ji klasîkên Kurmancî; *Eqîdename ya Şêx Ehmedê Xanî* û *Nehcu'l Enam a Mela Xelîlê Sêrtî* bi wergerek navzimanî wergerandiye. Berhema Şêxê xwe Şêx Mûhemmed Se'îdê Taxîkî *er-Rîsalet'un-nefî'e* û berhema Etâillâh el-Iskenderî *el-Hîkemu'l-'Etâiyye* ku pexşan in bi nezm wergerandiye. Wehareng ji 70yî zêdetir ayet û hedîsên Cenabê Pêxember yên di berhema Îmamê Newewî *Riyadu's-salihînê* da derbas dibin bi nezm wergerandiye.

Berhema el-Cezerî bi navê *Zâtu's-şîfâ fi sîretî'n-nebiyyû ve'l-xûlefâ* û hin berhemên din weke *Qesîda Burde* ya Îmam Buseîrî, *Lamîyetu* ya Îbnî Werdî ku menzûm in bi nezm wergerandiye Kurmancî. Bi van wergerên xwe, Mela Zahid, dide nîşandayîn ku hem di warê wergerê da, hem di warê honandina menzûmeyan da û hem di warê zimanê 'Erebî da gelekî serkeftî ye.

Encam

Ev xebat di çerçoweya nasandina nazim û şa'îrekî nenaskirî û danasîna berhemên wî da hatîye amadekirin. Bi vê sedemê hemû taybetîyên berhemên Mela Zahid neketin gotarê, lewra gotarek ewê têrê neke. Pêwîst e xebat û lêkolînên berfireh li ser van berheman bînin kirin. Hêvîya me ev e ev gotar bibe sedemên xebatên pîralî û berfirehtir.

Weke tradîsyonek 'alimên Kurdan, helbestkarên kurd ên klasîk, Mela Zahid jî bi sê zimanan berhem nivîsandîye. Pîrên helbestkarên kurd ên klasîk bi Farsî berhem nivîsandine lê Mela Zahid jî dêleva Farsî bi Tirkî berhem nivîsandîye ku ev taybetîyek wî ye.

Mela Zahid di vê serdemê da, bi bikaranîna bêjeyên 'Erebî û Farsî û teşe û cureyên klasîk şopînerêkî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Mela Xelîlê Sêrtî ye.

Mela Zahid, dilsozekî Îslam û Qurana Pîroz e. Her xwestîye eqîda ehlê sunnet û cema'et di nav gel de belav bibe û gel li ser wê bawerîyê be û dûr bibe ji bawerîyên selefîyan û şî'yan.

Mela Zahid, hemû berhemên xwe yên şî'r û nezm di berhemek forma A4'ê da civandiye ku hejmara rûpelan gihaştîye 752yan. Dema werin çapkirin pêkan e ku ji 1000 rûpelî derbas bike.

Mela Zahid hem şî'r nivîsandine û hem menzûme honandine. Hem berhemên pexşan û hem berhemên menzûm bi nezm wergerandiye. Di heman demê da,

du klasîkên Edebîyata Kurdî jî bi nezm ji nûve nivîsandî ye. Di her çar qadan da jî serkeftî ye.

Mela Zahid du Mewlûdname li Edebîyata Kurdî zêde kirîye ku yek ji van Mewlûdnameyan wergera Sîrenameyek menzûm e. Li gor jêderên berdestên me di warê wergera mewlûdek menzûm da mînaka yekem e.

Mela Zahid du 'Eqîdenameyên klasîkên Edebîyata Kurdî; 'Eqîdenameya Şêx Ehmedê Xanî û Nehcu'l Enama Mela Xelîlê Sêrtî bi heman wateyên wan ji nû ve nivîsandîye. Wehareng, du 'Eqîdename jî bi xwe nivîsandîye û dîyarîyê Edebîyata Kurdî kirîye. Bi vî şiklî çar 'Eqîdename yên menzûm li Edebîyata Kurdî zêde kirîye.

Mela Zahid du qesîdeyên ji klasîkên Edebîyata 'Ereban û çanda Îslamê wergerandîye Kurdî. Ji van qesîdeyana *Lamîyetu* ya Îbnî Werdî cara yekem e bi Kurdî tê wergerandin li gorî jêderên berdestên me.

Li gor jêderên berdestên me Ne'ta herî dirêj bi 500 malikî ji teref Mela Zahid va hatîye nivîsîn ku di heman demê da qesîdeyek *Taîye* ye. Herweha qesîdeya li ser her dû bajarên; Mekke û Medîne jî di vî warî (bi zêdebûna malikan) da qesîdeya yekem e.

Bi avakirina du Dîwanên Nû'ûtan; yek bi 'erebî û yek bi Kurdî tradîsyona avakirina dîwanên Nu'ûta berdewam kirîye û Dîwanek Nu'ûta li Edebîyata Kurdî zêdekiri ye.

Bi bikaranîna Mûqeddîmeyan di serê berhemên menzûm da nêrîteya nivîsandina menzûmeyan ne şopandî ye û şêweyek nû derxistîye holê

Mulemme'ên serbixwe ji teref kêma şa'iran va tînan honandin. Mela Zahid Mulemme'ek bi sê zimanî honandîye. Wehareng, hem bi Tirkî û hem bi Kurdî gelek *Elîfname* û *Herfname* di dîwanên Mela Zahid da tînan dîtî.

Ji cûreyên edebî pendname û şîrenameyên serbixwe kêma tînan dîtî. Mela Zahid di vî qadê da berhemek menzûm dîyarîyê Edebîyata Kurdî dike.

Hemû berhemên Mela Zahid hem bi halê dijîtal û hem wek nusxeyên kompîtorê li ber destê wî ne (û li ber destê me ne) û heta niha nehatine çapkirin.

Hem û dîwanên Mela Zahid, li gorî herfên serwayê bi rêbaza elîfbaya 'Erebî bi rêk û pêk hatine amadekirin.

Hemû berhem û helbestên Mela Zahid di xizmeta têkoşîna belavkirina bawerîyên ehlê sunnet û cema'et da ne. Bi vî awayî helbestên xwe xistîye xizmeta bawerî û ramana xwe ya dînî.

Mela Zahid, pisporê 'erûzê ye û di şî'r û nezmên xwe da bi serkeftî 'erûz bi kar anîye. Di sala 2020 da şa'ir û nazîmek; şî'r, nezm û 'erûz ji bo daw û doza xwe bi kar anîne, ew kirine amraz ji bo xizmeta doza xwe û bi ser ketîye.

Mela Zahid, bi nivîsandina şî'r û menzûmeyên xwe cihekî taybet digire di Edebîyata Kurdî da. Lewra hem Şa'ir e, hem Nazim e, hem Wergêrvan e, hem teşe û cûreyên edebî li Edebîyata Kurdî zêde kirî ye û hem di sala 2020an da bi terza Edebîyata Klasîk tevgerîya ye.

ÇAVKANÎ:

- 'Omer Rida Kehale, *Mu'cemu'l Muellifîn*, Muesseseti'r-Rîsaletî, Beyrut-Lubnan 1993.
- Altinkulaç, T. "İbnü'l-Cezerî", TDV *İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-cezeri> (pêgehî: 19.01.2020).
- Aydınlı, A. (2011). Cevşen Duası -Kaynakları Hakkında Bir İnceleme. *Usul İslam Araştırmaları*, 15 / 15 (Haziran 2011): 7-29.
- Aykaç, Y. (2015). *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)*, Teza Lîsansa Bilind ya neçapbûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Çewlîg.
- Batar, Y. (2018). Şeyh Mûşerref'in Hayatı, Eserleri ve Eğitim-Öğretimle İlgili Görüşleri, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler, Muş Alparslan Üniversitesi Yayınları*, Muş.
- Berwarî, M. A. (2020). *Dehdehê Evînê*, Amadekar: Yakub Aykaç-Hanifi Taşkın, Weşanên Lorya, Van 2020.
- Celaeddîn Humayî, C. (1373). *Funûnê Belaxet û Sina'atê Edebî*, Çapxane ê Stare, Qûm, Îran.
- Cizîrî, M. A. (1987). *Dîwan*, Werger: Z. Abidin Kaya, M. Emîn Narozî, Weşanên Roja Nû, Stockholm.
- Çağrı, M. "Gazzâlî", TDV *İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gazzali#1> (pêgehî: 13.02.2020).
- Dilçin C. (1992). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 1992.
- el-Qoxî, E. H. (2017). *Rehberê 'Ewam, Şerha Nehcu'l-Enam*, Mektebetî Seyda, Çapa Pêncem, Dîyarbekir.
- en-Nebhanî, (1996). *El Mecû'et'ul- Nebhanîyyeti Fî Medaîhi'n-Nebewîyyeti*, Daru'l Kutub, Beyrut-Lubnan.
- en-Nevevî, (1991). *Rîyâz'ussâlîhîn*, (Tercüme ve Şerhi, İhsan Özkes), İslamoğlu Yayıncılık, İstanbul.
- Ergin, A. Ş. ; Durmuş, İ. "İbnü'l-Verdî, Zeynüddin", TDV *İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-verdi-zeynuddin> (pêgehî: 23.01.2020).
- Ertekin, M. Z. (2015). *Dîwawçeyya Baqustanî (Metn û Lêkolîn)*, Lorya, Van.
- , M. Z. (2015). *Mewlûda Mela 'Elîyê Baqustanî (Metn û Lêkolîn)*, Lorya, Van.
- , M.Z. (2011) *Di Edebiyata Me de Mewlûd û Danberheva Mewlûdên*

- Pêşîn ên Kurdî û Tirkî*, Gotarên Konferansa Kurdolojiyê, Edt. İbrahim Seydo Aydoğan, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî.
- ez-Zemakî, S. (2006). *'Ewnu'l Etfal Şerhî lamîyyetî Ibnu'l-Werdî*, Daru'l Kutûbu'l 'İlmîyyetî, Lubnan.
- Güzel, A. (2019). *Dinî-Tasavvufî Türk Edebiyatı El Kitabı*, Akçağ Yayınları, Ankara.
- Hevpeyvîn bi Mela Zahid ra 16.06.2019, 22.09.2019 û 11.02.2020- Amed.
- <https://www.kutubpdf.net/book/%D8%A8%D8%B1%D8%AF%D8%A9%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%AF%D9%8A%D8%AD%D9%84%D9%84%D8%A5%D9%85%D8%A7%D9%85%D8%A7%D9%84%D8%A8%D9%88%D8%B5%D9%8A%D8%B1%D9%8A.html>(pêgehî:23.01.2020)
- İskenderî, I. 'E. (1998). *el-Hikemu'l-'Etâiyye*, şerh: Ibn 'Ebbad en-Nefezî er-Rundî, Metabi'el-Ehram, Qahîre-Mısır, 1988.
- İbnü'l-Cezerî, Ebû'l-Hayr Muhammed b. Muhammed b. Muhammed, (2017). *"Mukaddime", Zâtu's-şifâ fi sûretî'n-nebiyyi ve'l-xulefâ*, thk. Hâyif en-Nebhân, Dâru'l-Zâhiriyye, Kuveyt.
- Kandemir, M. Y. "nevevî", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/nevevi> (pêgehî: 21.01.2020).
- Kara, M. "İbn Atâullah El-İskenderî", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-ataullah-el-iskenderi> (pêgehî: 21.01.2020).
- Kaya, M. "Bûsîrî, Muhammed b. Saîd", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/busiri-muhammed-b-said> (pêgehî: 23.01.2020).
- Mehwî, (2018). *Dîwan*, Latînekirin: M. Z. Ertekin - H.'U. Xoşnav, Lîs, Diyarbakır.
- Mela Zahid Zeherî, *Dengê Ehlê Sunnet û Cema'et*, Berhema neçapbûyî.
- Mucan, Y. (2015). *Tanzimat'tan Bugüne Divan Şiiri Geleneğinde Yazılmış Na'tlerin İncelenmesi*, Yüksek Lisans Tezi, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, İstanbul.
- Mutçalı, S. (2015). *Arapça - Türkçe Sözlük*, Dağarcık yayınları, İstanbul.
- Nursi, B. S. (1993). *Emirdağ Lâhikası*, Sözleryayınevi, İstanbul 1993.
- , B. S. (1996). *Sözler*, Yeni Asya Neşriyat, İstanbul.
- , B. S. (2003). *Mesnevî-i Nûriye*, mütercim: Abdülmecid Nursî, Zehra Yayıncılık, İstanbul.
- Özerverli, M. S. "Nebhânî, Yûsuf b. İsmâil", *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/nebhani-yusuf-b-ismail> (pêgehî: 13.02.2020).
- Pertev, R. (2012). *Ferhenga Kerbelayî: Mîrsad'ul Etfal/ Şahrahê Kûdekan*, Nûbihar, İstanbul.
- Restgar Mensûr Fesâî, R. M. (1380). *Enwa'ê Şîrê Farisî*. İntişaratê Nuwêd, Şîraz, İran.
- Saraç, M. A. Y. (2014). *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belâgat*, Gökkuşbu Yayınları, İstanbul.
- Seyîd 'Elî Findikî, S. 'E. (2004). *Diwan*, Amadekar Selman Dilovan, Nûbihar, İstanbul.
- Taşkesenlioğlu, L. (2017). *Divan Edebiyatında Elifnameler Ve Bilinmeyen İki*

Elifname Örneği: Memi Can Saruhânî Ve Ömer Karîbî Elifnameleri, *Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi [Taed]*, 58, Erzurum.

Topaloğlu, B. “ez-Zevâcir an İktirâfî'l-Kebâir”, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ez-zevacir-an-iktirafil-kebair> (pêgehîn:13.02.2020).


Toprak, M. “Cevşen”, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, <https://islamansiklopedisi.org.tr/cevşen> (pêgehîn: 23.01.2020).

Xanî, Ş. E. (2008). *‘Eqîdeya İmanê*, Analiz ve Şerh: Kadri Yıldırım, Avesta, İstanbul.


Yıkılmaz, A. (2010). Molla Muhammed Said El-Amedî (Yıkılmaz) Hayatı, İlmi Ve Tasavvufi Yönü, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi -www.e-sarkiyat.com*- ISSN: 1308-9633 Sayı: IV, Kasım 2010.


Yıldız, Ö. (2019). *Lâmiyyeler ve Manzum Çevirileri*, Kitaparası yayınları, İstanbul.

Pêvek 1: Berga Berhema Mela Zahid.



Pêvek 2: Berga Berhema Mela Zahid Ya bi Navê Dersa Geda.



Pêvek 3: Wêneyê Mela Zahid.

MUQAYESEYÊ SONIKANÊ KÊZ XATÛN A KURMANCÎ Û GÛLAL XATÛN A ZAZAKÎ Kürtçe Kêz Xatûn ve Zazaca Gûlal Xatûn Masallarının Karşılaştırılması

The Comparison of Kurmancî Kêz Xatun
and Zazaki Gulal Xatun's Tales

Pervin SEPTİOĞLU¹

Xulase

Meqsedê ina xebata ma sonika Kêz Xatûn a Kurmancî û sonika Gûlal Xatûn a Zazakî sero yew muqayese yo. Eserî anonîmî senî ameyî meydan û komî dora vêrîn vato kifşe nîyî la vatişê yîn fek ra fek ameyî û resayî ma. Sonikî, goreyê hûnerê vatoxan, goreyê kultur û uslubê vatoxan newera şekil genî, ino semed ra varyantêko newe yeno meydan. Varyantê sonika Gûlal Xatûn, ziwananê Zazakî û Kurmancî di, miyanê şarî di zaf vecîyeno vernîyê ma. Ma hêverî kilmîyê sonikan danî û dima qehremananê sonikan, ca û wextê sonikan îzeh kenî. Dima cîyatî, şîrîkî û lezvatayanê sonikan muqayese kenî.

Kelîmeyî Mifteyî: Muqayese, Sonik, Kêz Xatun, Gûlal Xatûn, Kurmanckî, Zazakî.

Özet

Çalışmamızın amacı Kürtçe “Kêz Xatûn” ile Zazaca “Gûlal Xatûn” masallarının karşılaştırılmasıdır. Anonim eserlerin nasıl oluştuğu ve ilk söyleyicileri belli değildir ama söylemleri ağızdan ağıza bizlere ulaşmıştır. Masallar, anlatıcının kabiliyeti, kültürü ve üslubuyla yeniden şekillenirler, sonuçta yeni bir varyant oluşur. Halk arasında masalların Kürtçe ve Zazaca farklı varyantlarına rastlamaktayız. Öncelikle masalların özetini yapıp, sonra masalların figürlerini, mekân ve zaman unsurlarını izah edeceğiz. Masallarda geçen tekerlemeleri, masalların farklı ve ortak yönlerini karşılaştırmaya çalışacağız.

Anahtar Kelimeler: Karşılaştırma, Masal, Kêz Xatun, Gûlal Xatûn, Kürtçe, Zazaca.

1 Wendekara Lîsansê Berzî, Unîversîteya Bîngolî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan Qisimê Edebîyat u Ziwanê Zazakî. pervin-septi@hotmail.com

Abstract

The aim of our study is a comparison on Kurdish “Kêz Xatûn” fairy tale and Zaza “Gûlal Xatûn” tales. It is unknown how the anonymous works’ are formed and their first sayers are unclear. But their sayings have reached us by word of mouth. Tales are reshaped with the talent, culture and style of the narrator. All in all it consists a new variant. We encounter different Kurmanci and Zazaki variants of the tales among the people. First, I will make a summary of the fairy tales and then explain the figures, places and times of the fairy tales. Then the rhymes, different and common aspects of the tales will be compared.

Keywords: Comparison, Fairy Tale, Kez Xatun, Gulal Xatun, Kurdish, Zazaki.

1. Destpêk

Her çendik zîwanê mîletan çîya bibo zî, benateyê mîletan di tekîliyanê folklorî, kûltîr û sewbîna çîyan estî. Kûltîrê mîletan çendik çîya bibo zî, ê mîletî waharê ûrf-edet û bawerîyanê şîrîk î û ino rid ra sonikanê yîn manenî yewbînan. Wexto kî folklorînasî muhîmîyê folklorî û bixususîyet muhîmîyê sonikan ferq kerdî, vilabîyayîşê sonikan sero vindertî. “Dinya di dora vêrîn Birayanê Grimman kewtî mîyanê şarê xu û bihewayêko îlmî folklorê Almanî sero xebitîyayî û sonik û deyîranê şarî arêdayî” (Oğuz, 2010: 38).

Dinya di tarîxê destpêkerdişê xebatanê folklorê muqayeseyînî zî; eynî sey edebîyatê muqayeseyînî sereyê seserra XIX. di dest pêkerdo. Wexto kî Birayanê Grimman sonik û deyîranê Almanan arêdayî, di kî yew qisimê inê deyîran, welatê zimeyî bîn di zî estî. Inê metnê zimeyî, bi metnanê Almankî muqayese kerdî. Peynî di teorîyêka mîtolojîk eşt werte; “dewirê mîtîk di qowmî kî eqreba yî, folklorê yîn zî eynî yî.” (Türkmen, 2008: 113).

Xebatê Grimman ra dima Ewropa di mîyanê şarî di yew xebatê arêdayîşî dest pêkerd. Zonayoxanê edebîyatê şarî, Ewropa di tîp û motîfanê sonikan sero xebatî kerdî û kitabî neşir kerdî. Ma vêynenî kî cigêrayîşê folklorî, şaxê edebîyatî yo û edebîyatî keno temom. “Sebebê vecîyayîşê edebîyatê muqayeseyîn, qey cadayîş û averberdişê edebîyatê xu yo, ino rid ra tetkîkkerdişê edebîyatê sewbîna mîletan o” (Aytaç, 2013: 32). Wexto kî merdim edebîyatê muqayeseyînî sero xebatan keno, lazimo kî têna girêdayê yew eser mebo, fikiranê xu û ewnîyayîşê xu hîra bikero.

Semedê zonayoxanê edebîyatê muqayeseyîn, qey xebatanê yîn ê cigêrayîşî, se-haya tewr hol mewzuyê şîrîk î. Materyalêki fek ra fek kirişîyayî, yew welat ra şîyî yewna welat, destê yew nuştox ra resayî yewna nuştoxî, mîyanê inê mewzuyan di yî (Aytaç, 2013: 99). Wezîfeyê edebîyatê muqayeseyîn; esero kî zîwanê

cîyayan di nusîyayî hetê mewzu, fikir yan zî hetê şekil ra analîzkerdiş o, şîrîkî, sêycêtî û cîyatîyê ê eseran tespîtkerdiş o û inê xususan sero şîrovekerdiş o (Aytaç, 2013: 9).

Labelê ina muqayese têna bêteateyê di eserê ziwananê cîyayan di nêvirazîyeno. Eserê kî eynî zîwan di nusîyayî benateyê yîn di zî xebatê muqayeseyî bena. Xebatê muqayeseyî di ganî gayeyo vêrîn; têveranayîşê eseran nêbo, merdim lazimo kî hêverî xu biresno îlm. Şîrovekerdiş û tehlîlê yew eser, hendê nuştîşê yî gureyêko zehmet o. Cigêrayox hêverî xu rê/rî yew teori kifşe bikero û goreyê yî hereket bikero.

Cigêrayîşê folklorî di zaf teorî estî, cigêrayoxê folklorê xebatanê xu bi inê teorîyan, goreyê yew teorî virazenî. Mîyanê teorîyanê folklorî di tewr muhîmê yîn ekolê Fînî ya. Kaarle Krohn, metodê muqayeseyî namdar (Metodê Fîn-Metodê Tarîx Coxrafya) îzeh kerdo û qeydeyê cigêrayîşê folklorî ardo meydan (Türkmen, 2008: 114).

Ekolê Fînî di çekuyê “varyant, orjînal, kronoloji û coxrafya” zaf muhîm î. Varyanto orjînal yan zî bi îfadeyê Krohn “ûrform” bîngê teorîyê ano meydan. Yanî goreyê teorîyê Fînî; mîyanê se(100) varyantan di yewî orjînal o û eyê bîn vatişî xeripnaye yî (Pertev, 2015: 44).

Gelo, ma mîyanê varyantan di kom varyant goreyê kom peymeyan (kriter) orjînal hesabnenî? Eg ma yew varyantê sonikî, orjînal ferz bikir, gelo ina sonik mûmkun o hetonê inê rojan bê bedilîyayîş bîyero? Şar zereyê yew lokiz (fanus) di nîyo kî pîyer mûdaxaleyanê teberî ra qefîlnaye bibo. Her vatox, her yew pasajê sonikî, bi yew şeklêko neqîşnaye newera vano û sonik bi ino şeklê xu beno yew varyant û her ca ra vila beno. Kesî kî sonikan vanî beno kî; nameyê sonik, qehremanê sonik, rol û hedîseyanê sonik bibedîlnê, sonika xu derg yan zî kilm vajî. Labelê gon bîngê û temayê sonikî muhefeze bikerî. Sonikanê şarî di, zemûnê vîyerte di derheqê însanîyet di sirrî estî û cayo kî tede ameyî arêdayîş, ûrf û edetê ucayî sonikan di muhefeze benî.

Sonika ma kuwena tewirê sonikanê heywanan. Ziwanê Latînkî di fabl (fabula) yeno me'nayê qalkerdişî, ina sonik mîyanê dinyayê heywanan di vîyerenê û tedeyîyê sonik bizafî qalkerdiş o. Bîxususîyet sonikanê heywanan di; hûnerê teşhis (çayê însangirewtîş) û întak (qiseykerdiş) zaf muhîm î. (Bîlkan, 2009: 87).

Yanî heywanî benî wayîrê xususîyetanê însanan. Nê heywanî bi însanan ra qalî kenî, rahar mujnenî ci, aqil danî yîn û însanan tengasîyî ra xelisnenî. S. Sakaoğlu qey me'nayê sonikî hîna vato: Qehremananê yê ra tayê yîn heywan î û tayê yîn zî fantastîk î, hedîseyanê yê welatê sonikan di vîyerenî, yew çîyî xeyalî yî û yew tewiro fekkî yo labelê goşdaranê yê sonikan re bawer kenî (Sakaoğlu, 2012: 2).

Têna sonikî nê, metnî edebî zî dinyayê xeyalanê însanan di yenî meydan. Sanikî; heyatê şarî, fikir û zîkrê şarî, ûrf û edet û kûltîrê şarî, şekilê ciwîyayîşê

şarî û xeyalanê şarî zereyê xu di kom kenî. Mabenê zemanê vîyerte û îstîqbalî di wezîfeyê yew pirdî genî.

Inê sonikî yanî sonikanê heywanî; goreyê sonikanê raştîkin û fantastîk hîna kilmek î. Sê vateyê verînan dersdayîş û ekserîyet qey îqazkerdiş vajiyenî. Heywanî; semedê sembolizekerdişê însanan î (Karadağ, 2004:198). Sonikanê fabl zaf rehet yenî fomkerdiş, ziwanê yîn rengîn î û bi yarî yî. Ino rid ra qicî inê sonikan ra zaf heskenî.

Fabl vateyêko alegorik o wezîyetê însanan bi xeberdayîşê heywanan îfade keno û înan ra netîceyêko exlaqî vecîyeno. Ino xusus sonikanê heywanan di hîna zaf vecîyeno verbê ma. Ziwanê sonikan di, ziwanê qalkerdişê şixulîyeno, yanî dîyologî zaf î. Her fabl di fikrek, temayêka cemaatî esta û muheqqeq qey însanan yew mesaj dano. Fablan di her heywan sembolê yew tîp û rolî yo. Misal; şêr, sê qiralî yo û sembolê cesaretî yo. Lûy dekbazîyê, fêlbazîyê temsil kena. Mar xayîn, bêbext û dişmen o. Her heywan, goreyê wezîfeyêkî û rolêkî zereyê sonik di ca geno.

Cigêrayox destpêkê xebatê xu di; gonî eseranê kî muqayese keno, hevêrî nuştoxanê yîn bido şinasnayîş. Mewzuyanê şîrîkî û motifan yew bi yew tetkîk bikero û muheqqeq cîyatîyê yîn, zereyê çarçewayê metodê xu di tasnif bikero (Aytaç, 2013:100).

Ma na xebatê xu di sonika Kurmanckî, M. Emîn Bozarslanî ra girewt. Sonikê Bozarslanî yew şeklo edebî di ameyo nuştiş û hetê zıwanî ra zaf zengîn û zelal a. Sonikê Bozarslanî pîyerê unsuranê sonikan zerreyê xu di muhefeze kena. Sewbîna varyantê sonika Kurmanckî Kêz Xatûn esta la sey sonikê Bozarslanî derg nîya. La hetê muhteva, karakter û lezvate ra eynî ya. (Gazî, 2006: 99)

Nuştox serrê 1934 di bajarê Dîyabekir di yew dewa Licê di ameyo dinya. Kîtabanê xu hem bi Tirkî û hem zî bi Kurmanckî nuştî. Zafê kîtabanê namdar açarnayo ziwanê Kurdî. Dora vêrîn Tirkîya di, bi ziwanê Kurmanckî di kîtabê hîkaye (Meyro-1979) wi neşir kerdo. Derheqê sîyaset, tarix û folklorê Kurdan di zaf kîtabî nuşto. Mudeyêk mûftîtiyê kerdo û serrê 1979 di şîyo Swed û uca di cuyeno (Bozarslan, 2002: 115).

Sonika Zazakî zî hetê ma ra arêdayîya û vatoxê yê Sedîya Cîrît a (Septioğlu, 2019). Vatoxa ma 55 serrî ya û dewa Zûvîr (Guewdere- Pali) ra ya. Mektebî nêwendo la bi îmkananê xu nuştiş û wendiş musaya. Badê zewajê xu, serrê 1992 di şîya Almanya û uca di cuyena. Mîyanê varyantanê Zazakî di ina sonik hîna teferuatîna a. Vatox, nameyê cayanê dewa xu û werê xu sonika xu di ca dayo ci. Her varyant, mintiqaya kî tede vajiyayo, coxrafayê mintiqayî ra besteyo, sembol û xususîyetanê uca yî zereyê xu di top keno. Xususîyetanê lezvateyê sonikanê Zazakî, exleb Kurmanckî yî la sonika ma di lezvate Zazakî vajiyaya. Kîtabê Îsmet Borî di lezvateyê varyantê sonika ma Kurmanckî ya. (Bor, 2013: 19)

Benateyê zaffiyê varyantanê sonika ma (Zazakî) di cîyatîyê muhîm çinîyî. Têna sonika Sebehedîn Bor arêdayo pîyerin ra cîya yo. Sonika kî ma vonî kîtabê *Vîstonikê Dadîyê Mi* di vîyeren; têna di qehremanê serekeyî (merri û gûlal xatûn) şîrîk î la hedîse û qehremanê bînî bedilîyayî (Bor, 2013: 333).

Ma vatibi kî, sonikan di nameyê cayan nêvîyerenî. Labelê hem sonika ma di hem zî sonika Xezala Şarikî “*Gûlala Gulxatun*” di nameyê cayan û nameyê yew merdimî vîyeren. “Kuçey Evdûn rî kena war. Emîn Evdûn ho ser bûn ya,... “Gûlala Gulxatun awk di şîya, dusya pûncey Pird Palî ya” (Şarikî, 2002: 87-88). Têna mintiqayanê Pali û Çewlîg di sernameyê sonik di nameyê “Gûlal Xatûn”vîyeren. Cayê bînan di sername “Kêz Xatûn” a.

2. Varyantê Sonika Kurmanckî

2.1. Kilmîyê Sonikî

Yew Kêz Xatûna zaf rind esta. Wexto kî tîj dona ser qalikanê yî yê rengîn, qalikê yê beriqîyena û leylan dona. Labelê goreyê rindiyê xu, ehendî zî qurayî û fexîr kena, xu qowmê xu ra pîl tepîşena. Kêz Xatûn yew roj xu bestena, xemel-nena şîna xu rî gêrena mîyerdi. Zaf rahar şîna onîyena linge yê ha dejena, çahar linganê xu kena mîyanê silî, dona verê tîjî, sil bena wuşk û ci rî bena, di citê sol. Seba kî linge yê di sil bena wişk, wexti g’ rahar ra şîna, linge yê ra “req-req” veng vecîyena. Zaf şîna tay şîna, raştê yew şiwone yena. Şiwone wexti g’ Kêz Xatûn vênena, persê xu sê yew lezvate ci rî vano. Kêz Xatûn zî cewab dona, vona; “Ez xu rî gêrena mîyerdi.” Şiwone von; “Eg ti kêna bibên mi ti girewtên.” Kêz Xatûn zî vona; “Eg ti mi bigirewtên, ti yers bibîyên, ti pê çinê dên mi r’?” “Şiwone von; “Mi pê ina çûwê xu dên tu r’.” Kêz Xatûn tersena û uca ra dona ra, şîna. Ina rêy raştê yew aşwûn yena. Wi zî ci rî a lezvate vono û perseno. Kêz Xatûn yî rî zî eynî cewabon dona. Ya zî şiwone ra çinê persa bî, yî ra zî persena. Aşwûn cewab don; “Mi pê ina çemçeçûyê xu dên tu rî.” Kêz Xatûn yî ra zî xatir wazena û kuwena rahar. Raştê yew merrî yena. Eynî qîseyan merre yê ra zî vano. Kêz Xatûn honê persena. Merre vano; “Ez tu dona ser sarê xu, la ez zaf yers ib’, ez pê bueçê xu don tu r’.” Kêz Xatûn xu bi xu vona; bueçê yî mi nidejnena û peynî di zewijîyênî. Yew mûdo ra pê merre von; “Werê ma tay mendo, ez şîna bajar keyeyê mîrî, ma rî wer ona”. Ya zî vona “Ez zî şîna verê yew çalê aw, sareyê xu şuwena.” Kêz Xatûn şîna verê çalê aw nişka ra lingê yê rîyesena û ginena mîyanê çalê awî. Yew aspar uca ra vîyeren, Kêz Xatûn qêrena, vona; “Asparo, wexto g’ ti şî keyeyê mîr, Merrî Axa uca di yo, yî ra vaj; Kêz Xatûn kewta çalê aw, lez şû, yê bixeles!”... Aspar onîyeno çew çinîyo, la wexto kî resena keyeyê mîr, inê çîyan vano. Merre her çî goşdarî keno, ca d’ vazdono û şîno reseno Kêz Xatûn. Merre bueçê xu keno derg, seba kî yê bixeles. La Kêz Xatûn nazon kena. Merre hîrê rey bueçê xu keno derg, kuweno layk, la seken niken pê yê baş niken. Peynî di yers beno, bueçê xu don yê rî, Kêz Xatûn mîyanê awî di xeniqîyena.

2.2. Fîgûrê Sonikî

Sonika Kurmanckî di serqehreman, Kêz Xatûn a (kurmancî di *kêzika rêxê* yeno vatiş) yanî yew luelik (bûcek) a. Mewzuyê sonik, temayê sonik û munayîşê hedîseyan hathatê Kêz Xatûnî di vîyerenî. Destpêkê sonik di rindiyê yê û fexrê yê tesvîr bena. Sonikanê Kurdan di “kêzik” sembolê rindî yo. Peynîyê sonikan, exleb bi bextîyarî qedîyena la pêynîyê sonika ma trajik a çimkî qurratî û nazê Kêz Xatûn peynîyê yê ona. Sonika Kêz Xatûn di kêzik sembolê qurratî yo. Xususîyetê xirabî, yanî fexir, xu pîl vênayîş û nazê bêlûzûmkerdiş Kêz Xatûn di estî. Hedîseyê sonikî, bizafî mabenê yê û merre di vîyerenî. Vatoxî qîsêkerdişê merre û Kêz Xatûn zaf derg tepîştö.

Karakterê bînî; “*kêzikê din, şivan, aşvan, mişk, suwar û xulam*” sonik di sê “tîp” hesibyenî. Mîyanê sonikanê Kurdî di karakterî sey şiwone, aşwûn, cityer û aspar zaf vîyerenî. Ma eşkenî vajî, inê karakterê kî sonikan di vîyerenî, sê yew dekorê sonikî yî. Merre fîmsalê holiyo la peynîyê sonik di qey dersdayîşê sonikî, peynîyê holiyê xu nêano.

Sonikanê Kurdan di merre her çend qicik bibo zî ardimkar û şîrîn o û probleman di serfîraz beno. Merre ina sonik di hetonê peynîyê sonik karaktero hol o la ridê înadê Kêz Xatûnî, xirabî keno. Bêla zî seba dersdayîşê sonik, nuştöx merre visto rolêko xirab.

2.3. Wextê Sonikî

Tayê xususîyetî estî kî sonikan; hîkaye, mît, efsane û roman ra cîya kenî, inê xususîyetan ra tewr mûhîmê yî, unsurê “wextî” yo (Bilkan, 2009:74). Zafiyê tewiranê edebî di wext kifşe yo la sonikan di mefhumê wext zaf mûhîm nîyo. Merdim sanikan di zaf goş nêdano zeman, mekan û heqîqet. La sonikan di çîyo mûhîm, binge û meqsedê sonikî yo. Sonika ma di wextê kî vîyerenî inê yî; “*rojek ji rojan*”, “*pirr çû hundik çû*”, “*rojêk*”, “*mûdeyek*” vîyerenî. Inê wextî kifşe nîyî, xura semedê sonikvajî wext mûhîm nîyo, mewzu mûhîm o.

2.4. Mekanê Sonik

Sonikan di ca; herçend xeyalî bibo zî, rawrê cayê kî ma tede cûyenî sonikan rî beno mekan. Dinyayê sonikan di tewir-tewir ca estî û zaf lez zî bedilyenî. Zerreyê sonikan di mûhîmîyê cayî, hendê wextî nêbo zî zaf mûhîm nîyo. Bixususîyet sonikî; yew welat di, dewan di, bajaran di, koşkan di, ser koyan di, hegeyan di vîyerenî. Ina sonikî di cayî kî vîyerenî: “*welatên kêzikan*”, “*qerax*”, “*aşek*”, “*perê bajarek*”, “*kavîla xaniyek*”, “*kuna diwarê oda xulaman*”, “*çala awê*” yî (Bozarslan, 2002: 63-87).

3. Varyantê Sonika Zazakî

3.1. Kilmîyê Sonikî

Gûlal² kuwena rahar vona ez şîna xu r' zewcîyena. Yew cityer vêynena. Cityer von:” Gûlal, se ra?” Gûlal sê lezvate nameyê xu û wasfonê xu vona, dima vona,” Ez şîna xu r' gêrena zewac”. Cityer von,” Mi bigîr.” Gûlal vona;” Ben, la ti mi bigîr, ti yers ib', pê çînê mi kişeno?” Cityer vono;” Pê ino pirsê³ xu, ti kişena.” Gûlal vona,” Nê tu nigena.” Uca ra şîna, şîna Delverg⁴, uca di yew şiwone vêynena. Şiwone yê ra persena, von; “Se ra? “. Gûlal eynî çîyan, yî ra zî vona. Şiwone von; “Ez pê ina zelê xu ti kişena.” Gûlal tersena, vona; “Ez ti nigena.” Honê kuwena rahar, şîna verê arîyê Wûs, uca di yew merre vêynena. Merre zî eynî çîyan persena. Gûlal cityer û şiwone ra vatibi se, yî ra zî vona. Merre von; “Ez pê bueçê xu wa filîkin a, tu kişen. “Gûlal vona; “Bueçê tu nemir a, mi nidejnena. Ez tu gena.” Pîya zewijîyên. Mûdeyek dima beno wûsar. West pîr ecuzî yo. Vewr helîyawa, yew xetê awk yena. Gûlal şîna vêr derî, lîyê xu nona sêr adîr. Merre ra zî vona; “Ti zî şû veyveyê lajê axayî, ma rî wer bîyar.” Gûlal wexto kî şîna verê xetê awk, nişka ra laser yeno, ya erzena xu ver û hetonê Pirdê Palî şîna, uca di yew çîya aliqîyena. Yew aspar uca ra vîyeren. Gûlal qêrena, vona; “Ti şîn veyveyê laj axayî, merre ra vaj, wa bîyer mi îtaya ra bixeles. Aspar şîno keyeyê axayî çîyê kî eşnawito, uca di vano. Merre bin textê sifre di yo û veng şîno ci, ca d' vazdono hetonê Pird Palî. Bueçê xu keno derg û vano; “Xonim bîye, tu qedênen”. Gûlal xelisneno û şîni keyeyê xu. Çend rojî ra dima, merre vano; “Ez vendena ombazanê xu, tu zî ma rî yew mastibo powc. Gûlal mastibo nona ser, mastibo pixûr dona, ya ginena zerreyê mastibo, mirena. Merre yeno zere, vendeno, Gûlal çînî ya. Onîyeno, Gûlal ginawa zerî mastibo, merda. Ombazanê xu ra zî vano; “Vila bîyen, xonim merd”.

3.2. Fîgûrê Sonikî

Sonika Zazakî di serqehreman, Gûlal Xatûn a. Wexto kî name dîyenî qehremananê sonikan, meqsedê yî qey vîrardiş û asankerdişê vacîyayîşê sonikan o (Bîlkan, 2009: 99). Gûlal, luelikê silî ya, ina sonika ma di Gûlal, sembolê dej û wefayî ya. Çîyî kî sareyê Gûlal Xatûn ra vîyerenî problemê cinîyan î.

Ina sonik di zî merre qehremanê diyîn o. Merre yew karaktero hol û ardimkar o û ina sonik di merre Gûlal xelisneno û çîmanê goşdaranê xu di beno qehreman.

Hedîseyê kî mabenê bûcek û merreyî di vîyerenî, ina sonik di hîna zaf î. Karakterê bînî, cityer, şiwone, merre û aspar î. Rol û wezîfeyê nê karakteran û karakteranê sonika Kurmanckî eynî yê. Pêynîyê sonik di zî, yew cumle di embazê

2 Yew qal ma di (Zûvîr) esta. Vonî “emeg mi, bi emeg gûlal”. Gûlal şîna, xebitîyena, xebitîyena. Sil dona arîye, kena gud, xu r' kaşkena, yena vêr kaş, gudê yê fek ra vera diyena, şîna. Vonî, emeg Gûlal pîyor otir şî. Ayê ra von “emeg ma, bi emeg gûlal”.

3 Pirs: Yew çuwa zaf derg a, lewê yî di yew mîx ho pa.

4 Dewê Zûvîr ‘îd nomê yew ca yo.

merreyî vîyerenî. Ina sonik di zî hedîseyî, dormaleyê Gûlal di vîyerenî la sonik di xususîyetanê yê ra derg û dila behs nêbeno.

3.3. Wextê Sonikî

Ina sonik di zî wext kifşe nîyo, sê pîyerî sonikan. Nizdîyê pêynîyê sonik, wextanê sê “yew-di roj, wisar, waxt Pîr Ecûz” vîyerenî. Sonikvaj zereyê sonikê xu di menayê wextê Pîr Ecûzî ra behs kena. “Waxt Pîr ‘Ecûz di rê- rê varon varen, rê-rê zî bena tîj. Hîre ruej zimiston ra gena, çar ruej wisar ra gena” (Septioğlu, 2019). Pîr Ecûz kûlturê Kurdan di yew wext o. Mîyanê Kurdan di serr goreyê aşman nê, goreyê hedîseyanê tebietî name dîyeno ci. Ma vêynenî kî kûltir û coğrafya tesîrê ina sonika ma kerdo.

3.4. Mekanê Sonikî

Sonikan di nameyê cayan vîyerenî la kifşe nîyî û sey tewiranê edebî yê bînî teswîrê yîn nêvirazîyenî. Îzahkerdiş û dasinaşnayîşê cayan, exleb sonikan di çînîyî. Mekanî kî sonik di nameyê yî vîyerenî, cayanê dewa Zûvîrî yî: “mehlê Evdon, kuçê Hewên, yegê kê Hecî Heyder, delverg, vêr arîyê Wûs û Pird Palî”. Vatişê sonikan goreyê kî merdimo kî vano bedilîyeno. Vatox nameyê cayan, karakteran û sewbîna çîyan daxîl keno. Cayê kî nameyê yî kifşe nîyî “vêr xetê awk, keyê axayî, kîye”.

Yew varyantê Çolîg di nameyanê “Pali û laj mîrê Pali” vîyerenî. Sonik bi sernameyê “Zewaj Gulalxatûn” vîyerenî (Bor, 2013: 21). Xura ina sonik kom dewa Pali di bîyer vatiş, muheqqeq nameyê Pali vîyerenî.

4. Muqayeseyê Sonikan

4.1. Çiyatîyê Sonikan

Sonika Kurmanckî bi formelê sonikan dest pêkena. Sonika Zazakî di formelê destpêkerdişî çînî yo. Nameyê sonika Kurmanckî, çekuya “kêz /kêzik” qey hemmi luelikan yena vatiş la sonika Zazakî di “gûlal” nameyê luelikê silî yo. Xususîyetanê ser qehremanê wird sonikî, yewbînan ra çîyayî. Kêz Xatûn; nazdar a, pê xu rid-yena û fexir kena. Gûlal zî xu wasifnena la fexir nêkena.

Sonikan di teswîrê karakteran û cayan sê tewiranê edebî ê bîn, zaf nêvecîyeno vernîyê wendoxan. Bozarslan, di rîpel teswîrê serqehremanê sonikî keno, him hetê teberî (fîzîkî) ra dano sinaşnayîş, him zî hetê ruhî ra. Nuştox; hûneranê teswîrî, mubalaxayî û teşbîhî sonika xu di zaf hol xebitnayo. Sonika xu; bi yew ziwano zelal, asan û dewlemend nuşto û no rid ra wendiş û fomkerdişê sonikî merdimi rî şenik yeno. Cumleyê yî derg û qeydeyîni û qiseykerdişê karakteran kilm nîyî.

Karakterê bînî (şiwone, aşwûn, merre) wexto kî Kêz Xatûn rî qal kenî yîn zî wesifanê yê danî. Veyvêyê Kêz Xatûn û merre ra derg û dila behs keno. Sonika Zazakî seranser diyalog ra yena meydan û sonik di qet teswîr çînî yo.

Sonika Kurmanckî di embazanê Kêz Xatûn, him destpêkê sonik di him zî pêynîyê sonik di Kêz Xatûn rexne kenî. Nuştox, şîretê sonik bi vesîleyê înan dano. La nuştox nê şîretan zaf derg kerdo. Sonikanê heywanan di exleb, mesaj yan zî şîretê sonik yew-di cumle yî. Sonika zazakî di şîretdayîş çîni yo.

Merre wexto kî reseno hewara xonimê xu, sonika Kurmanckî di hîrê rey kuweno layk, bueçê xu, yê rî derg keno la nazê Kêz Xatûn, merre yers keno û persa kî Kêz Xatûn merre ra persabi bena raşt. Yanî pê bueçê xu dano yê rî û qeldeno bin awî rî û Kêz Xatûn xeniqîyena. Sonika Zazakî di merre Gûlal xelisneno û sonik dewom kena.

Sonika Zazakî di çiyatiya zaf muhîm, Gûlal mastibo powcena û ginena zerreyê mastibo, mirena. Mastibo, werê Zazayan a namdar a. Vatoxê ma werê xu yê mehelli daxilê sonika xu kerda. Her varyant, mehsulê vîrê vatoxê xu yo. Beno kî sonik tam nîyero vîrê vatoxî û kê m bivajîyo. Reyna beno kî tayê hedîseyî sonik di çîni yê la vatoxî hişê xu di nayê pîyeser û sonik deforme kerda.

4.2.Şîrîkiyê Sonikan

Wird sonikî zî zewacê kêzikî sero awon bîya. Kêz/ Gûlal Xatûn keyeyê xu ra vecîyena û kuwena rahar xu rî gêrena mîyerdi. Raştê hîrê karakteran yena. Mabenê yê û karakteran di eynî diyalog û seycê lezvate vîyerenî. Lezvateyê varyantan di zî şîrîki esta. “*Bî şimiken req-reqûne. Bî fistane gulavdûne*”(Sonika Kurmanckî). “Sol zixalîn a, Tumon dixalîn a”(Sonika Zazakî). Xususiyetane şimik/ sol û fistan/ tumon ra behs kena. Wird eşyayî zî ayê Kêz/ Gûlal Xatûnî yî. Ma inê lezvateyan ra zî fom kenî, Kêz Xatûn xu ra heskena, xu wasifnena û bi ina halê xu qurrayî kena.

Kêz/ Gûlal Xatûn şiwone û ey bînan ra eynî persan persenî, yîn zî vanî kî ma pê inê çîyan ti kuwenî: “*darê kaşo, çeçeqa aşê, dûv* (Sonika Kurmanckî)”, “*pirs, zel, bueça filikin* (Sonika Zazakî)”. Nameyê inê eşyayan çîya bibo zî wezîfeyê yîn eynî yî. Yîn wexto kî îna vonî; ya bîye merre pîyerin ra zaf tersena û eynî cewaban dona. Sebebê qebulkerdişê zewacê merreyî, Kêz/ Gûlal Xatûn di zî eynî yo. Bueçê merre nemir a u yê nêdejnena.

Wird sonikan di zî Kêz Xatûn qowmê xu ra yewî ra nêzewicîyena. . “*Lê muşk ne kezîk bû, biyani bû û kurê xelkê bû*.”(Bozarslan, 2002: 87). Kêzikanê bîn vanî; merra, ma ra nîyo û lajê şarî yo. Mîyanî însanan di hîna wo. Însanî kî tîyedir zewicîyenî lazimo kî cemaate yîn, kulturê yîn, bawerîyê yîn re yewî şîrîk bibo.

Bad zewajê yîn, wird sonikan di hedîseyî, eynî dewam kenî. Merre şino keyeyê axayî (mala mir/ veyveyê axayî. Kêz/ Gûlal Xatûn zî şina verê liç/ xetê aw û ginena mîyanê awî û hewar kena. Yew aspar uca ra vîyerenî û vengê yê eşnaweno, şino keyeyê axayî mîyanê cemaat di çîni eşnawito, vano û veng şino merre. Merre erzîyeno reseno hewarê xonimê xu. Sonika Kurmanckî di Kêz Xatûn sey mîyerde xu nêkena, nazan kena û peynî di mirena.

4.3. Lezvateyê (Vacvacox) Sonikan

Sonik di zıwanê qalîkerdişê esas gerîyeno û her çend vajîyayîşê sonik sey nesir bibo zî tayê sonikanê Kurdî di qisimanê vendayîşê sey şeklê nazimî (şîr) vajîyeno. Inê lezvateyî sey yew deyîr yenî goşê merdimî. Qisekerdişê qehremanan zî formê lezvate di vajîyeno. Nê lezvateyê rawrê bê me'na yî û yewbînan rê eleqeyê yîn çînî yî. Meqsedê vatişê lezvate, dîqetê goşdaran vatox sero komkerdişo û hetonê pêynîyê sonik mereqê yîn kêmnêkerdişo.

Formelê sonikan hetê S.Sakaoglu ra îno şekil kom biyî.

- a. Formelê Destpêkerdişî,
- b. Formelê Girêdayîşî
- c. Formelê kî eynî durum di xebitîyênî
- d. Formelê Qedinayîşî (Sakaoglu, 2002: 265).

Sonika Kurmanckî bi “*Hebû tunebû carek ji caran, rehme li dê û bavên guhdaran, xeyn ji cendirme û tehsildaran. Demek ji deman li welatek ji welatan... .5*”dest pêkeno (Bozarslan, 2002: 63). Werteyê sonik di Kêz Xatûn xu sê şîr dona sinasnayîş:

“Ez Kêz Xatûn im, qahkrengin im.

Pirr xweşik im, pirr şîrin im.

Bi cavdîtn ez kêzîk im.

Lê bî rasti ez zêrin im” (Bozarslan, 2002: 64).

Wexto kî Kêz Xatûn şina cê şiwone, aşwûn û merre; eyî hîrê hemin zî yew lezvate vonî.

“Kêzê kêzê, Kêz Xatûnê.

Bî şîmikên req-reqûnê

Bî fistana gulavdûnê.

Tu ji ku ve têyi, bî ku ve dîçi?” (Bozarslan, 2002: 69).

Formelê girêdayîşê; sonika Kurmanckî di vîyerenî û nê cumleyanî: “*Rojek ji rojan, Pirr çû hundîk çû, çû hey çûûûû*”.

Sonika Zazakî di formelê destpêkerdişî çînî yo. Gûlal Xatûn sê lezvate cevab dona karakteranê bîn û yîn re îna vona:

“Lîya, ez Gûlal nîya.

Ez Gûlal a, Gûl Xatûn a,

Sol zixalîn a,

Tumon dixalîn a” (Septioğlu, 2019)

Yew zî wexto kî vendona aspar “*Astwareko, puer çareko*” vona (Septioğlu, 2019).

5 M. Emin Bozarslan alfabe-yê Jacobson şixulnayo.

Şîretê sonika Kurmanckî hetê kêzikan re vajîyayo. Şîreto kî goşdaran re diyno; gonî merdim tim exlaqê yî hol bo û gonşenik bo. Lazimo kî merdim qedrê heskerdoxanê bizan û yîn re rik mekir. Eg merdim bîlasebeb înad bikir, çîyê xirab yenî vênîyê yî.

Vatoxê ma Sedîya Xonim, cayê dewê xu, rindîya kûlturê xu û werê xu daxîlê sonika xu kerda. Sonika Zazakî di Gûlal hetê merre ra nîyena kiştîş. Bêla sonikvajê ma nêwazena merre çimê wendoxan di suçdar bibo. Ina sonik di şîret çinî yo û beno kî vatox mesajê sonikî bawê goşdaran verdaya.

Netîce

Ma sonika Gûlal Xatun a Zazakî û sonika Kêz Xatûn a Kurmanckî muqayese kerd. Ma kilmiyê wird sonikî da û inê sonikan hetê figûr, ca û wextî ra analîz kerd. Şîrîkî û çîyatîyê sonikan yew bi yew rêz kerd û lezvatayê sonikan muqayese kerd.

Ma peynîyê xebatê xu di dî kî, wird sonikan di zî sername, karakterî, eşyayî, cayî û hedîseyî bizafî sey yewbînan î. Zaza û Kurmancî hetê kûltur, bawerî, zîwan û coxrafya ra yewbînan re nîzdî yî û çîyî yîn ê mûşterek xêlek î. Xura xebatê muqayese, benateyê di eserê serbestkî (rastgele) sero nêvirazîyena. Lazimo kî benateyê eseran di hetê mewzu ra, hetê vatişî ra yew şîrîkiyê û tekîliyêk bibo.

Eserê edebîyatî hetê herkesî ra sêycê fom nêbîyeno û eynî eser sero herkes yewna qeyde hîs geno û fikirîyeno. Çimkî her însan; tedeiyê eserî, sembol, şîrîkî û çîyatîyê eserî bi goreyê dinyayê xu fom keno. Wazeno kî; ino însan wendox zî bibo, cigêrayoxê edebîyatî zî bibo ferq nêkeno. Honê ino cigêrayox yan zî wendox mumkun o kî; esero kî sero xebat kerdo, rêya diyîn di bi şeklêko çîya analîz bikero.

ÇIMEYÎ

Aytaç, Gürsel, *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Say Yayınları, İstanbul, 2013.

Bilkan, Ali Fuat, *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2009.

Bor, İsmet, *Vistonikê Dadîye Mi*, Weşanxaneyê Roşna, İstanbul, 2013.

Bozarslan, M. Emin, *Kêz Xatûn, Meselokên Lawiran III*, Weşanên Deng, İstanbul, 2002.

Gazî, Mustafa, *Gurzek ji Zargotina Zarokan/ Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepora Kurdî, 2006.

Karadağ, Metin, *Türk Halk Edebiyatı Anlatı Türleri*, Ürün Yayınları, Ankara, 2004.

Pertev, Ramazan, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok-Teorî-Rebaz-Lîteratur-Berawirdî-1*, Avesta, 2015.

Sakaoğlu, Saim, *Masal Araştırmaları*, Akçağ, Ankara, 2012.

Septioğlu, Pervin, “Gökdere Bölgesinde Derlenen Masalların İncelenmesi (Metin-İnceleme)”, 2019, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.

Şarikî, Xezala, “*Gûlala Gulxatun*”, Vate: Kovara Kulturî, Hûmare: 19, Skârholmen / Sweden, Zimistan 2003.

Türkmen, Fikret, “*Mukayeseli Edebiyat ve Mukayeseli Folklor Çalışmaları Üzerine Görüşler*”, Türk Dünyası İncelemeleri Dergisi / Journal of Turkish World Studies, Cilt: VIII, Sayı 2, Sayfa: 111-116, İzmir 2008.

DAHÛRANDINA HELBESTA BERKEN BEREH YA BI NAVÊ “TU CARÎ BERNEDE DESTÊ EVÎNÊ” (The Analysis Of The Poem Berken Bereh With The Title “Never Leave The Hand Of Love”)

Mehmet Nur YAVUZER¹

Puxte

Di vê xebatê da dahûrandina helbesta Berken Bereh ya bi navê “*Tu Carî Bernede Destê Evînê*” hatiye kirin. Pêşîyê derbareyê helbestvan da bi kurtasî agahî hatiye dayîn, piştra dahûrandina helbestê hatiye kirin. Behsa nerîta helbestê hatiye kirin û li ser tema, ciwankarî û ziman hatiye rawestan. Berken Bereh, nûnerekî girîng yê helbesta modern ya Kurdîyê ye. Helbest bo wî qadeke azad e, ku ew helbestê wek welatê xwe pênase dike, herwiha helbesta xwe dişibîne axa xwe. Temaya vê helbestê du hestên bihêz in ku ew evîn û hêvî ne. Serena va helbestê, di serî da helbestê wek helbesteke ku li ser evîndariya dil hatiye nivîsîn bide hîskirin jî, ji naveroka helbestê tê têgihîştin ku armanca ku bi hezkirinê yê destbikeve tê ziman. Naveroka helbestên Bereh zêdetir civakî ne. Sîtava rewşa serdema wî û civaka wî di helbestên wî da reng vedidin. Ew, li pey nûjenkirina helbesta Kurdîyê tevdigere lê vê nûkirinê li ser bingeha helbesta Kurdî ya berîya xwe pêk tîne. Herwiha ew radihêje bi dengê xwe bibe dewama nerîta helbesta kurdîyê. Ramana netewetîyê ya ku rengê hevpar yê helbesta Kurdîyê ye, di helbesta Bereh da jî xuya dibe. Bereh, vê rengê hevpar, li gorî şert û mercên serdemê, bi hêma û hênerên edebî va ristiye ku ev helbesta wî, yek ji helbesta kurdî ya modern û pêşketî, ya ku li ser rêça nerîta netewetîya helbesta Kurdîyê ye.

Bêjeyên Sereke: Berken Bereh, Helbest, Rengê Netewetî, Êş, Evîn, Hêvî.

Özet

Bu çalışmada Berken Bereh'in “*Bırakma Hiçbir Zaman Sevginin Elini*” adlı şiirinin tahlili yapılmıştır. Öncelikle şair hakkında kısa bir bilgi verilmiştir,

1 Xwendekarê Doktorayê/PhD Student, e-mail: mehmetroniyavuzer@gmail.com

sonrasında şiir tahlil edilmiştir. Şiir geleneğinden bahsedilmiş, tema, edebi sanatlar ve dil üzerinde durulmuştur. Berken Bereh modern Kürt şiirinin önemli temsilcilerinden birisidir. Şiir onun için özgür bir alandır ki o şiiri ülkesi olarak tanıtır. Aynı zamanda şiirini kendi toprağına benzetir. Bu şiirin iki ana teması iki güçlü duygu olan sevgi ve umuttur. Şiirin başlığı şiiri başta bir seveda şiiri olarak hissettirir, şiirin içeriğinden sevgi ile elde edilecek amaç konusu işlendiği anlaşılmaktadır. Onun şiirlerinin içeriği daha çok toplumsaldır. Döneminin ve toplumunun durumu onun şiirlerine yansır. O Kürt şiirini modernleştirmek için çabalar ve bu modernleştirmeyi gerçekleştirmek için kendini kendinden önceki kürt şiirine yaslar. O, kendi sesi ile kürt şiirinin devamı olmak için çabalar. Kürt şiirinin ortak rengi olan ulusal düşünce, onun şiirlerinde de kendini gösterir. Bereh, bu ortak rengi, kendi döneminin şartlarına göre, imge ve edebi sanatlar ile kendi şiirinde örür ki onun bu şiiri gelişmiş modern Kürt şiirinin bir örneği olup, ulusal Kürt şiir geleneğinin devamı olma özelliğini taşımaktadır.

Anahtar Kelimeler: Berken Bereh, Şiir, Ulusal Renk, Acı, Sevgi, Umut.

Abstrac

In this research, Berken Bereh's poem "Never Give Up the Hand of Love" was analyzed. First, the poet was briefly introduced, then poem was analyzed. The tradition of poem was mentioned, the theme, literary arts and language were emphasized. Berken is one of the important representatives of modern Kurdish poem. For him, poem is a free field, which he defines as his country, and likens his poetry to his own land. The two main themes of this poem are love and hope for two strong emotions. Although the title of the poem initially feels the content of the poem as love of heart, then the purpose to be achieved with love from the content of the poem is explained. The content of his poems is more social. The situation of his period and society is reflected in his poems. He endeavors to modernize his Kurdish poem, and he justifies himself to his previous Kurdish poem to realize this modernization. He strives to be a continuation of his Kurdish poem with his own voice. National thought, which is the common color of Kurdish poem, also shows itself in his poems. Bereh knits this common color in his own poem with images and literary arts in accordance with the conditions of his time, which is an example of his advanced modern Kurdish poem and is a continuation of the national Kurdish poem tradition.

Keywords: Berken Bereh, Poem, National Color, Pain, Love, Hope.

Destpêk

Di sedsala 19'an da bi geşedanên modernîzmê, çawa ku bi her alî va reng û rûçikê cihanê guherî, bi heman awayî ev guherîn li ser edebîyatê jî pêk tê. Bi ramanên nû yên ku bi modernîzmê pêk tê, edebîyat jî xwe nû dike. Bi vê nûbûnê, cureyên edebîyatê ji alîyê naverok û ruxsarê va duguherin. "Ev pêla nûhbûn û veguhaztinê gav bi gav xwe gîhand her deverê û erdnîgarîya kurdan jî.² Bi vê nûbûnê, helbest jî wek yek ji cureyên edebîyatê, guherîn dixwe. Helbesta Kurdî di destpêkê da ji alîyê naverokê va diguhere, piştra qalîkê xwe diavêje û xwe nû dike, bi vî awayî dirûvê helbesta modern digire. "Nûkirina helbestê ne tenê di edebîyata Kurdî da, di edebîyatên neteweyên dewrûber da jî ji naverokê dest pê dike.³ Di edebîyata Kurdî da pêşiyê Hecî Qadirê Koyî (1816-1907) di helbestên xwe da rexne dine li ser naveroka helbesta klasîk ya Kurdîyê, naveroka helbestê nû dike⁴ û demajoya helbesta modern ya Kurdîyê dide destpêkirin. Di vê demajoyê da "helbesta Kurdî ya modern bi Evdila Goran va digihîje lûtkeyê.⁵ Yek ji pêşketinên modernîzmê ramana netewetîyê ye ku ew li cihanê belav bûye û bandor li edebîyatê kiriye, bi heman awayî bandor li helbesta kurdî ya ku ji alîyê naverokê va guherîye jî kiriye. Ramana netewetîyê dibe rengê hevpar ya helbesta kurdî ya nû. "Helbesta Kurdî ya modern di nav peywenda guherînên civakî-sîyasî yên rojhilata navîn de derçûye, geş bûye û bi hilweşîna Împeretoriya Osmanî û hilatîna neteweperwerîya kurdî ra li hev aliqîne.⁶ Ev rengê hevpar ya helbesta Kurdîyê, bi xwe ra nerîteke domdar pêk tîne ku bandor li helbestvanên li pey hev tîne dike. "Piranîya helbestvanên tevkarîya helbesta modern kirine çalakvanên sîyasî û çandî bûn ku hewl didan bi pêdeçûna modernîteyê ya di nav civaka xwe re li hev bikin, têkoşîn û îtirazên wan, herî baş li helbesta wan da rû dane.⁷ Di helbestê da ramana netewetîyê ya ku bi Hecî Qadirê Koyî va destpêdike û bi helbestvanên pey wî Ebdurehîm Rehmî (1890-1958), Pîremêrd (1867-1950), helbestvanên ekola Hawarê û hwd. va didome, wek nerîtek di helbesta kurdî da cih digire û pêlên wê di helbesta kurdî ya îro da hê jî berdewam e. Herwiha ramana netewetîyê ya ku rengê hevpar ya helbesta Kurdîyê ye, di helbesta Bereh da jî reng vedide. Derbareyê vê Bereh dibêje; "Helbesta min digel ku li ser nerîta netewetîyê bilind bû û hîna jî bi awayekî xurt pala xwe dide wê.

2 Berken Bereh, "Helbesta Kurdî a Modêrn û Dîroka Wê", *Kovara Bîr*, Zivistan-Bihar, j. 4, 2006, r. 179.

3 Zülküf Ergün, *Nerî û Helbest, Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de*, Nûbihar, Îsta - bul, 2017, r. 12.

4 Hacî Qadirê Koyî, *Dîwan*, Weşanên Nefel, Stockholm, 2004, bnr.

5 Farangîs Ghaderî, *Ji Nû ve Hizirîna li Ser Peydabûna Helbesta Kurdî ya Modern*, wer. ji Îngilîzî Fexriya Adsay, *Zarema*, j. 3, Nisan 2015, r. 137.

6 *h.b.*, r. 139.

7 *h.b.*, r. 139.

*Bereken Bereh bi reng û dengê xwe helbesta neteweyî dixemilîne.*⁸ Helbesta Bereh ji alîyê naverokê va serdanpê Kurd û Kurdî ye û ji alîyê dirûv va jî nûjen e. Ew, derbareyê felsefeya helbesta Kurdî da dibêje: “*Felsefeya helbesta Kurdîyê Ehmedê Xanî berîya sêsed û pêncî salî danîye, ew felsefe hê jî şîara herî mezin û bilind e. Lê bi hişmendî û feraset û kirasekî modern.*”⁹

Bereh, wek helbestvanekî pêşverû tevdigere, ku ew li gorî şert û mercên serdemê li pey nûkirina helbesta kurdîyê ye. Ew li pey qalikeke nû ya helbestê tevdigere, dike ku helbesteke kurdî ya resen û nûjentir pêk bîne û bibe helbestvanekî resen, herwiha dirûvekî rojaneyî bide helbestê. Bereh derbareyê bingeha helbesta kurdî gotina Arjen Arî par ve dike û dibêje; “*Em mecbûr in, helbesta xwe li ser koka helbesta ya mayî ava bikin. Bikin ku bibe dareke geş û gur û pirşax. Yan an em rabin ser xwe, em helbesteke an jî şêweyeke helbestê ya îthal bikin, sibê dusibe xelk yê henekên xwe bi me bikin.*”¹⁰ Bereh derbareyê ramana ‘dewra klasîzmê bihurîye’ da rexnek dîne li ser helbestvanên kurdîyê û dibêje, “şairên kurd yê ciwan ji vê ramana ku divê helbest ji hêla naverok, peyama, hêma, îmaj, rûxsar, şewaz û teşeyê bi temamî modern be, şaş têgihîştine, wan hîç berê xwe nadane helbesta klasîk ya Kurdîyê, berevajî ku turîkê xwe bi helbestên kurdî yên berîya xwe dagirin û pênuşa xwe bigerînin, berê xwe dane berhemên bîyanîyan, teknîk û vegotina Ewropîyan, ji ber vê jî nekarîne ku awa û çawanîya vê nûbûna helbestê pênase bikin ku bi vê şaşîyê jî rastîya civakê dûr ketine. Bereh dibêje, ji alîyê teknîkî va xwe şibandina bi helbestvanên bîyanîyan ne pirsgrêk e, lê ji hêla naverokê va xwe şibandina helbestvanên bîyanîyan, pirsgrêk e. Ew dibêje, ruhê helbesta Kurdî divê Kurd be û kiras (teknîk) modern be.”¹¹ Ew di helbestê da radîhêje ku zimanê helbesta kurdîyê xurt bike û bi rew û rêzên helbesta nûjen ya serdema xwe û bi dengê xwe tevdigere, resenîyê bi dest bixe. Derbareyê naveroka helbesta wî da Jîyan wiha dibêje: “Bereh, ne ji gundan dibe û ne jî ji bajaran. Ne gundan dicibîne û ne jî bajaran. Hem gundan dipesinîne hem ji bajaran.”¹² Taybetîyeke berbiçav ya Bereh ev e ku bergeha wî ji guherînan ra vekirîye. Bereh di gotareke xwe da wiha dibêje:

Di van salên dawî da divîyabû helbesta me, êdî ji her alî va dest bi hewldaneke modêrntir bikira. Lewra rewşa civak û çanda me rastî veguherînen berbiçav tên. Li Başûr hema bibêje bingeha komareke serbixwe hatiye avakirin, bajar bi xeml û rengên modernîtîyê dirûv û teşe girtiye. Têkilîyên civakî li gor

8 Rêdûr Dijle, “Hevpeyvînek bi Berken Bereh re”, *Kovara Kund*, j. 2. Tebax, Îlon, Cotmeh, 2018, r. 5.

9 *h.b.*, r. 9.

10 *h.b.*, r. 7

11 *h.b.*, r. 7-8.

12 Adar Jîyan, “Êş “ a “şagirtê(n) êvînê” ango Berken Bereh”, *Kovara Wêjeyî Çand û Hunerî*, j. 49, Rezber-Kewçêr 2013, r. 43.

bazara kapîtalîzmê pêk tên. Li Bakûr hema bibêje gund nemane. Gelemperî, Kurd bajar û bajarokan civîyane. Ev rewşa ne siruştî di çand û têkilîyên civakî da rastî, kartêkirina tevlihevîyêkê jî bi xwe ra anî. Mixabin li gor vê prosesa nû, helbesta kurdî hê bi peyv û hevokên gundîyane tên nivîsandin. Em rastî dîmenên bajarvanî, çêj û tahma civakeke rêk û pêk nayên. Ango helbestvanên me hê li ser mêrga Hawarê dibezin û tiştine ku wan pêk anîbû wek benîştê dicûn.¹³

Bereh wek helbestvanek xwedî dengê xwe yê resen e. Bi hêmayên xurt helbestên xwe xemilandîye. Helbestên wî sade û kurwate ne, herwiha nerm û fesîh in. Di helbestên wî da gund û çolter xweş in, pak û bedew in, bajar tevlihev in û bi dijwarîyan va dagirtî ne. Ew, evîndarê jîyaneke azad e, helbestê wek welatê xwe dibîne û helbest bo wî qada azadîyê ye. Ew, derbareyê gotina xwe ya "helbest welatê min e" da wiha dibêje:

Helbestvan karibe yên aîdê vê dinyayê ne -qehr, tenêti, eşq, hezkirin, têkçûn hwd.- di helbesta xwe de bi awayek serkeftî cî kiribe, êdî xwedî welatekî ye, ku li wir her tişt yê wî ye, ew xwediyê wê gencîneyê ye. Helbest ji ber ku derfeta xwederbirîn û xwebicîhkirina -bêsansûr û bêdesthilatdarîya tu kesî- dide helbestwanî ew dibe welatê wî yê herî şîrîn û pîroz. Lewra li wira, desthilatdar, stemkar, axa, şêx, karbidest û zordar nîn in. Çiya, banî, robar, kulilk, mêrg û çîmen û hesp û hewa û ewr û baran- dinyaya xeyalî- bi gor dil û viyana te ne. Tu li wir serbest û azad î, çawa dixwazî wisa dijî.¹⁴

Li ser van gotinên Bereh em têdigihîjin ku ew di helbestê da per û baskên xwe bi dilê xwe lê dide. Helbestvan, berevajî astengîyên jîyanê di helbestê da serbest e, xwe dibîne û tîne ziman. Di jîyana Bereh da helbest xwedî cihekî girîngtir e ku ew çil sal e, bi helbestê ra bi hevhal e. Ew, derbareyê têkilîya xwe û helbestê da dibêje; "*Ez û helbest bûne du hevalên hev, dostên qedîm. Yanî ji jin û mêrtîyê jî pêşdetir. Ji ber ku helbest ji bo min warê bextewarî, warê xwebûn û warê xwenaskirinê ye, têkilîyêke gelekî xurt di nabera min û helbestê da heye.*"¹⁵

Bereh, wek nêçîrvanê bêjeyan, wan bi pisporane dijbere û di helbestê da li her tîne. Ew daxwazek ji helbestvan dike û dibêje; "*Divê zimanê xwe baş bizanibe. Her peyvek xwedî maneyekê ye, Ew mane bi jîyana civakî ku bi hezar salan re dirûv û teşe girtiye.*"¹⁶ Ew, di helbesta xwe da hunereke pêşketî nişan dide. Ew, ji alîyê ziman va xwedî ferhengeke dewlemend e û bi giranî helbestên kurt dihene. Hest û hizrên xwe bi vegotîneke kurt derdibire. Di helbestên wî de ne bi tenê vegotin; gotin û bêje jî kurt in. Ev bi serê xwe hunerek e û hostatîyek dixwaze.

13 Berken Bereh, 2006, r. 187.

14 Dilawer Zeraq, "Hevbêjîn, Helbestvan Bi helbesta Xwe li Xaka Xwe Vedigere", *Kovara Wêjeyî Çand û Hunerî*, j. 49, Rezber-Kewçêr 2013, r. 37.

15 Roger Dîjle, *h.b.*, r. 6.

16 *h.b.*, r. 9.

Nemaze, di warê helbestê da şêwaza vegotina kurt wekî serkeftinê tê dîtin. Bi ya min Berken Bereh şayanî vê serkeftinê ye.¹⁷ Bereh derbareyê hevîrê helbesta xwe yê kurdewar da wiha dibêje:

Çavkanîya helbestên min, jîyana civaka min, erdnigariya wê û xem, metirsî û keyalên wan yên dahatûyeke rengîn û bi ber e. Lew, ez bi xwe jî bi wê ciwatê re mezin bume û bi wê ciwatê re êşiyame û bi wê ciwatê re bi rê va diçim ber bi paşeroja xwe va. Ji ber hindê, her helbesteke min wekî çemê ji karêza xwe der bibe û diherike ber bi şetî, ji ruhê min dizê û ber bi ciwatê va diherike. Vêca her bêje û rêzikeke min ji reng û dirûvê civaka min e. Ango helbesta min dişibe axa xwe! Ji bo wê dikare xwe zû bigihîne dilê xwîner û çêjekê dihêle li ser dil û hişê wî.¹⁸

Di hevbêjîna me ya bi Berken Bereh da me dît ku ew zimanekî xweşik û nerm bi kar tîne û xwediyê bîr û dîrokekî xurt e. Li ser helbestê serê xwe êşandîye, bi helbestê razaye û rabûye. Ew devokên Kurdîyê û bêjeyên wan devokan baş dizane. Mirovekî dîlnizm û letîf e. Derd, kul û helwesta civaka wî, wî diêşîne. Helbestên wî hestên bi êş û jan va dagirtî ne, hêmayên bi doz û armanc in û bi sûrûştî welatê wî va xemilandî ne.

1. Jîyana Helbestvan û Berhemên Wî

Berken Bereh, di sala 1954'an de li Şîrnexê ji dayik bûye. Enstîtuya Perwerdeyê ya Boluyê tamam kiriye. Yekem car helbestên wî di kovara Tîrêjê (yekem kovara kurmancî û dimilkî, 1979) de hatiye weşandin. Herwiha helbestên wî di gelek kovar û rojnameyên bi Kurdî yên bi navên Nûbûn, Nûdem, Jiyana Rewşen, Nûbihar û hwd. de belav bûne.¹⁹ Helbestên wî, bi zimanên Tirkî, Erebi, Farisî, Fransizî va hatine wergerandin.²⁰

Berhemên Wî: *Êş*, Weşanên Sî, 2001; *Şagirtên Evînê*, Weşanên Sî, 2003; *Pandomîm*, Weşanên Belkî; 2006, *Şîna Helbestê*, Weşanên Doz, 2008; *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê Re* (di gel pirtûkên bi navê Şerbeta ji Êgir û Haikuyê) hemû berhem, Weşanên Lîs, 2011, *Ji Dûriyê Re*, Weşanên Lîs, 2013; *Xewna Dawî*, Weşanên Lîs, 2016, *Xana Xeme*, Weşanên Lîs, 2018, *Çemê Baranê*, Weşanên Avesta, 2019.

Wegerên Wî: Lapis Lazûlî, Mehmet Altun, Weşanên Babil, 2011; *Gotina Deryayê ye*, Mustafa Köz, Weşanên Lîs, 2012.²¹

17 Adar Jiyan, *h.b.*, r. 42.

18 Ceng Hêvîdar, "Helbest Çekeke Vejînê ye li ser ilê Berken Bereh", *Kovara Wêjeyî Çand û Hunerî*, j. 49, Rezber-Kewçêr 2013, r. 60.

19 Berken Bereh, *Ji Dûriyê Re*, weşana Lîs, Ankara 2013, r. 4.

20 <http://www.kurdilit.net/>, Gihîn: 29.05.2020.

21 Berken Bereh, *Xewna Dawî*, weşana Lîs, Diyarbakır 2016, r. 4.

Berhema wî ya **Dilê Min Palgeh e Ji Işqê Re** bi navê **Kalbim Bir Yas-tıktır Aşka** (Weşanên Evrensel Basım Yayın, 2012) bi zimanê Tirkîyê va hatiye wergerandin. Roger ACUN, di teza xwe ya 'Îmaj di Helbesta Kurdî ya Nû ya Bakur de' li ser çar berhemên helbestvanên Kurdîyê rawestiyaye ku yek ji wan Berken Bereh e.²² Herwiha Bereh li "İstanbul Biligi Üniversitesi, Hakkari Üniversitesi, gelek bajarên cihê yên mîna, Amed, Wan, Hewlêr, Dihok û hwd. tev li konferans û festîvalan bûye û pêşkeşîyan kiriye."²³

2. Helbest:

*Tu Carî Bernede Destê Evînê*²⁴

şahid e
 ev bajarê xemgînî jê difûre
 ev dîwarê te coş û peroşa xwe lê nexşandî
 ev delala mil bi mil ji te re bûyî pişt
 ev çîyayên asê
 park
 û meydan
 û çolter
 bi kevir û axa xwe
 bi mêş û mozên xwe
 ev welatê perçeyek ji biheştê
 û dîroka xwîna min jê diherike

 metirsî
 şik û guman
 wek mija li ber tavê ferikîye
 rêya menzilê bûye rêkurt
 û zilm
 wek genimê hatî hêran
 piç piç
 û hûr hûr bûye
 kengê şalûlên evînê

22 Roger Acun, Îmaj Di Helbesta Kurdî Ya Nû Ya Bakur de, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016.

23 Berken Bereh, <https://www.kurdipedia.org/> Gihîn: 12.06.2020.

24 Berken Bereh, *Çemê Baranê*, Avesta, Stenbol. 2019, r. 11-12.

*lîrandibin bi zimanê xwe
yê xweşik û navmalî*

*li vî bajarê, bêdengîyê ji xwe re mêranî dihesibîne
tu tenê yî û birîndar î
rûyê te galerîya xeman
destên te li xurbeta kar û şixul
û dilê te ye tê kutan li ser sinda êşê*

*dê hilweşe ew kelehên êşê lê kirî
dê vebin derîyên li ser dengê te hatî radan
kengê zeman bibe leyîstoka te
kengê bibî bezvanekî baş
û bernedî destên hez kirinê*

*ma vêca çi bêjim
ez baş û li ser xwe me
şî'ran dinivîsim havêna wan ji kulîlkan
û şev amadehiya xatirxwestinê dike.*

Berken Bereh, Dihê, 1983

3. Dahûrandina Helbestê

Hunermend neynûkekê li cîhanê digire, sirûşt, meriv û jîyanê di berhema xwe da nîşanê me dide. Ji mêj va ne berhema hunerî bi neynûkê va hatiye şibandin. Şibandina berhema hunerî tenê ji bo berhema wêneyê na, çawa ku Sokrates jî dîne ziman; “ya ku helbestvan dike jî şewq e”, ji bo helbestê jî wisa ye. Di rexneya dîrokî da gelek caran gotina helbestvanê yewnan Snnoides; “wêne helbesteke bêdeng, helbest jî wêneyeke bi ziman e” wek ramanek derdikeve pêşberî me. Li ser taybetîya herî girîng ya hunerê ramana hevpar ya hunermend, rexnegir û ramangêran ev e ku huner rastînîyê vedibêje. Di navbera huner û rastînîyê da bêguman têkilî heye ku ya girîng ev e; gelo hunermend rastînîyê çawa olan dide. Helbet têgiha rastînîya ku tê olandan ji bo hunermend, ramangêr û estetîkvanan xwedî wateyên cuda ne. Di nav kesên ku hunerê wek “olandan”ê pênase dikin da rastînîya ku tê olandan li gorî hin kesan ew “rastînîya rûxarî” ye, li gorî hinekan “puxtya sirûştîya mirov” e, li gorî hinekan “rastînîya îdealkirî” ye û li gorî hinekên din jî “jîyana rojane ya civakê” ye.²⁵ Berhem ji pêşveçûnên civakê

25 Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*, İletişim Yayınları, ç. 7, İstanbul, 2004. bnr.

azad nînin, mijarên xwe ji jîyan û civakên ku jê derdikevin digirin. Derbareyê vê Bereh wiha dibêje: "Çavkanîya helbestên min, jîyana civaka min, erdnigariya wê û xem, metirsî û xeyalên wan yên dahatûyeke rengîn û bi ber e. ... helbesta min dişibe axa xwe!"²⁶ Her çiqas ramana ku berhem wek neynûka civakê hatibe pejirandin jî divê neyê ji bîr kirin, ku rastinî di berhemê da tê duruvandin û ji nû va tê hilberandin. Helbesta Bereh zêdetir bi rastînîya civakê va têkil e. Ew, wek hunermendek rastînîya civakê olan dide. Rewşa civakê ya ku di nav dîrokê da teşe girtîye di helbesta Bereh da olan dide. Ew ji derûnîya civakê, liv û çalakîyên wê haydar e. Bereh di vê helbestê da rastînîya civakê bi hunera xwe dirûvîne û ji nû va hildiberîne. Civakê di nav serdemê da dinirxîne, rewş û helwestê tîne ziman, hêvî û armancek ya ku dê dahatûyê da pêk were kifş dike.

Li gorî rexneya civaknasîyê, edebîyat bi serê xwe çênebûye, di nav civakê da derbûye û derbirîneke civakê ye. Şert û mercên civakî hunermend, berhem û xwîner kifş û ava dike. Berhem ji ber xwe dernakevin, hilberînerên wan ji alîyê rewşa welatê wan, şert û mercên fizîkî, sîyasî û civakî dertên.²⁷ Bandora şert û mercên sîyasî, civakî di helbesta Bereh da dîyar in. Ji ber şert û mercên civakî, helbestvan vê helbestê li ser vîn û armancekî ava kiriye. Li gorî Lukacs, "peywira hunermend ew e ku hêmanên serdemekê yên ku li ser pêşveçûn û geşedanên civakê dîyarker in, vebêje. Bi alîkarîya kes û bûyerên ku di naveroka berhemê da hene, serdemekê dîrokî yan jî avanîya wê tê şênberkirin."²⁸ Bereh, hêmanên serdemekê yên ku li ser pêşveçûn û geşedanên civakî dîyarker in, di helbestê da ristîye. Ew pirsgirêkan rêz dike û çareserîyan kifş dike. Di helbestê da daxwaz û armanc dê bi hesta hezkirinê bi dest bikevin. Yanê heke destê hezkirinê neyê berdan armanc yê bi dest bikeve. Ji ber vê helbestvan serenava, "Tu Carî Bernede Destê Evînê" li helbestê kiriye. Helbestvan dizane ku evîn hesteke qewî û xurt e ku ji bo armancê hewce ye. Heke bezayê baş destê evînê tu car bernede, kelehen ku ji aliyê êşê ve hatine lê kirin wê hilweşin û dengê ku ji aliyê zordaran ve hatiye birîn yê rizgar bibe, ew deng yê bigihîje sirûştîya xwe û ji nû ve bibe deng. Di helbestê de êşeke kur û giran heye ku ew encamek e. Di encama tişteki, belkî di encama bûyer û helwestekî de êşek qewimîye ku mîna ewrekî reş û giran xwe daye li ser singê û ranabe. Ev rewşa xerab di demekê dîrokê de qewimîye û hê jî berdewam e. Di helbestê da helbestvan di nav axaftinekî da ye. Dema ku em dêna xwe didin helbestê di navbera beşên helbestê da aheng û hevtamamîyek heye. Beşa yekem:

*şahid e
ev bajarê xemgînî jê difûre*

26 Ceng Hêvidar, *h.b.*, r. 60.

27 Berna Moran, *h.b.*: bnr.

28 Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, İletişim, ç. 11., İstanbul, 2003, r. 54-56.

ev dîwarê te coş û peroşa xwe lê nexşandî
ev delala mil bi mil ji te re bûyî pişt
ev çîyayên asê
park
û meydan
û çolter²⁹
bi kevir û axa xwe
bi mêş û mozên xwe
ev welatê perçeyek ji biheştê
û dîroka xwîna min jê diherike

Ev beş li ser sê hêmanên girîng ava bûne: Ya yekem **“helbestvan”** bixwe ye, ew temaşaker e û dinirxîne. Ya duyem **“kesek”** e, ku “ew kes” yan kesekî serbixwe ye, heta dibe ku ew kes civakê temsîl dike be jî. Lê dema ke meriv helbestê bi timî li ber çavan digire û li ser wê hûr dibe, meriv dibîne ku ew kes helbestvan bixwe ye. Hêmana sêyem bi sirûşt, dîrok û civaka xwe va **“welat”** e. Helbest di beşa yekem da bi bêjeya “şahid e” dest pê kiriye. Rêza yekem yek bêje ye û ev bêje bêjeyeke xurt û bandorker e. Ev bêje, balê dikişîne li ser helbestê. Ji ber ku helbest bi “şahid e” dest pê dike, nexwe bûyerek girîng li holê ye. Ji nişandayîna şahidan xuya dibe ku neheqîyek heye û yên ku di wî warî de şahidîyan bikin hene. Helbestvan paşê şahidan rêz dike ku ew wiha ne: bajar, dîwar, keçik, bi kevir, ax, moz û mêşên xwe ve ew welatê parçek ji bihiştê, park, meydan, çolter û dîroka bi xwîn.

Hêmana duyem **“kesek”** e ku me wî kesî dîyar kir û ew û delalek mil dane hev. Helbestvan di helbestê da cih daye jinê û wê wek delalek daye nasîn. Herwiha mil dayîna mêr û jinê ramana jiyana hevpar ya mêr û jinê, dîne li ber çavan. Bajarek heye û ew pir bi xemgîn e. “Ew kes” jî yek ji parçeyek ji bajêr têra xwe xemgîn e. Wî li ser dîwarê bajar coş û peroşa xwe neqş kiriye. Xwîna helbestvan ji dîrokê diherike, nişan dike ku zordarî dom dike. Nivîsên li ser dîwaran peyam in, armanc in, doz û daxwaz in. Ew bi rêya nivîsê xwe derdixe pêş.

Di helbestê da hêmana sêyem **“welat”** e ku helbestvan hezkirîyê welat e. Di vir da em dibînin ku helbestvan welatê xwe estetîze dike û disêwirîne. Welatê xwe wek parçayek ji biheştê dibîne. Di dîroka welatê helbestvan da xwîn rijîyaye û hê jî berdeyam e. Ji ber wê ye ew û bajarê xwe tev xemgîn in. Ev wêneya ku helbestvan di vê beşê de xêzkiriye, wêneya welatê wî ye û di heman demê da wêneya wî û ya civaka wî ye. Beşa duyem:

29 **çolter**: derveyî gund, bajar, bajarok, derên ji insanen xalî.

*metirsî*³⁰
şik û guman
*wek mija li ber tavê ferikîye*³¹
rêya menzilê bûye rêkurt
û zilm
wek genimê hatî hêran,
piç piç
û hûr hûr bûye
kengê şalûlên evînê
lîrandibin bi zimanê xwe
yê xweşik û navmalî

Di vê beşê da hest, derûnî û ziman derdikevin pêş. "*Bêjeyên arkaîk di avakirina îmajên wî de xwedî roleke giring in.*"³² Di vê beşê da em bêjeyên arketîpî³³ yên hêvî û bêrîkirinê dibînin. Li gorî dozîneya rexneya arketîpî ya Jung,³⁴ îfadeyên "metirsî, şik û guman" ji bo cihê ku tê bêrîkirin fikar û gûmanan jî tîne ziman. Di vê beşê da bêrîkirina cihekî tê dîtin. Yanê berîkirina bajar an jî welat tê dîtin. Lê li cem vê bêrîkirinê, fikar û guman jî hene. Helbestvan di cihê ku bîrê kirîye da ceribandînen xwe yê bi êş bi me ra parvedike.

Di wê bajar an jî welatê ku ji mêj ve ye, xwedî dîrokeke bixwîn e da hestên metirsî şik û gumanê jî berbelav in. Yê ku bi kirinên xwe metirsî, şik û guman pêk anîye heye û yê ku metirsî, şik û guman li ser hatiye pêkanîn heye. Yê ku bi xêra metirsî, şik û gumana ku pêk anîye, hewsarê civakê hildaye bin destê xwe. Di hiş û derîniya bindestan da metirsî, şik û guman hatiye avakirin. Zilmeke zêde li civakê hatiye kirin, tirs û xof ketiye dil û hinavên kesan. Helbestvan dibêje "kengê şalûlên evînê bilîrînin bi zimanên xwe yê xweşik û resen", wê gavê metirsî, şik û guman mîna mija li ber tavê dê bela wela bibin. Di vir da xwebûn û xwejiyin derdikevin pêş. Çivikên evînê merivên bindest û yên ku hatine astengkirin in. Dîyar e ku bi zimanê xwe na, bi zimanê yên din, yên serdestan diaxivin, yan jî nikarin bi rastîya xwe ra bijî. Helbestvan dixwaze di vî warê da merivên bajarê xwe hişyar bike. Dibêje ger hûn hemû bi zimanê xwe biaxivin, yan jî dema ku hûn hatin asta xwejiyînê, ew dem dema rizgarîyê ye. Di vir da ziman tav e û şalûlên

30 **metirsî**: fikar, şayîş, endîşe.

31 **ferikîye**: belavbûye.

32 Roger Acun, *h.b.*, 64.

33 **arketîp**: Arketîp ew e ku ji destpêka ku meriv hatine cihanê pêva di binhişê kolektîf da refstarên berhevkerî yên hevpar in. Bêrîkirin, hestek e ku ew di derûniya her merivî da heye. Ev hest hin caran ji bo merivekî, hin caran ji bo demekê û hin caran jî ji bo cihekî dikare were hîskirin (Carl Gustav Jung. *Dört Arketip*, wer. Zehra Aksu Yilmazer, ç. 5, weş. Metis. 2005, bnr.).

34 *h.b.*, bnr.

evînê jî merivên bajar in. Şalûl bi firîna xwe azadîya xwe dijîn, şalûlên evînê, yanê ew kesên ku ji aliyê ziman va hatine astengkirin kengav bigihîjin zimanê xwe, wê demê yê azad bibin. Beşa sêyem:

*li vî bajarê, bêdengîyê ji xwe re mêranî dihesibîne
tu tenê yî û birîndar î
rûyê te galerîya xeman e
destên te li xurbeta kar û şixul
û dilê te ye tê kutan li ser sinda êşê*

Helbestvan ji cihê ku lê dijî ceribandînen xwe yên bi êş bi me ra parvedike. Kesên bajar li hember zilmê bêdeng in û bajar vê bêdengîyê ji xwe ra mêranî dihesibîne. Di bajêr da yek heye û ew kes jî birîndar e. Dilê wî bi kul e û rûyê wî xemgînîya wî dide der. Herwiha civaka wî bi hemû neyînên xwe, wekî galerîya xeman di rûyê wî da xwe daye der. Ew birîndarê bêxemiya civakê ye. Ew di axaftina xwe da derbareyê civaka xwe da wiha dibêje: “Vêca her bêje û rêzikeke min ji reng û dirûvê civaka min e.”³⁵ Li bajarê xurbetê kar dike, lê her çirka demê dilê wî li ser sindê tê kutan. Ew di nav helwesteke trajîk da ye û di nav jîyaneke bi nakokî da ne. Ne dikare xwe bijî û ne jî dikare jîyana ku ji wî ra hatiye pêşkeşkirin bipejirîne. Dibê qey navika wî bi civakê va girêdayî ye, ku ne dixwaze navikê biqetîne, ne jî ji hal û helwesta civaka ku pê va girêdayî ye xweş e. Ji xwe di serdama modern da çî helbestvan û çî romanûsên kurdîyê ji ber astengî û tûndîyan çare ji derketina derveyî welat dîtine. Lê Bereh bi rastîya xwe û ya civaka xwe va xwe rû bi rû hiştiye û derneketiye derva. Derbareyê vê Bereh di axaftinên xwe da wiha dibêje: “*Lew, ez bi xwe jî bi wê ciwatê re mezin bume û bi wê ciwatê re êşîyame û bi wê ciwatê re bi rê va diçim ber bi paşeroja xwe va.*”³⁶ Dil, di helbestê da hêmayeke girîng e. Dil di nav çakûç û sindê da ye. Di vir da çakûç serdestên wî ye û sind jî rastiya wî ye, dil jî “ew” e. Helbestvan êşa ku tê jîyin bi metofora dilê ku li ser sinde tê kutan va şênber dike. Helbestvan wiha pê da diçe:

*dê hilweşe ew kelehên êşê lê kirî
dê vebin derîyên li ser dengê te hatî radan
kengê zeman bibe leyîstoka te
kengê bibî bezvanekî baş
û bernedî destên hezkirinê*

Helbestvan di vê beşê da dikeve di nav axaftinê da. Ew hêvî, bawerî û pêşbinîyên xwe rêz dike. Helbestvan ji xwe ra belê di heman demê da ji civaka xwe ra dibêje ku heke destê evînê hişke hişk were girtin û neye berdan, meriv bibe bezvanekî

35 Ceng Hêvîdar, *h.b.*, r. 60.

36 *h.b.*, r. 60.

û têkoşerekî baş û hakimê rihê wê demê, yenê têbigihîje, wê demê, dem dibe pêlistok û meriv dibe hakimê demê. Zanîn û amûr êdî di bin dest in. Dura kelehên êşê hildiweşin, lewre armanc bi dest dikeve. Helbestvan behsa hesta herî xurt dike. Hesta ku merivê cîhanê li ser lingan digire, wan li pey armancan dixê, ku ew evîn û hezkirin in. Evîna welat, hesreta welat, daxwaza mafên ziman, wekî mijar ji bo helbesta modern ya kurdî, ji bo zimananîna hestên helbestvanên ku nûnerê civakeke ku ji alîyê erdnîgarîyê va hatiye parçekirin û ji alîyê ziman va ketine di nav pirsgirêkên dijwar ra, guncaw û lêhatî ne, ku ew mijar di helbesta Bereh da rû didin. Di beşa dawiyê da helbestvan bi xatirxwestina şevê, helbestê diqedîne.

*ma vêca çî bêjim
ez baş û li ser xwe me
şî'ran dinivîsim havêna wan ji kulîlkan
û şev amadehîya xatirxwestinê dike*

Di dawîya helbestê da îronîyek xuya dike. Helbestvan "baş im û li ser xwe me" dibêje, lê di nav van gotinan da xemgînî û fikarên wî veşartî ne. Helbestvan rewşê û helwesta xwe anî ziman, xatir xwest û helbestê qedand, lê ne bi dilekî germ.

4. Ziman û Şêwe

Helbestvan, bi hêza gotin û vegotinê kul û xem li piştta helbestê bar kirine. Rewş, hest û helwestên mirovî bi zimaneki xwerû û bi hêmayên xurt anîye ziman. Helbestvan, wekî mêşa hingiv, ji kulilkên her rengî sûd wergirtiye. Zimanê ku di helbestê da bi kar anîye xweş, lihevhatî û xwerû ye. Yekî serhedî, botanî û bahdînanî dikarin bi qasî hev ji helbesta wî fehm bikin. Ev yek jî ji esasgirtina wî ya hemû devokan tê. Bi vê taybetmendîya xwe, wî devokên cuda yên welatê xwe bi hunerane lê kiriye. Bereh li ser helbestên xwe wiha gotiye: "Ez helbestên xwe bi zimanê xwê yê ku her bêjeyeke wê bi hezar carî hatiye birindarkirin û lê dîsa bi berxwedanekê kariye xwe bigihîne roja me ya îro, dinivîsim."³⁷

Zimanê wî ne saloganîk e û sirûştî ye û herikbar e. Helbesta wî ji aliyê naverok û rûxsarê ve nûjen e û bi pîvana serbest hatiye honandin. "Berken Bereh, zimanê gel bi kar tîne. Zimanê ku dûrî gel be, nikare nêzikî helbestê bibe. Zimanê xurt helbesta xurt derdixê holê. Zimanê helbesta Bereh xurt e. Ew, di helbesta xwe da bi helwesteke pêşverû tevdiqere. Têgihên nûjen bi kar tîne. Hebana bêjeyên xwe bi bêjeyên nû dadigire."³⁸

37 Ceng Hêvîdar, *h.b.*, r. 59.

38 Adar Jiyan, *h.b.*, r. 44.

5. Hunerên Edebî

Helbest li ser bêjeyan ava dibe. Helbestvan dikeve di nav çalakîyê û bêjeyan digihîne hev û wate li wan bar dike. Ciwankarî ji bo ku gotin bedew be, di xwe da pêwîstîyek dihewîne. *“Bi hêmanên ciwankariyê, rengê zimanê helbestê û yê hêmayê eşkere dibe. Bi rêya wê mirov xwe nêzîkî sirûştê dike, yan jî sirûştê nêzîkî xwe dike û bi vî rengî di navbera wan da têkiliyek saz dibe. Bê xêra vê têkiliyê peyv zindî dibin û wateyên nû digirin.”*³⁹

Helbest ji aliyê hunerên edebî va dewlemend e ku helbestvan ji aliyê bi kar anîna hunerên edebî hunera xwe ya pêşketî raxistiye li ber çavan. Ew, bi ciwankariyê reng û dirûvekî nû dide bêjeyan. Em dikarên bêjin helbest serdanpê bi hunerên edebî va hatiye ristin. Di helbestê da hêmayên ku bingeha helbestê ye, bi hunerên edebî va hatine pêkanîn ku di vê helbestê da wek hunerên edebî; mecaz û manendî, hatine bikaranîn.

Di beşa yekem da hêmayên wekî: **“bajarê xemgîn”, “çiyayên asê”, “welatê parçek ji biheştê”, “dîroka bi xwîn”** cih girtine. Di vê beşe da wekî hunerên edebî sparde⁴⁰ hene ku helbestvan, **“bajar, dîwar, keçik, welat, park, meydan, colter û dîrok”**ê wekî sparde bi kar aniye, ku ew mîna merivan şahidîyê dikin.

Di beşa duyem da **“şalûlên evînê”** wekî hêma hatiye bikaranîn ku wetaya wê **“merivên bêşûc û bê guneh”** in. Manendin/şibandin hene ku, helbestvan **“metirsî”, “şik”** û **“guman”**ê şibandiye **“mija li ber tavê”,** herwiha **“zilm”** jî şibandiye **“genim”**.

Di beşa sêyem **“tu tenê û birîndar î”** da mecaz hatiye bikaranîn. Lewre ew kes di rastîyê da ne birîndar e. Helbestvan **“rû”** şibandiye **“galeriya xeman”** ku bi vî awayî hunera manendîne bi kar aniye. **“Dilê te ye tê kutan li ser sinda êşê”,** di vir da mecaz heye ku behsa dijwariya jiyana wî kesî tê kirin. Herwiha hunera spardeyê heye ku **“dil”** di dewsa **“merivekî”** da hatiye bikaranîn.

Di beşa çarem da di **“kelehên êşê”** da mecaz heye ku **“keleh”** li derveyî wateya xwe ya rast, di dewsa piraniyê da hatiye bikaranîn. Di **“deriyên li ser dengê te hatî radan”** da **“derî”** di dewsa **“qedexe”**yê da hatiye bikaranîn ku di vir da hunera sparde tê dîtin. Di **“bernedî destên hez kirine”** da **“hezkirin”** şibandiye mirovekî ku deste wê heye, di vir da hunera kesandinê/teşxîs heye ku taybetîyeke merivî daye hesta heskirinê.

Di beşa dawiyê **“şev amadehiya xatirxwestinê dike”** da hunera kesandinê heye ku taybetîyeke merivan barê şevê kiriye, ku şew mîna merivan xwatirê dixwaze.

39 Remezan Alan, *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, Weşanên Peywend, 2015, Ste - bol, r. 107, 111.

40 sparde: îstîare.

Encam

Helbesta Berken Bereh li ser şopa nerîta netewetîya helbesta Kurdîyê ye. Wî, bendê xwe bi helbesta Kurdî ya berîya xwe va neqetandîye. Kirasê helbesta wî nûjen e, lê naveroka helbesta wî xwedî estetîkeke ku ji çand, dîrok, ziman, derûnî û sirûştta ku ji netewe û erdnîgarîya civaka xwe parzûnkiriye ye. Helbesta wî dişibe axa wî, ya ku xwedîyê sirûşteke bi xeml û dîrokeke êşbar e. Wî, helbesta xwe bi hêmayên xurt û bêjeyên kurwate ristîye, her wiha helbesta wî herikbar û bi teql e.

Helbesta wî, ji pênc beşan pêk hatiye ku di navbera beşên helbestê hevtamamî û aheng hene. Zimanê helbestê sade û fêambar e. Ziman ne devokî ye, ew standard e. Di helbestê de bi awayekî serkevtî hûnerên edebî hatine bikaranîn. Helbesta wî ne bi tund û bi şid e, nerm û herikbar e ku helbestvan wekî kesayetîya xwe ya dilnizmî, dilsozî û nermî helbesta xwe honandiye. Hestên arketîpî, armanc û hêvîya helbestvan di helbestê da derdikevin pêş, herwiha helbest ji aliyê naverokê va helbesteke civakî ye û li ser şopa nerîta netewetîya helbesta Kurdîyê ye, ku netewetî rengê hevpar ya helbesta kurdî ya modern e. Hezkirin wek temayeke sereke hatiye ristin ku evîn, hesta watedar û xurt e, merivan li ser pêyan digire û hêzeke germ di dilê xwîneran da dide peydakirin. Helbestvan rewşa jîyanê, helwest û hêvîya xwe anîye ziman. Helbest dide zanîn ku armanc yê bi hezkirinê bi dest bikeve.

ÇAVKANÎ

- Acun, Roger (2006). Îmaj Di Helbesta Kurdî Ya Nû Ya Bakur de, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.
- Alan, Remezhan (2015). *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebîyata Modern*, Weşanên Peywend, Stenbol.
- Bereh, Berken (2019). *Çemê Baranê*, Avesta, Stenbol.
- Bereh, Berken (2013). *Ji Dûrîyê Re*, Lîs, Ankara.
- Bereh, Berken (2016). *Xewna Dawî*, Lîs, Diyarbakır.
- Bereh, Berken (2006). "Helbesta Kurdî a Modêrn û Dîroka Wê", Kovara Bîr, Zivistan-Bihar, hejmar: 4.
- Koyî, Hacî Qadir (2004). *Dîwan*, Weşanên Nefel, Stokholm.
- Dijle, Rêdûr (2018). "Hepeyvînek bi Berken Bereh re", *Kovara Kund*, Hejmar: 2, Ankara.
- Ergün, Zülküf (2017). Nerît û Helbest, Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de, Nûbihar, İstanbul.

- Ghaderi, Farangis (2015). Ji Nû ve Hizirîna li Ser Peydabûna Helbesta Kurdî ya Modern, wer. ji Îngilîzî Fexriya Adsay, *Zarema*, j. 3, Nisan 2015.
- Jung, Carl Gustav (2005). *Dört Arketip*, wer. Zehra Aksu Yilmazer, ç. 5, Metis, İstanbul.
- Hêvîdar, Ceng (2013). “Helbest Çekeke Vejînê ye li ser dilê Berken Bereh”, *Kovara W*, Rezber-Kewçêr, j. 49.
- Moran, Berna (2004), *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, ç. 7, İletişim, İstanbul.
- Zeraq, Dilawer (2013), “Hevbêjîn, Helbestvan Bi helbesta Xwe li Xaka Xwe Vedigere”, *Kovara W*, Rezber-Kewçêr, j. 49.
- Jiyan, Adar (2013), “Êş “ a “Şagirtê(n) evînê” Ango Berken Bereh”, *Kovara W*, Rezber-Kewçêr, j. 49.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

BEYTÊN KURDÎ: MEMÊ ALAN WEK MÎNAK

Parviz JAHANY - Hasan ÇİFTÇİ

TAYBETÎYÊN SEBKA IRAQÎ

DI HELBESTÊN ÎBN ADEM (WACIM) DA

Hemin Omar AHMAD - Nurettin ERTEKİN

ZAZAKÎ DE SEBEBÊ VURÎYAYÎŞÊ VENGAN

Û CAVURÎNAYÎŞÊ VENGAN

Ahmet KIRKAN

WEKÎ NIMANDINA ZANAVÊ; RANÊZIKIYA

ZIMANÎ Û WÊJEYÎ DI KOVARA REWŞENÊ DE

Dilaver DÖĞER - Canser KARDAŞ

KURTENÊRÎNEK LI TÊGEHÊN EDEBİYATA DINYAYÊ,

EDEBİYATA BERAWIRDÎ Û NÊRÎNÊN DAVID DAMROSC

Türkan TOSUN

NAZİM Û ŞA'IR MELA ZAHİD ZEHERÎ (BAŞER):

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

Nurettin ERTEKİN

MUQAYESEYÊ SONIKANÊ KÊZ XATÛN A KURMANCÎ

Û GÛLAL XATÛN A ZAZAKÎ

Pervin SEPTİOĞLU

DAHÛRANDINA HELBESTA BERKEN BEREH YA

BI NAVÊ “TU CARÎ BERNEDE DESTÊ EVÎNÊ”

Mehmet Nur YAVUZER